

NÜDEM
WERGER

No 1 1996



NÜDEM
WERGER

Kovara wergerê

*

Xwedî û berpirsiyarê giştî

Chief Editor

Firat Cewerî

*

Hejmar 1, sal 1

Payîz: 1996

*

Postgiro: 636 36 25-2

ISSN: 1103-1964

*

Wêneya bergê: Tabloya Mark

Rothko, 1951-52, 295 x 235 cm.,

Nû York

*

Pergala bergê û rûpelan: Nûdem

*

Adres:

NÜDEM

Termov. 52 2tr.

176 77 Järfälla-Sweden

Tel û Fax: 8-583 564 68

NAVEROK

- 4 NÜDEM WERGER ♦ **Firat Cewerî**
- 6 ÇÎN Û EDEBIYAT ♦ **Ivar Lo - Johansson**
Werger: **Süleyman Demir**
- 19 ŞÎR DI SALÊN 2000'Î DE ♦ **Pablo Neruda**
Werger: **Dr. Poloço**
- 22 NIRXANDINA HELBESTÊ ♦ **Seamus Heaney**
Werger: **Şahîne Bekirê Soreklî**
- 42 ŞAHÊ KEMANÊ ♦ **Birgitta Bergman**
Werger: **Zinarê Xamo**
- 51 ÇIMA KOMPÛTER NIKARIN PIRTÛKAN WERGERÎNIN
Peter Gärdenfors Werger: **Arif Zêrevan**
- 58 MIROVÊN ŞIKEFTAN ♦ **Yaşar Kemal** Werger: **Felat Dilgeş**
- 94 LAŞÊ NIVÎSKAR ♦ **Marguerite Duras**
- 96 ÇÊXOVÊ HERDEMÎ ♦ **Sofia Grigoryeva**
Werger: **Hesenê Metê**
- 101 LI SER ŞIKÊ ♦ **Francis Bacon** Werger: **Beyhanî Şahîn**
- 107 MURATHAN MÜNGAN ♦ **B. Fundermann û H. Kalkan**
Werger: **Zinarê Xamo**
- 119 JI WAN RE BIBÊJE BILA MIN NEKUJIN ♦ **Juan Rulfo**
Werger: **F. Cewerî**
- 126 JI RÛPELÊN NENASKIRÎ YÊN ROJHILATNASIYA POLONÎ ♦
Jan Reychmon Werger: **Sidqî Hirorî**
- 142 SARTRE LI SER SARTRE ♦ **Michel Contat**
- 147 EWRÊ REŞ Ê LI SER TIRKIYÊ ♦ **Yaşar Kemal** Werger: **F. Dilgeş**
- 159 NE DEMA KIRÎN Û FIROTINA GULAN E ♦ **Erdal Öz**
- 164 ÎLYADA ♦ **Hemeros** Werger: **Süleyman Demir**
- 184 KURD DI TARÎXA TEBERÎ DE ♦ Werger: **Emîn Narozî**
- 213 JI EFLATÛN ♦ Werger: **Faxîr Mamedî**
- 214 HEVPEYVÎN BI MARQUEZ RE ♦ **Plino A. Mendoza**
Werger: **F. Cewerî**
- 226 ALBERT CAMUS Û ANTONIO DE SAINT - EXUPÉRY ♦ **Fawaz Husên**
- 232 JACK LONDON ♦ **Mustafa Aydogan**
- 236 DOSTOYEVSKÎ Û JOHN STEINBECK

Nûdem WERGER



Firat Cewerî

Bi gelemperî gava kovareke nû dest bi weşana xwe dike, bi pirsra "ji bo çi kovareke nû?" dest pê dike. Em ê negasiyonekê têxin navbera vê pirsra klasîk û bibêjin: "Ji bo çi *ne* kovareke nû?" Ger kovar bi kurdî be, armanca wê geşkirin û avakirina zimanekî edebî be, tradisyona kevnar şikandibe û dabe ser riyeye unîversal, wê çaxê em ê adjektîvekê jî li pirsê zêde bikin û bibêjin; rast e, ji bo çi *ne* kovareke nû?

Kovar ji bo gîhandina nivîskar û edebiyatvanan mîna laburaruaran in; nivîskar di kovaran de berhemên xwe yên pêşî diweşînin, keşîfên xwe di kovaran de dikin. Nivîskarên mezin, piraniya xelatgirên Nobelê

yên edebiyatê, serkêşên tevger û tendensên edebî, avakirên ekolan di kovaran de û li der û dora kovaran gihîştine. Kovaran her tim edebiyat aktuel hiştine, munaqêşeyên germ ji kovaran berê xwe dane civatan, civatan bi alîkariya kovaran berê xwe dane pêşerojê.

Me di pêvajoyê tecrubeyên weşana kovara Nûdemê ya pêncsalane de, girîngiya bi kurdîweşandina kovarekê dît. Niha, di demeke ku Nûdem pêncsalîya xwe dadigire de, derxistina kovareke din ya xwerû bi kurdî û xwerû ji wergeran pêkhatî, me bêhawe dilşa dike. Bê ku em îdiayên mezin bikin, em dikarin bibêjin ku wê kovara me ya nû bixwaze di riya wergerandina berhemên cîhanî de, zimanê kurdî ji kirasê folklorî yê teng derxîne, bi riya peydakirin û avakirina formulasyonên edebî, dewlemen-

diyekê bigihîne zimanê kurdî yê edebî û herweha kurdan bike şîrîkên edebiyata cîhanî. Di gavavêtina xebateke weha cidî û xwedîberpirsiyarî de, em dizanin ku wê gelek asteng û kelem derkevin pêşberî me. Lê ji ber ku em hêza xwe ji girîngiya karekî weha pîroz digirin, em bawer dikin ku em ê bikaribin bi we xwendevanan re zora hemû astengî û keleman bibin.

Mîna tê zanîn, Nûdem WERGER berdewam û zaroka kovara Nûdemê ye. Ew ji tecrubeyên kovara Nûdemê zaye. Loma wê polîtîkaya wê jî mîna ya kovara Nûdemê demokratîk, pîrhêl û plural be. Em ê di bijartîna nivîsan de li nêrîn û îdeolojiyên nivîskar û wergêran nenihêrin, lê em ê kalîteya nivîs û wergeran bingeş bigirin. Herçiqas em di destpêkê de salê du hejmar fikirîbûn jî, em ê salên pêşî qîma xwe tenê bi hejmarekê binin. Lê belê em ê bixwazibin têra xwendevanan tiştên xwendinê di hejmarê de bicivînin. Bi gotineke din, wê Nûdem WERGER hindik be jî, bixwaze valahiya ansîklopediya kurdî dagire. Yanî ew ê hem fêrker be, hem jî înfomatîf be; hem rola geşkirin û têkûzkirina zimanê kurdî yê edebî bileyize; hem jî edebiyat, felsefe û zanyariya cîhanî bigihîne civata kurdî.

Em ê di vê hejmara 1'ê de şîroveyên nivîskarê swêdî Ivar Lo Johansson yê li ser nivîskariya karkeran bixwînin; nêrîna Pablo Neruda ya di salên 2000'î re rewşa şîrê; li ser nîrxandina şîrê gotara Seamus Heaney ya girtina xelata Nobel ya edebiyatê; di navbera salên 1782-1840'î de hebûna dahiyekî kemanê Paganîni; pîrsgirêkên wergerê û nîkarîbûna wergerandina kompûteran ya berhemên edebî; jiyana kurdan ya di şikeftan de ji pê-nûsa Yaşar Kemal; herdemîya çîroknivîskarê rûs Anton Çexov; li ser şik, tol û mirinê ji Bacon; nêrîna Murathan Mungan ya li ser ziman û edebiyata kurdî; ji *Deşta sincirî* çîrokeke nivîskarê Meksîkî Juan Rulfo; di kevnokovarên polonî de kurdoloji; nêrînen Marquez yê di derheqa nivîskarî û nivîsandinê de; di dîroka Teberî de kurd û welatê wan; Îlyadaya Homeros; di heftê saliya filozof û nivîskarê navdar Sartre de, zehmetiyên wî yê nivîsandinê û hwd...


Bi hêviya têkiliyên berdewam û pêşerojêke rohnî... ✍

Çin û edebiyat

Ivar Lo - Johansson

Sala 1920-an, dîroka edebiyata Swêdê bi peyveke nû, bi peyva helbestvanê proleter, dewlemendtir bû. Edebiyatnasê akademîk Richard Steffan ev peyv xist zimanê me. Bi vê yekê, xwestina wî, ne kirina tiştêkî xerab bû. Ev nav, ji bo hinekarkerên ku xebata bi destan dikirin û hinek kesên ku xwe bi xwe gihandibûn berhemên edebî afirandibûn, hatibû gotin. Hinek ji wana bi vê peyvê kêfxweş bûn, lê hinekan jî, bi taybetî hozanan ev peyv qebûl nekirin. Dixwestin wek “helbestvanê bi rastî” bimînin. Lê peyva nivîskarê proleter ciyê xwe di zimên de girtima. Piştî deh salan, hejmareke baş ji wan kesên ku ew nav li wana dihat li Swêd derketin, bi kêmasî bîstek hebû. Desthilata Swêdê ya di warê edebiyatê de bi vê yekê kêfnexweş bû. Bi piranî tu xeter di helbestvan de nedidîtin, lê ên ku nivîsê nesir dinivîsîn, dibûn hedefa pîrê êrîşan, ya jî bi carekê re dihatin rawestandî.

Wê demê, hîna li Swêdê ferqeke mezin di nabêra çînan de hebû. Dema xuyabû ku helbestvaniya proletarya dike ciyê edebiyata kevnar a bûrjûva bigire, bawerî û êrîş çûn ser. Bi tirs û xiroşeke bi lez, nivîskarên proleter wek komunîst hatin destnîşankirin. Ev kirinên êrîşker, bû karekî rojane. Bêyî ku hêla estetîkî ya roman û çîrokên karkeran rexne bikin û kêmasiyên di wî warê de derxin, hat gotin ku edebiyateke ku xwe li gora edebiyata Sovyetiyana ava dike ye. Ji ber nezanîyê, li Swêdê, ji vê xetê re “realîzma sosyal” hat gotin. Ev yek ji serî ve şaş bû lê mixabin hîna jî tê gotin. Lê divê bê zanîn ku li Swêdê edebiyateke bedew k



dewletê bi rê ve dibir tunebû û hîna jî tune ye. Loma şaş e.

Li Sovyetistanê, ji kongra edebiyatê a sala 1934-an pê ve peyva “realîzma sosyalîst” hatibû bikaranîn. Lê wek ku rexnegirên me ên Swêdî bawer dikin, r peyva realîzma sosyal bû. Ew peyva ku çend salan bi sistî ji xwe ketibû ser z manê Rusan, cara yekem Maksîm Gorkî li ciyekî fermî, bi awayekî fermî bikar anî. Lê Sovyetiyên gotin ku êdî tu proleter li welatê wana tune, peyv, şaş e. Ji ber ku êdî çi hevvelatîyê Sovyetê ku heye, xwediyê milk û mekînan e, ne we ku peyva proleter dide nasîn, rût û bêmilkin, gotin. Lê li welatekî wek Swêdî kapîtalîst, proleter hebûn. Ji ber vê yekê jî, bikaranîna peyva nivîskarê proleter li ba me rast bû.

Peyv, di dîroka edebiyata me de ma. Lê hêdî hêdî hat nermkirin û bû we “nivîskarê karkeran” û edebiyata ku ji wir dihat afirandin jî, êdî bû “edebiyat karkeran”. Navê proleter bû navê biçûkdîtîne û her wilo nizm ma. Eşkerek b ku Swêdê ji ber edebiyata xwe ya karkeran şerm dikir. Dema dihat gotin ku şaş e, ne kifş e bê peyva “karker” dikare ji bo kê û kê bê gotin jî rewş baştir nedibî. Piraniya hevvelatîyên me bi karekî li gora xwe mijûl bûn. Bi piranî ferqa di nav bêra kesên ku bi bedena xwe kar dikirin û ên ku xwediyên karên siviktir bûn ne zelal bû û carinan jî qet ne xuya bû.

Ji xwe nivîskarên Swêdê yê karker, piştî ku bûn nivîskar, karên xwe yê k bi bedenê dikirin, berdan. Hêdî hêdî bûn nivîskarên ji bo xwendevan û guhdarên bûrjûvazî. Dema wana bi xwe, meyla xweguhertina bi wî alî ve diyar kirin bûrjûvazî jî hinbêza xwe ji wana re vekir. Nivîskarên proleter ên “vegeriyayî bûn xwediyên ciyên xweş. Lê ji hêla mirovên çîna xwe ve, wek penaberên nêzîk letlêhatî hatin binavkirin. Ev babet rexneyên giran ku ji hêla karkeran ve, bi piranî raserî sê kesan bûn: Ragnar Jendel, Harry Blomberg û Ivan Oljelund. Mîna wê çaxê nikarîbû neheqî û rastiya di derheqa derkirina wan xanîketiyên de mu naqaşe jî bikira, rewş xerab bû. Lê bi dû re toleransa çîna karker firehtir bû rewş sisttir bû û hêdî hêdî qebûl kirin ku nivîskarên karker dikarin di çapemeniya bûrjûvazî de binivîsin. Lê mixabin berovajî vê, qet nebû.

Ev helwesta ku him ji hêla burjûvazî û him jî ji hêla pêşengiya karkeran ve bû û ku edebiyata karkeran bi taybetî nixand, kir ku em li Swêdê di warê edebiyatê de bibin xwediyê du çandan. Haya ewên ku dibêjin ferqa di nav çînan d

heliyaye, ji vê yekê tune ye. Lê karin kerem bikin û li pirtûkên di vî warî de binerin. Bi edebiyata xwe ya karkeran Swêdê li dinê welatê yekem e. Ev yekembûna me, him di warê firehbûna edebiyata me ya karkeran de ye û him jî di warê wê yê sosyal û estetîka wê de ye. Ji vê edebiyatê re, him edebiyata bipaşvexistinê û him jî “di edebiyata Swêdê ya salên 1900-an de bûyera mezin-tirîn e” hat gotin. Lê mixabin ku heta aniha jî lêkolînên baş di derheqa edebiyata karkeran de nebûne û ev yek baş nayê zanîn. Di warê edebiyata karkeran de hew mezinbûna çend kesan hatiye qebûl kirin. Ew kes jî, bi pîranî ên ku bi dû re karkerbûna xwe ji ser xwe avêtine ne. Lê mixabin edebiyata karkeran wek ked û hebûneke kolektîv nehatiye dîtin û di bédengiyekê de tê hiştin. Tiştê ku ji rewşê xuya dibe ku nivîskarên karkeran nikarîbûn bi keda xwe bi pêş ve herin. Mixabin bi pîranî, bêyî ku şerefa xwe bidin ber bazaran ji hêla serdestiya edebiyatê ya bûrjûvazî ve nehatine qebûl kirin.

Îro, her yek ji van çandan, çanda bûrjûvazî û a karkeran, bi texmînî ji hêla nivê gelê Swêdê ve tê qebûl kirin. Berê, çîna karker di warê nivîsandinê de nikarîbû derkeve pêş. Tu kesan texmîna serketineke wilo nedikir. Tu kesan texmîna ku ew çand wê bikaribe di civatê de bibe xwedîya giraniyeke çandî û tesîrekê, nedikir. Çandeke wilo bê bingeş û rût, bê qesir û qonaxên bilind, bê mobilya û bê pirtûk, wê bi salan re wenda bibe û here, dihat gotin. Çandeke gundiyan hebû, li Skansenê jî raxistî hebû, lê a ên ji wana nizmtir tunebû. (Skansen, li Stockholmê ye, kombînasyoneke muze, şano, parka heywanan ûhw. e. Li gora organîzasyonê sosyal a civata Swêdê, ji ber ku gundî xwedî milk bûn, xwediyên ciyekî ji ê karkeran bilindtir bûn S.D.) Heta salên 1930-an jî, dema bûrjûvaziyê xwediyê ramanên rast, karker li bajaran li nêzîkî xwe didîtin, tîrsekê ew digirtin. Karker ji bo wana babetekî mirovên nenas bûn. Hew mirovên ku karên serbixwe dikirin, nivîskar û hunermend ne bi vî awayî dihatin nîrxandin, wana karîbû xeta çîna xwe derbas bikin û xwe nêzîkî wana bikin.

Rojekê, yekî bûrjûvazî ku xwendineke bilind kiribû, ji ber derdekî xwe bi min şewirî. Tiştêkî mala wî şkestibû. Ji bo ku bi çêkirin bide, wê rojekê yekî karker bibira mala xwe. Îcarê bi min dişewirî: Gelo dibû ku li malê, tenê pê re bimîne? Gelo cegerkirina tiştêkî wilo rast bû? Gelo dibû ku qedehê tiştêkî vexwarinê îkram bike? Heger mirov îkram bike, gelo divabû bîra be, ya jî araq

bi xwe be? Gelo wê bîra ne a baştirîn ba? Ji ber ku belkî ê karker bixwaze şûşe bi ser xwe dake, îcarê heger qedehê pêşkêşî wî bike, gelo wê pirr aciz nebe? Mêrik, pîrsa heger karkerê wî bike ku tişteki ji mala wî bidize, ji min nekîr, lê min didît ku pîrseke wî li dora wî diçe û tê. Di wan ferhengên/pirtûkên biçûk ên bi Almanî û Fransî ku tûristên me yê Swêdî pê perwerde dibûn û li dinê digeriyan de, wergera wan peyvokên mîna:- gelo gîzma min baş hatiye çirîsandin? ya jî:- dema te kincên min şuştin te tişteke ne dizî ne? tenê hebûn û mirov bi wan peyvên tenê pirr perwerde ne dibû.

Mirov dikare di bîranînên hinek kesên ji çîna serdest, ên di temenê min bi xwe de jî bibîne bê di çaxê zarokatiya xwe de, çawa lêdan ji dê û bavê xwe dixwarin. Ev yek, adeteke wana bû. Karîbûn lêdanê ji bo jîbîrakirina hinek adetên biçûk ên bûrjûvazî jî bixwin. Loma ez karim texmîn bikim bê ew şika wana ya ku xwe di pêwendiyên wana de dida der, li hemberî me karkeran çawa bû. Bê guman bingehê wê kîne, aliyê wê yê li hemberî me bû. Dema mezin dibûn, îcarê hinekî demokratîk dibûn, lê hîna jî ji tesîra tîrsa wê rewşa ku ji wana ve me eşkere bû, xelas nedibûn, her demê di tîrsa xerabiyên ku karker dikarin bilkin de bûn. Ev, wîlo ye. Lê ez her demê mirovên ku wîlo jî dibêjin dibînim: “Dema darên platan pelan didin, heger ez ne li Parîsê bim û nebînim, ez nikarim bîjim. Ev yek ji bo min bê bazar e.” Ew spehîbûn, incex bi qasî spehîbûna dema spîndar pelan vedikin be. Lê dîsa jî wîlo dibêjin. Lê “li gora ku Fransiya min, ne bi qasî ku hewcedariya min pê heye ye jî” bi dû re dibêjin û dikin xwe “geleri” bidin nasîn.

Rast e, mirov êdî bi hesanî bi çavan ji rewşê dernaxe, lê hîna jî li welatê me, newekheviyeke mezin di nabêra çînan de heye. Îro, êdî karkerek jî dikare wek dîrektorê şîrketê, berçavkê bide ber çavên xwe, îşlikekî şîna li xwe bike û qerewatê bi ser de têxe stûyê xwe. Lê ma gelo tê zanîn bê îşlikekî şîna çiqasî navneteweyî bûye? Êdî serokwezîrên pîraniya welatên Afrîka jî wîlo dikin. Îro pêwendiyên karker û patronan bi awayekî din in, lê karker hîna jî karker e û nava wî tijê kîna e. Ev yek, nîşanên dijminatîya di nav herdu çînan de ye, ya jî qet nebe newekheviya herdu çandan e. Her çandekê ji vana, xwedîya kodekê ye û mirov hîna di salên zarokatiya xwe de fêrî wê dibin. Ji bo ku fêrî wê bibin, hewcedariya ku hinek rabin bi peyvên taybetî bibêjin nake.

Bapîrên min nizanîbûn bixwendina û binivîsandina, bavê min jî nizanîbû bini-
vîsanda. Ji încîlê û pirtûka îlahiyan pê ve tu tiştêkî ji bo xwendinê li mala me tune-
bûn. Destên me li tu rojnaman nediketin. Newekheviya di vî warî de, di nabêra
dewlemend û xizanan de wilo mezin bû ku mirov newêrîbû tê birame. Lê tiştêkî
wek hewayê û bê bû normal bû, tiştêkî ku mirov nikarîbû tiştêkî di derheqê de bi-
ke bû. Ev yek heta vê derengê jî wilo bû. Ev rewşeke xerab bû, lê feqîran pêşketin
di xwe de nedikirin, dixwestin ku gellek tişt wek berê bimînin. Ji xwe razî bûn û ji
nişê bi dû xwe de jî dixwestin ku wek wana bi xwe bin. Ji ber ku min di rojna-
man de dest bi nivîsandinan kiribû û bi dû re jî xwestibû ku pirtûkan lêkim û bi-
weşînin, dê û bavê min pirr li ber min diketin. Li gora wana, ez bi awayekî xerab ji
rê derketibûm û ne serketî bûm. Dema mirov dibû tiştêkî ne wek wana, ne nor-
mal bû. Demeke dirêj li malê ciyekî ji bo ku ez bikaribim pirtûkxana xwe lê bi cî
bikim, nedidan min. Pirtûkxana min hew nîv metroyê fireh bû û tu ciyê mezin
nedigirt, lê dûsa jî di ber nigên xwe de hisab dikirin, jê aciz bûn. Ji ber ku pirtûk-
xana min, nîşana ku ez bi feqîrtiyê re ne saxlem im bû. Pirtûkxanê bi wana dida
xuyakirin ku ez ê bibim yekî ne wek wana bi xwe.

Dema min xwest ez binivîsim, min nexwest ez bi peyvên dewlemend û feqîr
dest pê bikim, lê mijar dûsa jî diçe wir û bi wan peyvên tê eşkerekirin. Ji ber ku
rewş ji wê bû. Min didît ku dê û bavê min şaş in. Lê min wê çaxê hîna baş ne-
didît bê ez bi çi awayî kultura wana tehdît dikim û diçim ser a din.

Hinek karin bipirsin bê ma çi alaqa nivîskariya proleter bi vê yekê heye? Lê ez
dixwazim bidim diyarkirin ku ferqeke mezin a çînî di nav me de hebû. Ew ferq
îro ketiye rengekî din û bi peyvên din tê diyarkirin, lê hîna jî heye. Karker xwe-
diyên çandekê bûn û ji çanda bûrjûvaziyan cuda bû. Dema karkeran literatura
xwe afirandin, vê yekê xwe di berhemên wana de baştir da xuyakirin.

Karker bi awayekî cuda diramiyan û tişt cuda hisdikirin. Di derheqê tiştên
gîrîng de, pirr zû derdiket ku ne wek bûrjûvazî diramin û his dikin. Di jiyana
rojane de jî ne wek hevdû bûn. Malbatên bûrjûvazî ser didan hevdû, hevdû ga-
zî şîvan dikirin û bi hevdû re şîv dixwarin û dû re, bi hevdû re diçûn opera. Ya
jî wek ku pirr çandiyar bûn û ahlê xwendinê bûn dikirin, dixwestin bidin xuya-
kirin ku pirr dixwazin xwe di wê derheqê de nû bikin, loma jî bi hevdû re rûdi-
niştin û pirtûk dixwendin. Lê karker diçûn bîraxanan, diçûn revuyan, bi kaxe-

tan dilîstin û kovarên bêkêr dixwendin, ya jî qet tişteke nedixwendin. Lê bi piranî qet nedixwendin. Tu kes ji wana rojekê neketibû piştî sêncê hewşa pirtûkî firoşekî. Rêya pirtûkxanan nasnedikirin û ev yek ji bo gellekan tişteke pîrr sexbû. Lê divê bê zanîn, heger grûpeke xwedî berjewendiyên hevbeş nikaribe ji bo pêşveçûna xwe di dema ku pêwîst e de îdeolojiya xwe peyde bike, tiştên ecêb ji rewşa wana derdikevin û êdî dibê tişteke ku hew ew bi xwe tenê karin fambikin û biparêzin. Me ji hevdû fam nedikir. Di warê literaturê de her tişt bi şik e, ne kifş e, lê ev yek di derheqê naveroka kaxetên dadgehê de dikare xweş bê dîtin. Heger herdu alî ji zimanê hevdû fam nekin, rewş zû digihije ciyekî xerab.

Lê karkerên ku dixwendin, karîbûn tiştên baş ji bo xwendinê hilbijêrin he bûn û bûrjûvayên ku kerş û rêx hildibijartin û dixwendin jî hebûn. Lê ev ne rewşa tevayî bû.

Tiştêkî din jî dibû: karkeran xwe ji bûrjûvazî fêrî tiştên xerab dikirin, lê bûrjûvazî xwe fêrî tiştên karkeran ên baştirîn dikirin: komelevanî û rêxistin. Bi vawayî carinan herdu kultur nêzîkî hevdu dibûn, lê tu caran nebûne yek. Partiyên siyasî, hew rewşeke girrik derdixistin ber çavan, ev rastiya rewşê qet eşkerê nedikirin. Ev yek, bi literaturê baştir hat eşkerkirin.

Gelo naveroka pirtûkan bi salan re çawa dihat guhertin û çawa bû.

Autodidact-an, (ên ku xwe bi xwe digihandin) bi awayekî pîrr baş reng dar salên -30-an. Lê serdestiya hêza akademîk, bi qasî ku karîbû û jê dihat li hemberî wê rewşa serketî radiwestiya. Mixabin him karîbû gellek tiştan bike, dereng bixe û him jî zanîbû ku wê hewldana nivîsandina karkeran bi ser bikeve Loma jî hêza serdest, escapîst, ew kesên ku ji ba karkeran firar dikirin (escapîst= tê mana ên ku direvin, di literaturê dinê de tê mana ên ku ji rastiya xwe direvin S.D.) bi kêfxweşî dihewand. Heta salên -40 î jî, hindik ji nivîskarên karkeran, -ew jî ên ji nîşê ciwan- piştî xwendineke akademîk gihabûn. Hew wana tenê bi hesanî karîbûn tiştên xwe bidin çapkirin û xwe bigihînin xwendevanên xwe. Aniha, salên 1980-yî, ji rewşeke wilo derketiye. Nivîskarên karkeran nikarin nivîs û berhemên xwe bidin çapkirin, çapxane wana qebûl nakin. Lê heger piştî van hemû sextiyan romaneke karkeran derkeve jî, di medya rojane de ci nadin danasîn û nîrxê ku lê tê kirin, karê wê yê firotinê nakin û nagihînin destên xwendevanan. Pirtûka Maja Ekelöf a bi navê *Rapport från en skurhink*

bi baweriyeke pîrr xurt sala 1987-an bû, ne ji hemû çapxanên mezin tenê, lê mixabin ji ên ku xwe wek çapxanên karkeran hesab dikin jî hat vegerandin.

Ev, mirov ditirsîne. Heger wilo here, ne kifş e ku wê nivîskarên ku li gora baweriya me karker in, di pêşerojê de bikaribin hebin. Hebûna wana, ne armanc bi xwe ye. Lê literatureke karkeran heye û li gora ku rewş ji bo wê sext jî dibe, ên ku bi xîret dixwazin wê hilgirin pêşerojê û ji nû ve biafirînin jî hene. Wê serdestên ku dixwazin bindestan bindest ragirin, her demê hebin. Loma jî, wê hewcedariya me bi nivîskarên nû ên redikal ku bikaribin ciyên nivîskarên karker ên kevn bigirin û bindestan ji nû ve rakin ser pêyan hebe. Wê awayên xebera nivîskaran ên teknikî cuda bin, lê wê sedemên ku divê eşkere bikin, her hebin.

Lê gelo kî nivîskarên karkeran bûn û kî dikare bibe ew? Ji ber ku gellek defînîsyonên navê nivîskarê karkeran hene. Dema wilo be, her kes dikare li gora dilê xwe tiştekî hilbijêre û bêje. Lê na, hinek pîvanên bêşik hene. Divê ew nivîsakar lawê karkeran be û di ber karê xwe yê bi bedenê re dest bi nivîsandinê kiribe, divê bi pirtûkên xwe rewşa karkeran eşkere bike û xwendevanên wî jî karker bin. Li gora vê, ji pîrr hindik kesên ku navê nivîskarê karkeran li wana hatiyê kirin re, dikare nivîskarê karkeran bê gotin. Belkî ji Karl Östman û yek ji wan nivîskarên pêşî yên pîrek, Maria Sandel re bê gotin. Karl Östman, ji nivîskariya xwe bêtir karker bû. Camêr ji serî ve karker bû û heta dawiya jiyana xwe ya ku karîbû kar bike jî li derdora bajarê Sundsvallê, di febrîqâ textan de kar dikir. Heger ku wî bikarîba dev ji wî karê giran ku ji bo abora xwe dikir berda, bi baweriyeke pîrr xurt, wê berhemên baştir binivîsandina.

Nivîskarî jî, wek kîjan karê ku heye, karekî ku divê mirov seranserê rojê bike ye. Heta mirov ciwan e, mirov kare êvaran binivîse. Lê bi salên ku dirin re, qeweta di bedenê de dadikeve û rojek tê ku êdî nema têrê dike.

Baş tê bîra min bê min demeke sala 1920-an çî nivîsîbû. Ez wê çaxê hîna nozdeh salî bûm û li Stockholmê di şîrketeke kargo de dixebitîm. Di nav karên min ê rojane ku min dikir de, kişandina komira kevîran jî hebû. Min ji mişterîyan re dikişand qatên şeşan. Her çewalekî 98 kîlo bûn. Sextî, ne hew di giraniyê tenê bû, lê tûjbûna kevîrên komirê wek a kevîrên elmas, çermê piştî min tîşvîştî dikirin. “Komira kevîran, wek elmasê reş e, wêneyekî delal e” min wê çaxê

wek yekî estetîkevan gotibû. “Erê, lê ez bi dû re di vê yekê ramiyabûm.” Piri hindik ji tiştên ku min dinivîsîn dihatin çapkirin. Min hîna tu nivîskar nasnedikirin. Tu piştgiriya ji tu deveran tunebû. Nivîsakarên karkeran kar dikirin û dijiyan. Ez jî wilo bûm. Bi gotineke din, nivîskarên karkeran ên salên 1930-an, pirtûk ji gellê Swêdî re belaş dinivîsîn. Wek ku carinan ji hêla akademîsyenar ve bi çavnebarî dihat gotin, nivîskarên karkerên ji wê “dibistana jiyane” derdiketin. Lê çî bîba jî, serketin êşkere bû û hêvî bilind dihat ragirtin.

Bê nivîskarekî karkeran, yekî wek Karl Östman çiqasî bênav û nenas bû, ji bîranîneke min a ji jiyana wî ya dawî tê famkirin. Min namak jê re nivîsibû, lê min adresa wî nizanibû. Loma jî min li ser namê wilo bi pûteyî nivîsibû: Nivîskar, Karl Östman, li Sundsvallê, “derdor jî”, di nav parantêsê de. Name ji Sundsvallê li min vegeriya. Li ser hatibû nivîsîn ku adres ne nas e. Bi qasî ku wê çaxê, li wê herême, hew çend nivîskar tenê hebûn, ne nas bû.

Lê van salên dawiyê tiştêkî din dibû. Hinek zarokên serdestan ên ku li universîtan dixwendin, ji ku bikaribin di derheqa rewş û jiyana karkeran de roman binivîsin, dadiketin kolektîvên karkeran. Nivîskarên bûrjûva, berê jî ev yek ji ber diltenikiya xwe, ji dil û can kiribûn. Lê bi dû re li jiyana xwe ya rast vegeriyan. Xwendevanên wana, ên ku ew baş nas dikirin û zanîbûn zilamên wana ên saxlem in, bê şik pirtûkên wana qebûl dikirin. Bawer bin çapemeniya karkeran jî ew baş dipesinandin. Wek tê xuyakirin, nivîskariya karkeran tu caran nebûye monopola tu kesan. Nivîskarên karkeran bi xwe jî rewşa bûrjûvazî û serdestiya wana êşkere dikirin.

Yên ku baş di bûyerê digihîştin, zanîbûn nivîskarên ku tên mêvandariya karkeran, turîst in. Ne şaşiyên ku di berhemên xwe de dikirin dibû sedema vê şikê di derheqa biyanîbûna wana de, awayê axavtinê û atmosfera jiyane ew zû didardestan. Lê divê mirov bibêje ku di derheqa rewş û jiyana karkeran de nivîsandin, bi rastî jî ji a bûrjûvazî sexttir e. Edebiyata karkeran, realîzmeke ji makê ve dixwaze, mirov nikare bi dû re fêr bibe. Diyalog, bi piranî bi hindik peyvan dibin û der dor jî pîrr bê reng e, ne li gora adetan e. Lê dîsa jî divê ez bibêjim ku raxistina rastiya rewşa karkeran a di romanên nivîskarên bûrjûvazî de, ji dil dibû, ji derxistina ku nivîskarên karkeran bi xwe dikir, baştir bû, êşkeretir bû. J ber ku nivîskarên mêvan nedixwestin ku di derheqa bikêrnehatinê de rexne l

wana bèn girtin. Lê tişt bi awayekî cuda didîtin, bûyer bi awayekî din dihatin serê wana. Karkerên ku zanîbûn wê heta dawiya jiyana xwe di wan karxanan de bijîn, ew tişt û ew bûyer bi awayekî din didîtin. Ev hêl nedidîtin. Me ji vê yekê heznedikir. Lê nivîskarên mêvan ev yek ji hevdu dernedixistin. Nivîskarekî karkeran dikare gazinan ji karkeran bike û dîsa jî ew gazinên wî ji wî bi xwe ne. Lê di nabêra çînan de, zimanekî bêdeng jî heye. Ew ziman di derheqa edebiyata me de, bêşik bû û me jê fam dikir.

Di sê antolojiyan de (tê mana nivîsên civandî, dikare ên nivîskarekî bin û dikare ên gellek nivîskaran bin) dor pêncî nivîskarên Swêdê, kurte jiyana xwe û tiştên ku ew kiribûn nivîskar lêkiribûn. Ew her sê pirtûkên essê (nivîsên hunermendî di derheqa tiştên taybet de. Hunermend bi essêên xwe êşkere dikin bê hunermendiya ku ew bi xwe pê mijûl e, çawa tê kirin û karekî çawa ye.) ku di demeke pêncî salan dirêj de derketin, yek jê bi navê *Rû ye*, 1932-an derket, a din *Meram e*, 1945-an derket û a dawî jî bi navê *Dîtin e*, sala 1987-an derket. Navê nivîskarên di herdu pirtûkên pêşî de, kêma zêde wek hev in, di a duyemîn de hew çend nav kêma in. Lê di a sêyem de, çend nav ne tê de, lê ên din hemû navên nû ne.

Ew her sê pirtûk, dîroka nivîskariya karkeran a ku wana bi xwe nivîsiye ne. Divê ez bibêjim ku subjektîf in. Hinek nivîskarên ku divê bèn bîra mirov, tê de tune ne. Her yekî ji wana ji ber sedemên cuda tê de tune ye, hinek jê hatine ji bîrakerin, hinekan nexwestine tê de binivîsin û nivîsandina hinekan jî ji ber hinek sedeman pêwîst nehatiye dîtin, ya jî ji ber sedemên din tê de tune ne. Willy Walfridsson yek ji wana ye. Di nav rêza ên ku navê wana tê de tune ne de, navê nivîskarên lêkolîner ên békariyê Alfred Kämpe û Kurt Salomonsson, helbestvanên ji karkerên maden ên bakurê welêt Gunnar Adolfsson, Lars Ahlin, Allan Eriksson ê ku seqet bû û li ser kursiya xwe ya seqetan pirtûkên xwe nivîsîne, Otto Karl Oskarsson û gellekên din hene. Hinek ji ên navdar jî, ên wek Folke Fridell û Maja Ekelöf jî tê de tune ne.

Mixabin dema mirov baş lê dikole, mirov dibîne ku pîraniya nivîskarên karkeran û autodidactan hew şeş sal dibistana pêşîn tenê xwendine, lê bi dû re dibistana gel a bilind bûye ciyê fêrgeha wana. (Li Swêdê û li hinek welatên din ên Ewrûpayê, dibistanên ji bo kesên ku di wexta xwe de xwendineke baş nekirine,

ji bo ku bikaribin di salên xwe ên xortaniya dereng û salmeziniya xwe de xwe dinê bikin hene. Ew dibistan îro her tiştan xwendin didin. Ên ku li wir dixwandin nabin tişteki bi nav, lê fêrî tiştên ku dixwazin dibin. Matematîk, kîmya, zîk, dîrok, cografya, ziman û tiştên din. Bi bingehîn encama pêşveçûna karkeran in. Ji wana re Dibistanên Gel ên Bilind tê gotin, S.D.) Ên kevnên wana, ê wek Karl Östman û Hedenvind jî, bi dû re çûne hinek ders li dibistanên g xwendine û xwe perwerde kirine. Ew xwendin bi piranî zivistanekê bû, kêm c ran dirêjtir dibû. Xwendina li wir, ne ji bo perwerdekirina nivîskaran bû, ji t ku ciwan bikaribin xwe li ser karên xwe ragirin bûn. Lê bi piranî wekî din d bû. Xortên gundî ji warê xwe direviyan, karên xwe berdidan û xwe li Stockho mê digirtin.

Yek ji sê parên nivîskarên proleter hew xwendina dibistana gel a bilind kir bûn. Dibistana gel a bilind unîversîteya wana bû. Hinekan jî xwendineke pi kintir a li dibistanên karan tenê dikirin. Lê awayê xwendina dibistanan a n rewşa xwendina nivîskarên karkeran ên ciwan guhert. Lê dîsa jî xetek li b xwendina unîversîteyan heye. Hîna jî hew ji sedî heft zarokên malbatên kark ran dirin xwendina unîversîtê dikin. Di wan her sê antolojiyan de û bi taybe jî di a dawîn de, mirov kare li çend kesên ku jî lîse xwendine, ya jî xwediyê babetekî xwendina akademîk a kin in jî rast tê. Zarokên malbatên karker in, c derheqa jiyana karkeran de pirtûk nivîsîne û ew bi xwe jî ji ber hinek sedema hîna jî bi kêfa xwe li wir in û wilo dijîn. Lê aniha, dinya, ji ber ferqa ku di n unîversîtê û dibistana gel a bilind de heye, xera nabe. Çi kesê ku dikare bixw ne, dikare zaniyariyê peyde bike û xwe perwerde bike. Wek gotina pêşiyar, h yek li gora xwe bi qasî ên din baş e. Lê ev gotin ji bo nivîskaran ne rast e. Pey va, ferqa di nabêra çînan de rabûye, mixabin bi piranî ma ji bo hew çend kesê ku di jiyane de bi ser ketin. Pirên caran nivîskaran bi xwe, heger ew bi xwe l ser ketibin û êdî bikaribin xwe wek bûrjûvazî hesab bikin, rewş û derdora jiy na proleter, wek tişteki baş dîtine. “Bi qasî ku zarokatiya min li ciyekî wilo de bas bû, ez îro gihome vê derê” dixwazin bibêjin. Xizaniya salên zarokatiyê, b sedema serketinan û navdariyê.

Li gora dîroka edebiyatê a karkeran *Rû, Meram* û *Dîtin*, ev nivîskar wek n vîskarên karkeran tîn hisabkirin: Harry Ahlberg, Ove Allansson, Eyvind Johr

son, Erik Asklund, Harry Blomberg, Sven O. Bergkvist, Håkan Boström, Maj Hirdman, Jan Fridegård, Mauritz Edström, Martin Koch, Jan Fogelbäck, Helmer Grundström, Gustav Hedenvind-Eriksson, Gunnar Kieri, Ragnar Holmström, Ragnar Järhult, Torgny Karnstedt, Josef Kjellgren, Ivar Lo-Johansson, Artur Lundkvist (beşdarî amadekirina *Dîtin* bûn, lê daxwaz kir ku jê re nivîskarê karkeran neyê gotin), Harry Martinson, Moa Martinson, Wilhelm Moberg, Fabian Månsson, Karl Rune Nordkvist, Ivan Oljelund, Nils Parling, Gustav Sandgren. Ingemar Svensson, Åke Smedberg, Albert Viksten, Rudolf Värnlund û Karl Östman.

Ji nav wanên ku lîse xwendine ya jî hinek xwendina akademîk kirine, bi qasî ku xwe pêşdetir nexistin jî, Paul Lundh heye, karkerê daristanê bû, lê di ber re dixwend, bû externall. Çendik ên din ku xwendineke bilindtir kirine, ya jî unîversîte xwendine hene: Gunder Andersson, Lars Åke-Augustsson, Per Anders Fogelström. Ji ên ciwantir jî Fredrik Ekelund, Hans Lagerberg, Kjell Johansson, nivîskarên karkeran bûn, lê li unîversîtan ders didan. Ên kevntir, xwendineke pirr tev li hev kirine. Ji bo numûne Wilhelm Moberg xwendineke di buhayê lise de û bi dû re jî dibistana gel a bilind xwendibû, Bunny Ragnerstam jî, ji xwendina xwe ya bingehîn, bi dû re dest bi hinek xwendin kiribû. Yekî jî piştî ku romana xwe ya pêşî nivîsî, çû mihendisiya rêyan xwend: Harry Ahlberg. Ya jî yekî din ku bi esil proleter bû, lê bi dû re çû romanên nivdewlemendan nivîsîn: Hans Botwid.

Lê mixabin pirr eşkere ye, ên ku demeke dirêj wek karker mane, pirr bi derengî berhem afirandine. Ji ber ku ji bêgavî, karîbûn hew hindik wextê xwe bidin nivîskariyê. Mexseda min, ne ku ez bi vî awayî hinekan derxim pêş e; ez li gora agahdariyên ku wana bi xwe dane biografiyan û rêxistinên xwe, rastiye eşkere dikim. Ez dixwazim wê rûmeta ku bi xebata xwe heq kirine bidim wana. Ji ber ku ji gellekan hatiye veşartin. Mixabin nivîskarên ekola rênçberan, li gora ku hemû wê ji tebaqa civatê a nizmtirîn dihatin jî, nivîskarên ji hevdû pirr cuda bûn û hevdû qet nedigirtin, bûne hedefa rexne û tawanbariyên giran. Bi dû re pirtûkên xwe bi derengî dinivîsîn, dixwestin baweriyên di derheqa nivîskariya karkeran de biguherin, lê mixabin feyde nedikir.

Armanca edebiyata karkeran, ragihandina mesajan bû, ne pêhisandina rewşa

karkeran a xerab bû. Zengilê exlaq ê di dilan de lêdixist û mirov jî radibûn. L ew, gazîkirineke karkeran ji bo doza xwe bû. Lê ev yek ne wilo dihat dîtin. I unîversîteyên Swêdê yên cuda, ji bo ku bikaribin bilindiyêke karîsmatik bidin dîroka nivîskarên karkeran, bi quretî doktora rûmetê didan çend autodidacta û akademîsyenan, ew kirin filozof. Lê dema dor hat min, navê şiklekî petatan min kirin.

Dibe ku di pêşerojê de, him nivîskarê karkeran û him jî nivîskarê prolete wek nav, di wê mana ku îro li Swêdê dide de, hew bibin du navên dîrokî ê edebiyatê. Lê bi gumana min, wê helbestvaniya serhildanê her demê hebe Peyva nivîskarê karkeran dikare bi yeke din ku bikaribe bê mana peyvê edebî yata redîkal bi xwe, lê bi mercê ku ji kûraya jiyana bindestan hatibe, bê guher tin. Peyva redîkal, ji peyva latîn, redîks tê û tê mana peyva reh. Rehên daran i tiştên ku qewetê didin darê û ew jî spehîbûna pelan, ji wê qewetê bi xwe did şaxan. Mirov wan rehan nabîne, lê çi pelê ku heye, di derheqa hebûna wana d şahidiyê dide. □

Wergera ji swêdî: Süleyman Dem.

Ivar Lo-Johansson: 1901-ê li Ösmo, gundekî Stockholmê hat dinê. Wek ku ji nivîsa wî jî tê famkirin, k wê karkeran e. Di xortaniya xwe de gellek kar ji bo abora xwe kirine. Himaltî, kevirşkandin û rojnamev nî. Bi dû re hemû kar bardane û nivîsiye û xwendiyê.

Ivar Lo-Johansson, helbestvan, çîroknivîs, romannivîs û lêkolînerê dîroka karkerên Swêdê ye.

1925-an li seranserê Ewrûpa geriya, bi karkerên welatên din re ket pêwendiyên û di derheqa rewşa war û gera xwe de çar pirtûk nivîst. Ev bû destpêka jiyana wî a nivîskarî.

1930-an pirtûkeke çîrokan derxist. Piştî wê helbestên xwe çapkirin, 1931. 1932-an romana pêşî çap ki 1933-1935-an pirtûkên xwe yên di derheqa jiyana karkeran de derxistin. Ji 1935-an heta 1946-an, lêkolînê di derheqa jiyana karkeran de wek çîrok û roman civandin û wek pirtûk çap kirin. Hejmara wana ji d han zêdetir e. Hinek jê komedî ne. Gellek berhemên wî bûne film.

Ivar Lo-Johansson, her wilo salê pirtûkek çapkirîye. Heta sala 1990-î jiya ye. Çi xeta nivîsa wî ya k heye, ji bo baştirkirina jiyana bindestan e. Loma jî, jê re nivîskarê proletarya tê gotin. Karkerê Swêdê k wî nasnake tune ye. Wî wek nivîskarê xwe qebûl dikin. Îro piştî wî, êdî jiyana wî wek roman tê çapkirin.

Ev nivîsa wî ya ku min wergerandiye Kurdî, min ji kovara BLM (Bonnières Littéraire Magasin) hejm 6-1987-an girtiye.

Şiir di salên 2000î de

(Bersiva pirsekê)

Pablo Neruda

Tu dikarî pirsra ku wê di sedsala bîsran de cihê şîrê çî be, bipirsî. Ev pirseke pir berfireh e. Ger ez li kuçeyeke teng pêrgî vê pirsê bibûma, wê ji tirsan ziravê min biqetiya. Gelo ez di derheqa sedsala bîstan de çî dizanim? Ji wêdetir, ez di derheqa şîrê de çî dizanim?

Ya ku ez dizanim wê di sedsala bîstan de şîr nemire. Di her deman de mirina şîrê hatiye xwestin, lê şîrê temendirêjîya xwe daye nîşandan, bi nîşandana biserxwevehatineke bi sihet, wê jîndarbûna xwe jî daye qebûlîkirin, wilo xuyaye ku ew ê heta heta bijî. Gotin ku bi Dante dawîya şîrê hat. Lê piştî kurtedemê Jorge Manrique çîrûskek pêxist, û ew çîrûsk di siyan de biriqî. Û paşê, Viktor Hugo bi qasî ku tiştêkî ji yên dû xwe re nehêle, her tişt malîst û bir. Lê pir tê re neçû, yekî nazîk bi navê Charles Baudelaire derket, li dû xwe jî serseriyekî bi navê Arthur Rimbaud kişkişand û şîrê bêhneke nikenû bi dest xist. Kê bawer dikir wê piştî Walt Whitman şîr were nivîsandin? Wî hemû mêrg çandibû, kes nikarîbû li ser şenkayiyê bimeşîya. Bi vê re, Mayakovskî derket û bi dengê boriyan, bi dengê teqîna tivingan, bi axînkîşandinan, bi îskînan, bi dengê trênan û bi dengên erebeyan maleke şîran ava kir. Û çîrok wilo dewam dike.

Pir vekirî û êşkere ye ku dijminên şîrê amade ne ku çavê şîrê derxînin, destê xwe têxin qirika wê û wê bifetisînin. Gelek rê hatin ceribandin -maraşalên îndî-



vidualîst, dijaminên ronahiyê, artêşên burokratîk bi gavên xurt çûne ser şaîran. Wan zora cesareta çend kesan birin, ya xerabtir jî wan bi riya xapandinê kirin ku hin kes dev ji nivîsandina şîîran berdîn. Lê şîîr mîna kehniyekê herikî û mîna peçivandinekê pijiqî, bi kedeke mezin lêxwedîderketina avahiya ku ava kiribû, stranên ku li çolan digotin, geşbûna daran, herikandina bi coşiya çemekî û mîna ku bi şevan stêrkan li zozanên Bolîvyayê bireşîne, berdewam kir.

Şîîr li ber serê yê mirî bû, şîîr dermanê kewandina êşê bû. Ewpeşengê serfirazîyan bû. Wê ji tenêtiyê re hevaltî kir, ew mîna agir şewitî, ew mîna berfê hênîk û rohnî bû; destê wê, tiliyên wê û kulmên wê hebûn; çavên wê yên ku dişibîyan bajarê Granadayê hebû; ew ji gulleya tivingê bileztir bû; ew ji keleşan zeximtir bû. Wê reha xwe bera dilên mirovan dabû.

Di destpêka sedsala nû de, serkêşiya şîîrê ya şoreşê ne ewçend diyar e. Wê şîîr bi tenê ji bo pêşketina însên, ji bo gîhandina însên ya pirtûk û kulturê bi kêr were, belav bibe. Îro digel ku hinek pir û hinek jî kêr derdikevin pêş, dîsan jî ne mumkun e ku şaîr werin îktîdarê û desthilatdariyê bi rê ve bibin. Lê wê şaîr her tim bibin şîretkirên baş, wey li halê wan kesan be ku guh nedin şaîran. Piraniya caran desthilatdar bi gelê xwe re têkilîyan datînin. Şîîr pireke veşartî ye ku dirêjî xemgîniyên mirov dibe. Divê li şaîr were guhdarîkirin. Ev derseke dîrokî ye.

Di sedsala bîstan de wê qîmeta şîîrê pir were girtin, şaîrê herî dawî, wê şaîrekî yunanî yê ku îro nayê xwendin be, bi texmîniyê mezin wê navê wî Homeros be.

Ez ji vê bawer im û loma ez wî ji nû ve dixwînim. Çalakiya wî, tehm û qehremaniya wî, nifir û kehanetiya wî, rehên wî yên mîtolojîk î ji mermer, ez ê li çoyê wî korepeyayî bikolim.

Gava sedsala nû nêzîk dibe, ez ê bixwazibim di nivîsên xwe de qayîşê bi Homeos re bikişînim. Wê ew derya navdar bi çavekî xerab li min nenêre.

Ez ê ala Qralê Ithaca, Ulysses hilgirim, ez ê kuçe bi kuçe bigerim. Û wê paşê yunaniyên ku li dû hev ji girtîgehan derdikevin, ji bo avakirina qanûnên tarza nû tevî min bibin. □

Werger: Dr. Poloço


Pablo Neruda di sala 1904'an de li Şîliyê hatiye dinyayê û di sala 1973'an de jî wefat kiriye. Ew yek ji şaîrên dinyayê yê bijarte ye û di sala 1971'ê de layiqî xelata Nobel ya edebiyatê hatiye dîtin.

Nirxandina helbestê

Seamus Heaney

Dema ez cara yekemîn rastî navê bajarê Stockholmê hatim qe neket bala mir ez ê rojekê vî bajarî bibînim, hele hîn hatina wir wek mêvanekî Akadêmiya swêdî û Sazmendiya Xelata Nobel li haliyekî. Di wê dema ez behsê dikime de tiştekî wisa li dervayê xewn û xeyalên min bû. Di salên hezar û neh sed û çelan de dema ku ez mezinê zaroyên malbeteke li herêmeke gundî ya devera Derry bûm malbeteke ku hejmara endamên wê her zêde dibû, em hemî di sê odayên xaniyek kevneşopîni sersapîni de kome ser hev bû bûn û jiyana me li wir yeke ji şeweyên tenêmayîni û dûrbûnê bû ku em kêmezêde ji bandora atifi û întelektuel ya cîhana derve dûr hîştibûn. Cîhana me yeke biçûk û teng bû ku tê de dengên şevê yêr hespa di axurê li kêleka odeyekê de tevî dengên axiftina mezinan di mitbaxa li kêleka odeyêke din de dibûn. Gotinê naxwaze, ku haya me ji hemî dangan hebû - yê barana bi ser daran de dihate xarê, mişkên li banê, papora ji zeviyê li paş xênî wê de li ser xeta hesinî diçû - lê haydariyêke wekî ya lawirine di dema zivistanê de di tezin de bû. Di vê dema wekî yeke pêşdîrokî û pêşhaydariya seksual de, em di navbera kevnedem û nûdemê de wisa hesas û bandorgir bûn, wek ava satila di odeyê me ya firaxşustînê de: heku trêneke derbas dibû erd dihejand serbeşê wê avê bi şeweyêke nazik û bêdengiyêke bêhempa dilerizî.

Lê li gor me ne tenê erd dihejîya: bayê li dorhaliyên me û li jor me jî jîndar bû û em haydar dikirin. Dema bê darên narewanê dilivandin, herweha antênek jî dili-



vand ku bi çemelê herî jorîn yê dareke şembelotê ve hatibû girêdan. Antênê dengek bi rêya têla xwe di qulika di quncêkî pencereya mitbaxê de hatî çêkirin digî hand navîna radyoya me ya ku tê de cixevixeke kurtekatinê rê dida dengê nûçexwendewarê BBC ⁽¹⁾ yê ku bûyerên merov ne li benda bihîstina wan bû didan za nîn, wek qudreteke ji xeybê. Û me ew denga jî ji odeya razanê dibihîst, xwe ji pa û ser dengên mezinên li mitbaxê re digîhand me, her wekî ku me gellek caran dengê vîzevîza têlên telegrafê ji ser hemû dangan re dibihîst, dengê qebeyî zirav y ku kodên Morse yê telegrafî ji haliyekî digîhandin yê din.

Me navên cîranan yê bi zaravayên herêmî yê bav û daya me dihatinî ser zî mên di guh xwe re dikirin, û bi Înglîziya xwendewarê nûçeyan yê dengzengilîn na vên bombebaran û bajarên hatinî bombebaranandin digîhîştin guhên me, herweh nûçeyên di derheqê şer, tabûrên leşgeran, hejmara firrokên ketinî û dilên hatin girtin, miriyan û serkeftinan de; û peyvên din jî, gotinê naxwaze, diketin guhê me, ew peyvên ceddî ku tiştêkî ecêb e bi hev de girêdayî ne, peyvên “neyar” û “he valbendan”. Lê li gel vê jî çî nûçûyên van bûyerên bi xwîn yê cîhanê wek tiştêk bizdandinê nediketin nav hişên min. Eger tiştêkî nebixêr di naveroka gotina xwendewarê nûçeyan de hebû, ew tişt bi wê yekê ve girêdayî bû ku haydariya me, wek ku di bin bandora bencê de be, ji tehlûkeya li holê nebû; û eger tiştêkî lomejêkirî nê di derheqê nezantiya siyasî ya wê dem û şûnê de hebû jî, encama wê yekê ji bo min tiştêkî çak bû, ji haliyê xwehestkirina asayîşî de.

Bi gotineke din, dema şer ji bo min demeke pêşramanî bû. Herweha pêşedebiyatî. Li gor xwe pêşdîrokî jî. Dû re, bi derbasbûna salan re, dema ku guhdarkirina min bû yeke bi mebest, min dest pê kir rabim ser milê kenepeya me ya mezin da ku bikaribim dengê radyo baştir bibihîsim. Lê hîn jî tiştê bala min dikîşand ser xwe ne nûçe bûn; ez li dû heyecana di serpêhatiyan de bûm, wek zîncîra serpêhatiyên polîsekî Înglîzî bi navê Dick Barton, yan cergbaziyên bokefirrokvanekî hêzêr Înglîzî bi navê Biggles ku ji pirtûkeke firrokvan W .E. Jones ji bo radyo hatibûr adaptekirin. Nuha ku zarokên din bûbûn xort û tiştên di mitbaxê de cîh digirtin bêtir bûbûn, divabû ez xwe nêzikî radyo bikim da ku guhên xwe baş bidim ser, û bi encama vê nêzîkbûna ji derziya wê ez fêrî navên dezgehên biyanî bûm, wek Leipzig û Oslo û Stuttgart û Warso, û helbet, Stockholm.

Ez herweha fêrî guhdarkirina kurtebeşîne ji zimanên biyanî bûm ku di dema li

vandina derziya radyo di navbera dezgeha ABC û ya Radyoya Îrlendê de, di navbera şêwegotina London û ya Dublin de, diketin guhên min, û tevî ku ez di destpêkê de nedigihîştim xwebêja gotinên têyên kirin jî, gotinên bi dengên ji zimanên ewropayî yên ji zengulokê têyên der yan bi hîsînî ne, rêwîtiya min ya ber bi cîhana fireh û dûr êdî dest pê kiribû. Ev yek jî ji haliyê xwe de bû rêwîtiyeke di firehiya zimên de ji bo min, rêwîtiyeke ku têde her gihîştineke mebestekê - hem di warê helbestê, hem di warê jiyanê de - li şûna ku bibe xwegîhandina mebesta dawîn bû hîmekî gavpêşveavêtinê, û ew rêwîtiya ye ku ez nuha gîhandim vê qonaxa serbilindkirinê. Lê ev sehneya ji hîmekî gavavêtinê bêtir hestê xwedîtina li navendeke asîmanî diafirîne, û ji ber vê sedemê ye ku di jiyanê xwe de ev yekemcar e ez wê fersenda nerxzêde didim xwe ku li ser bê bimeşim.

*

Bi saya helbestê ye ku ev meş li ser bê ji bo min pêkan e. Ez wê di cîh de dinexînim ji ber ku min rêzek berî kurtedemekê nivînanand ku tê de ez ji xwe (û her kesê guhdar) daxwaza “meşa li ser bê heta li dij baweriya xwe jî” dikim. Lê ez wê careke din dinexînim ji ber ku helbest dikare rewşekê biafirîne ku neynika rastiyeke derwayî be û di eynî demê de bi hestê hundirîn yê helbestvên ve girêdayî be, wek çûna pêlikên ava satilê ber bi navendê û ber bi derve pênçê sal berê. Rewşeke wisa ku em xwe tê de êdî bikaribin bigihînin radeyeke pîvana li gor berhevkirina di wan salên em tê de mezin bûnî de. Rewşeke ku tê de hemî babetên şchweta di zîrekîyê⁽²⁾ de û meraqa di hestan de bikaribin werin têrkirin. Bi gotineke din, ez helbestê ji bo ku ew helbest e dinexînim, lê di eynî demê de, ji ber ku ew hacetekî alîkariyê ye, çimkî ew têkeliyeke hêsane û parêzmend di navbera navenda hişên merov û dorhaliyên wî de pêkan dike, di navbera zarokê li pêş derziya radyo bi peyva “Stokholm” ve dinihêre û peyayê nuha li Stokholm di vê civîna gellekî pîroz de pêrgî rûyê merovan tê de. Ez wê dinexînim ji ber ku ew layiqî nerxdanê ye, di dema me de û di her demê de, ji bo dirustiya wê bi jiyanê re, bi hemî xwebêja vê gotinê.

*

Wek destpêk, min hewce bi wê rastiya heyînî hebû da ku piştêgirêdaneke bi ba-

werî bi dest xim, û ez weqa dilşad bûm dema helbest wek hacetê herî rasterast li min ve xewan kir, hacetê ku di cîhana xwe de di warê nûnertiya rolê, piştgiriye li hemberderketinê de cîhê pêşeng digire. Hîn wek şagirtekî xwendegê, min helbesta stiraşewe ya John Keats "Payîz" hez dikir ji ber lîztina rola xiznequtiyek di navbera zimên û hestê de; wek ciwanekî, min ji Gerard Manley Hopkins hez dikir ji ber bihêzbûna qîrînên wî yên ku di eynî demê de hestên şabûn û janê di afirandîna ku ber xwendina berhemên wî ez bi tevahî ne haydar bûm li nik min he ne; min ji Robert Frost hez dikir ji ber dirustiya wî ya cotyarekî û xasûkiya wî ya di cîhê xwe de; û ji Chaucer jî, bêtir ji bo eynî sedeman. Ez ê dû re rastî duristiyeke bi şeweyeke din bêyem, duristiya moralî ku ez ber bi xwe kişandim û dê her bi kişîne, di helbestên cengê yên Wilfred Owen de, helbestên ku tê de hestnazikiyên nûdemekê diêşê û barbarîzma sedsala nû xewan dibe. Û hîn dû re, di encama sad ya stîla Elizabeth Bishop de, di enatiya di helbestên Robert Lowell de, di hemberderketinê di helbestên Patrick Kavanagh de, ez rastî bêtir sedemên bawerbûna bîhêz - û pêkaniya - helbestê hatim ku dikare tiştê diqewime diyar bike, "dil bi planêtişê bişewitîne," eger "xwe bi helbestê ve mijûl neke."

Daxuyakirina vê bîr û raya şexsî di derheqê hunerekê de ku yeke di warê xwe di grîng e bi tecrûbeyê jidaybûn û mezinbûna li Bakurê Îrlandeyê ve girêdayî ye û bi wê yekê ve ku ez li gel wê şûnê jî me tevî ku bîst û pênc salan li derve mame. Niyê li cîhanê warekî wek vî ku weqa bi payîbûn û realîzama xwe serbilind e, niye warekî xwe wek vî xwedan xibreteke di derheqê rexnegiriya li zêderetorîkê⁽³⁾ yan me zinkirina hêviyan de bibîne. Wisa, ta radeyekê bi encama jiyîna li gel van helwestên ku bûne beşekî ji min, û ta radeyekê bi encama afirandîna çermekî xweparastîna ji wan, min bi salan xwe ji dewlemendî û firehbelavbûna berhemên helbestvanên ji hev cuda, ji Wallace Stevens bigir heta Rainer Maria Rilke, nîvdûr û nîv parastî hîşt; min nerxdaneke ne di cîh de da kûrlênerîna kirîstalî ya Emily Dickson tevahiya wan brûskên şaxpîr û qelşên hevtêkel; û ez ji xeyalperweriya tewrbêganê ya Elliot bêhay mam. Û van şewelênerînan kêmzêde merbendkirî bi nepejirandinê ku ji bo helbestvên rêdaneke ji ya hemwelatîyên din serbestir bête dayîn hişki bûn; û hîn bi ser de pêwîstiya ku merovê helbestvan li gor rewşeke ku têde zorbi karhanîna bi siyasetê ve girêdayî berdewam û bawerî û hêvîjêkirina xelkê karê xwe bike. Hêvîjêkirineke, pêwîst e bête gotin, ne ku xwe bi helbestê ve têkilîgir dike, li

bi ramanên siyasî ve ku ji haliyên hemî komên hev û din napejirînin de bêyên pe-
jirandin.

Di nav şert û mercên wisa de hîn jî hişên merov li pê wê yekê ne ku xwe bi wî
tiştê ku Samuel Johnson bi xwebaweriyeke pirrbilind wek “cîhdîna rastiye” bi
nav dike şa bikin, tevî haydariya ji bêaramiya şeweya kar û lêgerînên xwe. Bêyî
hewcedariya bi hînkirindaneke ramyarî hestê haydariyê zû pê dihesa ku di wî de
axiftinên cudamebest digihên hev. Zarokê di odeya razanê de di eynî katê de guh-
dare zargotina herêmî ya malbata xwe ya îrlendî û zargotina fermî ya xwendewarê
dezgeha radyoya înglizî dikir û di eynî demê de li kêleka wan herduyan haydare
tiştine din dibû, ew zaroka hîn di wê katê de di derbareyê tevlihevbûna şeweya pê-
şeyyana xwe ya berbextî de dihat fêrkirandin, pêşerojê ku divabû wî tê de cuda-
ramanên di derheqê prensîpên exlaqî, bedeweperestî, moralî, siyasî, pîvanî, şikdarî,
çandî, babetî, sîmbolî, paşkolonyalî de ji hev derxistana û va yeka, dema merov
hemiyana bi hev re bide ber çav, tişteki nepêkan e. Wisa, min xwe di nivê salên hef-
têyan de di xaniyekî din’î biçûk de dît, îcar li devera Wicklow li başûrê Dublin, li
gel malbateke ciwan ku ya min bi xwe bû û radyoyeke ji ya berê piçekî kêmtir bi
heybet, û min guhdarî dengê barana bi ser daran de dihat xarê û nûçeyên teqîna
bombeyan li cîhên nêziktir ji mal - ne tenê yên ku IRA⁽⁴⁾ li Belfast didan teqan-
din lê herweha yên ku Milîsên Loyalîst yên li bakur bi eynî radeya şewehov li
Dublin didan teqandin. Çawa min xwe di salên 1930’an de bi xwendina mentîqa
trajêdî ya serpêhatiya Osip Mandelstam⁽⁶⁾ di rewşeke ne xweş de bêhêz dît, li vir
jî min xwe wekî li hember teheddîyekê hest kir, tevî ku hestê şernexwaziyê li nik
min her bi îsrar domand, dema min, wek mînak, bihîst ku hevalekî nemaze dil-
nerm ji hevalên min yên rojên xwendinê bêyî bête dadkirin hatiye girtin ji ber ku
li gor gumanan ew hevbeşê kujtineke siyasî bûye. Tiştê ku dilê min li dû vê bûyerê
li pê bû ne istiqrareke aram lê mişextbûneke aktîv bû ji dehfa relatîvîzmê⁽⁷⁾, rêye-
ke nerxdayîna helbestê bû bêyî tirs û lêborîn. Min di helbesteke di bin navê “Ex-
posure”⁽⁸⁾ de wê demê nivîsand:

Xweziya bi latekî stêtrîjekê bihatama!

Lê li ser pelên terr di rê de me,

Qaqil û beratetiştên li dû payîzê manî,

Di xeyalê min de bokeyekî
Li ser zewiyekî celbî heye,
Diyariya wî wek kevirê ji kevirkanîyekî
bipijiqe hawara bêhêvîmayîn e.

Çawa bû ku ez gihîştîm vê rewşê?
Ez bi bîr tînim car li dû carê
Bedewşîretên cewherî yên hevalan
Û sindanmêjîyên hindekên heznekir

Dema ku ez dîsa û dîsa dixim pîvanê
Berpîrsiyartiya xwe di sirgûniya xemdar de.
Ji bo çi? Ma ji bo guhan? Ma ji bo xelkê?
Ma ji bo gotinên li paş deriyan?

Baran ji nav kînyazan tête xarê,
Nizimdengên wê yên xêreber bi kerrî
Li ser hêvîsikandin û maşandinê dibêjine
Û li gel wê jî her çîlikek bi bîr tîne

Gişçakewestên almazê.
Ez ne dîl im, ne ajan im;
Penaberekî hundirîn, dirêjporekî berbext
û ramanyar; akîncîyekî daristanan,

Ji qetliyamekê reviyaye,
Rengparêzgeriyê bi kar tîne
Li hember qurm û qêqil,
Her şêwe bayê radibe hest dike;

Ew, yên van pizotan dipijiqînin
Ji bo hejargermahiya wan, wenda kirin
Xeberxêrê ku di jîyanê de tê carekê,
Firtlêdana doçstêrkê beza lê da.

Di yeke ji wan helbestên ku ji haliyê xwendekarên nîşê min de gellekî baş dihatin nasîn de, helbesteke ku merov dikare bibêje hilikê tevgera sîmbolîzmê di forma kapsûlekê de xistibû heyînê, helbestvanê emerekî Archibald MacLeish geş dike ku “pêwîst e şîr hevberê rastiye / ne rastiye be.” Wek gotineke bi cesaret ku helbest xwedîya pêkaniya diyarkirina rastiye ye lê bi şeweyeke xûzkirî, ew daxuyaniyeke hem bawerîafir û hem duristker e. Lê carine hene ku hewcedariyeke kûrtir tete holê, dema em ji helbestê ne tenê dipên ku bi rastiya xwe me dilşad bike, lê herweha hikmetyar be, ne tenê cudarêyeke veciniqandinê ji bo cîhanê, lê cardinzivirandina cîhanê bi xwe be. Em dixwazin ev veciniqandina wek ew kuta bêhtengiyê ya ku ji nişkan ve wêneyê li sehneya têlvizyonê vedigerîne livger be, yan wek şoka elektirîgê ya ku dilê lerizok li rastehaweyê vedigerîne. Em tiştê ku jina li Leningradê di rêza girtûgehê de li pê bû dixwazin, jina ku ji sermayê qefilî bû û ji tirsan bi kuste-pist diaxift, terora recîma Stalîn dikişand û ji helbestvan Anna Akhmatova⁽⁹⁾ dipirsî, eger bikaribûya bi karê wesifkirina tevahiya rewşê rabûya, eger hunera wê tere xuyakirina tevahiya wêneyê dikir. Û ev daxwaz bû ku min di nav şert û mercên gellekî hêsantir de li devera Wicklow hest dikir dema min ew rêzên li jor nivîsandin, daxwaza şîreke wisa bû ku bikaribûya ji heqê tiştê ku min dixwazt têxim wesfê derketa, berhemeke ku “rastiya bandora realîteya dervayî diyar bikira û ... haydar e hest û baweriyên hundirîn yê helbestvên bûya.”

*

Realîteya dervayî û dînamîkiyeta hundirîn yên bûyerên li Îrlendeyê di navbera 1968'an û 1974'an de cîh digirtinî bi guhertinê re peywendîgir bûn, guhertina bi xwîn bêguman, lê çawa be jî guhertin; û kêmahîtiya⁽¹⁰⁾ li wir dijî ji mêj ve li benda vê guhertinê bû. Divabû zûtir hatibûya, wek encama nerazîbûna di dawîya salên şêstan de li ser taxê dihat kelandin, lê wisa nebû û hêkên tehlûkeyê yên ku her di bin nixamtinê de bûn gellekî zû vebûn. Di eynî dema ku tê de beşê moralîyeta xiristiyaniê di merov de xwe neçar dît li dij şeweya hovane ya bombekirin û kujtinên IRA derkeve, û hestê îrlendîbûna merov bi bêrehimbûna hêzên înglîzî di demên wek ya bûyera Yekşema bi Xwîn de, ku li Derty di 1972'an de qewimî, vecinîqî, beşê biçûk yê hemwelatîyê di merov de, beşê ku bi wê haydariyê mezin bû ku koma ew jê bi hemî şeweyên fermî û ne fermî ji bawerîpêhanîne û wekhevîyê bê-

par bû, hestê vî hemwelatîyî yekcar bi edaleta xeyalî ya rewşê re bû, bi wê têgihîştî-
nê ku, eger jîyan li Îrlendeyê dê qe xweştir bibûya, guhertinê divabû cîh bigirta. Lê
hestê wî hemwelatîyî herweha yekcar bi rastiye re bû, bi encama têgihîştina ku
metodê xwînrejê yê ku IRA ji bo guhertina rewşê bi kar dihanî hacetê têkberina pê-
baweriyê bû, pêbawerîya ku pêkaniyên nû divabûn li ser cîh bigirtana.

Li gel her tiştî jî, ta Konferensa Sunningdale di 1974'an de, dema hukmata brîta-
nî ket bin bandora zexta karkerên Ulster yên ji bo kiraltiyê piştgir, merovên ar-
mançqenc hîn bi hêvî bûn ku bikaribin xwebêjeke bi mentiq bidin bûyerên cîh di-
girtinî, ku hêvîdariya li holê li hember metodên kavilker têxin mêmîzîne û wî tiştî bi-
kin ku W.B.Yeates berî wan bi nîvsaldemekê bizav kiribû ku bike, yanê, "bicîhki-
rina realîteyê û edaletê di nav eynî ramanê de." Lê li dû 1974'an, di nav bîst salên
dirêj yên di navbera wê demê û agirbesta 1994'an de vê şeweramanê xwe wek tişte-
kî ne pêkan îspat kir. Di nav wê demê de bikarhanîna zorê ji bin ve çî encam ne-
hanîn holê xeyn ji zorbikarhanîna ji jor ve, hêviya cîhgirtina edaletê li gor hişkbû-
na realîteya li holê hat tesnîfkirin, û xelk ket nav çaryekeke sedsalekê, demeke
wendabûna jîyanê û wendabûna meraqa canî (rûhî: Wergêr), demeke hişkbûna
bawerîyan û tengbûna îmkanan ku encamên xwezayî yên piştgiriya siyasî, kişandi-
na bi jan û netişt xeyn ji xweparastineke atîfî bû.

*

Yek ji wan bûyerên ku janê bi kûrtirîn şewe dixê dilê merov di dîroka Îrlende ya
tîjî jan de cîh girt dema mînbûseke tîjî karkerên ji kar diçûne malên xwe di êvare-
ke çileyê paşîn yê 1974'an de ji haliyê çekdarine rûnixamtî de hat rawestandî û
kesên tê de di bin tehdîda tîfingê de li ser rê hatin rêzêkirin. Dû re kujerekî rûni-
xamtî gote wan, "yên katolîk di nav we de, bila vir de werin." Wisa bûbû ku en-
damên vê komê, yek ne tê de, hemî protestant bûn, û ji ber vê yekê wan ê texmîn
kiribûna ku yên rûnixamtî endamên milîsên protestant bûn û dixwaztin katolîkê
di nav wan de wek bersîvdaneke kirinên haliyê din bikujin, bi bawerîya ku ew
piştgirekî rêxistina IRA û hemî kirinên wê ye. Ji bo katolîkê di navbera hebûn û
nemanê de rewş yeke bi tîrsê dagirtî bû, lê wî kir ku gavê ber bi pêş rane. Li vir,
wek tê gotin, di nav wê beşdeqeya girtina biryarê de, û di nav şevreşîya êvara zivis-
tanê de, wî hest kir çawa destê karkerê protestant yê li kêleka wî destê wî xist nav

destê xwe û guvaşt, bi xwebêja ku na, melive, em ê bi te re xiyanetê nekin, hewce nake kesek bizanibe tu ji çi olê yan partiyê yî. Lê bêyî sûd, çimkî ew ji rêzê çû der, lê li şûna ku devê tifingê li ser eniya xwe hest bike, ber bi paş û wê de hat gêrkirin di dema ku çekdaran yên di rêzê de manî dan ber agirê çekên xwe, ji ber ku ew ne terorîstên protestant lê, wek tê bawerkirin, yên IRA bûn.

*

Hindek caran dijwar e merov ramana ku fêrbûna ji dîrokê hema hema qasî ya ji şerjêxaneyê ye ji nav hişên xwe derîne, ku gotina Tacitus⁽¹¹⁾ rast e û aştî ji wêranbûna li dû livbaziyan serhişkane yên hêzeke bêwûjdan bêtir ne tişt e. Tê bîra min, wek nîşe, çawa ramanê di derheqê hevalê min de ketî serê min, hevalê ku di salên heftêyan de bi gumana ku tiliyan wî di kujtineke siyasî de hebûn hatibû girtin, ez vecinîqandim: Ez bi wê ramana di nav hişên min re derbas bûyî vecinîqim, ramana ku, eger ew rast tawanbar be jî, heye ku li gel wê jî ji bo zayîna pêşerojê nû alîkar derketibe, bi şikênandina formên stemkar û afirandina pêkaniyan nû bi rêya wî metodê ku hîn dikaribû encamê wîne holê, yanê, bi rêya zorbikarhanîne û xwînrijandinê - ku bi demê re xwe wek rêya di cîh de li holê feriz kir. Bîsteke wisa bû hestkirina vê ramanê ji bo min, wekî ku yek têkeve nav sermayaya di navbera stêrkan de, wekî biranîna faktorekî tirsandinê ku xwe bi hestên hundirîn û rewşa deryayî ve eleqedar dikir, ku divabû merov jiyana xwe tê de hest bikira û li gor wê têxista tevdêrê. Lê ramanê tenê bîstekê drêj kir. Zayîna ew pêşeroja em dixwazin bêguman di nav ketheviya wî katolîkê bizdoyî bûyî hest kirî de ye dema li kêleka rê destekî din bi destê wî girt, ne di nav gulleyên dû re hatinî avêtin de, ku realîteyeke hêvîvala ye, çiqê bûbe beşekî ji melodiya bûyerên cîh digirin jî.

Wek kesên nivîskar û xwendevan, wek kesên gunehbar û welatvan, realîzma me û hestê bedewetiyê di me de nahêlin em zû bi zû dengêkî pozîtîv wek çak binerxînin. Teqîna tifingê bi xwe ye ku vî xusetî di me de bi hêztir dike, û xêrnexwazê hov e ku wî dike tiştêkî layiqî bi karhanîna li dij wî. Tiştêkî di cîh de ye ku em ji badana di helbestên Paul Cedan⁽¹²⁾ de bi heybet bin û herweha di cîh de ye ku em evîndarên dengê bi keser yê Samuel Beckett⁽¹³⁾ bin çimkî evana îspat in ku huner dikare ji heqê rewşê derkeve û bi tewrekî ji tewran bibe encama xwezayî ya qedera brîndar ya Celanê jîndar ji qetlîama cihûyan filitî û qehremantiya bêlehf ya

Beckett wek endamekî Berxwedana frensî. Herweha şikdariya me jî di cîh de ya dema di rewşên wisa de bi şêweyeke pirrêde dilnazî tête diyarkirin; Zêdepêşveçûna zanistîya me di dawîya sedsala bîstemîn de mezinbeşekî mîrata me ya çandî dike îmtîhaneke bêhempa. Tenê merovê gellekî ehmaq û yê pirr mehrûm mayî dê hîn nedizanibin ku dokûmentên şaristaniyê bi xwînê û hêstiran hatine nivîsandine, xwîn û hêstirên ku çîqa ji me dûr bin jî dîsa bi-rastî ne. Û dema ev meyla întellektuelî li gel bûyerên Ulsterê û Îsrailê û Bozniyayê û Rwandayê û hejmareke dir ji şûnên brîndar yên li ser rûyê erdê bi rê ve biçê, nîşana vê yekê ne tenê ji bo nerxandayîna ji tebîeta merov re, wek xwediyê pêkaniyên sazker, kêmsîyek e, lê ji bo karê hunerî bi xwe jî çî nerxdayîné nayne holê.

Ev bû sedema xwarbûna min ya bi salan bi ser maseyê de, mîna rahîbekî ku ji bo bicîhkirina erkê kûrpêvemijûlbûna rûhî bi ser sendeliya pirtûka olî de xûz dibe, bi mebesta hewldana hilgirtina para xwe ji giraniya cîhanê, tevî ku dizane ew ne xwediyê qencramaneke bi qehremanî yan pêkaniyeke bandorfîreh e, lê bi encama guhlêdana rêbaziya xwe neçar e wê bizavê û wê rewşa ew tê de bidomîne. Pijiqandina pizotan ji bo hejargermahiya wan. Jibîrkirina baweriyê û xwemandîkirina ji bo berhemên baş bû. Xwemijûlnekirina bi tevahî ji bo giş çakewesfên almazî, ku herweha jêhatiya bikarhanîna ramanên bi tevahiya xwebêja peyvê xeyalî li gel xwe di hundirîne. Dû re êdî bi dilşadî, û ne ji bo xatirê rewşa xemgîn ya welatê min, lê li gel hebûna wê rewşê jî, min xwe rast kir. Berî çend salan min dest pê kir di hizirkirin û berxeyalkirina xwe de cîh ji bo bedewtîştan çêbikim, herweha ji bo kujertiştan. Li vir jî ez ê hewl bidim xwebêja wê guhertina ramanî bi çîrokeke ji Îrlendeyê pêşkêş bikim.

*

Ev çîroka rahîbekî din e ku bi mêranî xwe dide ber tehmûlkinê. Dibêjin rojekê ji rojan Welî Kevin (St. Kevin, welîyekî Katolîkên Îrlendeyê: Wergêr) li ser çongan danîştibû û çepelên xwe wek xaçekê ber bi herdu haliyan drêj kiribûn, li ser erdê kilîseyeke li Glendalough, devara Wicklow, şûna ku em lê diman ne dûr, cîhekî ku ta roja îroj bi dehl û dar û ava xwe ji dewlementirîn cîhên welêt e. Di dema ku tê de Welî Kevin li ser çongan nimêj dikir de teyrekî reş bi şaşî wisa texmîn dike ku destê wî yê wê de kişiyayî şêweyeke ji hêlînan e û li ser vedinişe, hêkên xwe tê

de dike û dest pê dike li ser wan rûne wekî di hêlîneke li ser çemelekî daran de. Ji ber ku dilê wî bi çivîkê dişewite û ji ber ku ola wî jê dipê ku bi evîndarî jiyana hemî mexlûqatên mezin û biçûk bide ber çavan, Kevin bi dirêjîya seetan, rojan, şevan û hefteyan ji şûna xwe nalive, destê xwe di şûnê de dihêle heta ku hêk vedibin û çêlik bi firê dikevin. Çîrok bi jiyane ve peywendîgir e tevî ku ji bo pejiwandina mentiqî dijwar e, lihevraştatina proseya xweristî û baweriyêke îdeal e di hevbirrîna rê de, herweha îşaret û bibîrhanîneke. Me raberkirina wê şêwe helbestê divêt ku me êdî bigihîne bilindiya wan tiştên ku em di proseya mezinbûna xwe de fêrê bûn.

*

Çîroka Welî Kevin, wekî ez dibêjim, ji Îrlende ye. Lê bi dîtina min dikaribû herweha ji Hindistanê yan Afrîkayê yan Arktîkê yan ji Emerîkayê hatibûya. Mebesta min bi vê gotinê ne ew e ku ez wê tenê têxim nav babetê çîrokên gelêrî, yan bi gumanlêniherîna cîhê wê yê çandî di nav çarçîveyêke çandpîrr de dev bavêjim nexê wê. Li bervaciya wê, hêjabûna wê ji bo bawerîpêhanîne û domandinê pêwîst e li gor rewşa herêmî be. Di rojên îroyîn de merov ê mat nemîne eger ew wek nimûneyêke kolonyalîzmê bête bikarhanîn, bi raberkirina Kevin wek çakîxwazê împiryalîst (yan şandarê olî li dû dema împiryalîzmê), yê ku xwe di nav re dike û jiyana kevneşop ya civakê dide guhertin û dest diavêje hawîrdora wê ya xweparastî. Û pêwîst e li xwe binim, bi rastî jî pêkenîneke qederê ye, ku yê va çîroka bi bedewtiyêke rasteqîne nivîsandî û di nav xizneya çanda îrlendî de parastî kesekî wisa bû: Bivêst nevêst, çîroka Kevin di nav nivîsarên Giraldus Cambrensis⁽¹⁴⁾ de tête dîtin, yek ji ewên ku Îrlende di sedsala duanzdemîn de dagirtibûn, ku pisporê dîroka zimanê îrlendî, Geoffrey Keating, ê li dû pênc sed sal wek “beranê di nav kesên dîroka îrlendî bi şaşî nivîsandinê de” bi nav bike. Lê li gel wê jî, ez nedikarim xwe bi wê yekê bawerkirin bidim ku va berhema ji beyaniya şaristaniya xiristiyanetê bikaribe wisa bi hêsanî wek hacetekî serdestiyê yan mebestên hovane bête şîrovekirin, ji bo demên borîn dibê yan îroj. Tevahiya wêneyê bi min ve wek mînaeke din ya ew berhema hunerî dixewine ku min berî çend hefteyan di entîkxaneyê biçûk ya Sparta de dît, di destpêka roja ku tê de dû re nûçeya xelata Nobel ya îsal ji bo edebiyatê hatî pêşkêşkirin belav bû.

Ev karê hunerî berhema helwesteke ji ya ku Welî Kevin baweriya xwe pê dihanî gellekî cuda bû. Lê tê de şûndariya çivîkeke li ser hêkan û lawirekî hatî sihirkirin û peyakî hişjêçûyî hebûn, tenê îcar peya Orpheus⁽¹⁵⁾ bû û hişfirandin ji mûzîkê dihat, ne ji nimêjê. Karê hunerî bi xwe tabloyeke biçûke hatî kolanandin (nehitkirin: Wergêr) bû û wê weqa bala min kişand ser xwe ku min xwe negirt û li ser kaxizê reşgeşeke wê çêkir; lê min herweha xwe negirt û agahdariya li ser karta di binê wê de nivîsand. Wêneyê ji bo kevnaî û domandina xwe ya demî ez weqa xistim bin bandora xwe, lê agahdariya li ser karta di binê wê de jî ez gellekî balkêş kirim ji ber ku tê de nav û nerxdayîn ji bo wî tiştî hebûn ku ez bi xwe ev bûn sîh sal pê ve mijûl im: “Berhema nerxdanê”, li ser kartê hatibû nivîsandin, “pêkan e ji haliyê helbestvanekî herêmî de ji bo Orpheus hatibe pêşkêşkirin. Ji hunera herêmî ya qonaxa helleni”⁽¹⁶⁾

*

Careke din, hêvîdar im ku ez bi şeweyeke hestî yan fenatîk - wekî ku têtê gotin - pirsra girêdana bi herêmê ve berçav nakim. Dixwazim li şûna wê pêşniyar bikim ku wêneyê û çîrokên wek yên min behsa wan kirî di rolên xwe de xwedan nerx in. Sedsala me bû şahida têkçûna nazîzmê bi encama bikarhanîna çekan li dijî wê; lê yek ji sedemên jihevbelavbûna rêçimên sovyetî parastina nerxên çandî bû, ku di bin gelemperiya îdyolojiya hatî ferizkirin de didomand, herweha berxwedana canî (nefsî / rûhî: wergêr) ku di van şeweyên wêneyan de têtê parastin. Tevî ku fêrbûna me di cîh de ye ku em bi tirseke mezin li zêdepesindana toreyên çandî û bizavkirinên parastina neteweyan di nav sîstêmên gelemperşewê û girtî de biniherin, û li gel ku me îspatên diltezîne hene ku serbilindiya bi mîrasên etnîk û olî dikarin xwe zû wergerînin baweriyên faşîst, haydariya me ji wê yekê pêwîst e jêhezkirin û pêbaweriya me di derheqê kevneşopên toreyî bi xwe de kêmtir neke. Li betvaciya wê, bawerîhanîna bi mayîna hêza erf û toreyên wisa çak û bi layiqbûna wan ji bo berdeyamkirina bawerîpêhanîne pêwîst e me bêtir ber bi nerxdana wê helwestê bibin ku rêzgirtina ji hemî erf û toreyan re pêkan e rê ji afirandin û domandina rewşeke siyasiye saxlem re li cîhanê veke. Li gel cîhgirtina pirrcar ya qetliyamên diltezîne, kujtina kesan û tarûmarkirinê, wan gewregavên bawerîbihevhanîne yên ku peywendiyên di navbe-

ra Filistîniyan û Israîliyan de, Reş û Sîpiyên Başûrê Afrîka de xistin qonaxeke nû, û ew şeweya ku li Ewropa dîwar pê hatin xarê û perdeyên hesinî vebûnî, hemiyar hêviyek afirandin ku pêkaniyên nû dikarin li Îrlandeyê jî bêtî holê. Cewherê wê gelsê xwe bi berdewamkirina dubeşkirina wê giravê ve girê dide, di navbera karbi-destiya brîtanî û îrlendî de, herweha bi îsrara bi eynî pîvan li Bakurê Îrlandeyê ya daxwaza hestgirêdana bi toreyên brîtanî li haliyekî û bi yê îrlendî li haliyê din ve; lê her yek ji danîştvanên welêt bêguman e bi hêvî be ku hukmatên li ser karbi-destiyê dê bikaribin wan dezgehên bi rê xî ku dê rê bidin wê yekê ku dubeşkirin bê-tir wek şebekeyeke herdu beşên cîhê leyiztina bi tennis ji hev vediqetîne be, taximêkî ku rê dide dan û stendina zûşewe, hevdiîtinê, axiftin û bawerîdiyarîkirinê, da ku pêşerojek bête berçavkirin ku tê de jînwerî li şûna ku wek berê ji pêçanepeyvên wek “dijmin” û “hevalbend” were, heye ku êdî ji peyvên kêmtir zoher û xwebêjên ne weqa bi hevûdin ve girêdayî bête der.

*

Dema helbestvan W.B. Yeats bêtir ji heftê salan berê li ser vê sehneyê bû, Îrlande ji nav jana afeta şerê ehlî derdiket ku rasterast li dû şerê serxwebûnê yê li dij Îngliztanê dest pê kiribû. Şerê navxoyî drêj nekir; di gulana 1923'an de rawestiya, dora heft heyvan berî keştiya Yeats tê de bigihê Stokholm, lê şerekî bi xwîn, hov û bandorkûr bû, şerekî wisa ku dê di jiyana gellek nişên pêşerojê de rola herî grîng di şert û mercên siyaseta bîst û şeş deverên serbixwe yê Îrlande de bilîze, ew beşê giravê ku berê wek Dewleta Azad ya Îrlendî hat nasîn û dû re wek Komara Îrlendî.

Yeats di axiftina girtina Xelata Nobel de şerê navxoyî û şerê serxwebûnê wekî ku nehanîn ser zimanê xwe. Kesekî ji wî bêtir di derheqê avakirin û têkdana dezgehên dewletê de nedizaniyê, ne jî di derbareyê dewlemendkirin û binvebirina jiyana çandî de, lê di vî munasebetê de wî baştir dît li ser Tevgera Dramatîk ya Îrlendî bi axifê. Gotara wî li ser mebesta afirîmend ya wê tevgerê bû û çakbûna şansê wê yê dîrokî ku ne tenê piştgiriya ebqeriyeta wî lê herweha ya hevalên wî John Millington Synge û Xanim Augusta Gregory bi dest xe. Ew hat li Stokholm ji cîhanê re bibêje ku di warê guherandina welatê wî û dem dewranê de ehmîyeta berhemên herêmî yê helbestvanan û nivîskarên dramayê ji ya kemînên hêzên gerîlayan ne hindiktir bû; û serbilindbûna wî bi wê şewepexşana bedew eynî serbilindî bû ku ew ê

li dû deh salan di helbesta “The Municipal Gallery Revisited.”⁽¹⁷⁾ de diyar bike Li wir Yeats xwe dixe nav wêne û tablobokeyên peyvîdar yên ku bûyer û şexsiyatekî dîroka nûjen pêşkêş dikin û ji nişkan ve hest dike ku tiştêkî nûnertiya qonaxê ke dîroka dike di hebûnê de ye: “ ‘Ev ne’, ez dibêjim, / ‘Îrlandeya mirî ya ciwantiya min, lê Îrlandeyeke / Ji xeyalên helbestvanan e, ziravberr û bêxem.” Û helbest bi du rêzên ku xwe ji hemiyana bêtir di tevahiya berhemên wî de dubare dikin tî dawiyê:

Biponije rûmeta merov bi pirranî çawa têt û çawa diçe,

Û bibêje rûmeta min hebûna van şêwehevalan bû.

Li gel ku ev rêz armançmezî û heyecanafir in jî, ew mîna keke xwexemilandinê helbestê ne li şûna xweşpatkirinê, ew nîşanên serbilindiya helbestvên in, û bi kêmasî di vî warî de ew dişebihin tiştê ku ez dixwazime di vî axiftinê de diyar bikim. Ez ê bi xwe jî nuha ji haliyê xwe de peyvîne din ji wê helbestê diyar bikim: “Tu yê ku dadmendîya min dê bikî, bila ne tenê tu bî dadmend / li ser vî pirtûkê dibayê yan wê.” Li şûna wê kirinê, daxwaza min ji te ew e ku tu tiştê Yeats ji guhdarê xwe daxwaz kiribû bikî û serkeftinê helbestvan û diamatîst û novelîstên îrlandî di nav çel salên borî de bi bîr wî ku ji wan gellek dostên min in, dibêjim bi serbilindî. Di warê berhemên edebiyatê de, Ezra Pound⁽¹⁸⁾ pêşniyar kiribû ku rexneyariya wan kesan neyê pejirandin, “yên ku bi xwe berhemên hêja neafirandibin,” û ez xwe talihçak dizanim ku min bi vî pêşniyariyê kir, çimkî bîrûbaweriyê baş yê karmendên hêja ye - û ne tenê yê ji welatê min - û vî yekê ji roja ku min li Belfast sîh salan berê dest bi nivîsandinê kir de pişt da bizavên min. Îrlandeya ez nuha lê dimînim ew wara ye ku bi alîkariya xeyalên van hevdemên min yê îrlandî gihiştîye vî qonaxê.

Lê ne hemî berhemên Yeats yê xwexemlokî ne. Bêyî çî guman û bi çî pîvanî dibe bila bibe herdu helbestên wî yê bi navên “Nineteen Hundred and Nineteen”⁽¹⁹⁾ û “Meditations in Time of Civil War”⁽²⁰⁾ li dû hev hatinê weşandinê se bilindî ne ji bo şîra sedsala me. Di ya duyemîn ji wan de loraniya navdar ya li se hêlîna li nêzikî pencereya wî heye ku çûkreşekê di qelşeke dîwarê kevin de çêkirî ye. Wê demê helbestvan di kelayeke normandî de dima ku roleke mezin di dîroka leşgerî ya paşeroja welêt de lîztiye, dîsa di demên bêaramî de, û di wê bîsta ku helbestvên tê de hişên xwe bi îroniya di derheqê şaristaniyan de mijûl kiribûn, ku ça

wa ew bi encama kirinên fatihên stemkar û hêzdar xwe bi cîh dikin, fatihên ku dû re hunermandan û hosteyan dixin xizmeta xwe; di wê bîsta mijûlbûnê de, dîmena makçûkeke ku xwarinê didêye çêlikên xwe haya helbestvên dikişîne û di wê dîmenê de ew xeyala mêşa hingiv bi bîr tîne, îmajaya ku di toreyên şîrî de cîhekî kûr girtiye û her dem xwebêjeke îdeal di derheqê xebata afirger û li hevbûna ji bo xatirê sûda gelemper de dide:

Mêşên hingiv di qelşan de çêdikin war,
Di xaniyên sist dibin de, û makçivîk
Tînin wir bi xwe re kurmik û mêşan.
Dîwarê min sistr dibêye; mêşên hingiv,
Werin di mala çavên mebestvala de çêbikin war.

Em li paş deriyê girtî ne, û kilit hatiye badan
Li ser qedera me ya di mij de; li derekê
Peyak tê kujtin, malek dişewite,
Lê dîsa jî nayê dîtîn zelalrastiyek:
Werin di mala çavên mebestvala de çêbikin war.

Astengdîwarên ji kevir û daran;
Şerekî navxoyî yê çardeh rojan;
Şeva borîn hilol dikirin li ser rê
Ew ciwanleşgerê mirî di nav xwîna wî de:
Werin di mala çavên mebestvala de çêbikin war.

Me dilê xwe av da bi xeyalan,
Ta ku dil hov bû bi vexwarina pirr;
Di me de hestên neyartiyê
Girantir bûn ji yên evîndariyê; Oh mêşên hingiv,
Werin di mala çavên mebestvala de çêbikin war.

Min gellek caran tevahiya vê helbestê yan beşine wê di nav bîst û pênc salên borîn de li Îrlende ji xelkê bihîstiyê, û ev yek ne tişteki mathîştinê ye, çimkî ew li hember jiyane wek Welî Kevin hestnazik e û di eynî demê de ew di derheqê bûyerên jiya-

nê û jiyane bi xwe de wek Homer⁽²¹⁾ hestbihêz e. Ew dizane kujtina li ser rê de dîsa cîh bigire, dizane ku karkerên di mînbûsê de dê li dû kutakirina kar bêyên rêzkirin û kujtin; lê ew herweha destguvaştinê, hebûna sempatiyê û parastinê di nav mexlûqatên jîndar de, dinexîne. Ew hewcedariyên jihevcihê û cudareng yên wûjdanî ku di demên kirîzên kûr de têyên holê razî dike, li haliyekî hewcedariya bi rastgotinê ku dê dijwar û bi tehlûke be, û li haliyê din, hewcedariya bi wê yekê ku hişkbûna ramanan negihê radeya bêparkirina helbestê bi xwe ji hêviya ku wek delal û bawerîhêja be. Ew îspatek e ku helbest xwedîya wê pêkaniyê ye ku ji heqê we-sifdana wê rewşa ku ew jina rûsî ji Anna Akhmatova hêvî dikir derkeve, û bi şeweyeke rasteqîne; û William Wordsworth⁽²²⁾ di dema kirîzeke dîrokî ya eynî nol û ji bo wî bi xwe ziravbîr de, dused sal berê, berhemeke wisa afirandiye.

*

Dema hozan Demodocus li ser ketina Troy⁽²³⁾ û qetliyama bi ketina wê re cîh girtî distirê Odysseus digirî, û Homer di helbesta xwe de dibêje ku hêstirên wî wek hêstirên jîneke ku li meydana şer li ser şûyê xwe yê ketî digireye bûn. ‘Teşbiha belaxî’ ya di destanê de wisa didomîne:

Bi dîtina dîmena peyayê di sikrana mirinê de,
 Jin xwe diavêje ser û wî hambêz dike, bi qîrîn;
 Dû re jana ji serên rîman li ser pişt û milên xwe hest dike,
 û tete gêrkirin ber bi koletî û şîne.
 Giriye bi dilşewat henarikên wê dihelîne;
 Lê agirê wan nade ser yê hêstirên Odysseus,
 Ku nuha veşartî, ji hevalan dûr, dihatin xwarê.

Hîn îroj jî, li dû sê hezar sal, dema ku em tê de bûyerên hovane yên hemdema xwe di eynî katê de dibînin û wilo zû di ber çavan re derbas dikin; wisa baş têyên agahdarkirin, ta radeya tehlûkeya avisûnbûnê; weqas dokumenterên di derheqê girtin û kujtina di kampên recîma nazî û yên sovyetî de cîh girtinê dibînin ku belkî ji hewcedariyê bêtir be; erê, di vê demê de jî wêneya Homer di destana xwe de afirandiye hîn dikare hişên me li me vegeirîne. Jana ji serên wan rimên li ser pişt û milên jinê li dû demê û wergerandinê hîn jî dimîne. Wêne di xwe de rasteqîniyeke

dokumenter dihewîne ku xwe bi her tiştê em sebarete tehemulnekirinê dizanin re peywendîgir dike.

Lê şêweyêke din ya rasteqîniyê heye ku mulkiyeta helbesta ji bo stiranê ye. Bêguman ew peywendîgir e bi “heykelê di nav hestên me yên bihîstinê de” ku bi guhdarkirina helbestê re xwe diafirîne. Rasteqîniyêke ku Mandelstam wek ya ji “xwebicîhkirina banşantiya axiftinê” hatî der bi nav dike, rasteqîniyêke ji mebestê û serxwebûnê ku her helbesta bi tevahî armançgir xwedî lê derdikeve. Ew herweha bi pêkaniya zimanî ya jihevbelavkirin û berbihevhanîna peyvan, bi xweşiya ji îqâ’î û deng û rîtm û stanzayên di helbestê de amade ve girêdayî ye, wekî bi ramanên helbest xwe bi wan ve mijûl dike û bi dirustiya helbestvên ve. Erê, di helbesta stiranşêwe de rastî di nav wesîleyê bi xwe de wek dengê dirust tete bihîstin. Û lêgerîna bêyî westabûn ya li vî dengê ye, dengê ku xwe li gel Emily Dickenson⁽²⁴⁾ û Paul Celan gîhandiyê çakradeya herî bilind û li gel John Keats⁽²⁵⁾ xwe gîhandiyê meqamê herî bi nerx, ev e ku dihêle guhê helbestvên her li bihîstina dengê xwedan pêkaniya bawerîpêhanîna tevahî bigere di nav hemî dengên din yên ragîhandinê de.

Ev rêyêke gotina wê yekê ye ku ez hîn bi tevahî ji ser milê wê kenepêyê danekitîme⁽²⁶⁾. Heye ku baldayîna nûçeyan li nik min pêşve çûbe û hişyariya min di derheqê dîroka cîhanî û xem û kederên ew bi xwe re dixe nav cîhanê de bêtir bibe. Lê tiştê ku dengê min guh daye ser dibêje hîn jî bi tevahî xwebêja bûyera cîh digirêye nade; xwebêj kûrtrir e, ji ber ku wek helbestvanekî ez li dû tiştêkî me ku bizava hatî kirin tê de bi saya rêzkirina dangan li gor razemendiyêke mûzîkalî bi cîh bibe. Mîna ku pêlika avê bi gihîştina dawîya xwe re îspatkirina xwe bi rêya xwevejandînekê hevî bike, ku ber bi navenda xwe bête kişandin û dîsa ber bi derve vekîşe.

Ez di xwendina helbestan de herweha li dû tiştêkî din im. Û, wek mînak, ez di dubarekirina rêza Yeats, “Werin di mala çavên mebestvala de çêbikin war” de rastî wî tiştî tîm, di dengê bergerîna di wê de, di hêza di nav peyvên “çêbikin” û “war” de û di diyarkirina bêhêvîtiyê di peyva “vala” de. Ez herweha di hêz û lihevhatina rîtm peyvîne helbestê de rastî tîm, û di wê yekê de ku tevahiya helbestê xwe wek formeke serbixwe di nav zimên de bi cîh kiriye. Forma helbestî di eynî demê de keştî û lenger e. Hem biserketin e hem ragirtin, rê dide tevçîhgirtina dilşadiya bi her tiştê ku dikare di hiş û giyanê merov de xwe ber bi detve vekîşîne û ji derve de

xwe ber bi wan rakişîne. Û ev tişt in ku dihêlin berhema Yeats her tiştê ku helbsta grîng dike bike, ku xwe bigihîne hîmê xweristiya sempoatîk di me de û di eynî demê de haydarê xweristiya nesempoatîk ya cîhanê be ku dikare ya me têxe bin bandora xwe. Forma helbestê, bi gotineke din, ji bo hêza wê, ku wî tiştê jê re wek çaviya nerxdayîne maye û dê her bimîne bike, bêyî hempa ye: Hêza bawerkirindana wî beşê nazik di wêjdana me de bi dirustbûna wî, li gel îspatên nediristbûnê li hemî haliyên me; hêza ku di me de wê yekê bi bîr wîne ku em nêçirvan û berhevkarên ramanên bi nerx in; ku heta bi tenêmayîn û xemgîniyên me bin, ew jî nîşanên realîteya merovtiya me ne. □

Wergera ji inglîzî: Şahîne Bekirê Soreklî

Têbiniyên Wergêr:

- 1) British Broadcasting Service : Dezgeha Radyo ya Înglîzî.
- 2) Intelligence.
- 3) Zêdebikarhanîna beyan û belaxeta zimanî.
- 4) Irish Republican Army: Hêzên Komarî yên Îrlendî.
- 5) Îrlendiyên dixwazin li gel Înglîzîtanê bimînin.
- 6) Osip Mandelstam: Helbestvanekî rûsî ye. Di 1891'ê de li Warso ji day bûye, di 1937'an de hatiye girtin û tete gotin ku di 1938'an de di kampeke girtiyan de li Rûsistanê miriye.
- 7) Teoriya ku dibêje rastî û zanistî tiştên nisbî ne, xwe li gor demê û kesan diguherin.
- 8) Raberkirin / daxuyakirin / Riswakirin.
- 9) Anna Akhmatova: Navê nivîsandîne yê Anna Abdreyevna Gorenko: 1889 - 1966; di de-ma miri na wê de, li Leningrad, wek jina herî navdar di warê edebiyata rûsî de hatiye bi navkirin.
- 10) Mebest kêmahîtiya etnîk e: mînorîte.
- 11) Cornelius Tacitus: 56 - 120 ; dîrokzanekî navdar yê Roma.

12) Şaîrekî cihû ye, 1020 li Romanya ji day bûye û 1970 li Parîsê miriye. Ji kam pê naziyan jîndar filitiye.

13) Nivîskar û helbestvanekî îrlendî ye, 1906 - ?

14) Giraldus Cambrensis: Dîrokzanekî ji malbateke bi rûmet e, ji devera Wales. Di sala 1184'an de ketiye xizmeta Kiralê Îngliztanê Henry yê Duyemîn û di navbera 1185 û 1186 de li gel komeke ji hêzên wî çûye Îrlandeyê. Pirtûkeke wî di derheqê dîroka Îrlande de heye.

15) Orpheus: helbestvan û mûzîkvanekî kevneçîrokên yewnanî ye, weqa xweş li lêreyê (qîsare) di xistiye ku lawirên çolê li ber dengê mûzîka wî ji ber xwe diçûne.

16) Di dîroka yewnanî de qonaxa li dû dema Aleksender yê Mezin.

17) "Galeriya Herêmi di Serilêdaneke din de."

18) Ezra Pound: 1885 (D.Y.E.) - 1972 (Venice / Îtalya) Yek ji mezintirîn helbestvan û pisporên edebiyata inglîzî ku di derheqê gellek ziman û edebiyatên din de jî xwedan zanyarî bû. Di dema Şerê Cihanî yê Duyemîn de li Ewropayê piştgiyariya rêçima nazî kiribû û ji haliyê hêzên amerîkî de dûre hatibû girtin û wek merovekî dîn hatibû îlankirin. Berî bimire xelatîne edebiyatê ji bo wî hatibûn dayîn.

19) Hezar û Nehsed û Nozdeh.

20) Kûrponijandinên di Dema Şerê Navxoyî de.

21) Homer: Şaîrekî kevneyewnanîyan e ku pêkan e nivîskarê 'Odyssey' be.

22) William Wordsworth: 1770 - 1850, helbestvanê herî navdar yê tevgera romantîkî li Îngliztanê.

23) Bi yewnanî Troia; bi latînî Troja. Kevnebarekî li bakurê roavayê Anatolya bû.

24) Emily Dickenson: helbestvaneke amerîkî ye: 1830-1886.

25) John Keats (1795 - 1821): Yek ji mezintirîn helbestvanên Îngliztanê ye di sedsala 19'emîn de.

26) Kenepeya ku ew di rojên zarokîya xwe de ji bo guhdarkirina radyo radibû ser milê wê.

Şahê kemanê: Paganîni

Birgitta Bergman

Li ciyê karê min tim radyoya min vekiriye. Rojekê (26. 9. 95) piştî nîvro, radyoya min wek hûn tim vekiribû û li ser Nicolo Paganini programek hebû. Him programê û him jî muzîka wê pîl bala min kişand. Ya rast ev cara pêşî bû ku min navê Paganini dibihîst û li muzîka wî guhdarî dî kir. Min ev jî xwe re weke kêmasiyê mezîn dît. Piştî programê min telefonî radyoyê kir û xwe bi xanima ku program çêkiribû re bipeyivim. Telefona mala wê dan min û min bi şev telefonî mala wê kir. Mala wê li Göteborgê bû. Min jê pirsî gelo ew ê kanibe kopiyake wê programê, (ya deng yê jî nivîs) ji min re bişîne yan na? Xatûnê piştî çend rojan kopiyake teksta programê ji min re şanî Berê min guhdarî kiribû, îcar jî min xwend. Piştî xwendinê min hîn bêtir jê hez kir. Û lema jî min biryar da ku ez wê wergerînim kurdî û li derkê biweşînim. Û netîce qîsmet bû ya *Nûdem Wergerê*.

Ji ber ku muzîk jî bo programeke radyoyê hatibû hazirkirin, lema jî li gor min gelek nimûne referuatên zêde (ku di axaftinê de dikarin meriv aciz nekin û jî guh re gelekî xweş bînin) tê de hebûn. Min çend tiştên wiha hewce nedît ku wergerînim. Ez hevî dikim ku li gel vê kêmasiyê jî hûn ê dîsa jê tehmekê bigirin.

Zinarê Xam

Muheqeq hin kes hene ku tu carî navê kemanvanê efsanewî, Nicolo Paganîni (1782-1840) yê Îtalî nebihîstine. Esas di serî de li pêş wî gelek zahmetî hebûn. Hema di xaniyekî xerabeyê di Kuşa Pisika Reş de hatin wî ya dinyayê bi serê xwe jê re problem bû. Vê yekê kir ku wî tu carî nikanî bû qebûl bikira ku hin kes rê li ber wî bigirin. Û tiştêkî din yê înteressant jî e

xaniyê wî yê xerabe li Genua, hema bi qasî menzîla kevirêkî qewetê ji mala Chrîstopher Columbus wêde bû. Helbet divê milekî merivê bi qewet hebe ku meriv kanibe kevirê qewetê bavêje.

Bavê Nîcolo, Antonîo ji lêxistina mandolînê pir hez dikir. Her êvar diçû meyxana mehelê *chiantiyek* û masiyekî birajtî dixwest û ji hevalên xwe re li mandolînê dixist. Wan jî *serenader* û stranên gelêrî distiran.

Bavê wî karkirê lîmanê bû. Dema wî xwest Nîcolo fêrî mandolînê bike gelek zahmetî derketin pêş wî. Hercara ku wî çewt lêdixist Nîcolo tavilê di vê çewtiya wî derdixist û ji hêrsan xwe wenda dikir. Erê meriv dizane hemû zarok ji muzîkê re hesas in, lê yê Nîcolo hinekî zêde bû. Ew li hember dengê seeta dêrê dikane kelogirî bibe û bi qîrîn bicoşe. Û gava li dêrê dengê orgê dibihîze hemû laşê wî dilerize û di xwîdanê de vedigevize. Carê hîn pênc salî ye kemana birayê xwe bi emanetî jê digre, hewqasî di bin tesîra wê de dimîne ku êdî digihîje dereca xewirandinê û du rojan wer bi cuzbê dikeve.

Kemana pêşî

Pîştî xewirandinê radibin Nîcolo ji kemanê bi dûr dixin. Lê ew her dike nûze nûz û dawiya dawî bav radibe ji mecbûrî dersa pêşî didê. Nîcolo hewqasî jîr e ku di nav çend rojan de êdî ji kokimê bavê xwe gelekî jîrtir e. Ji nişka ve fikreke dahiyane tê Antonîo:

– Dibe ku Nîcolo jî rojekê wek Mozart bibûya zarokekî mûcîzewî û bi vê riyê wê malbata xwe jî gelekî dewlemend bikira. Û gava malbat dewlemend bibûya ewê Antonîo jî êdî bikanîbûya li gor kêfa dilê xwe ji xwe re biçûya meyxaneyê; ji dêlî ku ji sibê hetanî êvarî li lîmanê bixebitiya.

Ji vê rojê û pêve êdî xelasiya Nîcolo tune. Radibe ji Nîcolo re programeke xebatê ya gelek zahmet hazir dike. Ji sibê hetanî êvarî di odekê de wî hefs dike, heger baş prova neke nahêle tişteki jî bixwe, Hetta gava Nîcolo têra xwe prova dike jî dîsa ji heqaretê xelas nabe Ji ber ku vê carê jî wî derdixest ser masa xwarinê -ku ser masê jî tim tije piskiwît û şekir e - û hemû malbatê mecbûr dike ku giş jê re li çepikan xin.

Bêguman Nîcolo ji vê merasimê nefret dike, lê li alî din destê wî ji kemanê jî nabe û roj bi roj jî pêşketineke pir mezin nîşan dide. Di nav salekê de



ew besta xwe ya pêşî çêdike, li *Katedrala San Lorenzo* konsera xwe ya pêşî dide û wek solîst êdî amade ye ku derkeve hember temaşevanan. Gelek eşrafên bajêr bi vê pêşketina Nîcolo hewqasî kêfxweş dibin ku radibin di nav xwe de pera top dikin, didin malbata Nîcolo ji bo ku wî bişînin ba mamos-teyekî baştir. Lê bavê wî tu carî jê naqete, tim wî rexne dike, tirsê tê difirîne û ezîyetê pê dide kişandin. Piştî gelek sal wê Nîcolo bibêje ku di hemû jiyanê wî ya xortaniyê de du tişt tenê di serê wî de hebûne:

– Yek jê, fêrî teknîkeke muazem bibim û ya din jî ji bavê xwe bi dûr kevîm, ku ew bi tu hawî nikanibe xwe bigihîne min.

Xumara mezin

Piştî demekê Nîcolo digihîje her du armancên xwe jî. Rojê yanzde saetan dixebite, heta ku tiştê nikanibe lêxe nemîne. Dûre roja ku musabeqeyeke mehelî qezenc dike û di tiyatroyê de wek kemanvan ji xwe re karekî dibîne radişe ji malê jî direve. Û di eynî wextê de ew şerabê, jinan û xumarê jî kişîf dike û sond dixwe ku ewê pereyekî pirr qezenc bike ji bo ku kanibe xwe bigihîne wan hemûyan.

Evîna wî ya pêşî xatûneke esrarengîza esîlzade ye. Xatûn wî bi xwe re dibe qesra xwe ya li Toscana û li wir du salan li ba xwe dihêle. Li gor îddîfa Nîcolo ev xatûna esîlzade wî fêrî gîtarê dike. Gava ew ji wir dihere, ji bo bîranênê xatirayekê dide xatûnê. Ev "Duetto Amoroso" ya ji bo keman û gîtarê ye, ku ji neh beşên bi navên "îqna", "muwafeqet", "dilşadî" û yê din. pêk hatîye.

Karekî baş e, ku meriv kanibe bi dest xwe bixe

Piştî wê Paganînî li ba xweha Napoleon, Marîe Elîsa Bonaparte, qiralîça Lucca wek sermuzîsiyen dixebite. Ew dibe şefê orkestra qirêl û di merasimên wî yê muzîkê de besteyên xwe pêşkêş dike, dersa kemanê dide wî û hetta gelek caran di oda Qiralîçê ya razanê de dersê dide wê jî. Marîe Elîsa yekcar nan di konserên Paganînî de ji kêfa dengê xwe pirr bilind dike û digure. Li ser vê, wê derdixin der, îcar gava wê derdixin der ji jinên qesrê yê din re êdî pirr ne zor e ku xwe bigihînin Paganînî.

Dostikê jinan

Meriv nikane qal neke: Paganînî ji jinan hez dikir û wan jî jê re nedigotina. Wî qebûl dikir ku ew ne yekî "çeleng" e, lê digot :

"Gava jin li min guhdarî dikin xwe davêjin ber nigên min."

Û ji xwe wî jî dixwest tam wan li wir bibîne, lema jî kêm lênedixist.

Şevêkê nivê şevê dihere ku keçikeke cuwan ziyaret bike, lê bi şaşî dikev maleke din û ji mecbûrî ji pacê bazdide. Li Mîlano dîsa bi şaşî dikeve maleke xerîb, xanimeke gelek delal nexweş e, di nav nivînan de ye. Vê carê nare ve, dibêje ez tixtor im. Piştî ziyareta sisiyan jînik dibe bistim. Li Turîn dil wî dikeve keçikeke çarde salî, lê bavê keçikê nahêle keçik pêre bizewice; bav keçikê dibêje:

– Bi xêr kînga keçik mezin bû ezê wê çaxê bifikirim.

Û li Genua bi rastî jî ew tê girtin; îddîa ewe ku bi soza zewacê keça yek terzî xapandiyê û pê re razaye. Li ser vê yekê ew bi hawakî felsefîk dibêje:

– Di meseleyên wiha hesas de kaba meriv hertim mîr nayê.

Gelek carên din jî tu namîne ku Paganînî bizewice, lê her car jî di deqîqeyê dawî de geşek, mani'ek derdikeve. Di mektûbeke xwe de ji hevalekî xw re dinivîstine, dibêje "bêkarî (azibî) sultanî ye." Û her wisa azib jî dimîne Wî ji vê jîne hez dikir.

Şampiyonê muzîkê

Bi vê yekê re tiştê herî girîng yê qewimî bû bi rastî jî Paganînî bûbû kemanvanê herî bêemsal, bêemsalê hemû wextan, her çiqas ev îddîa ya wî be jî Wek hosteyê mezin wî dikanîbû bi kemanê reyina kûçîk, qixîna qazê, çirçira sîsîrkê û çîrkeçîrka(zîqzîqqa) deriyakî hesinê zengarî texlîd bikira.

Carê di vebûna konserekê de bi kemanê ji temaşevanan re dibêje "êva baş." Vê yekê hewqasî bi ruh dibêje ku hemû temaşevan jî lê vedigerînin dibêjin "êvar baş." Careke din kemanvanekî zikreş şert digre, dibêje raqib min nikane konsereke nuh û zahmet raste rast ji rûpelê lêxe. Paganînî bi şîk lekî mukemel lêdixê û hetta hinekî din jî zahmettir dike, noteyan serberjê dide ser textikê notayê.

Heger di dema lêxistinê de têlek biqetiya, ji bo ku têlê biguherîne nabê

nedidayê, tenê dûzana tiliyan diguherand, bi vî hawî bi wan sê tîlên mayî dom dikir. Ji hevakele xwe re besteyeke "Scene Amoureuse" bi du tîlan çêdike û gelek caran jî perçeyên xwe yê herî meşhûr ji serî heta dawî bi tîlekê tenê lê dixê. Li Fransayê endamên orkestrayê di konserekê de refeqeta bi Paganîni re red dikin, ji ber ku nikanin xwe înbîaqî tempoya wî bikin. Li Englistanê kemanvanekî meşhûr, bi navê Morî hewqasî di bin tesîra lîxistina Paganîni de dimîne ku radibe kemana xwe dide ser serê xwe û wê bi du kronan harac û mazat dike. Li Îtalyayê mezinayiya wî ya bêemsal tesîreke hewqas mezin li Meyerbeer(1791-1864) dike ku Meyerbeer êdî nikane bixebite, dev ji amadekirina operên xwe berdide û dide dû Paganîni, teqrîben hijsed(18)konserên wî temaşe dike. Li Awusturyayê Schubert ji bo ku li Paganîni guhdarî bike ji xelkê pera deyn dike û gava ji konseran jî derdikeve êdî ne li ser hijsê xwe ye, dibe wek mirîdekî ku bi cuzbê bikeve. Chopin(1810-1849) li Polonyayê dibêje:

– Ji alî hisan ve ew pirr xurt û bêemsal e.

Rexnegirekî Fransîz di nivîseke xwe de dibêje:

– Heger wî sed sal berê wiha lê xista ewê wek sihêrbazekî bihata şewitandin.

Gelek dijwari

Lê pirr mixabin ku bi rastî jî hin însanan bawer dikirin ku Paganîni sed salî berî dema xwe dijiya. Qenaeta hin kesan ew bû ku bi Paganîni re muheqqetîştêkî mîstîk heye, ku tunebuya wî yê nikanîbuya wiha lîxista. Rîwayet li hemû Ewrûpayê belav dibin:

– Paganîni teknîka xwe ya harîka pirr bi pêş de biribû, ji ber ku ew heyşt salan di hefsê de mabû û di nav van heyşt salan de wî bi hawakî bînabên prova kiribû. Wî hemû perçeyên xwe ji bo tîlekê nivîsandibûn, ji ber ku qerdiyanê hefsê hew destûr dabûyê. Nizanim ruhê hemû dostikên wî di kemana wî de girtî bûn. Wî hewqas zû lê dixist, ji ber ku yaya kemana wî tije gulleyên(xar) ji qurşûnê bûn. Dengê kemana wî tu carî nedibû, ji ber ku tîlên wê ji rûviyên raqibên wî yê mirî bûn. Û ya ew lawê şeytên bi xwe bû û ya jî bi kêmanî ruhê xwe firotibû şeytên û li hember vê jî li sahnê şeytên her

hereketê wî îdare dikir.

Dawiya dawî Paganînî mecbûr dimîne ku mektûbeke diya xwe biweşîne û bi vê riyê jî nîşanî mîlet bide ku dê û bavên wî jî însan in. Ew bi vê jî nayê serî, radibe anonsên dirêj dide rojnaman ji bo ku îddîa û derewên der û doran ên bê bingeş pûç bike. Lê însan dîsa jî bi şik in.

Kemanvanekî Îngilîz pirr ji nava xwe raziye, dibêje ezê sirê vê hostetiya Paganînî fêr bibim. Li ser vê radibe tam şeş mehan li pey Paganînî digere, bi dizî li axaftinên wî guhdarî dike û bala xwe didê hela ka çi dixwe û çi veduxwe. Carekê jê re li hev tê, li otêlekê oda wî û ya Paganînî dikevin kêlek hev, bi vî hawî firsendê dibîne ku di qulika derî re li Paganînî mêze bike. Lê tiştekî bi ser avê naxe.

Serkevîtin li pey hev tên

Ji ber ku sir qet ji hev naqetin, lema efsane jî her ku diçe mezintir dibe.

Û Paganînî jî her ku diçe dibe super star. Împaratorîçe, dukên herî mezin û prens ji bo ku herin li konserên wî temaşe bikin bi hev re dikevin reqabete. Û muzîsyenên feqîr jî kincên xwe difroşin ji bo ku kanibin ciyekî erzan bi destê xwe xînin. Heyranên wî li serê kuçan, ji hotêlên lê dimîne heta salonên ku konseran lê dide pê li serê hev dikin, ji bo ku bi kêmasî kanibin vî merivê mezin bibînin. Û gava dibînin jî destên xwe pê dikin, dixwazin baş îqna bibin ku ka rast ew benderuh e ya na.

Gelek tacirên jîr, bi saya hin îcadên wek parfumên Paganînî, qutiyên cixarê yên Paganînî, gopalên Paganînî, bişkokên Paganînî û gelek tiştên wek wan pirr dewlemend dibin. Hetta meriv dikanîbû paste û simîdên Paganînî bixwara, kulîncayên wî bikiriya. Di lîstika bîlardoyê de şiklekî temasa bi tope pê re navê wê kiribûn derba "La Paganînî." Ya jî meriv dikanîbû biçuya ji dikanekê cotek lepikê ku li ser ferê çepê keman û li ser ferê rastê jî yay hati-bûn nexşandin bikiriya û têkira destê xwe. Paganînî bû baron, bû amîral...

Tê gotin ku Paganînî rojekê li Wîyanayê li paytona yekî Îtalî suwar dibe. Yê Paytoncî ji Paganînî destûra belavkirina vê bûyerê dixwaze û helbet destûrê digre. Û bi herfên mezin li pişt paytona xwe "PAGANÎNÎ FÎACRE" dinivîsîne. Piştî vê reqlamê karê wî hewqasî baş dibe ku mêrik radibe dev ji

paytoncîtiyê berdide û ji xwe re otêlekê dikire.

Qet desttengiyê nabîne

Paganînî qet pera wenda nake. Konserekê li pey konserekê dide û wek qaîde jî bilêtên wî tim du-sê qatan ji yên xelkê buhatir bûn.

Careke din, paytonciyek wî ji otêlê dibe avahiya ku ewê konsêrê lê bide, lê hinekî zêde jê digre û wek sebeb jî dibêje ku:

– Ez ji te zêde digrim, ji ber ku bilêta konsera te jî pirr buha ye. Paganînî gotina mêrik di dev de diqurçimîne, dibêje:

– Heger tu min li ser tekerekî bibî wir, ezê jî heqê bilête ji te nestînim.

Lê wê pirr nekşîne ku bilêtên konserên wî hîn jî buhatir bibin; hewqas buha bibin ku hetanî wê demê tu muzîsîyenekî din negihîştibe wê derecê. Lê dîsa jî konserên wî tim tije dibin.

Nuha jî li Ewrûpayê hin îddîayên din digerin:

– Li Ewrûpayê Paganînî merivê herî çukûs e. Zêrên tu qiralekî bi qasî yên wî tunene. Ew li pey perên temaşevanan e. Li hin deran navê wî dikin ”Paganîente” (Paganîniyê ku heqê tişteki nade). Hetta bigihê şairekî wek Heîrich Heîne ji Paganînî re dibêje:

– Ew wampîrekî bi keman e, heger naxwaze xwîna me vexwe, bi kêmanî dixwaze perên bêrikên me bixwe.

Her çuqas millet di der heqê jiyana Paganînî ya pîrvat de çîrok belav dikirin û ji buhabûna bilêtên wî gazin dikirin jî, lê dîsa jî însan qefle bi qefle diçûn konserên wî û her kes hemfikir bû ku lêxistina wî ya kemanê tişteki muhteşem bû. Rexnegirekî Fransiz dibêje:

– Destûrê bidin bira jin zarokên xwe yên nuhwelidî bi xwe re bibin konserên wî, ji bo ku piştî şêst salên din rabin quretiyê bikin, bibêjin me jî carekê li Paganînî guhdarî kiriyê.

Final

Dibe ku Paganînî ne lawê diya xwe yê herî di halê xwe de bû, lê tiştê bêmunaqeşe ew kemanvanê herî baş bû. Û helbet yê herî bi şik.

Ew perçên xwe yên soloyê bi piranî bi dizî digre, ji bo ku kemanvanên din

wan nedizin. Li gor îddîa Paganînî metodeke wî ya sirî hebûye, li derekê dibêje:

– Bi vê metodê muzîsiyenekî xort di nav sê salan de dikane bigihîje mukemeliyeteke wiha ku ancax ew piştî xebateke gelek zahmet di nav deh salan de dikanibe bigihîjê.

Lê çi heyf ku tu kes vê metodê fêr nebû, lema jî çi wextê Paganînîyekî din derneket. Însan bi gelek hawî xebitîne ku sirê vê deha wî fêr bibin, lê heta nuha kes fêr nebûye. □

Wergera ji swêdî: Zinarê Xamo

Çima kompûter nikarin pirtûkan wergerînin?

Peter Gärdenfors

Li seranserê cîhanê mirov rûdinin û zimanekî werdigerînin bo zimanekî dî. Ne tenê tekstên edebî têne wergerandin, belkî nivîsarên zanyarî, peymanên bazirganî, belgeyên dadyarî, rêbaznameyên teknîkî û hw.d. jî. Ev xizmet kêman caran payeyek bilind dibîne, piranî wekî karekî ji-ber-xwe-ve tête dîtin. Di seredema me de kompûter hingî diçe pirtir van karên ji-ber-xwe-ve dide ser milê xwe. Madem wisa ye çima kompûteran dest ne avêtine karê wergerandinê?

Mirovan xwe ceribandine. Hêj di salên 50-yê de, gava ku beng benga kompûteran bû, datalog û zimanzan lê xebitîn ku programina çêbikin da bikaribin wergerandinan bi otomatîkî bikin. Mirov difikirî heger ku mirovî bikaribûya rêzimana zimanekî bi hinek rêbazan, ku dê bikaribin wekî program bêne nivîsandin, formûle bike; û heger mirovî ferhengine kompûterîzekirî ji her zimanekî re hebûya hingê bi kêmanî dê kompûteran bikaribûna wergerên tiştên herwek-her bikin. Ji ber ku kompûter pir xweragir in û ji mirovan çêtir rîiayeta rêbazan dikin, divêt wan ev kar bi hêsanî bikira. Di têgehiştinên mirovan de xweşbînî di heqê mekanîzekirina karên wiha de mezin bû; herwiha ji bilî wergerandina otomatîkî di warên dî de jî. Di şê'ra xwe ya bi navê »Aniara« de, Harry Martinssonê ev pêşdîtinîya paşerojê wiha îfade kir:

Ew dizanin ku bîrtûjîya mîmayê•
ya entelektuelî
û vebijartin û ragihandina wê
sê hezar û heştî caran zêdetir e
ji ya mirovan heger ku mirov Mîma jî bûna.
Her cara têm malê û mîmayê dixebitînim
ew wekî di mîhrabekê de dadinişin.
Û gelek caran min bihîstiye ew di minminin:
bifikire li wî kesê ku wekî mîmayê be.

Lê belê pêşketin rawestiyân. Feylesofê israîlî Yehoshua Bar-Hillel hêj di sala 1960-ê de raporeke pir rexnegir li ser wergerandina kompûterîzekirî ya ji zimanekî bo zimanekî dî nivîsand. Ewî ji wan metodên ku dihatin bi kar anîn encama ku mirov dê tucaran negihî vê armancê derêxist. Rapora Bar-Hillel bû binasekî mezin ji kêmkirina lêkolînên li ser wergêriya kompûterîzekirî. Ev lêkolînên wiha di salên 60-yê û 70-yê de nizbeten dorsênckirî bûn, lê cardî di salên 80-yê de bişkivîn. Li Ewropayê, bo nimûne, welatên EU-yê bi navê »Eurotra« projeyeke gelek gewre ya lêkolînê dan dest pê kirin. Armanca projeyê çêkirina programek wisa bû ku bikare wergêriyê di navbera her neh zimanên EU-yê de bike. Beriya salekê proje xelas bû, lê encamên wê dorsênckirî ne. Wan hinek pêşkeftin kirine, lê ew bersiva hêviyên mirovî nadin.

Çima wergerandinên bi otomatîkî hewqes zor in? Bi rastî jî dê hem ji bo weşanxaneyan, hem ji bo dersdaran xarîqeyek mezin bûya heger mirovî bi arîkariya kompûteran zûka bikariya pirtûka xelatgirê Nobelê yê dawî wergeranda bo swêdiyê. Lê belê kompûteran, ne tenê di warê wergêriyê de, sergêjiyê mezin bi zimanî re – ango bi zimanê xwezayî re – heye. Pîraniya programan heta roja îro jî dixwazin ku rêbazên wan komandoyên diyarkirî yên ku mirov dide wan wekî mirîdan bi kar binin; ji lewra xeletiyêke biçûk wekî nîşandeka bihnokê (°) dibe binasê wê yekê ku hemî hûnerê kompûterê bibe sifir. Çima em nikarin bi swêdiya xwezayî bi kompûteran re komûnikasyonê çêbikin?

Şona ku ez serast bersiva van pirsan bidim ezê pey dewsa wêqesê bikevim ka çi-

ma em wisa bawer dikin ku kompûter dikarin wergêriyê bikin û bi zimanekî xwezayî dikarin komûnîkasyonê çêbikin. Ango pirsê min ya ewil dibê: kê gotiye ku dê ev tişt hêsanî be?

Di cîhana akademîsyenan de – ew qismên ku xwe bi wergêriya otomatîzekirî ve mijûl dikin – nêrîneke sereke li ser zimanî heye ku dibêje ziman berî hemî tiştî jî hinek qaideyên rêzimanê pêk têt. Li gor wan bi ferhengê û bi arîkariya van qaideyan mirov dikare hemî hevokên zimanekî serast çêbike.

Nêrînek wiha li ser zimanî efsane ye. Li gor dîroka ranyarî mirov dikare van efsaneyan bi hinek daxwazên jî zimanî, yên felsefî, ve girê bide. Leibniz xewna »characteristica universalis«, ku dê zimanekî wek hesabê matematîkê sedêsed rast bûya, dît. Bi vî zimanî dê mirovî bikaribûya hemî ramanên zanyarî û felsefî deqedeq îfade bike. Bi hebûna aleteke wiha, li gor Leibniz, bêmane bû ku du »feylesof devjeniyê li ser nakokiyê nav xwe de bikin. Ji ber pêwistiya wan tenê bi derêxistina qelemên xwe û rûniştina li ser texteyê hesabî ye. Ew dikarin jêk re bibêjin: 'Ka em bihesibînin!' «

Pozîtîvîstan di destpêka vê sedsalê de formûlên mentiqî wekî bingeh jî daxwaza zimanekî wiha re didîtin. Ev daxwaz îro jî di nav datalogan de dijî; pirtirîn bi zimanên programan yên wekî sîstemeke jî qaideyên rêzimanê hatine ava kirin. Ew sîstema welê ku bi îfadeyên diyarkirî dide nîşan dan ka sembola çawe di programan de dixebitin.

Bi birha mezin ya teoriyên Noam Chomsky yên li ser rêzimana generatîv, di nav zimanzanan de nêrîna ku ziman jî qaide û rêbazên rêzimanê pêk tên pir xurt bûye. Di lînguîstîka modern de mirov vavêriyê diêxe navbera sê beşên zimanî: *hevoksazî*, ku behsa avahiyê rêzimana zimanî dike; *semantîk*, ku behsa maneya bêje û hevokan dike; û *pragmatîk*, ku lê dikule ka çawe ziman bo mebestên cida têt bi kar anîn.

Chomsky bi pirtûka *Syntactic Structures* (1957) hevoksazî êxistiye nêrîngehê, »fokosê«, de. Ew dibêje hevoksazî dikare wekî qaideyên sîstemê yên formel – li got wê îdeala zimanî ya ku min li jorê bi dirûv kir – bête te'rîf kirin, herwiha

ew dibêje ku rêziman dikare bête formûle kirin bêyî girêdana bi teoriyên se mantîk û pragmatîk ve. Serdestbûna Chomsky bûye binasê wêqesê ku teoriyên wiha ji nêrîngê wînda bûne.


Ez bawer dikim »sêparî«, ango hevoksazî-semantîk-pragmatîk, ji bo lêkolînê zimanî stratejiyê xelet e, û hêj xirabtir e heger mirov bihesibîne ku li ser va hersê babetan lêkolînê serbixwe dikarin bîn kirin. Ziman ne tenê sistemek ya qaideyan e. Ev, gava mirov metodên hevoksaziyê di wergêriya kompûterîze kirî de diceribîne xwe diyar dike. Heger ew zimanên ku mirov wergerandinê jê û bo dikin ji malbateke nêzîk bin, mirov dikare bi arîkariya ferhengê û qaideyên rêzimanê hinqewîçkê pêş ve biçe. Lê gava ku mirov wergerandinê di navbera zimanên ji familyeyên cida de bike; bo nimûne, swêdî û japonî, hingê diya e ku bikaranîna metoda rêzimanê bazareke hima bêje nemimkûn e.

Bi rastî jî hêsanî ye ku mirov bide izbat kirin ku rêziman bi ferhengê re têr wergerandinê nake. Bifikire ku emê vî metnê jêrî wergerînin bo zimanekî ku navê gemiyan di wî zimanî de ne mê ne:

»Ewa di karê kirîfirota di gemiya rêwingiyan Queen Elizabethê de dixebit Anna bû. Wê rojê du hezar lître benzîna dîzel vedixwar.«

Xwendevaneke mirov di têgihiştina ku »wê«-ya di hevoka didoyê de ji bo gemiyê ye tu zehmetiyê nakişîne. Tu rêziman nikarin biryara vê bidin, lê divê mirov tekstê *fêm* bike, ango semantîka zimanî binaseke mezin e ji bo ku »wê rast bête wergerandin. Pêwistî bi *zanîna* ka mirov û gemî çawe dixebitin heye da mirov *fêm* bike ne Anna ye ya ku benzîna dîzel vedixwe.

Problemeke di ji bo wergêriya bi hevoksaziyê ve girêdayî ew *metaforên* di zimanên cida de ne. Heger ziman bi kûltûrî nêzîkî êk bin belkî mirov teşbîhên êl *fêm* bike; wek nimûneya ku gemiya rêwingiyan benzîna dîzel »vedixwe«. Lê belê her li hir jî problem derdikevin. Wergerandineke deqedeq ji hevoka »it's raining cats and dogs« dê bibe tişteke xerîb. Ev dê hêj xirabtir bibe di wergerên j zimanên ji kûltûrên cida de. Heger mirov hevoka »Tu di serê min de yî« bigirin dest xwe, ku wergereke deqedeq e ji idyomeke bi japonî, hingê ne hêsanî ye mirov *fêm* bike ku mebesta kesê diaxive »Ez ji te aciz bûme« ye.



Beşek dî ji wan efsaneyên heyîn ew bawerî ye ku hevoksaziya zimanekî serbixwe ye ji semantîka wî. Di eslê xwe de heta dereceyekê semantîk biryarê li ser rêzimanê dide. Ev nimûneyek e. Di zimanên rojavayê de sê demên bingehîn hene; ango demê bê, demê niho û demê borî. Sebebê vê ew e ku em zemanî weke xetê rast fêhm dikin. Demê niho niqteyek e li ser vê xetê, paşeroj ewa li paş niqteyê ye û demê borî ewa li pêşiya niqteyê ye. Demên rêzimana me bersiva vê dabêşkirina polên zemanî ne.

Li ba hinek kûltûran, û piranî li ba kûltûrên welatên dorûberê Deryaya Bêdeng, mirovan qenaeteke dî di heqê zemanî de heye, ew jî dikare wekî xelegekê bête salûx dan. Gera dinyayê pîrbare dibe û ew tiştê carekê bûyî dê careke dî bibe. Bi nêrîneke wiha li ser zemanî bê mane dibe ku mirov demê bê û yê borî jêk veqetîne. Herwisa cardî diyar dibe ku di gelekî wan zimanan de tenê du demên bingehîn hene: demê niho û yê ne-niho. (Hinek birhên dî jî yên wê qenaeta zemanî ya wekî xelegekê hene. Bo nimûne di zimanekî de mirov eynî bêjeyê ji bo »nevîçîçirik« û »bapîrkalikî« bi kar tîne.)

Ji ber ku ez xwe naspêrim wê îdeala zimanî ya tradisyonel, bawer nakim ku ji bo wergerandina otomatîzekirî wan metodên ta niho mirovan bi kar anîn im-

kan hebe ku bi ser bikevin. Bi vê gotinê ez naxwazim bibêjim ku makîne *nika rin* wergêriyê bikin, tenê dibêjim ew metodolojiya ku mirovan bi kar anîn, li ser nêrîneke kevnare ya di heqê zimanî de ava bûye.

Axe hingê kîj metodan divêt mirov bi kar bîne ji bo bikare li makîneyan wergêriyeke bereqil bide kirin? Beriya ku em kompûterên xwe vekin divêt em nêrîneke hêj berfirehtir, ji ya heta niho heyî, di heqê zimanî de peyda bikin. Mir tu xarîqe ji bo teoriyeke nû ya zimanî nîn e, lê belê ezê xwe bi destnîşankirina hinek bergehên giştî yên zimanî qane bikim.

Beriya her tiştî dixwazim idia bikim ku tercûmekirina zimanî ji lidûvçûyina qaideyan pirtir, girêdayî jinûvenaskirina dirûvî ye. Bifikire ka em çawe xwe fêrî zimanekî dikin. Bêguman mirov xwe fêrî hinek rêbazên rêzimanê dike, nemaze heger ziman ne zimanê mirovî yê zikmakî be, lê belê ez bawer nakim ku em li dûv rêbazan diçin gava em zimanî bi aktîvî bi kar tînin. Mirov ji qaideyên xeyalî zêdetir bi arîkariya *nimûneyan* fêrî zimanî dibe. Nimûne dirûvên zimanî, yên ku mirov ji nû ve nas dikin, nîşa mirovî dide da mirov zayî ve bike. Û demê mirov ew dirûvê avahiyê zimanekî nas kir hêdî pêwistî bi qanûnên rêzimanê nîn e.

Honê bêjin ma ne pêwist e ku zimanek bide pey hinek rêbazan? Ma mirov nikare hertim dirûvan wekî qaide bihesibîne? No, ev qismek ji wê nêrîna adetî ya li ser zimanî ye. Hinek dirûv hene ku tu qaide jê re nayên dîtîn. Bo nimûne feke rûyê mirovekî. Piştî bîst salan jî em dikarin ji nû ve rûyê mirovekî nas bikin. Ew hûrahiyên xweser yên di rûyî de mimkûne seranser hatibin guhartin, lê dirûvek heye ku em cardî nas dikin. Kî dikare qaideyekê ji bo rûyekê formûle bike?

Ez bawer nakim ku qaideyên rêzimanê bikaribin dirûvên ku di zimanekî de hene biguncînin. Problema vê qenaetê ew e ku tu teorî – wekî teoriyên ku îro ji rêzimanê re hene – ji dirûvên zimanî re nîn in. Ew pêşniyarên ku psîkologan di destpêka vê sedsalê de formûle kirin û salûx dayîn, ku îro ji nû ve têne keşif kirin, tenê destpêkek in, lê ji bo bikaranînên di zimanî de ne hewqes pêşketî ne û

ji bo barkirina li kompûteran pir paşdemayî û nepijayî ne.

Wezîfeyeke dî ya mezin ji bo teoriyên berfireh li ser zimanî, salûxdana wan *armancên* tekst li xwe bar dike ye. Armanc û daxwazên wan kesên di romanekê de derbas dibin hene û mebestek ya nivîskarî ji tekstê heye. Ew armanc dikarin vekirî yan veşartî bin. Qisimeke mezin ji mebesta tekstekê, bi gotina feylesofan, mebestên li pişt tekstê ne. Evên he bi tu awayî nakevin ber qardeyên rêzimanê. Ango rêya mecbûrî ji kompûtereke wergêrkar re ew e ku ew bizane ka ew mebestên vekirî û veşartî yên di tekstê de heyîn çî ne. Di nav felsefe, psîkolojî û zimanziyê de lêkolîneke pir berfireh li ser başsalûxdana mebestan tête kirin. Lê belê hêj demeke pir dirêj maye ji wêqesê re ku mirov modelên bikêr ji kompûteran re bibîne.

Û di dawiyê de divêt bête gotin ku ferqeke mezin di navbera mirovekî û kompûterekê de ew e ku kompûterekê dilxwaziya, motîvasyonê, nivîsandinê an wergerandinê nîn e. Wê armanc û daxwaz nîn in, ew tu xelatan jî nastîne û ji wê re qet ne girîng e ka te fişa wê ji kehrebê kêşa ye an no. Lê belê ev ne dezewantajek e ji bo kompûterê, herwekî Martinson di heqê mîmayê de dibêje:

Ango mîma tu tiştî hes nake
mêrxasî di nava cergên mîmayê de najî,
ew wekî hercar resiman, ziman
û bêhnên ji welatên nekeşifkirî diafirîne,
û ew vî karî bêyî pesindarî dike,
bêbertîl ew tête girtin
û ji dûmanê jî dilê wê namîne.

Wergera ji swêdî: Arif Zêrevan

•Harry Martinson »mîma«-yê bi maneya »kompûter« bi kar tîne.
Peter Gärdenfors profesorê lêkolînên kognîsyonê, ilmê têgehîstîne, ye.

Mirovên şikeftan

Yaşar Kemal

Rojekê ez diçim gundekî Wanê yê bi navê Sor. Gundê Sor di pişt kendalên çiyayê Esrûkê de ye. Biniya çiya rast e. Em ji bo vê rastiye, beriyek biçûk jî bibêjin dibe. Kevirên beriyê bi qasî bejna mirovan in. Yanê bi hezaran kevirên ku rabûne pêdarê... Daristana keviran.

Ez çûm, çûm ne gund heye ne jî tiştek. Piştî ku ez gellekî geriyam, komên zibilê ber bi çavê min ketin. Li vî kendalê xirîxaltî, koma zibilê elametek girîng e. Çawa ku hêşînahî ji bo avê nîşan be, wusa jî koma zibil ji bo gund nîşan e. Bi çûyîna ez gihîştim ba zibil, ku di pişt her komên zibil de, wek deriyên bîran, deriyên xaniyên gund hene. Ji bîran, mirovên por û gijikên wan tevlihev, wek wan mirovên ku wêneyên wan di kitêbên dîrokî de tên dîtîn mirov derdiketin. Li hember vê rewşê ez ji şaşbûnê sar bûbûm. Di vî qirnê bîstan de dema kevîr... Min di dilê xwe de, "Pirr hebe ev gundê Sor li Rohilet hebe du heb in. Yê bi vî awayî jî li hemû deran tên dîtîn" gotibû. Lê pişt re min ji Erzerûmê heta Agiriyê, ji Betlîsê heta Sêrtê, heta Mûşê li tevê Rojhilat dîtîn. Yê li wan deran jî bi pirranî wekî gundê Sor bûn. Min ji van gundan li ser çend heban bi awayê ku min dîtibû, min nivîsî. Hed û hesabê yê ku digotin, "Ma tiştên weha jî hene?" tunebû. Bawer nedikirin. Niha ez vê nivîsa xwe diyarîyî wan dikim.

Di gera xwe ya dawî ya ji rojhilat re, piştî perizîna (ayîna) li çiyayê Andokê, ancax sê roj bi şûn de ez dikaribûm bişeqitim beriyê. Û ez sê şavan li gundan mam.



Şeltê doşekan, di cihê pembû de bi giya û pelan dagirtibûn. Şeltan ruyê sabûnê ne dîtibûn. Van gundiyan hemûyan an nanê ceh û an jî nanê garis dixwarin. Yên ku nanê ceh dixwarin hal û wextê wan ji yê din çêtir bûn. Tevahiya feqîran bi gari bûbûn tîrîmok. Di nav wan de yê ku qet nanê genim nexwaribûn gellek bûn Gava ku em dibêjin gund, hûn nefîkirin ku ev komek malan a li ser hev e! Li ser her qotî malek.. Hudûdê gundekî bi kîlometreyan digire. Zivistanê haya ru kesî j kesî çênabe. Lingê hemû jinên gund tazî ne. Çima ne mêr lê tenê jin pêxwas in Min ev yek fêm nekir.

Ez û rêberê xwe Mihemed em li gundê Goma ne. Gundê Goma diyarek ji zibi e. Bi hemû belengaziya xwe, bi qirêj û zenga xwe ve bi binê çiya ve zeliqî ye. He gundiyekek bi qasî hundirê çengekê xwedî zevî ye. Min bi yarî bi gundiyeke Goma ti nazên xwe kir û ji wan re got:

“Yahû ev çi halê we ye? Qet nebe xwe bişon. Hinek pergale bidin xwe. Hemî gundî bigîhjin hev û vê riya xwe çêkin. Gundekî bi qasî gundê we sefil li rojhîla nikare bê dîtin.”

Wan li min vegerand:

“Yê me hê baş e. Ha tu vî çiyayê bi kendal ê li hember dibînî? Di binê wî çiyay de not şikeft hene. Şikeftên gellek mezin. Ha di wan şikeftan de gundek dijî. Ya aa...yê me nûr û nîmet e.”

Ji ahî başûr ve rast, çiyayek ku ji zinarên asê pêk hatiye xuya dike. Bi reng axê(erdî) ye. Ji zinaran hilmek rojê ya mor difûre.

Xwedê dizane, lê min bawer nekir.

“Yahû mebejin, hûn tinazên xwe bi min dikin, ma di vê dewrê de êdî di şikeftan de mirov dijîn? Êdî tiştên bi vî awayî di kitêbên dîrokê de man. Bi min neleyizir. Ka we bi xwe ev şikeft dîtine?” min got.

Berî hemûyan rêberê min Mihemed xwe avêt navê:

“Jina min ji şikeftan e. Hê jî xwezûrê min li şikeftê rûdinê,” got.

Gundiyan jî sond xwarin û diyar kirin ku ew bi xwe jî her roj diçin gundê şikeftan û li wir bi mêvandarî dimînin.

Ez bawer nekim ezê çi bikim. Lê ez westiyabûm. Ez nikaribûm li ser lingan ra westim. Lingên min perçe bi perçe bûbûn. Vî çiyayê Andokê tiştê ku ewê bi mi bikira, kiribû. Lê dîsa jî ne mirin e ya, ez dê biçûma û minê bidîta.

Ev meraq e ya. Misêwa min pirs li ser pirsan dikir:

“Van şikeftan di wextê de, ode bi ode bi destan çêkirine ne wusa?”

“Na. Ne bi destan. Şikeftên qirase Xwedê çêkirine. Şikeft wusa qirase ne ku heta binê çiya dirêj dibin. Şeqarên qirase... gundî hespên xwe, kerên xwe, eşyayên xwe, giyayên xwe, êzingên xwe, kaya xwe, bizinên xwe dadigirinê, hê jî aliyên wan vala dimînin. Hemû tiştên mirovên vî gundî di şikeftan de ne. Ava wan jî.”

Rêberê min Mihemed:

“Beg,” got. “Sibê em neçin Pasûrê(Qulpê). Emê li şikeftan bimînin. Madem tu evqas meraq dikî, tê bibînî.”

“Em herin,” min got.

Dîsa xewa min nehat. Nivîn ne tu nivîn e. Tu dibêjî qey kêr xistine kêleka min. Hemû derên min diêşên. Parsiyên min dikalin.

Saet di sisê û nîvan de ez rabûm. Li vir ji xwe roj di saet çaran de derdikeve. Hundirê devê min wekî jehr e. Çend roj e ez nikarim xwarinê jî bixwim. Ji nanê garis hundirê devê min bûye birîn.

Mihemed hesp derxist. Halê ku ezê bikaribim lê suwar bim bi min re nemaye. Bi zor û bela ez lê suwar bûm. Lê ez dizanim, ewê demekê bi şûn de zinarên tûj derkevin pêşiya me, ezê jî mecbûr bimînin ku di zinaran de peya bim û bi lingan herim. Ji bo ku giliyê tenhayî û hovîtiya riyekê bikin, çivîk lê nafire, karwan tê re derbas nabe dibêjin. Eynî bi wî awayî, ji min re wusa tê ku tu kes di van şiveriyan re derbas nebûye.

Li jorê teaveke ku belaya Xwedê ye û germiya helanan... Bêguman ez dîsa peya me. Hêdî hêdî em dikevin hundirê hudûdên şikeftan.

Mihemed, “Begê min” dibêje, “Binihêre li serê van helanan, li wir jî ziyaret heye. Di panzdehê gulanê de jî derdikevin wê derê.”

Camêr piştî ku gotina xwe diqedîne, di bin simbêlan re dibişire. Ma nebişire çi bike? Di rê de, li serê çiyayan ewqas turbe nîşanî min daye ku..

“Mihemed,” ez dibêjim, “Tev li aliyekî, emê çawa derkevin vê jorê. Aqilê min nagihîje vê yekê.”

“Begê min,” dibêje, “Riyeke wê ya teng heye, di wir re derdikevin. Dirûvê wan bi we naxe, ew mirovên kevir in.”

Divê mirov mîmekê deyne ber vê gotina mirovên kevir û derbas bibe.

Di dawiyê de şikeft xuya bûn. Ji birçîna zikê min bi hev ve zeliqî ye.

“Em li vir peya bin,” got.

“Çima,” min got.

“Beg, “ got, “Niha li şikeftan gellek kê mîrov hene. Tev derketine holikan(havîngehê). Holika li vê havîngehê merivên(eqrebayên) min in. Ji xwe tu ji birçînar mirî.”

Sê çar darên sipîndaran di bayê hênîk de dihejin. Holik li binê wan in. Li kêlekê rastê ya holikan erdek rast a hêşîn heye, ku biçûk û zirav e. Mihemed got li wê derê kaniyek heye.

Gava ku em ketin nav holikan, kûçikên mezin û qirase hatin pêşiya me. Pişt re extiyrek ku ruhê wî heta ser singê wî dirêj bûye, ji malîkek biçûk derket. Di pey wî re zarok derketin, dîsa bi hundir ve reviyar. Ev zarok tazî îppela bûn.

Meleyê ku nizane rojname çî ye

Ser û çavê extiyar ji xwêdanê şilopilo bûbû. Ruyê wî çîl sipî bû. Mûyên singê wî yên dirêj, ji singê wî yê vekirî firiyabûn derve. Da pêşiya me û em birin holika ku bi guliyên daran hatiye çêkirin. Li holikê jineke ciwan û zarok hebûn. zarokan bi tirseke xerîb li me dinihartin.

Ez bi ser Mihemed ve xwar bûm:

“Li min binihêre Mihemed, divê tu nebêjt ku ew bi kurdî dizane. Goya tê tercûmaniyê bikî. Te fê m kir, ne wilo! Li ser min çî dibêjin bila bibêjin, tê devê xwe venekî. An na ewê nava min û te xera bibe,” min got.

Mihemed:

“Tu çawa dixwazî bila wusa be,” got. “Karê yên wekî me wezîfa yên wekî we hêsan kirin e. Ez bi xwe, çî dibêjin bila bibêjin, dixwazî bila çêrî te bikin, ez qet devê xwe venakim. Ez dizanim tu ji bo çî vê dixwazî. Min fê m kir ya! Bi vî awayî çêtir e.”

Extiyar, şalwarekî bi qasî xirar zexm, bi destan çêkirî, kevn û dirîyayî li xwe kiribû. Şekala(pêlava) wî jî ji lastîkên hundirîn ê tekelên otomobîlan hatibû çêkirin. Ji laskê hundirîn hin perçeyan jêkiribû û bi benan bi lingê xwe ve girê dabû. Binê çota şekala wî ya ji lastîkan jî qul bûbû. Binê wê bi qulên qirase tije bûn. Neynokên wî xuya dikirin, dirêj bûbûn û qelişbûn. Destên wî, beravajiyê vê yekê biçûk

bûn û dirûvê destê wan mirovên ku nexebitûbûn pê dixist. Neynokên destên wî jî dirêj bûbûn. Binê neynokên wî reş dikirin. Çavên extiyar wek yê teyran di nav serê wî de dileyiztin. Li ser çavê wî, wek şewata tavê sorbûnek hebû. Di gel vê yekê nermayî û dostaniyek pê re xuya dibû. Hê bêyî ku bipirse ez çi me, li çi digirim, ji kuderê têm û bi ku ve diçim, bi dostanî li min dinihart. Te digot qey em dostê çil salan in.

Piştî ku çend caran li ser hev bi telaş û bi lez ket hundir û derket, hat li ba min rûnişt.

Bi kurdî:

“Tu bi xêr hatî, bi ser çavan re hatî. Mêvanê min ê delal cihê te li ser serê min heye. Li qusûra min nenihêre. Ezê nikaribin malxwehiyeke baş bikim. Çimkî em li holikan in. Heke em li şikeftê bûna, minê ji bo te berx jî serjê bikira,” got.

Hundirê çavên wî ji kêfan dikeniya. Hem dipeyivî û hem jî bi dostî û biratî mi-sêwa dibişirf.

Mihmed, peyvên extiyar bi awayê got ji bo min tercûme kirin.

Extiyar fêm kir ku ez bi kurdî nizanîm. Dest pê kir, pirs li pey pirsan ji Mihemed kirin:

“Kî ye ev zîlam?”

Mihemed:

“Rojnamevan e ev.”

Extiyar:

“Yanê ev çi karî dîke? Ewê xêrek wî bigîhîje me?”

Mihemed:

“Di rojnamê de dinivîse. Derdê tevê alemê dinivîse. Ji bo ku bi me qencyê bike, lê xistiye û heta van deran hatiye.”

Extiyar:

“Yanê ji hukûmatê re îstida(daxwazname) dinivîse?”

Mihemed hêrs bû:

“Bê hey gidî Mele Zûbeyr, îcar bi ser de tê bibî mele, ma te qet rojname nedîtine? Ne bihîstine? Bi ser de jî tê bibî mele! Ma te çawa xwend lo?”

Mele Zibeyr:

“Bi me rojname nedan xwendin. Bi me Quran dan xwendin. Ez ji wê pê ve ni-

zanim. Tu ji min re bibêje, ka ev mirov evê çî qenciyê bike. Ez çî bi rojnamê dizanim!”

Mihemed:

“Ji bo ku erd bidin yên ku bê erd in, ji bo ku hûn ji wan şikeftên pîs xelas bibin rewşa birçiyar, halê feqîran dinivîse...”

Kêfa Mele Zibeyr reviya. Bêhêviyek di çavên wî de peyder bû. Bi kul û derd ser xwe hejand:

“Evana,” got, “Hemû kesî nivîsand. Me ji hukûmatê re îstîda nivîsand. Qeymeqam jî nivîsî. Yê ku derziyan lê dixist jî nivîsî. Yê ku derzî lêdixistin nediket şikestan. Tu dizanî ya, ew “derzîkarê” ku li ber derê şikeftê rûnişt û bi deng giriya. Wê jî ji hukûmatê re nivîsî, lê tu tiştek derneket. Min jî got qey ev zilam tiştek e.”

Mihemed ji şerman sor bû, bi hêrs:

“Ev zilamê şêx Kemaledîn e. Ma karek pê nebûya, şêx Kemaledîn evqas jê rî hurmet nîşan dida?”

Mele Zubeyr:

“Tiştê ku evê binivîse, ma ewê ne wek îstidaya ku “derzîkar” nivîsî be? Wê gav hukûmatê çî kir? Qet?”

Mihemed:

“Ev rojnamevan e,” got. “Hukûmatê wezîfe daye wî ku ew yên bê erd, yên ku di şikeftan de dijîn tesbît bike. Ewê tesbît bike û haya hukûmetê pêxe. A ha rojnamevan ev e. Ewê hukûmet jî we ji şikeftan derxe.”

Mele Zibeyr di ber xwe da:

“Ev mirov bi kêrî tiştekî nayê. Ka tu bala xwe bide kincên wî? Çî cihêtiya wî ji min heye? Ma zilamê hukûmatê bi vî awayî çêdibe?”

Mihemed:

“Bila ev mirov bi kêrî tiştekî neyê. Ewê şikeftên we nede piştî xwe û nebe ya Xerabiya wî bi we çênabe. Belkî jî qenciya wî bigîhîje we.”

Hêrsbûna Mihemed di çavê wî de xuya dikir. Çavên wî sor bûbûn. Sedem jî, di kir nedik nikaribû min bi Mele Zibeyr bide fêmkirin.

Mele Zibeyr jî sil bû:

“Min her cûre mirovên hukûmatê bihîstine, lê min bi navê rojnamevan karmen dekî hukûmatê nebihîstîye. Çî ye ev? Ka ev çî bûye? Ma şêx Kemaledîn negot?”

Mihemed:

“Ez nizanim, şêx got ev rojnamê dinivîsî, ji bo millet baş e, got. Ta ji Stenbolê lê xistiye, zehmet kiriye û hatiye, got. Tu tiştê rast bixwazî min bi xwe jî rojname nedîtiye, lê min bihîstiye. Ma şêx derewan dike?”

Mele Zibeyr:

“Binihêre Mihemedo, tu têkilî karê ku nizanî nebe, tu jî nizanî rojnamevan çî ye. Jê bipirse, bila bibêje. Bila gilî bike, ka em fêm bikin ev çî kar e?”

Hingê min dest pê kir ku ez bibêjim ka rojname çî ye. Lê tê çawa rojnamevan bi vî mirovî bidî fêmkirin? Ez dibêjim, Mihemed verdigerîne. Qey ez nikarim pê bidim fêmkirin. Pirrî min got, tuka zimanê min zûwa bû. Lê mele fêm nake.

Misêwa ji Mihemed dipirse:

“Baş e ewê feyda me bi çî awayî ji vî zilamî çê bibe?”

Ez dîsa dest pê dikim, giliyê feyda wî ya ji vî karî dibêjim. Tiştêk bi serê Mele Zibeyr ve nazeliqe. Bişirîna wî ya berê hat ser çavê wî û dev ji fêmkirina rojnamevan berda:

“Êdî ji me derbas bû. Dinya ye ev, çî tune li dinyayê? Ewê hê çî derkeve. Înşallah ewê bi xêra me be, “ got.

Di vê navê de, zilamek ku emrê wî di dora sîh û pêncan de nîşan dida, singê wî vekirî, şalwarê wî perçe bi perçe bûyî û ruhê wek sitiriyên dirêj bûyî, bi destê deh zarokên tazî îppela girtî hat û li pêşiya min rawesta. Ripîrast sekinî:

“Ez,” got, “Memûr efendî, ez bavê deh zarokên tazî, yê ku di emrê xwe de fanoriyê hundir li xwe nekiriye, xwediyê du şikeftên tarî, ji çengek ax(erd) bêpar, xulamê axê, deyndarê çarsed lîreyan, Ebdilhelîmê nexweş...”

Wek pûtan, ripîrast li pêş min rawesta û ma. Zarok jî wusa bêdeng, rêzbûyî û di rewşeke amade de disekinîn. Mêşan li ser çavê van zarokên qels û dev û ruyê wan ji qirêjê nuxamtî datanîn, zarokan jî ji ber vê yekê piçekî rewşa xwe xeradikirin.

Ez rabûm min bi milê Ebdilhelîm girt û li rû xwe da runiştandin.

Ji Ebdilhelîm re:

“Tu ji ku hînî tirkî bû yî? Tu çiqas xweş dipeyivî,” got.

“Min,” got, “ Min li Dortyolê leşkerî kir, li wir ez Tirkî hîn bûm. Xwendin û nivîsîn jî hînî min kirin lê min ji bîr kir. Heke ez nemirim, ezê van taziyan hemûyî bişînim dibistanê.

Pişt re bêtir nêzikî min bû:

“Ev nizanin ku rojname çî ye. Ez dizanim. Hûn rohnîya çavê hukûmatê n. Hûn dikarin her tiştî bidin kirin. Heke hûn bixwazin hûn dikarin me ji van şike tan derxin. Ezê hemû ciyan nîşanî te bidim. Ezê te li hemû şikeftan bigerînim. I tenê ji sermayê, ji satilcanê çend kes dimire, ezê navnîşana wan bidim we. Ka bi bibe sibe.”

Di vê navê de meleyê rûken savar daye çêkirin. Savar amîn ser sifrê. Savar kirin derdanek qirase ya ji dar çêkirî. Ev pak e. Lê nan! Nan dîsa garis e... Êdî ez ji nan garis tirsîya me. Gava ku ez dibînim ez vediciniqim. Bêçare, divê mirov bê nan l kevçiyar here savar. Min wusa jî kir.

Ebdulhelîm:

“De ka bila bibe sibe, ezê te bibim qesrên me şikeftan. Tê bibînî li ser rûyê erd çî kar, çî tiştên ku mirov bawer nake hebûne... De ka bila..”

Min got:

“Ebdulhelîm, îşev ezê bibim mêvanê te.”

Kenîya:

“Beg,” got, “Tiştê ku tu dixwazî bila savar be. Tu bi kevçiyar herê. Îcar piştî k bê nan be jî. Lê bi tenê nivîn tune. Ezê ji bo te ji giyayan doşekê çêkim. Tiştêkî m yê ku em biavêjin ser jî tune, lê emê çareyekê bibînin. Emê ji Hîsamedîn axa çar şefekê bistînin. Li qusûrê nenihêre.

Êdî ez dikevim nav mirovên şikeftan. Ez îşev mêvanê Ebdulhelîm im. Ev mê vandarî rojek be jî têr dike. Ebdilhemîd pê nizane ku ez bi kurdî dizanim, lê hem sir û tevahiya jiyana wan êdî ji bo min neynik e.

Peyva dîxtor qet nebîhistîne

Bi êvarê re tenêhiyek wusa bi ser min re hat ku..Ji aliyekî ve tirsî morbûna şikeftê ku kendalên wan serê xwe ber bi asîman kirine... Beriyek bi kevir a ku di bin ling me de ber bi çiya û rojhilat ve dirêj dibe... Ji vir re berî jî nayê gotin ya, ku em bi bêjin zeviyek keviran, belkî çêtir be... Ba wekî ku ji devê firinekê dertê germ e...

Di vê navê de malîyên şikeftên din jî hatin cihê ku em lê rûniştine. Qels, zipîzu wa, mirovên kincqetiyayî û li ser sêrê wan kumên ji kemnikan çêkirî yên dirîya yî..Kemnik di nav qirêjê de ne... Jînan fîstanên dirêj li xwe kirine. Fîstan wusa di

rêj in ku erdê paqij dikin. Li serê wan şalikên reng bi reng. Ev jinên şikeftan wek yên bajêr xwe nekirine tewrên eceb. Ne ji mêran direvin û ne jî tiştekan. Ser çavên xwe jî nagirin. Wek wan jinên ku em dizanin serbest in... Mêr rûniştine û dipeyivin...

Li dora serê min bi qasî bîst kesan gundî hebûn. Her bîst jî dibêjin û dibêjin. Ji bêerdîyê, ji sefaletê, ji dûmana şikeftan gazinan dikin û derdê xwe dibêjin.

Ebdulhelîm navekê:

“Ezbenî,” got, “Êvar hat. Kerem ke mala me. Ka were bibîne mala me di çî rewşê de ye. Sibê jî ezê te bibim şikefta me. Îcar tu were binihêre ku şikefta me di çî halî de ye.”

Holika Ebdulhelîm ji cihê ku em lê rûdiniştin piçekî wêdetir bû. Gava ku em ber bi holkê diçûn Ebdulhelîm bi kurdî li jina xwe diqêriya, niştecihên şikeftên din jî bi wî dikeniyên.

Ebdulhelîm:

“Jinê, jinê ez ji te re mêvanekî tînim. Divê tu baş lê binihêrî. Tê savarê bê rûn têxî sihana kevir. Ewê pirr li xweşa wî here. Bila îşev li ser mîndera ji giya razê û roja xwe bibîne. Em kêçan jî têxin paşila wî. Ewê wusa li xweşa wî here ku... Mêvanê me yê delal têê ji Stenbolê hatiye...Bila bibîne ku şikeftî çawa wî dikin mêvan... Ezê sibê li şikeftê ziyafetekê bidimê. Mihemed got, mêvanê me ji kulaman hes dike. Ewê kermêş îşev jê re wusa kulaman bibêjin ku ewê li hatina xwe ya dinê poşman bibe. Îcar ewê ji heft bavên xwe ve tobe bike û careke din ling neavêje şikeftan.” digot.

Bi ken û yariyan em gihîştin malê.

Jinikê:

“Helîm, Helîm,” got, “Lê van tiştên ku tu dibêjî fêr bike, ewê dilê mêvan nemîne.”

Helîm:

“Ma ewê kurdî ji kuderê bizanibe. Bi peyvekê jî nizane. Mêrik ji Edenê ye.”

Li ser vê yekê jinik hêrs bû.

“Helîm, ma aqil bi te re heye? Tu radikî vî mirovî tînî. Li mal nan jî tune. Tê wî li kuderê bidî razan? Hem tu ji kuderê dizanî ku ev mirov çî ye?”

Helîm:

“Qet hêrs nebe, ew mêvanê min e. Mirovekî baş e. Rojnamevan e ew. Wî xwest bibe mêvanê min. Wî halê zarokan jî dît. Min jê re got li malê nan, xwarin û nivîn tune. Îlla got ezê li mala Ebdulhelîm razêm. Bila were û bibîne.

Jinikê:

“Ev çi ye, an gelo ku tehsîldar bûye?”

Ebdulhelîm bi qureyî:

“Na, rojnamevan e ew. Fermanê ji hukûmatê re dibêje. Ewê derdê me, halê me bibîne, pişt re here ji bavê me hukûmatê re ferman bide. Ewê bibêje ku, Ebdulhelîmek heye li gundê şikeftê, halê wî pîr xirab e. Deh zarokên wî hebûn tazî îppela. Nanê wî yê garis tunebû ku bixwe. Ew jî bo me dixebite, ezê çawa wî bi mêvandari neynim mala xwe... li ser serê min cihê wî heye,” got.

Em hê li ser lingan bûn. Jinikê tejeke dirîyayî anî avêt erdê û balîfek qirêjî danî ser. Em bi Helîm re rûniştin.

Helîm bi şermî:

“Li qusûrê nenihêre begê min, tune. Bila çavê tunehî derkeve. Ha halê min jî ev e. Tu halê min dibînî. Ji hukûmatê re fermana xwe binivîse... Wusa bi dilşewitî binivîse ku me ji şikeftan derînin. Berê not mal di van şikeftan de rûdiniştin. Niha bîst û pênc mal man. Tev mirin. Hinekan jî barkirin gundên din. Sefilên wekî me di şikeftan de man. Li vir gellek zeviyên xezîne hene. Zeviyên xezîne tev di destê axayan de ne, heke wan bidana me, emê ji van şikeftên nelet xelas bibûna. Xwedê neyarê xwe neke van şikeftan. Di dawiyê de nexweşînekê tînin serê mirov. Yên ku pîr dibin gellek hindik in ya, lê îlla nexweşînek dibe bela serê wan. Ev nexweşînan ku di şikeftan de peyder dibin, li tu gundekî nayên dîtin. Nexweşîna vira pîr cihê ye. Di sê rojan de mirov hişk dike.”

“Helîm, qet dixtor nehat van şikeftan? Qet hûn dizanin dixtor çi ye?”

Helîm

“Begê min,” got, “Beriya ku ez herim leşkeriyê, ne dixtor, ne derman û ne jî tiştek weha min bihîstibû. Li vî gundî, ji bilî min tu kesî dixtor nedîtiye, nebîhîstiye. Ji xwe berê li qesebê jî tunebû. Li ba me şex li hemû nexweşînan dinihêre. Par bavê Ebdoyê me nexweş ket. Xwedê dizane lê nexweşîna wî satilcan bû. Min got em viya bibin dixtor, lê kesî guhê xwe neda min. Bi xerabî li çavê min nihartin. Pişt re, di nav sê rojan de bavê Ebdo mir û çû. Mirovekî baş bû Bavê Ebdo. Wellahî tu

dixwazî yek bi yek ji vî gundê şikeftan bipirse, ka dixtor çi ye. Lê tu kes nizane. Ewê şaş bibin û bimînin.

Îcar jinik ket navbera peyivîna me:

“Tu wusa dirêj çi bi vî mirovî re dipeyvî? Ji vî zilamî re bibêje, bila hukûmat kon bide me. Hukûmat xanî nade. Qene bila kon bişîne.”

Helîm:

“Min hemû tiştî jê re got. Wî hemû li deftera xwe nivîstî. Ewê ferman li Sitenbolê bike. Tu jêgere.”

Jinikê li derve dîzikek ku ji dûmanê reş bûye daniye ser agir û misêwa dikelîne. Zarokên tazî jî, li dora agir bi qasî ku bişewitin nêzik rêz bûne û bi çavên birçî li dîxikê dinihêrin.

Jinik:

“Helîm,” got, “Em ji mêvanê xwe re şermî nebûn. Ezê îro tewaş(rûn) li savarê bixim. Ha tu jî çend roj bi şûn de rûn bibe bajêr. Ji mehan, ji salan mêvanek hatiye mala me, ma em savarê bêrûn bi wî jî bidin xwarin? Hema çi dibe, em îro jî rûn nexin kûp... Madem mêvan xwe li me girtiye û hatiye. Mêvan mêvanê Xwedê ye. Bi ser de ewê ji bo me fermanê binivîse.”

Ruyê Helîm bişirî, dike ji kêfan bifire:

“Wey tu her hebî jinê, li vî gundê şikeftan di ser te re yek rune. Te ez li hember mêvanê min şermî nekirim. Wey tu her hebî jinê. Ezê qet vê yekê ji bîr nekim.”

Min di vê dema şahiya Helîm de jê pirsî:

“Helîm, zivistanê şikeft ne sar in? Hûn agir pê dixin? Dûman ji kuderê dertê?”

Helîm:

“Beg,” got, “Esas begê min tu vê yekê di fermana xwe de binivîse. Zivistanê serma ji hemû aliyên şikeftê ve tê. Hemû der dicemide. Bi tenê nav şikeftê piçekî zûwa dimîne. Di hundirê şikefta min de kanî heye. Em ji bo avê dernakevin derve. Ava me li hundir e. Dûman jî qet dernakeve derve. Di hundirê şiteftê de diçe û tê. Tê sibê bibînî. Ez qet nebêjim. Tê sibê bibînî û wek te dît tê fermana xwe binivîsî.”

Jinikê sifre anî û li pêş me danî. Pişt re savar jî anî. Di dîzikek mezin de savar da ber zarokan jî. Zarok li ser savarê hêwirîn. Belkî di jiyana xwe de cara yekem sava- rek bi rûn dixwarin. Hem bi kevçî diçûn savarê û hem jî dizivirîn û ecêbmayî li

min dinihartin.

Ez dîsa bê nan çûm savarê. Piştî ku min xwarîna xwe xwar, zû nivînên min rastistin.

Helîm:

“Beg, niha tu westiyayî” got, “ Hema niha tu razê.”

Nivîn, doşekkek ji giya ya şelt dirîyayî bû. Gava ez li ser vezeliyam, bîhna giyayê hişk hat pozê min. Pirrî ku ez westiyabûm, min di ber xwe nedida. Ger tiştê ku min biavêta ser xwe hebûya, ezê dilgeş bibûma, lê... Min ji Helîm re got. Çû ji mala şêx Hîsamedîn anî.

Ez ketim nav nivînan. Jinikê ji xwe bi xwe re digot:

”Wey hêsîro, ew nikare di vê doşeka giya de razê îşev... Ka çi karên wî heye li van deran... De karê hukûmatê ye, aqilê mirov nagire... Wey hêsîro, ew nikare îşev razê... Kî zane li mala xwe di nav nivînên çawa de radizê.”

Lê gava ku min serê xwe danî ser doşekê(ne balîfê) ez pê re di xew re çûm.

Westîn...

Gundê ku di nav şikeftan de ava bûye

Dîsa beriya ku roj derkeve em rabûn. Tew ne diyar e ku jinik kîngê rabûye. Gava ku min çavê xwe vekir, min dît ku serê wê di ber wê de li ser serê min disekine. Kincên wê yên qirêjî û diriyayî dikirana ji ser wê ve biketana. Zarokan jî tazî îppe-la hawirdora min girtibûn. Zarok, dê, ez, Ebdulhelîm; em hemû şaş mabûn. Wan bi heyret li min dinihartin, min jî bi heyret li wan. Gava ku ez hişyar bûm û min kincên xwe lixwe kirin, jinikê jî dizîka ji dûmanê reşbûyî ji ser agir danî. Şorbe kir qafîkekê û da ber min. Pişt re bi dîzikê girt û danî ber zarokan. Di destê zarokan de du kevçiyên qirindirêj ên kevin hebû. Zarokan dest pê kir, bi dorê şorbe xwarin. Min jî kevçiyê bi çoçîkê yê mezin hilda destê xwe û ez nêz bûm.

Ebdulhelîm li min dinihart û dikeniya. Min jî li wî nihart û ez keniyam. Lê min ji vê kenîne tu tiştêk fêm nedikir. Gelo Ebdulhelîm çima dikeniya?

Di vê navê de:

“Beg,” got, “ Bila di navbera me de bimîne, ka ev rojnamevantî çi ye, piçekî qal bike, li wir min dengê xwe nekir. Lê dikim nakim aqilê min nagire. Tu dibêjî dibîjî ez fêm nakim.”

Minê çi bikira? Heta ku zimanê min geriya, min ji Ebdulhelîm re qala rojnamevantiyê kir. Nebû. Paşiya paşîn:

“Ebdulhelîm,” min got, “Gava ez herim Sitenbolê, ezê wan rojnameyên ku min li ser we nivîsîne ji we re bişînim. Tê li bajêr bidî xwendin, hem wê gavê rojnamê bibînî û hem jî bizanibî rojnamevan çi ye.”

Gellek kêfa Helîm hat..

“Begê min,” got, “Li fermana rojnamê binivîse ku, Helîmê ku di şikeftan de hatiye dinyayê sî û pênc salî ye, ji roja ku ji diya xwe bûye heta nuha gomlek li xwe nekiriye. Derpê li xwe nekiriye. Li fermana xwe binivîse, bila bajarî bixwînin.”

Min got:

“Birayê Helîm, bavê te jî di şikeftê de hatiye dinê û mezin bûye?”

“Bavê bavê min, kalê kalê min, hemû nîjada me di şikeftan de hatine dinê û di şikeftan de mirine. Diya min qet nedîtibû ku xanî çi ye. Wê gavê tu kes nedîçû leşkeriyê jî. Ji ber vê yekê kesî dinya nedidît. Piştî ku ez ji leşkeriyê hatim, min ji diya xwe re qala xaniyên ku min dîtibûn kir. Min qala apartmanên Sikenderûnê jê re kirin... Min qala bajaran kir, devê wê ji hev ma. Ji min re digot ku: Kurê min Helîm, tu çi dikî bike wan xaniyan nîşanî min bide. Hemû derdê wê dîtina xaniyekî bû. Min got ez wê bibim qesbê û nîşanî wê bidim, lê ew wê salê mir. Hesreta xanî di dilê diya min de ma. Xwezî min ew biriba. Xaniyek nedît û mir.”

Pişt re Helîm pê re dev ji peyva xwe berda. Bi wê lezê rabû ser lîngan:

“Rabe,” got, “Rabe beg, di germê de, di germa van helanan de em nikarin bimeşin şikeftan. Ku tav derkeve emê roja xwe bibînin. Mirov li erdê dixê, êdî mirov nikare rabe..”

Ew li pêş, ez li pey wî bi lez me dest bi meşîna kir. Ji ber ku mirov nikaribû bi hespê here van deran, me Mihemedê rêber li holika ku lê radiza hêştibû. Gava ku wî bibîhîsta em çûne şikeftan, ewê jî li pey me bihata.

Çiyayekî qirase yê yekpare, mor û bi saw. Sê qotên çiya hene. Ser van qotan rast e. Li ser yekê bermahiya kelehekê heye: Kela Kafromê... heta demên dawî derebegan (divê mîr bin-FD) li vir serweriya xwe berdewam kirine. Hinek yê di şikeftan de rûdinên neviyên van mîran in. Niha ji wan re mîr tê gotin. Mîr, lê çi mîr!..

Hê em negihîştine çiya, roj dernekeve... Roj wek tekerek alevê sor dike, agirek wusa ye ku çavê mirov diniqîne. Ji nişka ve alevê hawirdora me girt. Ji xwe He-

lîm bê gomlek e. Dexmeyên reş û qirêjî li ser goştê canê wî xuya dikin...Qirêj bi çermê wî ve cemidiye û zeliqî ye. Wek çermekî duwemîn.

Canê min dike derkeve.

“Em rûnên,” min got.

Em rûniştin.

Tavê ji para ve li zinarê tûj dixist û siya wî li ber me û bi ser helanan ve dirêj dibû. Sirreke hênîk hat. Di nav zinaran de çend darên benavan ên reş û hêşîn xuya dikirin.

Çawa em rûniştin, me dît ku wa ye şêx Hîsamedîn jî li rû me ye. Me do bişêx Hîsamedîn re hev nas kiribû. Mirovekî xweşsohbet e, baş jî bi Tirkî dizane.

“Tê bi kuderê ve herî şêx Hîsamedîn?” min got.

“Begê min,” got, “Ezê jî şikefta xwe nîşanî te bidim. Eva salek e ku ez li şikeftê rûdinê. Sala parî mala min alî gundê Duderyan hilweşiya. Jine-zarû em li navê man. Ne xanî heye, ne cih. Min rakir doşek û nivînan û berê xwe da şikeftan... Ji derê yê xerab çêtir e. Ez ketim hundirê şikeftê. Jin û zarok ditirsin. Dibêjin emê çawa di şikeftê de bimînin. Şikefta min şikefta herî baş e. Ji şikeftên din gellekî bilindtir e. Li serê çiyar, di nav hêlînên teyran de ye. Min derenceyekê çêkir, di wê re em dertên jor û tên xwarê. Zarok di serî de mehekê ji tirsan ranezan. Pişt re baş hîn bûn. Dest pê kirin şikeft xemilandin. Ezê wan xemlan nîşanî te bidim... Dirûvê şikefta min bi ya yê din naxe. Deriyê wê heye. Û şivakek wê ya biçûk jî liye. Çawa be tê bibînî.”

Ev şêx Hîsamedîn, ji ber ku merivê(eqrabayê) şêxê mezin ê Duderyan e, bi şêx re ew koçî Rojavayê Enedolê kirine. Gava ku ji koçê azad bûye, rast lê xistiye hatiye gund. Li hatina xwe hezar caran poşman bûye. Pirrî ku giliyê Rojava dike, naqedîne. Giliyê trêne jî yê şikeftan re kiriye, pê keniyane. Giliyê trêmbêlê kiriye, pê keniyane. Gava ku giliyê trêmbêlê kiriye, jê re gotine dîn e.

Dibêje:

“Li gunde şikeftan, bi çavê sêrbazekî ecêb, bi çavê dînekî li min dinihêrin.”

Şêx Hîsamedîn weha dibêje di pey re bi dengê bilind dikene.

Helîm dîsa rêberiyê digire destê xwe:

“De haydê rabin! Niha wê germa herî dijwar dest pê bike. Hingê hûn nikarin gavakê biavêjin.”

Min got:

“Em hinekî din rawestî Helîm, an ezê çawa di van zinaran de derkevim?”

Di çokên min de lerizînek, di lingên min de êşek min dikuje. Di dilê min de girî, li qeraxê van şikeftan rûniştin û bi dengî bilind girîn derbas dibe.

Helîm:

“Îro jî tu li şikefta min mêvan î, lê divê tu netirsî. Tê li şikeftê razîyî,” got.

“Ez natirsim,” min got. Em dîsa rabûn.

Di binê vê tava germ de em meşîn û meşîn. Zinaran lingê min dax kirin. Ez nikarim lingê xwe deynim erdê.

Bi vî awayî nivxerîqî em gihîştin serê zinarekî mezin. Jêrê, wek bîreke mezin di nav çiyayan de ye. Çaralî bi zinarên yekpare yên bi saw hatiye rapêçan... Zinar derbasî hundirê hev bûne... Di navendê de, li kêrahîyê pênc-şêş heb darên hawran yên bi tenê...

Helîm:

“Şikefta min li biniya me ye, em bişiqitin,” got.

Lê em çawa bişiqitin? Me şiveriyek dît. Helîm wek bizinan xwe hildiawêje. Lê ez çi bikim? Ez jî bi destan xwe digirim û deverû dişiqitim. Çokên şalê min çiriya(di-riya)ne. Çokên min çerm avêtin. Heke ji vê yekê re bê qeza û bê bela bê gotin, em bê qeza û bê bela hatin xwarê.

Min bi çavên serê xwe nedîta min bawer nedikir. Min anî bîra xwe, dirûvê wê şikefta ku gundiyan qala wê dikirin bi vê nedixist.

Heywan û mirov bi hev re

Şkeft bi devê xwe yê qirase û tarî, tu dibêjî qey di vê germê de, ji kêrî ve hilmê distîne. Hilma ku ji hundirê şikeftê radibe, wek zinaran bilind dibe û datîne. Vê şikefta ku di rewşeke lebatî(tevgerî) de ye, wek hûtên di çirokan de ji min re xuya dike. Tarîtiya şikeftê ji kêre ve veciniqî. Ez jî veciniqîm.

Ji vî serî heta seriyê din min bi gavan pêva. Dirêjiya devê şikeftê çil gav bû. Heşt mîtro jî bilindahiya wê heye. Bi kêrî dirêj dibe û diçe. Eynî wek tûnelê. Hinek ax xistine ber devê wê. Li ser vê axê darek tuyê ya navsere(navsalî) heye. Rengê dara tuyê ji hêşînî ber bi zerî ve çûye. Nav devê şikeftê çik rast bilind dibe. Li kêlekan dev heta erdê nizim dibe. Ew şikeftên ber deryayan hene ya, ji mirov re wusa tê ku

van şikeftan deryayê qul kirine. Dirûvê devê van şikeftan jî bi dirûvê devê şikeftên deryayê dixê. Belkî di dema xwe de ev der jî derya bûn, kî dizane. Li her derê bermahiyek deryayê, bîhnek deryayê heye. Ji mirov re wusa tê ku piçek berê li vir deryayek hebûye, bîskek beriya ku em werin serê xwe hildaye û çûye.

Li ber derê şikeftê, mîtroyek li pişt dara tuyê, du caran bi qasî bilindahiya devê derê şikeftê, kevirên ku sî çil mîtro çih girtine hene. Berê keviran li jêr, li aliyê rastê ye. Li jêr piştî keviran meyilek, ji meyilê wê ve rastek, li nav rastê li rû hev heft heşt darên sipîndaran, piştî wê jî dîsa zinararek yekpare yê ku serê xwe ber bi asîman ve kiriye, li ser rasta zinar Kela Kafromê. Kela Kafromê li alî rojava dikeve. Başûr jî zinar in. Di zinarên başûr de donzdeh şikeft hene. Zinarê rojhilat, zinarê herf bi saw û herf mezin e... Di bin de bi qasî deh şikeftan hene. Li ser şikeftan jî, dîsa bi qasî van şikeftan bi sedan hêlînên qertelan. Rasteke biçûk ji alî çiyayên asê û bi saw ve hatiye rapêçan. Di nava wê de bîrek qirase.. Bîrek kûr. Lê bêav e.

“Em derbasî hundir bibin, em ji germê şewitîn,” got.

Bi rastî jî em şewitî ne. Ez destê xwe di ser xwe bidim dişewite.

Gava em derbasî hundir bûn sirrek hênik a bi rewa li ser çavê min qelibî. Wexta em ji tavê ketin hundir, çavên min demeke dirêj hînî tariyê nebûn. Ez li ser kevirê kî rûniştim û li benda derbasbûna tariyê rawestîm. Piştî çend deqeyan hawirdor ronahî bû. Ebdulhelîm, ji aliyê rastê yê devê şikeftê ve hinekê û hinekê jî hûndir ve bi dîwarê ji çemûr girtiye.

Min ji Helîm pirsî:

“Ev çi ye?”

Helîm wekî ku ji xewê hişyar bibe:

“Ev,” got, “Cihê heywanan e. Beriya çûyina leşkeriyê em bi heywanan re li cihekî radizan. Piştî leşkeriyê min ev dîwar ava kir. Li şikeftên din dîwarê heywanan jî tune.”

Li quncikê din dîsa dîwarek wusa heye. Lê ev dîwar heta ku mîtroyek ji ezmanê şikeftê re bimîne hatiye bilindkirin û li pêş dîwar komên kayê tê dîtin. Min êdî ji Helîm nepirsî ku ev çi ye.

Em rabûn û ber bi hundir ve meşyan. şikeft bi qasî sed mîtroyî bi alî hundir ve dirêj dibe. Li aliyê çepê, kuçikek ku ji reşikê reşotarî bûye heye... Dîsa li jêr, li aliyê rastê kaniyek ku di rehek tenik de av jê didize tê dîtin. Ava kaniyê qirêjî ye û ser

kevzek hêşîn girtiye. Di bin kaniyê de sipîçolkek wek sipîtiya xwê heye. Gava ku min kanî dît nav dilê min şewitî.. Lê gelo ev av tê vexwarin? A hemû nexweşî ji vê avê çêdibe...

Şêx Hîsamedîn li ba min bû:

“Şêx,” min got, “ Li van deran avek vexwarinê heye?”

“Va ye kanî,” got, “ Ma ji vê çêtir av tê dîtin.”

Pişt re li ser avê vezeliya û têra dilê xwe jê vexwar.

Min dîsa pirsî:

“Li cihêkî din av tune?”

“Kaniyek heye, lê pirr dûr e. Emê piştî nîvro herin wê derê. Gava ku em çûn şikefta me.”

Ev av nayê vexwarin. Ez ji tînan bimirim jî ez vê avê venaxwim. Li pêş çavan ez komek mîqrob naxim zikê xwe.

Piştî şêx Hîsamedîn, Ebdulhelîm jî li ser kaniyê rûnişt, têr vexwar, kezeba dilê xwe rihet kir. Ji min re jî got:

“Were beg, tu jî vexwe, şîfa ye.”

“Şîfaya çî Helîm, bi tevahî ew jehr e,” min got.

Helîm li singê xwe yê bi pirç xist.

“Ev canê reş hîn bûye. Zarok jî hîn bûne. Jehr nikare tişteki bi me bike.”

Ev rewaya şikeftê çiqas diçe li ser çermê mirov rûdinê û bîhna mirov diçikîne.

Helîm:

“Li vir, li vê şikefta min bi qasî saetekê, tu dixwazî heta dana em rawestin. Ev gundiyên ku li nêzik dixebitin, navê rojê tev tînin li vir avê vedixwin. Hingê tê wan jî bibînî. Tu wan jî bibînî û derbasî fermana xwe bikî, ewê tişteke wusa çêbibe ku li dinê nehatiye dîtin. Tu wan, bi awayê ku tu dibînî derbasî fermana xwe bikî, ewê kes bawer neke ku mirovên weha hê jî hene... Niha piçekê bi şûn de ewê birrek mirovên nîvtazî, bi pirç û ji tavê reşbûyî bînin vira. Heke tu bi tenê bûyayî, tê bitir-siyayî û bireviyayî. Jin, çerm û hestiyek mane. Dirûvê wan qet bi wan jinên ku min li Dortyolê dîtibûn naxe.

“Em rawestin,” min got.

Kincên min nîvşîlbûyî ne. Rewşeke xerîb. Di serê min de ramanên cihê, xeyalên cihê derbas dibin. Şikeftên ku ji sedan salî ve ne ji mirovan re bûne xanî û sitar...

Bêhed jıyan, bêhed serpêhatî, evîn, sefalet, dilnexwazî, dostî, dijminî hatine û çû ne... Bêhed jınan li vir zarok anîne, bêhed dîlan li vir çêbûne. Şahidê herî mezin ên serpêhatiya mirov şikeft in. Piştî şoreşa me hê jî, ji sefaleta gellek mirovên ku ji yana wan naguhere re bûye war. Bavê Ebdulhelîm, bapîrê wî, bapîrê bapîrê wî, h ji wan wêdetir kalikên wî yên herî kevin, mirovê ku bi tîrê pêşîn nêçira heywan pêşîn kiriye, mirovê ku heywanê pêşîn li çiyê girtiye, aniye şikefta xwe û ji xwe r kiriye heval... Pişt re qebîle, zêdebûn, kêmbûn... Xeml, kinc... Yên bi sihet û wêre kên ku şikefta xwe bi kesên din ve bernedane, li ser şer kirine... Ji bo şikeftê, ji bo nan xwîn rêtin.. Pişt re li dora agirekî, belkî bi bilûrvanekî re bi hev re, destanel dirêj ê bi şevan ê ku bi hemû gelê şikeftê re berdewam kiriye...

Ezmanê şikeftê... Di ezmanê şikeftê de ewqas reşik heye ku, nikare bê salixdan Ji min re wusa hat ku ev ji sedan salî ve civiya ye. Teniya ku reşotarî dike wek gû şıyan li ezman dibiriqe.

Wexta Ebdulhelîm dît ku ez zoq mame li vê teniyê(reşikê) dinihêrim:

“Beg, “got, “Ew li wir bûne şembelîk û qefilîne.”

Serê xwe bixwin!

Fikrek hat serê min: Belkî li van şikeftan wêneyên ku mirovên yekemîn çêkirin hene. Ez lê geriyam. Dîwarên şikeftê di bin teniyê de mane. Belkî di bin teniyê di jî xuya dikin. Bi qasî saetekê, saet û nîvekê ez di hundurê şikefta Helîm de geriyam û çûm û hatim. Tişt tune.

Helîm li pey hev dipirsî:

“Tu li çi digeri? Tu li çi digeri?”

“Tişt tune,” min digot.

Paşiya paşîn:

“Tu dizanî ez li çi digeriyam Helîm?”

“Çi?”

“Ka ew wêne hene ya, wêneyên heywan û mirovan, ez li wan digeriyam. Ma t qet ew dîtine?”

“Na.”

“Ma qet tunin?”

“Belkî hebûye, lê min xwe dîtiye nedîtiye ev şikeft di bin teniyê de bûye.”

Di vê navê de gundî, zimanê wan ji tîna derketiye derve dibêjin ya, tam bi v

awayî, bi bihnefişk hatin û li ser kaniyê vezeliyan. Qeliya ne, ser çavê wan şewitiye, sipîtiya çavê wan jî bi awayek cihê reş dike, lingê wan ê tazî bi nasirek ku dirûvê kevir pê dixê hatiye rapêçan, tiliyên destê wan dirêj bûn. Te digot qeyê ev mirov ji sed salan berê ve dihatin vê şikeftê.

Ji nav wan yekî ji Helîm pirsî:

“Ev çi ye?”

Helîm:

“Ev rojnamê dinivîse. Ew hatiye ku fermana şikeftê derxe... Ji bo me hatiye...”

Yekî pîr:

“Ev ne tehsîldar be?”

Helîm hêrs bû:

“Ma hûn ker in çi ne, aqilê we jî tu tiştêkî nagire. Ewê zilam fermanê derxe. Fermana şikeftan. Piştî ku derxist ewê bide hukûmat axa. Ewê hukûmat rahîje fermanê û bibêje ev hemwelatî sefil û perîşan in, ez alîkariya wan bikim. We fêm kir?”

Çavê hemûyan fireh bûn, bêdengî û tirsekiyê bi wan girt. Piştî vê yekê deng ji yekî derneket.

Berîya ku ez giliyê tiştên ku di hundirê şikefta Helîm de ne nekim, ez derbas nebim: Dîzikek. Nîrek. Du çermên bizinan. Tenekeyek qendîl. Bi gellekan re qendîl jî tune. Bêguman Helîm mirovekî zana û dîtî ye...

Şikefta herî xweş ya Padişahê Perîyan

Mirovên şikeftan ên westiyayî xwe avêtin ser kevirê şikeftê. Yên ku xwe razayî nîşan didin, ji binî ve li min dinhêrin. Min got ya, kezeba min dişewite, ava li ber serê min jî min dîn dike. Ev panzdeh bîst mirovên ku xwe li ser vî kevirê vezelandine hemûyan jî av vexwarin. Tişt bi wan nayê ewê bi min bê? Hema çi dibe bila bibe. Min jî wek wan xwe deverû avêt ser kaniya hundurê şikeftê. Av qirêjî û pîs e, li derûdorê zîrça çivîkan û rêxa heywanan heye. Îcar av jî dilop bi dilop dicive, kî dizane êdî çi? Min çavê xwe girt û ez bi dev çûm avê.

Şêx Hîsamedîn:

“Qet netirse, av çiqas pîs be jî qet tiştêk nake. Tewwekkel bi Xwedê ye!”

“Bila wekî te be şêxê min,” min got. “Ma çareyek din heye?”

Şêx:

“Ma te bîhna xwe veneda? Haydê em herin şikefta min. Miheqeq divê tu bibînî. Şikefta min du qat e. Şikefta li jor bi du deriyan e. Deriyên mezin(jê re şikefta Qul tê gotin-FD)... Wek deriyên bajaran...”

Ebdulhelîm:

“Miheqeq divê tu bibînî. Şikefta dewlemendan, wek qesrê ye. Qet dirûvê wê bi şikefta min naxe,” got.

Bila wekî Ebdulhelîm be. Em dîsa di vê germê de bikevin riyan.

Li jor ewrên sipî yên wek ku baranê civandine. Helanan xwê dane. Mazîzerkên mezin li ser zinaran ji hêlekê direvin hêleke din. Germa zinaran xerabtir e. Zinar dişewitin.

Em şiqitîn rastê. Pişt re em hilkişiyên hervazekî. Li hervaz darên beîvan. Ev hervaz hervazê kelehê ye. Ev darên beîvan ji kuderê tîn? Min ji şêx Hîsamedîn pirsî.

“Li vê kelehê pîncî sal beriya niha jî mîrên Mervaniyan rûdiniştin. Li ser rastiya kelehê heft heşt heb sarinc hene(divê sêzdeh bin -FD). Ev darên beîvan ji Mervaniyan mane. Ev Mele Zibeyr heye ya, ew neviyê van mîran e. Ji Padîşah fermana wî heye. Niha tu herî şikefta wî, ewê fermanek qirase ya bi qasî çarşefekê nîşanî te bide.”

Ji nişka ve çavê min pê ket, hişê min anî serê min. Şêx Hîsamedîn li kuderê zinarekî mezin bibîne, li ser radiweste, hin tiştan bi devê xwe dike mirrîn, bi destê xwe ruyê xwe miz dide û pişt re dimeşe. Ebdulhelîm jî bi zarî (texlîtî wî) dike. Lê wusa li ser hev disekinin ku... Ez acis bûm, min pirsî:

“Ji bo Xwedê şêxê min, ev çi ye hûn disekinin û bi devê xwe dikin mirrîn?

Şêx bi hêrs li min nihart. Belkî jî nenihart, ji min re wusa hat.

“Ev hemû ziyaret in. Li her vana yekê mirovekî qenc radizê.”

Ev çiqas pirr ziyaret in! Qey ev mirovên qenc tev hatine gundê şikeftan û mirine. Em ji hervaz derbas bûn. Em hatin bin zinarekî ku ripîrast wek sipîndarekî be bi asîman ve bilind bûye.

Şêx Hîsamedîn:

“Ha li vir ewliyayê herî mezin radizê.”

Pişt re dest bi duaya xwe ya ku naqede kir. Ez şaş û mat mam. Ne li navê go heye û ne jî tiştê ku dirûvê wî bi gorê dixe. Ser zinar jî wusa tûj e...

Li pişt hev neh deh şikeft rêz bûne. Devê çend heban hatine girtin, deriyekî bi

çûk û şivakek bi qasî destekî li wan hatiye xistin. Yê din bêderî ne. Gelo hemû-yan derî çêkira dê baştir nebûya? Min ev pirs ji şêx Hîsamedîn kir. Şêx Hîsamedîn got ku xesara derî heye.

“Çûnkî,” got, “Dûmana wî agirê ku tu di hundir de dadidî bi hêsanî di derî re dernakeve. Îcar gava ku sê derî be... Ji aliyekî ve ba dikevê û dûmanê bi xwe re hil-tîne û dibe.”

Ev cihê ku bilindahiya devê wî ji mîtroyekê derbas nabe, mirov ancax xwe xwar bike dikare bikevê. Em derbasî hundirê şikefta ku firehiya wê bi qasî sî mîtroyî ye û ber devê bi zinarek mezin hatiye girtin bûn. Li hundir çend bizin radizan. Gava hatina me bihîstin, xwe hilavêtin û reviyân. Ji binî dengê avek ku dilop bi dilop tê dihat. Min ji şêx re got:

“Baş e, xwediye vir kî ye? Li ku ye?”

Şêx:

“Adulkadir Zumurud e navê xwediye vir. Çûye zozanan. Mirovê herî dewlemend ê şikeftan e. Gellek bizinên wî hene. Di nêz de ewê li pêş şikeftê xaniyek çêke û ji şikeftê derê.”

Niha ez yek bi yek li şikeftan digerim. Şikeftên bi av. Havînê av zuwa dibin. Ji ber vê yekê xwediye şikeftan havînê belawela dibin. Hesreta şikeftên wan di dilê wan de dimîne.

“Baş e, mirov çawa dikare here wê şikefta li ser zinar?”

Abdulhelîm Yildiz riyek nîşan da, lê min nedît. Bi ya min tu îmkan tune ku mirov here wir. Min vê fikra xwe ji Helîm Yildiz re got. Li ser vê yekê ew Helîmê ku bi tiralî, hêdî hêdî dimeşî pekiya. Min nihart ku li ber derê şikeftê ye. Ji kuderê, bi çi awayî derket? Bi rastî ez şaş mam.

Ew şikefta ku wek bîrê dikeve binê erdê ya ke ye? Ew ya Ebdulbaqî ye. Lê ev ya ku dike hilweşe ya kê ye? Ew ya Necmedîn Aydin e. Ya li rû wê ya Mihemed Emîn e. Ew ya ku li ber derê wê baxçe heye, ya Musa Polat e. Şikeftên Ehmed, Mihemed, Aqo, Hesên, Huseyîn, Zubeyr, Heyriya jinebî û kurên mirov ên cûr bi cûreyî yên ku qedera wan yek e...

Derê vê şikeftê wek taqekê bilind, fireh û ronahî ye. Bi kûrî ber bi hundir ve diçe, bêserûber e... Wek ku ji deryayê tê, bayek bi rewa li ser çavê mirov dixê. Rewşek şikeftê ya wusa heye ku tê bibêjî lingên mirovan bi vir nebûye.

Ebdulhelîm Yıldız:

“Ev şikeft,” got, “Şikefta mîrê cinan e. Li vir dîlanên cinan çêdibin, ziyafetê wan çêdibin. Padîşahê cinan ê herî mezin li vir rûdinê. Yên berê hemûyan dîlanê cinan dîtine. Li ser serê padîşah, elmasê ku wek sitêrkekê dibiriqê hebûye. Berê gundê şikeftan kesê ku ev nedîtibin nebûne. Niha jî yên ku dîtine hene ya... Mi Xwedê rihma xwe lê bike, bavê Ebdo beşdarî dîlana cinan bûye, digot nedigot ne diqedand.

“Min pîrî meraq kir Helîm, çawa gilî dikir bavê Ebdo? Ka bibêje?”

“Bavê Ebdo ji min re got ku: Rojek bizinên me hunda bûbûn. Ez jî derketibûn li wan digeriyam. Heta nîvê şevê ez li bizinan geriyam, ez geriyam lê min nedît. Min got niha guran bizin xwarine û ez bi şûn ve geriyam. Gava ez vedigeriyam e di ber şikeftê re derbas dibûm. Tariyek wusa hebû ku tiliya xwe bixistana çavê mirov, mirov nedidît. Min nihart ku dengê defê ji şikeftê tê. Bi hezaran, saz, zirne def... Bilûr... Tê bibêjî pêncsed bilûran bi hev re lê dixin. Ez ber bi hundir ve meşiyam. Li hundir ronahîyek... Tê bibêjî roj hilanîne û anîne vir... Ez şaş mame. Bwê şaşbûnê re, du cinên hêzdar ên bejnîkurt ên kincên kesk wergirtî ez hilanîm (birim pêş padîşah. Padîşah li ser textekî mezin rûniştiye û ji hemû aliyên wî ve ronahî dipijiqî. Padîşah ji min pirsî ka ez kê me. Min jê re got ez kê me û min giliyê hundakirina bizinên xwe jî kir. Pê re li du cinan emir kir, da ku bizinên min bibînin û bînin. Di nav nîv saetê de bizinên min anîn ber derê şikeftê. Padîşah li mirşîret kir ku ez giliyê vê dîlanê ji kesê re nekim. Min jî soz da. Ji min re got heke tu giliyê dîlanê bikî ewê tiştên gellek xerab bîn serê te. Bi hezaran keçikên ku bejnwan mîtroyek bû, di nav kincên ku ronahî ji wan dipijiqî de li pêş padîşah dileyistin. Bi hezaran kulîlkê hundirê şikeftê tije kirine... Bîhna wan li dinyayê belav dibû. Xaliyên hevrîşim seranser raxistibûn. Keçik dizivirîn. Bazkên keçikan hebûn. Bazkên bi xeml... Pişt re li ser sênîyên zêrîn berxên sorkirî anîn. Hemû kesî dest bi xwarina berxan kir. Di vê navê de qertelê bazkreşê ku ji çavê wî agir derdiket, bi xijînê kete hundir. Ez ji xwe çûm û xeriqîm. Carekê ez bi xwe ve hatim ku ez di nav tariyê de me. Ez ji wê derê reviyam. Serê sibê ez hatim ku şikeftê şikefta berê ye... Ne xaliyên hevrîşim û ne jî misînê zêrîn... Ne padîşahê cinan... Bavê Ebdo weha digot.”

Di dema peyivîna de em hersê jî çûbûn şikefta padîşahê cinan û li wir rûniştin.

bûn. Min serê xwe rakir û li ezmanê şikeftê nihart. Li ezman tenî tune.

“Ji ber vê yekê kes li vê şikeftê rûnanê?”

“Bêguman ji ber vê yekê. An na, ev ne şikeft e, qesrek e. De bila rûnên ez wan bibînim. Padîşahê cinan ewê wusa li wan xe... Ewê devê wan li aliyekî here, serê wan li aliyekî...Yaaa... ev padîşahê cinan e! Ma kî dikare mala wî jê bistîne?”

Helîm dest bi çîrokek din kir:

“Misto xortekî wek çiyayekî bû. Ax begê min de bila te ew bidîta. Misto şevêkê li vê şikeftê beşdarî dîlanek cinan bûye, çav bi qîza padîşahê cinan ketiye û dilê wî ketiyê. Piştî wê yekê Misto bi kesî re nepeyivî. Misto lal bû. Misto şeveroj li ber derê şikeftê diçe û tê. Keçik carekê xwe li serê zinaran nîşan dide û carekê jî li jêrê. Gava ku li jorê tê dîtîn, Misto bi bazdan hildikişe jorê, wexta ku ewê dildara xwe himbêz bike, dinihêre ku ew li ber derê şikeftê ye, li jêr jê re dest li ba dike û dike-ne. Higê Misto bi bazdan tê jêrê. Gava ku ewê Misto li jêrê wê himbêz bike, keçik li jor e... Bi vî awayî vî karî bi salan berdewam kir. Rojekê termê Misto li bin zinar parî bi parî bûyî dîtîn... Ji zinarê herî bilind xwe avêtiye... Misto wek çiya bû...”

Şêx Hîsamedîn:

“Dem derbas bû beg, hê şikefta me dûr e. Îcar emê negihîjinê.”

Germa gewr mirov dişewitîne. Şikefta Hîsamedîn ji dûr ve xuya kir. Ta li ba hêlînên qertelan e. Ma mirov çawa derdikeve wê derê?

Min di ber xwe da:

“Ez nikarim derkevim wê derê.”

Hîsamedîn:

“Tu heta vir hatî, tê derkevî. Tê derkevî û qesra min jî bibînî.”

Wek tişteki ku mirov derkeve serê çiyayê Andokê... Paşiya paşîn em gihîştin.

Bi rastî jî şikefta şêx Hîsamedîn du qat e. Herdu deriyên şikefta ser wî jî vekirî ne. Yanê zinareki bi qasî çiyayekî mezin di navê de qul bûye. Du lokomotîf bi hev re dikarin di qulê rê derbas bibin.

Şikeftek wek şikefta şêx Hîsamedîn ya min jî bûya min ê nîşanî hemû kesan bida. Deriyekî wê yê xweşik heye. Du şivake çêkirine şêx Hîsamedîn, herdu jî bi cam in. Em ketin hundir. Li hundir mase jî heye. Erd têr paqij e. Ji ber ku pîrr bilind e li vir kam(rutûbet) jî kêma e. Piçek jî tarî nebûya... Şêx Hîsamedîn agirek da da û hema li wir ji me re qehwe çêkir. Destê te ter be.

Tam li ser serê me çend hêlînên qertelan. Qertel di bin ewrê sipî de bêrawest di çin û tên.

Li şikeftan dersa demokrasiyê

Şêx Hîsamedîn li pêş şikeftan baxçeyek çêkiriye. Derûdora baxçe jî wusa xweşil çeper kiriye. Di hundir de kundir danîne. Dîtina dinyayê tiştêkî cihê ye. Bi şêx Hîsamedîn re, ji kêlekekê ve hêdî hêdî medeniyet dikeve şikeftan jî.

Piçek berî esrê bû ku em ji şikefta şêx Hîsamedîn qetiyayn. Riya ku em tê re diçin piştî zinarekî wek devê şûr tûj e. Hê jî tav bi şolîtî dertê.

Tam em gihîştine ber kelehê. Deh mîtro li ser me kavilê kelehê heye.

Şêx Hîsamedîn:

“Beg,” got, “Em herin û vê kelehê bibînin. Camêran çîqa zexm çêkirine. Li jo pênc sarincên gellek mezin hene. Kavilê kelehê ji tuxle hatiye çêkirin. Hê hezar salan ewê wusa bisekine û hilneweşe.”

Min got, “Baş e şêx Hîsamedîn, tu dibêjî di dema mîrîtiyê de jî mirov di van şikeftan de jiyane? Te li ser vê yekê tiştêkî bihîstiye?”

“Min pirr bihîst. Li vir, yên ku dizanin li vê kelehê mîr rûniştine hene. Mesela Mele Zibeyr dizane. Demên wê yên dawî baş dizane. Mele Zibeyr xortaniya xwe di kelehê de derbas kiriye. Di destê Mele Zibeyr de fermanek wî heye. Alimellah mezinahiya wê bi qasî nîv donimî ye. Ew fermana mîrîtiyê ya ku padîşahan danî kalên wan e. Niha em herin şikefta wî, ewê fermanê derxe û nîşanî te bide. Di wê demê de jî li şikeftan mirov rûniştine. Ev leşkerên mîr bûne. Niha jî neviyên mîran li şikeftan rûdinên.”

Em di kendalan re şeqitîn, ji zinaran derbas bûn. Germiyê wek gulê tesîra xwe li serê me kir. Bi pirranî jî ji ruyê şêx Hîsamedîn ve. Ji du gavan carekê, li ber zinarekî, li pêş darekê disekine, deh panzdeh deqîqeyan dua dixwîne. Em şewitîn, em peritîn. Lê şêx Hîsamedîn guhdarî nake...

Em hatin serê kendalekî ku tu nepirse. Ez bibêjim binê kendal xuya nake hûr bawer bikin. Em hatin li ser lêva kendal rawestîn. Min li şêx Hîsamedîn nihart Wî jî li min nihart.

Pişt re:

“Em çî sekinîne, em bişeqitin,” got.

Helîm li pey me mabû. Ew jî gihîşt me. Gava ku me hersiyar li bin dara tuy bîhna xwe vedida, rêberê min Mihemed jî hat.

Mihemed:

“Te dît beg,” dibêje, “Te dît tiştên ku dibin. Te paytexta şikeftan dît? Ha ev şikefta mezin ya xwezûrê min e. Xwezûrê min dewlemend e. Dewlemendê gund şikeftan e. Îsal li pêş şikefta xwe xaniyek çêkir.”

Ebdulhelîm bi ken:

“Mihemed dixwaze bibêje ku, xwezûrê min xanî çêkir, yanê xwezûrê min xwed medeniyet e. Xanî çêkir, lê dîsa di şikeftê de radizê. Beg, rihek xwezûrê vî Mihe medî heye, ta digîhije ber çokên wî. Riha wî meqes nedîtiye. Binihêre ez ji te re sa lix bidim: Sê miyan hevrîng bike, hiriya ku dertê bide ser hev, ha ji te re riha xwezûrê Mihemed.”

Min ji Mihemed re got:

“Tu ji vî karî re çî dibêjî?”

“Rast dibêje. Ji yê ku dibêje zêdetir e,” got.

Helîm:

“De haydê rabin êdî. Em li şikeftên dewlemendan jî bigerin.”

Em ketin rê. Niha dîsa em di hervazekî bi zinar re derbas dibin. Li jorê heşt şikeft û hêlînên şikeftan. Li jor, bi seden kevirên qirase yên ku li pêş şikeftan radiwestin. Daristaneke keviran... Em hatin nîvê rê ku, li serê hervaz hemû malîyên şikeftan rûniştine û li hatina me temaşe dikin.

Helîm:

“Niha ev hemû li holikan dimînin, bihîstine ku tu hatiyî, îcar hatine ku te bibînin. Ewê bibînin ku tu çawa fermanê derdixî.”

Em gihîştin ber hervaz. Çav bi firehî vebûne. Di hemû çavan de perçeyek ronahiya hêviyê dibiriq. Gelo çî ji min dixwazin? Nizanim dibêjin qey ez karmendek dewletê yê mezin im? Min li çavên wan nihart û min jî evqas hêviya ku min b wan re peyder kir, şerm kir. Gelo minê bikariba çî ji bo wan bikira! Tenê min di karibû binivîsim. Yên ku bixwendana, dê “Wax! Wax! bigotana û derbas bûna.

Em ji daristana keviran derbas dibin û digîhijin şikeftan. Kevir sê caran li bejnê min in. Di navbera keviran de rê heye. Em li pêş, gundiyên şikeftan li paş.

Bi rastî jî şikeftên li vir medenî ne. Hê ji derve xuya dike ku şikeftên dewlemen-

Ez şaş mam:

“Te got em bişeqitin, ji kuderê?”

Zinarekî ku rast diçe xwarê û wek cîlakiriye nîşanî min da. Hê beriya ku ez bi-pirsim ewê mirov ji kuderê ve bişeqite, şêx Hîsamedîn dest pê kir, ber bi jêrê ve meşiya. Eman şêx Hîsamedîn! Şêx Hîsamedîn wek bizinan e.

Hîsamedîn li min zivirî:

“De were, tu çi sekiniyî?” got.

“Yahû me canê xwe li erdê dîtiye. Ma mirov dikare di vir de bişeqite? Carekê lingê mirov bişemite, ewê mirov bibe hezar perçe. Tu çi dikî malava. Ma riyek din tune?”

Ew hê li pey hev:

“De netirse lo” dibêje.” Ka çi ye ku mirov jê bitirse heye? Kerê gundê şikeftiyan di vê riyê de dişeqitin. Ka tu were binihêre, li vir derence heye.”

Ez meşiyam keviyê kendal û min nihart. Bi qasî hundirê destekî zinar kola ne. Ji xwe ve derence ev bûye. Bêçare, min sola xwe derxist, bi zinaran girt û ez şeqitîm. Ji her deh deqîqeyê ez ancax du mîtro dişeqitim. Ev ji bo min bû şerekî mirin û mayinê. Bi vî awayî, nîvxeriqî ez karibûm bişeqitim xwarê. Careke din di zinêr de peyabûn! Tobe û tobe. Ew şîrê ku min ji diya xwe mêtibû di pozê min re avêt.

Em şiqitin jêrê ku em çî bibînin, bijimire, heta ku tu dikarî bijimêre, deh şikeft, panzdeh şikeft... Ev der bajarekî şikeftan e... Li gor yên din şikeftên vî alî wek bajêr in. Lê tev jî di cihên asê de ne. Tam li ser şikeftan, lê li gellek jorê hêlînên qertalan ên bi qasî van şikeftan mezin hene... Qertel li hewa diçin û tîn. Ne qertelek, bi hezaran qertel...

Dîsa ez wusa tî bûme ku feleka min dike şaş bibe. Ewê av li kuderê hebe? Li çalîkekê li rû hev çar darên tuyan hene. Hêşînahiyek teze li pelên wan. Gava min lê nihart dilê min vebû. Hevalê min:

“Ha kanî wa ye li wê derê ye,” got.

Em gihîştin kaniyê. Kanî bixwe serê xwe. Ji bîhnê mirov nikare nêzîkî bibê. Tiştêkî wek ava salan e ev. Binê wê reş dike. Li der û dora wê bişkulên bizinan. Ji bilî ku tu çavê xwe bigirî û heta ku têr bibî vexwî, zêdetir çareyek tune. Piştî hevalê xwe min jî wusa kir. Av gellekî sar e. Mîqrob be mîqrob! Yanê ewê çi bibe. Heta hê jî ez nemeribim, hingê tiştêk heye.

dan in. Pêşiyên wan heta ber asîmanê şikeftê girtine. Di her yekê de du şivake he-
ne. Şikeft li rû hev rêz bûne.

Şikeftêk jî du qat e... Ev şikefta Mele Zibeyr e. Mele Zibeyr şikeft bi sutû-
nan(qutekan) bi qasî mîtroyekî bilind kiriye, ser sutûnan raxistiye û bi heriyê girti-
ye. Ji ber vê yekê şikeft jî bûye wek qesrekê.

“Mele,” min got, “Ev ne şikeft e! Ev qesr e, qesr!”

Mele bi xemgînî serê xwe hejand:

“Tu were wê qesrê ji min bipirse. Zivistanê çiqas berf û baran bê li hundirê şî-
keftê tê. Ji devê wê ve diherike hundir.”

Mele cêrek jî av aniye. Ev heqê Mele Zubeyr jî nayê dayin. Bi dorê, heta ku em
têr bûn me av vexwar. Di vê navê de jinikek gellekî pîr li pêş min rawesta. Serçavê
wê dohn girtî, ser û porê wê tevlîhev, ji qelsî çerm û hestî maye... Destên wê dilerî-
zin.

Dest pê kir bi kurdî peyivî. Mihemed ji min re tercûme dike. Jinik bêyî ku ra-
weste nîv saetê peyivî. Di axaftina xwe de beyan dikir ku du neviyên wê mirine, dê
û bavê neviyan jî gellek berê mirine, ew jî wek bûman tî û birçî bi serê xwe di şî-
keftê de dimîne, ji min dixwaze ku ez derdê wê ji hukûmet û paşan re bibêjim.
Gotin li min e!

Mele Zubeyr jinik dût kir. Pişt re hat hundir. Ji hundir di destê xwe de bi torbe-
yekî pîr mezin ê bi pîrç hat. Torbe vekir. Destek kaxizê qirase..

“Ha ev fermana dawî ye ku padîşah daye kalê min.”

Me ferman li pêş şikeftiyên raxist. Tuxraya fermanê bi sitêrkî hatibû nivîsîn.

“Padîşahan heta sî sal berê jî miaş didan me. Gelo em vê fermanê nîşan bidin,
emê niha nîkaribin miaşê xwe bistînin? Nizanim ez heta Sitenbolê neçim?” got
mele.

Bi awayê ku pêwîst bû min got. Min jê re got ku êdî dewir guherîye û padîşah
çûne... Min giliyê demokrasîyê jî jê re kir!..

Mirovên ku nizanin balafir, radyo û trên çî ne

Selîm bi destê min girt û ez bi alî zinaran ve kişandim. Di pişt zinaran de ji nişka
ve xaniyekî yek menzel derket pêşiya min. Selîm, ji ber ku nizane ez bi kurdî diza-
nim, bi dest û milan hinek tişt ji min re dibêje. Lê ez dikim nakim fêm nakim ku

dixwaze çî bibêje. Paşîya paşîn min biryar da ku ez bi wî re bi kurdî bipeyivim.

“Birayê min Selîm, ez bi kurdî dizanim. Derdê xwe bi kurdî bibêje.”

Selîm şaş û mat ma. Ewê hin tişt bigota, lê devê wî lal bû, negeriya. Pişt re tirsîya.

“Dev jê berde Selîm, min mexsûs ji wan re got ku ez bi kurdî nizanim. Ji bo ku ji min tu tişteki veneşêrin min wusa kir. Tu jî ji kesî re qal neke ku ez bi kurdî dizanim. Ewê eyib çê bibe. Li ser min wusa pirr tişt gotin ku ewê şerm bikin.”

Ruyê Selîm ronahî bû:

“Nexwe tu bi kurdî dizanî, Tu kes pê nizane ku tu bi kurdî dizanî. Hemû tiştî li pêş te bi aşkerayî dipeyivin.”

Min ji Selîm pirsî:

“Te av xanî da lêkirin?”

Selîm:

“Min da çêkirin. Şikeft ji me re teng hat. Em bi heywanan re bi hev re radizan li şikeftê. Ez çûm Farqînê û min li wê derê xanî dîtî. Ez hatim vir û min ev xanî da çêkirin.”

Emrê Selîm hijdeh e... Qels e, teşikên lingên wî wek darikan in, ruyê wî yê tenik qeliya ye... Çavên wî yên reş û mezin bi keder in. Em bi wî re li hundirê şikefta wî rûniştin û em derdê xwe ji hevdû re dibêjin... Dirûvê hundurê şikeftê, bi hundirê malên Tirkmenan ê Torosê dixê. Çewalên bi nexş û rîsîn... Tejên kurdan... Di nav şikeftê de embarek ku bi awayê boruyê hatiye çêkirin (divê kewar be-FD)... Pişt re li quncikekê tîfîkek... Kuleka tîfîkê derdikeve derva... Di gel ku kulek heye jî dîsa gûşiyên teniyê li asîmanê xanî tên dîtî. Dirûvê şikefta Selîm bi şikeftên din naxe. Tişteki wek gundê xaniyên rojhilat ên binerdê ye. Belkî jî ji wan çêtir e. Tenê gava ku derî tê girtin piçek jî ronahî nakeve hundur.

Di demeke kurt de em bi Selîm re li hev germ bûn. Tu tişteki xwe ji min veneşêre, hemûyî bi aşkerayî dibêje. Berê giliyê bavê xwe kir. Bavê wî li şikefta jorîn rûniştû bûye. Şevêkê berdestî sibê miriye. Gava ku diya wî jî miriye, Selîm di şikeftê de bi serê xwe maye. Piştî vê yekê li ber derê xelkê mezin bûye. Şivantî kiriye. Du sal berî niha jî xatiya wî ya Emîne keça xwe daye wî. Jina wî şanzdeh salî bûye, Selîm ji jina xwe hes dike. Lê bi awayê ku ez fêm dikim jinik ji wî hes nake. Jinik zer e. Li şikeftan jî jina herî meqbûl ya zer e. Lê bi rastî Selîmok ne mirovekî ku neyê

heskirin e! Ruyek wî yê tenik heye ku, tu qet nikarî bibêjî ev lawik di şikeftan de hatiye dinê û mezin bûye...

“Selîm!”

“Kerem ke axayê min.”

“Ma zeviya te heye Selîm?”

“Na.”

“Lê tu çi dixwî Selîm?”

“Em garis dikirin.”

“Selîm!”

“Kerem ke axayê min.”

“Çend miyên te hene Selîm?”

“Deh”

“Çend bizinên te hene Selîm?”

“Pêncî.”

“Çend çêlekên te hene?”

“Panzdeh.”

“Tu ji vana tevan çiqas rûn digirî Selîm?”

Selîm ji min re bi hesabê bataman kir. Min zivart kîloyê. Salê bi qasî sed û heştê kîloyî rûn dike.

“Tu dewlemend î lo Selîm. Bila ev xanî weha nemîne. Tu yekî mezin çêke.”

Selîm:

“Şikir ez dewlemend im axayê min. Heke xatiya Emîne bihêle, ezê xaniyekî mezin çêkim û ji vê şikefta pîs xelas bibim.”

Selîm wek şêran e. Selîm lawikekî pirr baş e. Gellek tiştên li dinê jî meraq kiriye. Mesela rengê deryayê pirsîye. Jê re gotine ku kesk e. Pişt re jê re gotine ku li ser deryayê bi navê vapûrê wesayîtek bi qasî xanî, bi qasî xaniyê ku wî çêkiriye heye.

“Selîm! Tu van pereyên xwe li kuderê vedişêrî?”

“Xatiya min a Êmo wan vedişêre. Tu kes bi ciyê wan nizane.”

Xatiya Êmo xwesiya Selîm e ku li melekê dimînin. Jinek yeman e. Mesela di gel ku gellek jinên şikeftan nizanin pere çî ye, Êmo pereyan vedişêre, diçe li bajêr danûsitandinê dike û tê. Yên ku baweriya wê bi wan tê deyn jî dide wan. Bi ser de bê faîz. Hemû bizin û çêlek jî yên Êmo ne bêguman...

Niha ez li deftera xwe ya notan dinihêrim û wê peyivîna ku min bi Selîm re kiri ye li vir dinivîsim. Ramanên Selîm, kêr zêde fikrên rûniştivanên şikeftan dinimî ne:

“Selîm!”

“Kerem ke axayê min.”

“Birayê min Selîm, te radyo dîtîye?”

“Haaa!”

“Radyo, radyo!”

“Qutuyek heye. Li wî serê dinyayê dibêjin, tu li vir gohdarî dikî. Te qet nebihîstîye?”

“Na welleh...”

“Selîm!”

“Kerem ke axayê min.”

“Selîm, te trêr dîtîye?”

“Ka leşkeran lê suwar dikin û dibin. Ew?”

“Erê ew Selîm.”

“Min nedîtîye axayê min.”

“Selîm!”

“Kerem ke axayê min.”

“Te tirêmbêl dîtîye Selîm?”

“Min nedîtîye lê bihîstîye. Carna hatiye qeza me Pasûrê. Yê ku çûn leşkeriyê j gotin.”

“Balafir”

“Min bihîstîye, dibêjin li hewayê difire.”

“Traktor?”

“Ka cot dike, ew?”

“Ew.”

“Gava ku ez çûm û min li Farqînê emelîtî kir min dît. Agir wê dimeşîne.”

“Apartman çi ye, Selîm?”

“Haa!”

“Apartman.”

“Ha!”

“A-par-ti-man.”

“Ha!”

“Dolaba Cemedê?”

“Ha!”

“Elektrîk?”

“Ha!”

“Peqlewa!”

“Peqlewa? Min bihîstibû, lê min nedîtiye.”

“Selîm, pirseke din ji te re. Te tramvay dîtiye, tramvay?”

“Min qet nebîhîstiye ji xwe.”

“Te kuçikê gazê, simnika elektrîkê, ûtûya elektrîkê, makîna kincşûştinê, ma te makîna kincşûştinê dîtiye?”

“Na.”

“Bombeya atomê? Te bihîbtiye ku bombeya atomê çi ye? Bombaya Hîdrojenê... Keleha ku difire te bihîstiye Selîm?”

“Ha!”

“Atom,” dibêjim, “bombeya atomê?”

“Ha!”

Ji xeynî vana hê gellek pirs min ji Selîm kirin. Min çi pirsî Selîm heyirî. Bi rastî ez ji vî karî aciz bûm. Min ji xwe bi xwe re got ku, ez van pirsan ji hemû rûniştivanên şikeftan bikim. Ez çûm, tev li mala mele civiyabûn. Min pirsên xwe ji wan jî, bêyî ku ez aciz bibim û dev jê berdim, pirsîn. Tu kes bi tişteki nizane. Dîsa Selîm di nav wan de yê herî bi kultur e. Li Farqînê traktor dîtiye û dizane peran bijimêre.

“Selîm!”

“Kerem ke axayê min.”

“Tu jî di terîqatê de yî? Şêxê te kî ye?”

“Erê ez di terîqetê de me. Şêxê min jî şêx Kemaledîn e. Lê ew bêxêr derket. Wî murîdên xwe berdand.”

“Selîm, tu salê çend lîre didî şêx?”

“Bîst lîre.”

“Ma ne hindik e, Selîm?”

“Hindik e lê em jî feqîr in.”

Niha Selîm li min zor dike. Wan tiştên ku min jê pirsîne dixwaze hemûyan jî min hîn bibê. Yê min jî, heta ku ji destê min hat, min jê re gîlt kir. Gava ku min qal dikir, Selîm şaş û mat dima, çavên wî vedibûn.

Li gundê mirovên şikevtan şev

Siya zinarên ku ji germiya rojê sor bûne ber bi rojhilat ve dirêj bû. Li rojava kêle kên ewran mor bûn. Roj li ser çûna ava ye. Li Kela Kafromê, li ser zinarên ser şî keftan rojek din dike here ava. Ewê demekê bi şûn de, ev mirovên ku ji sed salar paş ve hatine, bi heywanên xwe re, bi wî şerê ku bi xwezayê re dikin, bi wê westû û tenêbûna xwe vekişin şikeftên xwe.

Li jorê, li asîman bi hezaran qertel diçin û tên. Siyên qertelan yê qirase li zinaran tên raxistin.

Ez di nav peraniyek mirov de me. Ez di nav peraniyek mirov de me ku belkî na in, belkî piçekî hîlekar in, ji xwezayê, ji lêxistina ewrûezman, ji zinarên hov ditirsîn, hez dikin, digirîn, êşê dikişînin, bi dengê bilind dikenin; darek çawa mezin dibe, gurek çawa mezin dibe wusa mezin dibin, wek heywanekî hov şer dikin, li ber tunehî û neçariyê di ber xwe didin.

Li serê zinarekî, di şeqara zinar de darek mezin bûye. Vê darê, di nav zinarê ecêl de ax çawa dîtiye? Avê, wê tevahiya gidaya ku ewê bistîne ji kuderê tîne? Guliyêr wê tenik û hêşin in... Li asîman ewrên sipî, li erdê wê tava ku li ruyê zinaran dixê duqat bêtir sor dike... Ewr dilopek av nadin. Di tevahiya havînê de, wusa sipî, wekî ku xeml bin diçin û tên. Lê serpêhatiya vê dara tenik? Wek heywanê herî hov ne çengê ax û ne jî dilopek av. Pelên wê bi hêşîniya herî xweş hêşin. Di gel hemî hêşînî û xweşikiya wê, rewşek mirinê ya dara ku di zinar de gihîştîye, heye.

Li serê zinaran dar, li şikeftan mirov... Çiqas xweş hatine rû hev.

Êdî bû şev. Tarî hêdî hêdî ser zinarên hov digire. Qertal vegeirîn hêlînên xwe. Hî jî di tariyê de çend qertel diçin û tên. Em li jêr in, li ser serê me, gellek li jor in hêlînên qertelan. Di tariyê de qertelan tind dane, xwe quncifandine ber hev, qirpa qirpa wan e. Hûn nikarin ji vî qertalê hêlînê re bibêjin ku qertalê li asîman e. Wusa xemgîn, wusa bêdeng rawestiye ku...

Selîm li ber çoka min e. Em bi Selîm re baş bûne dost êdî. Min ji wî re giliyê di

nê û mirovan kirin. Tiştên ku mirov dikin, dostanî û dijminahiya wan min jê re gilî kir. Selîm bi kêf e... Tê bibêjî qeyê hatiye dinyayek nû.

Ew jî li gotinê vebû. Ji min re giliyê qertelan kir. Dibêje ku:

“Li dinyayê, li dinyayê bi tenê dermanek heye, ew jî rûnê qertel e. Ji bawîtiyê re pîrr baş e. Ji bo her derdî derman e. Ji bîlî rûnê wî, ew mêjîyê hundirê hestiyên wî can dide mirovên mirî. Lê girtina wî zehmet e. Lê em digirin... Êvarê em werîs bi pişta yekî ve girê didin û ji serê zinar ve berî xwarê didin. Bi kêra destê xwe dikeve ser qertel. Lê em bi tivingê jî dikujin.”

Sitraneke, sitraneke pîrr bi nav û deng hat bîra min. Ewê sitraneke van hêlan be:

*“Nukraxî tu bibêjî çiyayê Ofo
Ji derd re derman e rûnê qertelo”*

Di ser pozê zinaran re sitêrk gir xuya dikin. Heta tu bibêjî bédengî û kerrîtiyek çêbû. Pîrraniyên gundiyên şikeftan ên ku li ba min bûn zivirîn cihê xwe. Li ba min Mihemed, Ebdulhelîm û Selîm man. Ha min dikira ji bîr bikira, Ebdo jî li ba me ye.

Germiya zinaran hê jî alev bi alev e...

Mihemed:

“Begê min, were em îşev li vir ranezên. Heta serê sibê emê biperitin,” got.

Çavê min jî ji vê şikeftê tirsîya.

“Lê em çi bikin Mihemed?”

“Em herin mala Êmo. Êmo niha li holikan e. Bi qasî bîst deqîqan li jêr, li rû avê ne. Rû avê li gor vir hênik e.”

Dibe? Çima nabe! Em herin. Ji xwe Selîmê heval jî dixwaze.

“Selîm!”

“Kerem ke axayê min.”

“Em herin holika xatiya Êmo.”

“Ewê baş bibe axayê min. Em herin wê derê... Ewê Ebdo jî ji me re li bilûrê bixe.”

Ebdulhelîm:

“Ma beg, Mihemed qet ji te re kulam negotin? Bila Mihemed ji te re kulaman

bibêje.”

“Got Edulhelîm. Pirr got.”

“Ma kilama Zeyno jî got?”

“Na.”

“Te çima negot Mihemed?”

“Ezê bibêjim beg.”

Em di tariya şevê de ketin rê. Ebdo û Selîm li kerên xwe sêwar bûne. Hûn li Ebdo bipirsin, hê çardeh salî ye. Di gundê şikeftan de kesî ku ji wî çêtir li bilûrê dixune. Sala parîn bavê wî di nav du rojan de miriye, Ebdo bêkes maye..

Em li ser zinaran digerin û digerin. Hîv jî derket. Hîv, zinaran bêtir hov dike Gava ku em di bin zinarekî mezin re derbas bûn Ebdulhelîm rawestiya:

“Beg, te çîroka vê şikeftê bihîstibû?”

“Min nebihîstiya.”

“Em bibêjin?”

“Bibêje lê, hê tu çi sekiniyî?”

“Berê malek ku şeş kes bûne li vê şikeftê rûniştine. Rojekê ji jorê zinarek gêr bû ye û hatiye devê şikeftê girtiye. Yê hundir li wir mane. Bi rojan qêriyane, gazî kirine. Tu kesî dengê wan nebihîstiya. Zinar, zinarekî wusa mezin bûye ku, gundi yê şikeftiyen kirine nekirine nikaribûne kevir bişikênin û yê hundir rizgar bikin Ew li wê derê mane û mirine. Vê jî li fermana xwe binivîse. Rojekê zinarek dikar devê şikefta Helîm jî bigire. Bi deh zarokên tazî re, ewê Helîm jî di şikeftê de bi mire û bimîne. Vê jî li fermana xwe binivîse.”

“Em vê jî binivîsin Helîm. Dibe, em vê jî binivîsin.”

Di tava hîvê de avek zirav dibiriqe. şîrtek birqînê dirêj dibe û diçe. Mihemed jî dest bi kilama Zeyno kir. Zeyno ji şikeftan e. Dergistiyê wê diçe leşkeriyê, di dem Osmanîyan de. Zeyno ji bo ku dergistiyê wê nebin leşkeriyê çî ji destê wê tê dike lê dîsa dergistiyê wê distînin leşkereriyê. Zeyno jî li ser wê destanek ku du roj û di şevan diajo derdixe. Destan dikeve devê dengbêjan û belav dibe. Îcar ciyekî destanê heye ku dilê mirov perçe bi perçe dike. Dibêje ku: “Evîndarê min, tu wê ava b rohnî yî ku ji zinaran dipijiqe. Dildarê min dilê min e. Bêyî wî ez dimirim. Gor min nîşanî dildarê min bidin.”

Evîndar heft salan li leşkeriyê dimîne. Di vê navê de Zeyno, ji hesretê di ber xw

nade û dimire. Di hilma xwe ya dawî de kezîyeke porê xwe dibire û bîhn dike. Piştî vê yekê, “Vê kezîyê,” dibêje, “Gava ku evîndarê min hat bidin wî.” Û bi vî awayî canê xwe dide.

Heta em gihîştin ba holikê Êmo Mihemed vê kilamê got. Tiştê ku gotibû, hê ji dehan yekê kilamê nebû.

Êmo em baş kirin mêvan. Mirîşkek jî serjêkir. Li holika Êmo doşek jî hebû. Wê şevê cara yekem ez li ser doşekê razam. Li mala wan gundiyên din ên ku li holika Êmo diman doşek jî tunebû. Lê li mala Êmo ya ji şikeftan doşek jî hebû. Çi qenc e!

Serê sibê bi berbangê re em rabûn. Emo dew dikula. Ji me re çayek çêkir. Piştî xurîniyê em bi rê ketin.

Bi zinarên xwe yên hov û bi saw gundê şikeftan li paş ma. Gelo ev xeyal bû, xewn bû? Niha ji min re wusa tê, ji sedan salî wê ve ma. □

25 Tebax 1953 - 2 Îlon 1953


Wergera ji tirkî: Felat Dilgeş

Ji pirtûka *Bu Diyar Baştanbaş*, weşanên Tekin, Stembol 1979.

Laşê nivîskar

Marguerite Duras

Laşê nivîskar di bin bandora nivîskariya wî de ye. Nivîskar seksualîtê li der û dora xwe belav dike, mîna mîran û karbidestan. Tu dibêjî qey mêran nihane serê me jî, ew bi radana laşê me re radidin serê me jî. Herçî ji bo min e tu tesadufên weha çênebûne. Li ba hezkirekî neîntellektuel eynî raman heye. Karkerek bawer nake ku ew ê bikaribe jineke nivîskar bi dest bixe. Ev li hemû din-



yayê wilo ye, hem ji bo nivîskarên mêr û hem jî ji bo yên jin. Ew bi awayên beloq alavên seksê ne. Gava ez gelekî ciwan bûm, carinan kalemêran bala min dikişandin, ji bo ku ew nivîskar bûn. Ez tu carî nikarim seksualîta bêî întellîgens bifikirim, û herweha întellîgensa bêî jidûrketina laş. Gelek întellektuel hezkirên hepeloî û bêkêr in, şermokî û tirsonek in, belawela ne. Gava ew dûrî min bûn, ji bo min ne girîng bû, ew nivîskarên wilo bû, ku dûrî laşê xwe bûn jî. Min ferq kiriye, nivîskarên ku hezkirên pir baş in, ew ne nivîskarên pir mezin in. Jîrî û bîaqilî bangî tecawizê dike, mîna ku ew bangî mirinê bikin ew wilo jî bangî tecawizê dikan. Problemên nivîskarên sexte yên wilo tune ne. Siheta wan baş e û mirov dikare bi hêsanî bi wan re bimîne. Di jinûmêrîtiya nivîskariyê de, gava jin qala karên xwe dike, dibêje: Mêrê min nivîskar e. Lê mêr dibêje: Jina min jî dinivîsîne. Zarok dibêjin: Bavê me pirtûkan dinivîsîne, diya me jî carinan dinivîsîne. □

Ji swêdî hatiye wergerandin

Ji pirtûka bi navê *Vardagens ting* (Tiştên rojane). Wergera swêdî: Katarina Frostenson, weşanên Interculture, 1989.

Marguerite Duras nivîskareke fransî ye. Wê heta niha gelek çîrok û roman nivîsandine û pirtûkên wê wergeriyane zêdeyî bîst zimanî. Ew îro yek ji nivîskarên dema me ya bijarte tete hesabandin. Ew bi berhema xwe ya dawî *Hezkir* aktuel e.

Çêxovê herdemî

Sofîa Grîgoryeva


Bi qasî ku niviskariya Çêxov di dema xwe de xwediyê ciyekî girîng bû, îro jî herwusa ye. Îsal(*) 130-saliya bûyîna wî ye û ji ber vê sedemê jî meriv dixwaze çend gotinan li ser vî klasîkerê lîteratura dunyayê bibêje.

Anton Çêxov di malbateke bazirgan de, di 17 zivistana navîna sala 1860'î de li Taganroga kêleka gola Azovskayayê hate dunyayê. Karê bazirganiya bavê wî li hev nehat, rewşa wî xirab bû û ji neçarî rabû koçî Moskvayê kir. Lê ji bo jîmnaza xwe biqedîne Anton û birayê xwe î piçûk li wir man. Li wir herdu birayan jiyaneke gelekî xirab buhurandin. Serbixweyiyeke weha zû û dijwar bû sedem ku ew bigêhîje prensîbekî exlaqî û wê ji xwe re bike pîvan, bi gotineke din, pîvana ku ew ê tucarî ji rûmeta xwe nekeve.

Mîna ku naturê ew xîrabramanên bazirganiya bavê wî veguesti be zarokên gelekî jîr û dabe wî, çar law û keçek. Ew bi xwe mijûlê muzîk û sitranan, mijûlê wêneçêkeriyê dibû. Ji birayên Anton yek bû hunermendekî wêneçêkerinê, herduyên mayî dan ser riya lîteraturê, xwenga wî Mariya bû mamoste lê mijûlî wêneçêkeriyê jî dibû.

Di sala 1879'an de Çêxov dest pê kir û li unîversîta Moskvayê beşa doktoriye xwend. Di vê dema xwendina xwe de bi destsivikiyeke nepayî dest bi nivisandina novelên kurt û mîzahî kir ku bi naznavê Antoşa Çexonte dihate weşandinê.

Sala 1886'an jî bo Çêxov bû saleke giranbuha. Vî doktorê xort biryara xwe da ku



hejmara nexweşên xwe kêr bike û bi wî awayî bikanibe wexteke zêdetir bide lîte raturê û ji dêla naznavê xwe bi navê xwe î rastîn derkeve holê.

Piştî du salan ji bo novelên xwe yêr bi navê *Tariya Êvarê* li Ûristana wê dem bilindtirîn xelata edebiyatê, xelata Pûşkîn wergirt. Piştî saleke din jî *Merivên Xen gîn* xelas kir û weke pisporê kurteprosayê xwe da vî karî.

Li ser vê yekê ramanên hevalbendên Çêxov bi giştî hatin guhertin. Û hîn di wa deman de têgehîştin ku prosayên wî yêr sade û bêqisûr, kurt û balkêş, bêguma serketina daxwazên wî ne.

Piştî koçmaliya ji Taganrogê rewşa malbata wî li Moskavayê nebaş bûbû. Lê c dawîya dawîn de Anton têra kirîna xaniyekî bi ser ket. Dê, bav û xwenga wî koç wir kirin. Li gel vê yekê jî ji bo ku bi serêkî rihet bikanibe niviskariya xwe bidomî ne, quncîkekî piçûk bi dest neket. Pêwîstiya wî ya ji danûsandinên mêvanan wu sa kir ku ew mala di demeke kurt de bû weke otêlekê, ji niviskaran, ji heyranên w yêr jin, ji doktor û karmendên navçe, ji nasên dût û nêzîk tev zarokan herkes i wir şevbuhurî dibûn.

Çêxov ji hêlekê ve wekî doktorekî pratîka xwe dikir û ji hêlekê ve jî heta malên nexweşên xwe diçû û bêpere saxiya wan dikir. Lewra piraniya nexweşên wî gundi yêr xizan bûn. Di dema belavbûna nexweşiya kolerayê de weke nexweşxane avah dane vekirinê û li wan avahiyan kar kir. Herweha di navçe de baweriyeke wusa j dabû dezgeh û dadgehên dewletê ku li ser vê yekê îcaza avakirina sê dibistanan daçandina daristanê, mijûliya bi bax û bîstanan ji wan girt, bersivên gelek û gelek nameyan da, û ji bo bajarê xwe pirtûkxaneyeke tekûz da hev.

Mîna hay jê hebe ku jiyana wî ê ewqas dirêj nebe û bixwaze gelek tiştan bibîne Anton Çêxov di vê kurtejiyana xwe de pir derkete dûtgeştan. Di sala 1890'î de der ket dûtgeşt Girava Saxalîn ku bibîne bê ew kesên sirgûnê di çi rewşê de ne. E dûtgeşt dijwar û xeternak heta wir 81 rojên wî girt. Bi qasî sê mehên xwe li Girava Saxalîn buhurand. Bi dest û keda xwe hejmara wan hemû kesên wir dan hev û ev hemû kesên ku bi karê zorê hatine arihandin derxiste holê. Ew erkên dermanî t sosyolojiya ku wî li wir berhev kirin, bûn bingehên berhema wî ya Grava Saxalîn berhema ku bû şahîdiyeke nivisandî ji bo êş û piçûkxistina merivan.

Ev rojedeftera wî ya ku wî bi xwe bi navê karekî bingehîn bi nav kiriye, him l Ûristanê û him jî li derveyî welêt bi reaksiyonên xurt deng da. Û ev yeka bû se

dem ku hukumata Çar li ser çareserîya çêtirkirina jiyana girtîyan raweste. Tiştê ku li Girava Saxalînê bêtir bandora êşekê li Çêxov kir, rewşa zarokan bû. Zarokên ku terkî mirina birçîbûn û nexweşîyan bûbûn. Piştî hatina xwe ya Moskovayê, Çêxov bêja peran li dar xist, ji bo zarokên Girava Saxalînê pirtûk û materyalên dibistanê bi rê kirin.

Çêxov di 44-saliya xwe de ji nexweşîya tuberkulosê, li Badena Almanyayê serî li ser çoga jina xwe mir: jina ku şanogera hunerşanoya Moskvayê, jîyana derdê wî bû.

Çêyî û enerjîya ku li ba Çêxov ne tenê xetke bêqûsûr, herweha perçeyek ji felsefa wî bû. Felsefa ku ew pê radibû, felsefeyeke wusa ye ku meriv erka xwe bi baştirîn şeweyê jîriyê bi kar bîne. Meriv dibêje qeyê ev maqûliya ha û ew îronî û rûteralîzma ku wî di hemû berhema û diamên xwe de jî bi kar haniye, li hev nake. Lê ew rastiya ku Çêxov bi çavên xwe didît, nikani bû bi xweşrengan binixumanda. Tiştêkî weha li ba Çêxov gunehkariyê mezîn bû, wersira ku navûdengê wî ter digire û wî dike yekî hertimî jî ev e. Lehengên wî, bûyerên wî û ew radeyên psikolojiya ku ew vedijene bêhneke rastkîno didin. Çêxov xwe baş serwext kiri bû ku hîs, raman û danûstandina merivan li hemberî hev hertim weke hev in û ew ê hertim jî weke hev bin.

Helbestvanê bi navûdeng Korney Çûkovskiyê hemdemê Çêxov di bîranînên xortaniya xwe de li ser wî dinivîsîne û dibêje: jîriya Çêxov xwendevan mecbûr dike ku ew, êş û xemgîniya xelkê weke êş û xemgîniya xwe hîs bike û bijî. Nivîskarê prosayê Ilya Ehrenbûrg jî li ser vê yekê dinivîsîne ku: vê jîriya Çêxov hişt ku ew bi kurtejiyana xwe ya li vê dunyayê, jiyana bi sedan merivan bijî.

Ji ber stîla wî ya lîrîkî û bikarhanîna zîmanekî kurt û sergirtî Lev Tolstoy wî bi navê Pûşkînê prosayê dinavîne, û romanivîskarê fransî Francois Mauriac jî wî û Mozart dide ber hev.

Çêxov hertim gotiye ku her meriv, her qedereke jiyane çiqasî bêmane û serneketî dibe bila bibe, dîsa jî ew perçeyekî organîk e ji çemê jiyane yê bêdawî, û dema ku ew bi tevayîya xwe xwe pêve berdide, bi xwe re bandorekê jî lê dike. Çêxov dixwaze bibêje her çiyê ku were kirinê tiştêkê jê bêşop û li avarê naçe, hertişt ji bo îro û ji bo siberojê xwediyê maneyekê ye.

Li ba nivîskarên antîk tevayiyê berpirsiyariya kirinên merivan di hustuyên Xwe-

dayan de bûne, lê li ba Çêxov, meriv bi xwe berpirsiyarê kirinên xwe ne. Dibe ku ji ber vê yeka ha ye ku berhemên wî wusa giranbuha dixuyin û hertim têne xwen dinê. Bêguman em ê hîn gelek carên din jî novelên wî bixwînin, bi alîkariya lehen gên dramên wî xwe nas bikin û herweha em ê xwe jî û yên mayî jî baştir fam bikin. □

Wergera ji swêdî: Hesênê Met

(*) Sala ku niviskara vê tekstê behs dike 1990 e. (HM)

Li ser şikê

Francis Bacon

Di nav teyran de şevşevik çi be, şika di navbera ramanan de jî ew e; herdu jî di şeva belek de difirin. Girtina şikên me yên li bin çewsandinan, qet nebe bêgav di bin çav de bidine dîtin, ji ber ku serê me şelo dike, windakirina riya hevalên me vedike, karê me serûbino dike û ji rêçê xwe derdixînin.

Qiralan ber bi stemkariyê, mêran ber bi çavtengiyê, kesên zana ber bi lolijînan û bêşik diajo ramanên reş...

Kêmaniyêke serê me heye, ne yê dilê me, ji ber ku, wek ku me di wekoka me ya qiralê Înglîstanê Henry de jî dîtîbû, di afirandinên herî mêrxas de jî serên xwe nîşan didin. Ji Henryê VII. yê şikdar, mirovekî jê pehlewantir bila tune be. Mirovên bi vî awayî afirîne, zirarê şikê nikare degme lêbîkeve, ji ber ku yên wilo bi firehî û dûrûdirêjî diponijin, li ser mijarekê ta ku sedemeke mafdar nebînin xwe ji pê şikan bernadin. Di kesên afirînên tirsonek de jî, gelek bi hêsanî kok dide. Qesî kêmanî, tiştê ku mirov dike şikê, qet nîn e; ji ber vê jî, divê em şikê bi karên zanistiyên xwe zêdekirinê ve têk bibin, ne bi herdem di nav xwe de gerandinê ve.

Ma mirov çi dixwaze? Ma kesên ku dide xebitandin an jî yên ku bi hev re dixebitin, mîna kesên pîr (ewliya) dizane? Ma ew nizane ku wan jî dê binêhêrin xirxwebaziyên xwe û berî her tiştî jî wê ji bo xwe bixebitin? Ji ber vê jî, ji bo rakirina şikên me, riya herî baş, mîna ku van şikana rastînî bûne karên xwe



berdewam kirin, mîna ku çewtbûyinê jî dizgîn kirine. Wekî ku şikên me rast bûne, divê em li ber tetikbûnê ji şikên xwe kêr bînin, încax divê ji vê jî zirarê nebînin. Şikên ku di hundirê mirov da ji xwe bi xwe dizên, vizînî, vizîkê dihîne bîrê, lêbelê bi saya kesên din yên ku dikevin hundirê me, yên ku bi saya riyên nerastîni xwedî dibin û şikên ku bi kurtepistan, bi piste-pistan dihêne hişyarkirin, gelek zêde giyan dişewitîne. Bi rastî jî, kesên ku dikevin daristanên şikên wisan, ji bo ku riya xwe bibînin, kesandin tiştên herî baş kesê ku pê şikê, bi vekirî peyivîne. Bi vî hawayî him mirov hundirê rastiyê, ji yê berê baştir hîn dibe û him jî hişyarkirina tevgerên şikê, ên li hember xwe ne, ji vî şuftir parastina xwe bi dest dixîne. Lê hema, li kesên ku bi pespayeyî afirîne, ev rêça nayê tetbîqkirin, ji ber ku, heger wan carek ji xwe şikê ketin bihîstin tune ne, tu zema-

nekî din diliyê nîşanî nadin. “Sospetto licentina fede”⁽¹⁾ dibêjin Îtaliyan, say ku şikê ji serê xwe bawerî dehf kirî ye. Ew ku, bi rastî jî, ji bo ku xwe mafdar derîne, divête bawerî kiş bikira.

(1) “Şik baweriyê dehf dike”.

Li ser tolê

Herçiqaş afirîna mirov gelek xwar û nêzîktirîn tolgirtinê bibe jî, ji ber bûyina dadekî hevûyînê, diviyabû tiştên ku zagonan ji binî ve rakisandin û bihavêtabû; çêbûna bêmafîya yekemîn, derketina li hemberî zagonan e, tolxwestina vê bêmafîtiyê girtin jî, zagon wek tunebû hejmartine. Kesê ku tola xwe digire wek dijminê xwe dibe, ew ku xoş bibîne û derbaz bibe dê ji dijminê xwe rewşbilindtir bibe, ji ber ku bexişandina xwerûyî mirovên mezin e. Li gorî zanîna min Silêman jî wilo dibêje: “Çewtîyek bexişandin ji şanê mirovî ye.” (1) Yê ku bûye, carek din nikare bê guhartin, ji ber vê yekê jî kesên zana încax dikarin bi niha û dahatî ve mijûl bibin, yên ku dibuhurî de çî bûye çî nebûye ve mijûl dibin jî, mîna kesên ku wextên xwe ji zewq, yan huner, yan jî ji ber tiştên ku mîna van in jî korîtiyê dike; nexwe, çima biqehirim kesê ku xwe ji min bêhtir hez dike? Bi rasteqînî jî, kesê ku ji ber kotîbûna meyayê xwe neçetiyê dike, ji bo ku ji destê wî tiştêkî din nayê, mîna sincekî sturiyê ku xwe dixurîne û tê de diçe xwarê, ye. Cinsê tolê, ya ku wê herî xoş bê dîtin, ew jî gava ku zagonan nekariya bi ferisandinekî ve girêdidin, ew tol e; belam di rewşeke bi vî hawayî de kesê ku tolê digire jî, divê gelek bizanibe ku ji riyeke ku zagon nikaribin bi ceza bikin, vî karî kiriye; heger nîn e, dê dijmin ji xwe dîsan bilindtir, him jî vê carê du qet bilindtir bibe. Gava ku hin kes dixwazin tolê bigirin, dixwazin yên ku li hemberî xwe ye bi rewşa berê ve agahdar bibe. Yên wilo kesên seglawî ne, ji ber ku dixwazin yê ku li hemberî xwe ne ji zirarek dayinê hê pirtir, dixwazin wî poşman kirin bidin. Lêbelê hin komikên nizamjar, pinî û kesên durû mîna tîrê ku di tariyê de difire, wek hev in. Dûkê Florenseyê Cosimo, van tevgerên wan, yên ku me bîr dikin an jî wilo dibêje: “Di pirtûkan de ji we re bexişandin dijminên we hatiye gotin, belam dostên xwe bexişandin li tu derekê nehatiye nivîsandin.” Hezretî Eyûp jî bi dengêkî hê çermê dipeyîve:” Gava tiştên

baş yê n ku bi destê Yezdan tên dayin dihawînin, ma tiştên nebaş em dê negirin Kesê ku di serê xwe de herdem avakirina tolgirtina xwe çêdike, dê birînên xwe neber bi xweşbûnê ve, lê belê tişteki vekirî ku dê bêhtir ber bi harbûna xwe biçê. To la ku li pêş raya gelemperî tê girtin, bi piranî mîna yê Caesar, yê Pirtûnaks, mîn: qralê Frensayê Hendiyê. Û mirina hê gelek yê n din dikare tola bi xêr be. Hema d tolên xasî de rewş diguhere; belê, mirovên kîndar mîna cadiyan dijîn: Ji ber kotî bûnên xwe dawiyên xwe jî kotî dibin.

(1) Pirtûka Pirozwer Pirsgirêkên Silêman XIX, 11

(2) "Û Şeytan ji ber Yezdan derket, û ji paniya ling ta bi serî bi kunêrên kotî li Eyup xist. Û Eyup j xwe re perçeyek dîzik girt ku pê qezenc bike; û di nav ariyê de rûniştîyî bûbû. Û ji jina xwe re got: Ma tu hêj kemaliya xwe kîp pêdigirî? Nalet li Yezdan bike jî bimirî. Û ji jina xwe re got: Mîna yekî ji jinên ço pik dibêji. Çawan? Ma Yezdan baştiyê nepejirîne jî, nebaştiyê nepejirîne?" (Pirtûka Pirozwer Eyup II. 7-11)

Li ser mirinê

Tirsa mirovan ya ji mirinê, dişibe tirs zarokên mîna ku bi tirs dikevin derek tarî; çawan ku çîrok tirsîna zarokan ya xwezayî pirtir dikin, mirina mirov j wilo zêde dibe. Ramanêke xwedêyetyê ye û bêşik pîrozwer e, gava ku mirin be ramberî gunehan û ji bo derbasbûyina dinyayeke din bê hesibandin. Lê belê, çawan be ji ber bûyina dê ne ku xwezayî û pê hewceyî bûnê, ji dê tirsîn sergêjîti ye Bi tevî vê jî, carna baweriyên kor û quretî jî tevli ramanên olî dibe. Wek pirtûkêr ku keşîşan di nav de çîle nivîsandine, gava sertiliyê mirovekî tê çewsandin ango îşkence dibîne çawan ku şewitîna canên xwe diponije, tê gotin, ji hevvebûn û belavbûna vî laşî, li hêşa mirina bedên payekî derdixîne; ew ku gelek zeman mirin, j hêşa beşên organên me hindiktin êş dide, ji ber ku endamên (organên B. Ş.) bedên nê me yê n herî girîng, yê n ku êşên herî pirtir dibihîzin, nîn in. Fîlozefekî bêkes tele, mirovê zana, yê ku wek mirovekî xwezayî dipeyîve, çî xweş gotiye: "Pomp: mortis magis terret, quam mors Îpsa." Tiştên wek nalîn, xwe bi xwe xistin, rûyek çilmisîn, kesên nêzik yê n ku digirîn û niştîn, mirinê tirsehêztir nîşanî dide. Divî pintê ku ji ber çav neyê revandin, ji bo ku mirinê têk bibe hesaka ku di dilê mirov de ye bêhêz nîn e; ji ber vê yekê ji bo ku serê qezenc bike, li paş xwe ewqas nixtêr peseran hebe, ji bo mirov mirin, dijminê ku jê bê tirsîn nîn e. Tol, mirinê têk di

be; evîn piçûk dibîne; serbilindî bîr tîne; xemgînî ber bi bez ve diçe; tirs ji berê de dipejirîne; ser da jî li gorî ku me di dîrokê de xwendîye, ji paş kuştina giyanê xwe împeretor Ortho, gelek kesên ku bi mîrzayê xwe ve girêdayî hevûdu bûn, ber bi mirinê biriye; ji ber hesta dilovaniyê, ya ku ji hestan ya herî teniktir e. Erê, dibe ku mirin ji ber bêzarîti angoyê dilzaritîyêkê bê hesret kirin, dibêje Seneca: "Cogita quam diu eadem feceris; mori velle non tantum fortis, aum miser sed etiam fastidiosus potest." (2) Heger mirovek egît angoyê bêdilgeş nebe jî, ji bo bêzaritîya tiştê ku herdem dike jî dikaribe bixwaze û bimire. Nêzîkîbûna mirinê, di rihên kamil de çêkirina guhertîneke gelek hindik jî, tiştê ku neyê bîrjîyanî kirin nîn e; ji ber rihên wisan ta bîstekên dawîn eynî radiwestin. Bi silavekê dimire Augustus: "Livia conjugui nostrimemor, vivi et vale." (3) Tiberîus, di nav durûtîya xwe de dimire, wek Tacîtus jî gotibû: "Jam Tieberium vires et corpus, non dîssimulatîon." (4) Vesparsîannus, li ser kursiyê xwe yê rûniştok, bi henekkirinê dimire: "Ut puto Deu fîos." (5) Golba jî, "Feri, si ex re sit populi Romanî," (6) dibêje û hustiyê xwe dirêjî mirinê dike. Gava bi hemû xortaniya xwe ve dixebitîya Septîmus, li ser kar dimire. "Adeste, si quid mihi restat agendum." (7) Gelek zêde ne wekokên wekî wî. Bêşik, Stoavanan jî gelek pir qîymet didan mirinê; bi amadekariyên zor mezin, wê ji bûyîna xwe bêhtir, wek tişekî hê tîrsehêztir nîşan didan. Kesê digot: "Oui finene vitae extremun inter ponat nature" (8) hê rintir dibêje. Mirin jî wek zayînê tişeteki bi xwezayî ye; ji bo zarê hê nûh bûye, zayîn jî qesî mirinê êş dide. Gava kesê ku di nav kêrîtîya xwe da dixwaze xwe nîşan bide û dimire, wek kesê ku di lecê de birîn dibe û ji ber germbûna birîna xwe êşê nabihîze, mîna hev in; ji ber vê yekê jî mirovê birîndar, ê ku xwe ji bo karekî baş gorî kiriye, ji tîrsê dûr dibe. Ji min bawer bikin, kilamên herî şêrîn, mirovê ku bi armancê xwe yê mezin ên ku di dilê xwe de ne, gava gihîşte hêviyên xwe, "Nun dimittis" (9) e. Wekî din, vekirina deriyên navûdengî yê mezin, zuwakirina koka çavnebariyê jî tiştê mexsusî mirinê ye: "Extinctus amabitur îdem." (10)

Wergera ji almanî û tirkî: Beyhanî Şahîn

(1) "Şemeteyên ku li dorberê mirinê tên kirin, bi xwe ji mirinê tîrsehêztir e/ erjengtir e." Ji nameya Seneca yê ji Lucilliusî re(2). "Tu bifikirî carek, tu bizanibî tu eynî tiştî dikî û radiwestî; mirinê tenê kesê

mêrxas angu jî bêkamran nîn e, kesê bêzar jî dixwaze.” Seneca, name 77.

(3) Livia, tev jiyana me di omirdirêjîya xwe de ji bîr neke, bimîni di xêr û xweşiyê de.” Suetonius, Augustus, 99.

(4) Giyanê Tiberius ji bedenê xwe derketibû, lêbelê durûtiyê xwe derneketibû.” Tacitus, Annales, V 50. Tiberius, ji paş Augustus Caesar PZ. di navbera salên 14-37 de împeratoriya Romêkiribû.

(5) “Herhal dibim Xwedê. “Suetonius, Vespasianus, Vespasianus 23, PZ. di navbera salên 70-79’an d împeratoriya Romê kiribû.

(6) Heger dê ji bo gelê Romayê xêr be, lêbixe. “Suetonius, Galba, Galba 20. Ji paş Neron bi alîkariy dewlemendiya xwe ve împeretor bû. PZ. di sala 68’an de li kolanekê hate kuştin.

(7) “Lez bikin, heger karên din yê ku ez bikim û li paş mane (bînim B. Ş). “Dio Cassius, LXXVI, Septimus, PZ. di navbera salên 193-211’an de împeretore Romê bû. Ji bo vemirandina serhildanê, gava ber t Brîtanya Mezin ve dihate, li Yorkê miribû.

(8) Şabaşekî xwezayî ye; dawîya jiyanê ye. “ Juvenalius. Satires, X357.

(9) Êdî niha min berde Xwedayê min.... Binêre: Pirtûka Pîrozwer Luka 11, 29.

(10) “ Dê kes piştî mirinê bi evîne bê biranîn. Horatius, Name 11, 1, 14.

Francis Bacon (1561-1626), nivîskar û essayistê **ingilîz e**. Hinek ji berhemên wî yê navdar e in; "Pêşketina zanyariyê", "Zanatiyê yê berê", "Xwenûkirina mezin", "Organuma nû", "Sylv. Sylvarum an jî dîroka xwezayî", û hwd.

Murathan Mungan: "Edebiyata kurdî bi kurdî dibe"

Baran Fundermann

Hüseyin Kalkan

– *Tu xwe merivekî çawa dibînî û dikani xwe çawa tarîf bikî?*

– Ez xwe çawa tarîf dikim? Wek şair û nivîskar, wek hunermend, ji ber ku têkiliya min bi hin hunerên din re jî heye, yanî wek hunermendekî total-global, ez dixwazim bi perspektîv û ruhekî wiha, bi nêzîkbûneke wiha bijîm. Ne tenê tiştên min nivîsîne, her wiha tiştên min dîtine û hatine serên min jî ez wan wek perçakî jiyana xwe dihesibînim. Yanî ez dixebetim ku ji jiyana xwe jiyaneke bê kêmasî, bê çewtî û bê guneh derxînim. Bêyî vê, helbet min beşeke jiyana xwe ya muhîm di riya çareserkirina huwîyeta xwe de, huwîyeta xwe ya şexsî û di riya kamilkirina xwe de buhurand. Welhasil, min xwest ku ez xwediyê sekneke saxlem bim, rastgo bim, kanibim tazî rawestim û ji tiştên ku ez jê bawer im û diparêzim tawîzê nedim, yanî bi kurtayî ez dixwazim vana bi cîh bînim. Ez dixebetim ku însanekî baş ji xwe çêbikim.

– *Ji destpêka sobbeta me û heta nuha te tim qala çar kulturên kir...*

– Em qala hemû kulturên ku Osmanîyan ji me re hiştine bikin wê rasttir be. Bavê min durreyek î(melezekî) ereb û kurd e; diya min durreyeke boşnak û tirk e. Ez wek însanekî ji van herdu durreyan(melezan) çê bûme, têkiliyên xwe yê kulturî bi hawakî îndîrek tam nabînim. Çimkî kulturên ez ne xwediyê wan im jî di eynî wextê de min pîr alaquadar dikin. Mesela bi min re Elewîti tune, lê ez çavê xwe jê re nagrim. Bi taybetî bi kultura Elewîtiyê ez pîr mijûl dibim û ez vê kulturê pîr girîng jî dibînim. Li gel vê jî, mesela piyesa min a pêşî ji urf û adetên Yêzîdîyan bi rê dikeve; *Mahmûd û Yezîda*.



Marathan Mungan

Min li ser Sebatiyan romanek nivîsand, ku di tarîxeke pirr kevn de li herêma Heranê medeniyeteke pirr muhîm ava kirine. Vana kurdên ku secdeyî serên jêkirî yên însanan dibûn. Vana him ji Xiristiyanîyê ekola vaftîz a Yahya hebandine û him jî ji Enedolê hin dînen din hebandine. Û him jî di wexteke ku Herran Heran bûye, yanî medeniyeteke dema îbatedgehên spî. Yanî ya rast ez girîngiya merivantiyên genetîk û yên xwînê zêde mezin nakim. Bi qasî ku muhîm e, heta dera ku heye ez pê re me. Lê ya jê wêdetir çavgirtina ji dunya mayin re ye. Ji ber ku îro em li planeta dunyayê dijîn. Her tiştê em diparêzin û baweriya xwe pê tînin em mecbûr in ku wan bi dîtin û zanîneke planetî biparêzin. Ger ne wiha be emê di cografîyêke teng de, di nav sînorên axake teng de mahkûm bimînin. Divê li alîkî em him ev axa ku em li ser rawestiyane grîng bibînin û li alî din jî ji wir kanibin

zimanekî ku ji hemû dunyayê re gotinekê dibêje, wê ferhengeke wiha, perspektîfeke wiha û wê felsefê ava bikin.

– *Esas tiştê ku me dixwest bipirsiya bi tevayî te bersîva wê da. Lê dîsa jî em meraq dikin, gelo tesîra kîjan kulturê hîn zêde li te bûye?*

– Heger pirsra we tesîra li min be, ezê nikanibim bersîveke konkret bidim. Lê ezê kanibim tişteki wiha bibêjim: Ez girîngiyeke mezin didim kultura Mezopotamyayê û wek şexs jî ez xwe warisê vê kulturê dihesibînim. Tiştên ez dinivîsînim helbet ji kultura vê coğrafyayê ne, temayên şairiya min, malzemeyên ku pêwîstiyên dîtînen min in, hemû ji vir in. Û ez tim dibêjim; rast e, sebebê ku *Şîn* metneke hewqas saxlem e girêdayî van tiştan e. Lê li alî din jî heger min felsefe nexwendiba dibe ku min *Pezkûwî* û *Yên Nahletî Bûne* nenivîsandina. Wê gavê jî ezê bibûma antropologekî basît, etnologekî basît, merivekî basîtê ku nikane ji malzemeyeke civakî qumaşekî hunerî derxe. Fîlmên em lê temaşe dikin, muzîka em lê guhdarî dikin û hemû kitêbên em dixwînin helbet tesîrê li me dikin û feydeyekê digihînin me. Malzemeyeke bi vî rengî, him bi şiklê xwe yê xam û him jî bi şiklê çêkirî wesfên cihê û qîmetên cihê nîşan dide. Heger hûn bibêjin tesîr, qada tesîr li min kiriye pirr fire ye. Ji xwe ji ber vê ye ku ez tesîrên unîwersal, qîmetên unîwersal dicivînim. Lê ev coğrafya ku divê meriv lê xwedî derkeve hewce ye ku bi dunyayê bê nasandin, ji dunyayê re bê pêşkêşkirin. Ji bo nûnertiya vê kulturê min xwe mecbûr hîs kir.

Mesela li Mezopotamyayê, li Rojhilat wext çawa derbas dibe? Dibe ku ev yek derdê hunermendekî din be jî, lê tiştên ez dinivîsînim ji maneya wextê gelekî muhîmtir in. Urf û adetên wir, merasîm û tradîsyonên wir, maddeyên wir, hemû îdeolojiyên dizî û eşkere, welhasil vana hemû ancax dikane ji alî yekî ji wir bînin sandin; helbet yekî ku wan deran baş nas dike û baş dizane. Ev merheleyeke du alî ye, tu tim ji kîjan alî ve lê mêze dikî, ew muhîm e. Mesela em bibêjin ku di çîrokeke dujminatîyê de xwîn rijyaye. Sê kes dikanin ji perspektîvên cihê li vê meselê binêrin. Dibe ku di nivîsandina yekî de tu kanibî musbetîyekê bibînî û di ya yê din de jî tenê malzemeyeke enteresant a etnolojîk. Di vir de tiştê esas muhîm, divê tu kanibî ji vê malzemeya xwe him ji bo wê herême, wê axê, wê coğrafyê, wî welatî û him jî ji bo hemû însaniyetê çîrokeke esasî derxî. Gotineke esasî bînî meydanê.

Ji ber vê yekê jî ez dibêjim ku divê meriv malzemeyên jê feyde girtiye û qada ku

tesîr li meriv kiriye hinekî ji hev cuda bike.

– *Rola Mezopotamyayê ya lîser însaniyetê ji alî tarîxnas û hemû însanan ve tê qe bûlîkirin. Gelo vê Mezopotamyayê tiştê ji alî edebî ve dikeve ser milê wê bi cî aniyê ya na?*

– Na. Yanî gava ez bibêjim çêbûye wê çi bê guhertin? Esas divê li ser sebebên va na hemuyan bi dûr û dirêjayî bête rawestan. Ez wiha bibêjim: Ji alîkî ve kultur Xiristîyanîyê û ya Îslamiyetê ji hev cihê ne. Meseleyek ev e. Lê ji aliyekî din ve j piştî ku Xerbê dîreksiyona dunyayê, dîreksiyona erebê otomobîlê girt destê xwe dîtina xwe ya etno-merkezî, (merkez-Xerb) bi cî kir û bi pîvanên Xerbê li hemî dunyayê nêrî. Yanî Xerba etno-merkezî, hemû herêmên li derî xwe mahkûm kir Li derî xwe hişt. Û ev merhele îro jî hîn berdeyam e. Ji ber vê yekê jî di piyês min ya bi navê "Şînê" de antî-tezeke pîrr ciddî heye. Yanî min tiştên mexsûsî Roj hilat û malzemeyên ku li forma Xerbê nayên bi hev re, di eynî wextê de bi kar anî.

Me hin firsendên tarîxî wenda kirin. Me wek Rojhilat wenda kir. Tiştê îro bê kirin ev e: Divê em kanibin hunermendên mezin, yên ku kanibin di nabeyna tarîx hemû însaniyetê û malzeme û dîtina herême de sentezên baş peyda bikin, derxînin. Di vê maneyê de ez baweriyê bi ekolan naynim. Yanî dema ekolan qediya, e dem hat girtin. Êdî dunyayên ku ji macerayên hîn ferdî û ji gotina peyvên hîn fi reh re musaît in dikanin bêne avakirin. Şêla meriv girîng e. Ne rast e meriv oryan talîzmê bifroşe Xerbê...

– *Te got frotina oryantalîzmê ya Xerbê...*

– Li ser Rojhilat fikreke Xerbê heye, dîtineke wê, wîzyoneke wê di der heqê Roj hilat de heye. Perspektîfêke wê ya oryantalîzmê heye. Ev perspektîv etno-merkez ye. Yanî wek etnografîk Xerbê merkeza dunyayê dihesibîne. Hin nivîskarên Rojhi lat bi fikra ku ewê xweş bête dîtîn, ewê cazîp bête dîtîn, ewê enteresant bête dîtîn radibin nizanîm çend kevçiyên textî, sihêrbaziya basît, çend satil û hin ûnsûrê wiha folklorîk derdixin pêş û dixawazzin van tiştan şîrîn nîşan bidin. Feqîriyê j wiha difroşe. Kulturê jî wiha difroşe. Lê esas ev malzeme hemû ancax bi felsefeyê kê, bi dîtinekê, bi rawestandinekê, bi avakirina dunyayekê dikane mumkûn bibe Û li vir armaanc ne xwe şîrînnîşandana bi Xerbê ye, kamiliya hunermend bi xw ye.

– *Ji bo dema civatên sanayî derketine ortê, dibêjin peryoda edebiyatê ya zêrîn. M*

di dema me de edebiyatê hêza xwe wenda kiriye gelo?

– Ev yek girêdayî dîtina me ye, ku em ji peryodên zêrîn çî fahm dikin. Hin dem hene ku di wan deman de bayê pîrr sert tê, guve guv û hîbe hîba wî tesîrê li gelek mirovan dike. Mesela di hereketa 68'an de kara(gezenc) herî mezin, bi ya min muzîka rockê ye. Grûbên rockê yên ku di maneyeke unîwersal de gotinên mezin gotin, wê demê derketin ortê. Tesîrên demên tarîxî yên bi vî rengî helbet hene. Ji ber ku îdfal muşterek in. Di dema pêşveçûna burjuwazî de jî daxwaza dunyake nuh, daxwaza xuluqandina dunyake nuh hin hunermend derxistine. Helbet înkarkirina vê ne mumkûn e. Vana pêlên civakî yên gelemperî ne. Ez nabêjim vana qediyane. Bes ez dibêjim em di demeke pîrr kaotîk (tevlîhev) de dijîn. Ev dem wê sakin bibe. Anuha, mesela ez ne bi wan kesan re me ku dibêjin sosyalîzm bi temamî mirî ye. Bi lêgerîna rîyeke sisiyan sosyalîzm ewê heyfa xwe ji vê sîstema kapîtalîst bi hawakî fecî bigre. Ketina sosyalîzmê ya vî halî ji kapîtalîzmê bêtir sûcê marksîstên ortodoks e, yên ku di sosyalîzmê de jî wek merivên dîndar dijiyan û pêşketina sanayiyê nedidîtin. Mesela ji ber fetîşekirina îndusturîyalîzmê, sosyalîzmê hesasiyeteke ekolojîk qet nîşan neda. Piştî ku hêzên kesk, ya jî hêzên hawîrdor derketin piyasê û şûn ve sosyalîst mecbûr man ku li ser zirarên îndusturîyê bifikirin. Ji ber ku min ji bo hemû dunyayê dîtineke unîwersal, nêrîneke wiha peyda nekir ez zeif ketim. Gelşek heye, gelşeke umûmî ye. Ez bawer dikim wê guherandin bibe. Ne ku her tişt wê wek berê bibe, di wê maneyê de nabêjim. Ez dibêjim sosyalîzm wê bi pekînekê derbasî planeke din be, di pilaneke din de vana hemû ewê maneyên nuh, dîmenên (boyût) nuh bigrin.

Divê mirov bi çavekî nuh li hunerê dema me binêre. Ya din, em bibêjin ku yekî rabû di salên 1990'î de sedî sed tam wek Balzak roman nivîsî, qet qîmeteke wê tune ye ku. Yanî divê meriv bi şiklên vê demê, bi gotinên vê demê li dunyayê binêre. Tiştê ez red dikim ne têkoşîna sinifî ye, nêrîna çewt e. Bi kitêbên referensê yên ayidî sedsala 18'an û 19'an meriv nikane li mucadela sinifî ya îro mêze bike. Yanî di vê demê de, nuha em çî dikin?

– *Ma her edîb bi berhema xwe şahidê dema xwe ye?*

– Ez bi xwe bi şablon û klîşeyên nafikirim. Dibêjin belkî şablon û klîşeyên wiha jiyanê îzah dikin. Ji ber ku ez baweriyê bi van şablon û klîşeyan naynim lema jî ezê ji vê pîrsa we re hema nebêjim erê, ya na. Xwediyên dîtinên wiha şaş dimînin

gava hin însan ne li gor wan bin. Esas di îzahên wiha de ez tesîra kapîtaaltîzmê ye: seqet a parkirina kar dibînim. Yanî merivek ya alim e, ya romancî ye; ya şair e, yê jî nizanim çî ye. Gava ev tişt bigihîje dereca fetîşîzekirina pisporîyê(ekspertîyê), bime wer tê ku hin gotin hunerê tînin zimên û hunermend jî dunyayê îzah dike. Numûne: Şahidê dema xwe...Yanî pîvana vê çî ye? Çaxa ez dibêjim sientkarek ferdî ye, qesta min hinekî jî ev e. Huner têkiliya di navbera umûmî (gelemperî) û qismî de hercar ji nuh ve datîne. Yanî ew tiştê ku em pîr umûmî dihesibînin, dixwaze bike cûzî û tiştê pîr cûzî jî dixwaze bike umûmî.

Ev demeke dûr û dirêje ku tişteke ji min tê pirsîn: ” Ma tu’yê li ser vê rewşa îro tişteke nenivîstî?” Nizanim hewqas hedîse dibin û hwd. Ez ji wan re viya dibêjim. Ez dicivînim. Nuha ez ne kovareke aktuel a hefteyî me. Yanî do li Dêrsimê çenc kes mirine, li Mêrdînê çî bûye, ez ne di wê telaşê de me ku hema ji vana çirokar derxim. Gava derxînim jî dixwazim tişteke baş derxînim. Ji ber ku têkiliya wext û huner gelekî muhîm e. Lema jî ji bo hunermend wext huner e. Esas derdê her hunermendekî, bi zanîn ya jî bi nezanî bi wextê re heye. Di berhemên, di nivîsên hunermendên ku vî karî hîn bi zanîn dikin, diguherînin zanîne, wext wek bûyereke pîr baş derdikeve hember me. Ez viya dikim: Ez Tîrkiya 1990’î bi dunya 1990’î re digihînim têma û ûnsûrên dunya xwe ya esasî. Ev jî di kirinên min de xuya dibe. Çimkî ez nikanim kitêba kesên ku jiyane wan ne ya min e binivîstînim. Ez nikanim li ser meseleyên ku ez jê ne bawer im ya jî jê fahm nakim û pê nizanim, binivîsim. Ji ber vê yekê jî însanên dibin obyektên rexneyên min bêtir ji der û dorê ku têkiliya min bi wan re heye. Lema jî hedefa rexneyên min tim bi alî çep de ye. Çimkî ez derdê xwe û însanên ku em tim bi hev re ne, destên me di hev de ne û dixwazim bi wan re mil bidim mil, tînim zimên; dinivîstînim.

– *Ma şair însanekî normal e?*

– Bi ya min divê meriv gotina normal û anormal ji nuh ve şirove bike. Mesela ez naxwazim di warê îdeolojîk de zû bi zû gotina normal bi kar bînim. Çimkî gava hûn gotina normal bi kar tînin, bivê nevē hûn bi zimanê xwe îktîdarekê tesîs dikin. Gotina normal mefhûmeke pîr tahlûke ye. Lê belê ez ne li gel im ku meriv viya bi şikleke pîr xusûsî, wek statuyeye hiyaraşîk tarîf bike. Esas şair û hunermendên ku di nav însanên din de veşarî mane divê derkevin ortê. Yanî civatê serê hemû însanan kirye qafîk(qutîka gula, saksi), gelek kesên ku bi rastî dikanin bibir

hunermend, civatê hisên wan kor kiriye, tehayula(îmgeya) wan mifte lê xistiye. Ez ji wan kesa me ku jiyânê ne wek necarekî, lê wek zîvkirekî diborînim. Ez tim li gel pîvanên nazik im. Helbet tiştê ez kirme şair ji ber ku ez pirr tiştan hês dikim. Ya jî ez wiha bibêjim: Em bibêjin ku diya me herduyan jî bimre, em'ê pirr pê biêşin. Heta aletek hebe, kanibe êşê bipîve, dibe ku êşa me herduyan jî bi qasî hev be. Lê ez vê êşê hîn baştir îfade dikim. Ev nîşan nade ku tu bê hês î, ya jî êş tesîrê li te nake. Vana numûneyên qebe ne, ji bo ku derdê xwe bidim fahm kirin dibêjim. Tiştên wiha hinekî jî girêdayî ku em li hisên xwe çuqasî xwedî derdikevin. Piştî sê êşên evîne, min dikanîbû hundurê xwe bikola û evên ji jiyana xwe derxista. Li gel her tiştî min deriyê xwe ji evîne re vekirî hîşt. Yanî hegerdi jîna te de şîr tunebe ji xwe tu ne şair î. Tu nikane bibe jî. Di jiyânê de divê tu şairê hundurê xwe feda nekî. Ji ber ku gelek kes qîmeta şairê hundurê xwe nizane, bi gotina we, ya jî li gor pîrsa we, dibin merivên normal.

– *Bi ya te meriv dikane şairiyê fêr bibe?*

– Mêze! şairî û nivîskarî ne hunerek e. Çimkî xusûsiyetên huneran yê esasî meriv dikane fêr bike û fêr bibe. Dikanin dewr bibin. Yanî hoste fêrî şagirtê xwe dike. Navê viya zenaet e. Civata Rojhilat hîn bêtir civateke zenaetkar e. Nexşa fêr dike, hetadiyê (kalîgrafiyê) fêr dike. Ez viya ji bo vê dibêjim: Belkî bilandîneke (meşxûliyeteke); bilandîneke ku meriv ji yê din cihê dike. Lê belê tişteki ku qabîliyetê, lênerîne û pêşdebirîne dixwaze. Lema jî ji bo ku hûn kanibin zewqa xwe, zewqa xwe ya baş, şêla xwe ya şairiyê kirîtik bikin, divê bi hawakî ciddî hûn xwe perwerde bikin. Ji ber du sebebên: Yek, li welatê we û li dunyayê şair çi dikin? Dudu, her ku hûn bixwînin hûnê bibînin ku gelek tiştê we digot belkî nuh e, hûnê pê hay bibin ku di esase xwe de ne nuh e. Tiştê nuhîtiyê li we zêde dike tenê yektatiya we ya şexsî ye. Yanî di şairiya xwe de, di nivîskariya xwe de ez li pê çi me? Bi maneya zenaet ez li pê viya me: Ez li pê wê yekê me ku bila şopa tiliya min û nivîsa min yekta bin; bê emsal bin. Ev yek jî gava hûn kanibin di teoriyên hunerê de, di nezariyên huner de xwe bi pêş xî, çavkaniyên ku hûn xida xwe jê digrin hîn dewlemend bikin, mumkûn e. Em bibêjin ku hûnê şîreke gelêrî binivîsînin, di 1990'î de, tu maneyeke nivîsandina şîra gelêrê tuneye ku. Ya jî hûn gazelê dinivîsînin... divê hûn tişteki pirr taybetî bikin.. Divê hûn ji hemû tradîsyonê tiştê ku ji bo we danîziliye derxin ortê. Ji ber vê jî, divê şair jî, nivîskar jî bi hawakî ciddî bixwîne û xwe

perwerde bike. Bi viya meriv nabe şair ew tişteki din e.

– *Ece Ayhan dibêje "jê êşê nebîne nikane bibe şair." Divê meriv hinekî jî xwe tevî şî'rê ke...*

Ez nabêjim divê meriv êşê bikşîne. Ez tim dibêjim, ez hertim li pey pîvanên narîn im. Hin kesên pîrr kişandine, van êşên xwe wek parsekan li ser rebenêyê ava dikin. Esas gava êş dadinizile esîlzadetiyeke (necîbiyekê) digre. Qerekerêki unîwersaldigre. Mesela xusûsiyeta forma tragediyê ya herî mezin ew e ku êşên însan yên herî unîwersal rafîne dike (diparzinîne). Kesê hunermend divê muheqeq atolyeke rafînekirinê be. Divê ew hîs û daxwazên xwe, tiştên fêr dibe û difikire gişan bişîne wê atolyeyê, li wir wan ji hev derxe. Ez vekirîbûnê qest dikim. Yanî bi êşa xwe, bi hisên xwe divê meriv vekirî be. Bîska berê numûna evîne min ji bo wê dabû. Em ji hisên xwe, ji fikrên xwe, ji serpêhatiyên xwe û ji xwenidina xwe tişteki nuh dixuliqînin. Bi ya min xusûsiyeta nivîskar ya esasî di hunerê destê wî de ye; em di fabrîqê de çênakin. Yanî ez tişteki bi destê xwe çêdikim. Bi gotineke din, di dikana min de ji wiya yek tenê heye. Bes li vir tahlûkyek heye; (ku ez li ba gelek şair û nivîskarî viya pîrr dibînim) piştî demekê dibin texlîdê xwe. Yên min bi xwe wek şair ,wek nivîskar ji salên destpêkê de ye sozeke min bi min re heye: Tişteki ku min pîrr baş çêkiribe ezê zêde nakim. Piştî *Sixtiyan* min yek Sixtiyanekî din jî nenivîsand. Piştî *Şîne* min Şîneke din dernexist. Lê kemîna hostetiyeke wiha jî heye...

– *Te got "evîn." Li pey wê tavilê îxanet hat. Evîn û îxanet?*

– Weleh min bîst kitêb nivîsandine, lê min dîsa jî neqedand. Nuha di nav çend deqîqeyan de îzahkirina wê pîrr zahmet e. Yanî ez evînê jî, îxanetê jî yek ebatî (dîmensîon, boyut) nabînim. Di maneya qîmetên(nirxên) însanî de. Ez li gel im ku dilê însan biwêribe hemû hîsan bihewîne. Ji alîkî de ez bi cesûriya dilê xwe re me. Lê yekcarna têkiliya îxanetê bi salan re heye. Salên em tê de ne. Netîce ji berê de vana nuxtayên pîrr esasî ne. Vana temayên Yûnana antîk, yên Yûnana kevn in jî. Di her qirnî, di her civatên cihê cihê de, li gor her însanî şiklên çawa digrin bira bigrin, lê divê meriv dîsa li ser wan raweste. Ez jî li ser navê xwe viya dikim. Dixwaze bila evîn be ya jî îxanet be, hemû deriyên dilê min (li gel hemû tiştên fêr bûye û dizane) ji wan re tim vekirine. Ji bo ku ew me bikin însan. Di vê de tesîra tecrûbeyên min jî pîrr e.

Gotinên straneke ku ez pîrr jê hez dikim vê yekê hewqas sade, hewqas xweş, hewqas beraq îfade dikin ku. Kitêbeke min heye, ez dixwazim di dawiya 96'an de derxim; metnên biçûk in, carna wek şîrê ye, carna wek çîrokê ye, carna jî raste rast wek metneke dûz e. Navê kitêbê "Evîn" e. Ezê gotinên wê sitranê bigrim rûpela pêşî. "Evîn li ser kaxetê nayê nivîsandin."

– *Tu ji gotina nostaljiyê xîyê dikî. Gava me qala dema borî kir, me dît ku tu dema borî û îro bi hawakî dîyalektîk bi hev ve girê didî. Esas do û îro di nav hev de ne...*

– Hemû wext di nav hev de ne.

– *Hûn zêdetir mîtolojîk û destanwarî dinivîstînin...*

– Na. Tenê kitêbên ku min ew tê de tecrûbe kirine cihê ne. Dibe ku dilê min hîn di îklîma destanê de dijî lê, ez çî binivîstînim binivîstînim ji bo min tim tişteki ku ez di konseptê wê kitêbê de çêdikim heye. Wek numûne, *Meseleyên Lalan, Çîrokên Cengê* di vê maneyê de kitêbên bira ne. Yanî kitêbên ji yek xwînê, ji yek ruhê ne. Lê em bibêjin *Stenbola Dawî û Pêşîya Çiyayê Qaf* qet jî ne wiha ne. Netîce di *Çiyayê Qaf* de ez formê çîrokê jî bi kar bînim, tê de hin beşên bi şîklê çîrokê hatibin nivîsandin jî hebin, ji bo min kitêb bi xwe hertim wek bajarekî cihê ye. Tu rîyan cihê bi cî dikî, parkan cihê bi cî dikî. Ez ji lêgerîn û eksprîmentan (tecrûbeyan) hez dikim. Tim bi eynî şîklî nanivîstînim. Ji ber vê yekê jî kitêbeke min nivîskariya min îzah nake. Lê her kitêbeke min temayên min û derdên min eşkere dike. Yanî dibe ku hûn li kitêbeke min binêrin lê nikanibin di der heqê kitêbeke min a din de bibin xwedî fikir. Mesela hûnê *Metalê* têxin ku derê?

– *Di tevgera kurdî de romantîzîm kêma e, ya jî dibêjin ku qet tune ye. Wek tevgera 68'an, hewake wê ya romantîk tune ye. Ma hûn jî wiha his dikin?*

– Nuha dibe ku hûn viya ji min baştir zanibin. Ez pîrr ne di nav de me. Lê dîsa jî bawer nakim ku ewê pîrr cihê be. Ez nikanim bibêjim di dil û jîna hewqas keç û lawên ku di vê xortaniya xwe de derdikevin serê çiyê, ewê şîrek tune be. Ewê neheqî be. Tevgereke ku her roj hewqas şehîd bide ez nikanim jê re bibêjim ew ji bin de ne poetîk û romantîk e. Lê ew şîr û romantîzma ku hûn qal dikin êdî li ru dera dunyayê tune ye. Em di demeke wiha de dijîn ku hisên me bêtir rasyonel bûye, ferdîyet ketiye pêşîya kîtlewîtiyê. Bi vê manê jî ji xwe qet naşibin hev. Xusûsiyeteke tirkan a wiha heye; tevgerên tirk dest navêjin tişteki ku di esasê xwe de dikane li her dera dunyayê bête parastin. Tu ji kîjan alî ve lê mêze dikî mêze bike, ji hundur

û ji der ve kemîneke milîyetçî heye. Ev bi hawakî di tebîeta wan de heye. Çimk dereng mane.

– *Hûn dizanin kurd ji mecbûrî ketine şerekî, ku esas ne li gor vê serdemê ye, yan dema wî hatiye girtin...*

– Erê erê. Mucadela ku divê di destpêka vê sedsalê de bida nuha dide. Ji xwe j ber vê ez diqherim.

– *Lê li alî din, ma heta meriv nebe milî, dikane bigihîje unîwersaliyê?*

– Nuha mêze kin, di vî warî de hûn negihîştine tirênê...

– *Di şoreşê de ciyê edebiyatê çiyê?*

– Qet ciyekî wê, qîmeteke wê jî tune ye, gava hûn wiha lê binêrin. Ev serê sedsa la ye ku edebiyat jahriya xwe dirjîne. Gava hûn wiha lê binêrin, carê berî her tişt edebiyat sinetekî tenêtiyê ye. Feyda edebiyatê ne ji gelan re, lê ji însanan re heye Alîkariya wê nagihîje kitleyan, digihîje yeko yeko însanan. Çimkî meriv kitêbek bi tenê dixwîne. Divê em hemû mefhûm û terman bişon. Ji ber ku marksîzma or todoks ev mefhûm û term hemû qîlêrî kirine. Li vir, berê divê em ji hev pak bi bin. Hin kes carna dibêjin, "min ş'ira te fahm kir, fahm nekir." Te jiyana fahm ne kiriye, te birayê xwe, mêrê xwe, jina xwe fahm nekiriye, ma tu'yê çawa min fahm bikî ku? Piştî ku di jayanê de te hewqas tişt fahm nekiribin, ji bo çi tu'yê mir fahm bikî? Yanî fahmkirin prosesekê ye. Gava mijar sinaet giş bin, divê her dawiyê em xwînsar bin. Çimkî tixtorê dikeve emeliyatê, hemû aletan bi nazikî û tîtiziya cêrahekî dixebitîne. Ez tim dibêjim zîvkir, qala karên narîn dikim. Tiştê wiha karên narîn in. Karên wiha narîn ne ew kar in ku dema tu çuyî qahwexanî tu'yê kanibî wan hel bikî. Yek, divê di jiyana te de hebe, ya jî divê hin deriyên jiyana te ji fahmkirin, hilanîn û tesîrgirtina wan re vekirî bin. Merivekî wek êzîngekî Turk be jî, kurd be jî, nizamî çî be jî nîhayet jiyana xwe wek êzîngekî borandiye Huner nikane zêde alîkariya merivekî wiha bike. Huner ne tiştêkî yekalî ye, ne nuxteyêke ku tenê diçe. Têkiliya wê bi bêaramiya te ya di jiyana de heye. Bi daxwaza te ya fêrbûnê ve girêdayî ye. Carê edebiyat mesela hezkirinê ye. Di vê meselê de divê em li hev bikin. Edebiyat karekî ku ji bo zewqê bide meriv tê çêkirin.

Esas bersîva "em dereng man man, ma em çî bikin?" heye. Ez dixwazim wiya bi bêjim. Mesela ez tiştêkî dikim, pîrr hindik kes jê fahm dike. Gava min di rojname Welatê Azad (Özgür Ülke) de dinivîsand, di meseleyên kultur û hunerê de ez pîr

sakin bûm, şêla ku bi temamî rafineyê mewzuyên kultur û huner tim tercîha min bû. Piştî ku ez di rojnama Welatê Azad de dinivîsînim, ji xwe şêleke min, tercîheke min heye. Baş e ez viya ji bo çi dikim? Ji ber ku hewcedariya kurdan nuha bi ronensanê heye. Ji ber ku hewcedariya wan bi însanê ronakbîr heye. Wexta şer sekinê ewê çi bê kirin? Yanî qadeke, tiştêkî ku divê însan li ser bipeyive, bifikire hebe. Ev şer bi şiklekî ewê raweste. Heta qiyametê dom neke. Roja sekinê divê di sepetê de pembo hebe. Yanî di prosesa vî şerî de tiştê ku herf bêtir hewcedariya kurdan pê heye, divê ew li qîmet û normên navnetewî xwedî derkevin. Bi vê riyê ewê him kanibin li hember îthama "mîlîyetçîtiyê" derkevin û him jî tevgera xwe ji meylên mîlîyetçîtiyê rizgar bikin.

– *Te got tu li dijî cereyanan(ekolan) î. Te got di her warê huner û edebiyatê de ronensans. Ma Tirkiye ji viya derket? Û ya din ji gelo ronensans dikane di nav sînorên wêlatekî de bê girtin?*

– Gava min got ronensans, ne şerte ku ewê şopekê li dû xwe bihêlê. Min ew bi şiklekî hîn mutewazî, di maneya zanîne de got. Zanîn û fikirandina li ser xwe. Nuha tiştêkî wiha heye, ez viya wek meyleke tahlûke dibînim. Ewê bête gotin ev tiştêkî demî ye, ewê were fahmkirin, ev dem jî wê derbas be, rast e lê tûnin nuxteyêke wiha ku tu namîne bibêjin karbondîyoksît jî kurdan keşif kiriye. Divê wiha nebe. Dema meriv kultura xwe da nasandin divê meriv têkiliyê (afdiyeyê) bi rengegî formule neke. Ev şêleke xwe parastina prîmîtîv e.

– *Ma edîbê kurd qet tê bîra te? Şair, ramancî, nivîskar, çiroknivîs...*

– Hatina bîra min ne mesele ye. Edebiyata kurdî tiştêkî ku bi kurdî dibe. Tu'yê bi kurdî bikî ku bibe edebiyata kurdî. Ne xwe, nizanim kurdê mezin ê bi Tirkî dinivîsîne ya jî yê bi eslê xwe kurd e, hûn çi dibêjin bibêjin,- ez ji serfikirina gotina 'bi eslê xwe kurd e' hez nakim. Ji ber ku kurdan wek grûbeke laletayin a etnîk nîşan dide- hene. Lê vana ji kultur û edebiyata tirkî re xizmet kirine, tu bixwazî nexwazî ev karê wan bûye perçeyekî edebiyata tirkî. Ji Yaşar Kemal, Ahamed Arîf heta bi Cemal Süreya; bijmêrî heta tu dikanî bijmêre...

– *Melayê Cizîrî heye, Ehmedê Xanî heye...*

– Ez hebûn û hertim parastina van navan fahm dikim. Lê Ehmedê Xanî di maneya hemdemîyê de, heger yê xwendevan ne pisporê wî be, lezetekê nade xwendevanekî roja îro. Ew şairê sedsala 16'a ye. Hertim çûyin û hatina li dor navê çar şa-

iran nikane bibe pîvana dewlemendya kultura kurdî. Mêze mesela min ev nivîsand; kurd çima muzîka rockê çênakin? Li gor tirkî, kurdî bêtir nêzîkî muzîka rockê ye. Yanî hezar û pêncsed rê hene ku meriv dikane bi demê re, bi nixrên unîwersal re li hev bike. Yanî hema tu hîn wek sedsala 16'an, wek Ehmedê Xanî binivîstî-nî wê çi bibe ku? Gava ez dibêjim zanîn qesta min hinekî jî ev e.

– *Li Tirkîyê edîbê ku tesîr li te kiribe heye gelo?*

– Çavkaniyên tesîr li min kirine fireh in. Gava ez bersîvê didim pirsên wiha ez tim çivan didim xwe. Ne ku ez ditirsim, esas ji ber ku ez naxwazim li hember wîjdanê xwe neheqiyê li kesî bikim. Gelek hunermendî, gelek şairî tesîr li min kirine. Lê ev heye; mesela pênc sal berê ez pîrr di bin tesîra yekî de manî, lê dûre min ew qet nexwendiyê. Vana tiştên wihane ku li gor sal û zemên pîrr tîn guhertin. Şairê ku di hijde saliya xwe de ez sebê dîn dibûm, nuha qet nazxwînim. Wê demê gelek tesîra wan li min bûye, feydeya wan gihîştîye min. Ya jî di wan salan de yekî ku qet kêfa min jê re nedihat, gava bûme sîh salî min gotiye haa, ez nuha fahm dikim, ez nuha lezetekê jê digrim. Yanî ev meseleyeke merheleyê ye. Mesela klasîkên dunyayê jî wiha ne, ez nikanim wan jî bijmêrin. Ez ji Dostoyevskî pîrr hez dikim, lê hisekî wiha bi min re çêdibe, dibêjim gelo ez li filankesî neheqiyê nekim. Min berê jî got, ez pîrr di bin tesîra kulturên vê coxrafayê de mame. □

Özgür Politika 25-26 Sibat 1996

Wergera ji tirkî: Zinarê Xamo

Murathan Mungan di sala 1955'an de ji malbateke mêrdînî li Stembolê hatiye dinyayê. Ew çêrok, şîr, gotinên stranan, piyes, lîstikên radyoyê, senaryoyên fîlm, gotar û hwd. dinivîstine. Murathan Munganê ku di nivîsên xwe de gelek motîvên mîtolojiya kurdî jî bi kar tîne, îro yek ji nivîskarên Tirkîyeyê yê aktuel û bijarte ye.

Ji wan re bibêje bila min nekujin

Juan Rulfo

"Ji wan re bibêje bila min nekujin, Justîno! De, here bi wan re bipeyive. Ji bo Xwedê, here ji wan re bibêje."

"Çênabe, zabitek heye hîç naxwaze di derheqa te de tişteki bibi-hîze."

"Çi dibe, wî li ber xe. Serê xwe bixebitîne; ji wan re bibêje, ku wan têra xwe ez tirsandime. De, ez rice dikim, here carekê bi wan re bipeyive."

"Tu niyeta wan a ku ew bixwazin te bitirsînin tuneye. Wan biryara kuştina te dane. Ê ez ji te re bibêjim, ez naxwazim careke din jî herim wir."

"Çi dibe, careke din jî here, belkî tu bikaribî tişteki bikî."

"Na, çênabe, ez nikanim herim. Ger ez vê carê jî herim, ew ê ji sedî sed fêhm bikin ku ez lawê te me. Ger ez wilo bi ser wan de herim û ew fêhm bikin ez lawê te me, ew ê min jî bikujin. Ya baş ew e em her tiştî bispêrin Xwedê."

"Guh bide min Justîno, qet nebe bila hebekî gunehê wan bi min were; tu vê ji wan re bibêje bes e."

Justîno diranên xwe qiriçandin û serê xwe vir de û wê de hejand.

"Ji bo dîtina albay ji zêbit destûrê bixwaze. Ji albay re bibêje ku



Resim: Kermis Oliver

ez çiqasî kal û bêkêr bûme. Ma ew ê bi kuştina min çî têkeve destên wî. Bivê nevwê wê hebekî dilê wî nerm bibe. Jê re bibêje ku ew ji kuştina min bigere, ew ê ruhê wî jî azad bibe."

Justîno ji ser qûçê rabû û ber bi deriyê hevşîk ve çû. Paşê li pişt xwe zîvirî:

"Baş e, ez ê herim, got. Ger ew min bikujin, wê jin û zarokên min li kuçan bimînin."

"Wê Xwedê li wan miqate be, Justîno, tu niha here û tişteki safî bike; ya herî girîng ev e."

Wan ew rohilat anîbûn wir. Roj bi qamekê bilind bûbû, lê ew hê jî bi darê ve girêdayî bû. Ew mîna li ser êgir bû, ji bo xwe jî bîr bike, demekê xwe li xewê danîbû, lê kiribû nekiribû xewa wî nehatibû. Ew birçî jî bûbû, lê xwesteka wî tenê jîyan bû. Êdî wî dizanîbû ew ê were kuştin; loma jî mîna mirovekî ku miribe, lê dîsan rabûbe, wilo xwestekeke jîyanê pê re çêbûbû.

Kê bîr dibir û aqil dikir, ku ew bûyera berî bi salan bûbû û hati-bû jibîrkin, wê dîsan derkeve ortê. Wî jî mejbûrî Don Lupe kuştibû. Bi ser de weke ku Alimanyyan jî digotin, ne ji nişkê ve. Yê ku wî kuştibû şîrkê wî, xwediyê Puerta de Piedra, Lupe Terreso bû. Digel ku Don Lupe hem xwediyê Puerta de Piedra bû, hem jî şîrkê wî bû, destûr nedabû ku ew pezê xwe biçêrîne.

Ew pêşî hêrs nebûbû, bêdeng mabû. Lê paşê, gava ziwahiyê dest pê kiribû û heywanên wî yek bi yek miribûn û digel wê jî Don Lupe destûr nedabû ew heywanên xwe biçêrîne, ew hêrs bûbû, û ji hêrsan tenê çerm û hestî mabû. Rojekê êdî hew xwe girtibû, pezê xwe di ser sêncê re bera mêrga wî dabû. Don Lupeyê ku ji bo vê yeka han gelekî hêrs bûbû, ji Juvencio Nava daxwaza durustkirina sêncê kiribû. Lê Juvencio Nava careke din sênca wî şikandibû. Ew keriye pêz yê ku berê tenê bi bêhna gîhayê dijiya, niha her tim di nava mêrgê de bû. Sênc bi rojan xerab dibû û bi şevan jî dihate durustkirin.

Juvencio Nava û Don Lupe qet nikarîbûn li hev bikirana û her-tim munaqeşe dikirin.

Dawî dawî, rojekê Don Lupe jî Juvencio re gotibû:

"Binêre Juvencio, ger careke din heywanên te têkevin mêrga min, ez ê bera wan bidim û wan bikujim."

Juvencio jî li Don Lupe vegerandibû:

"Binêre Don Lupe, tu sêncê heywanan tune ye, ew tenê karê xwe

dikin. Ger tu mêr bî tu ê bera wan bidî, hingî tu ê jî min li hembrî xwe bibînî."

Û Don Lupe paroneke min ya nûzayî kuşt.

Berî sî û pênc salan meheke adarê bû, meha nîsanê ez ji ber me kemeyan reviyam serê çîyan. Min deh çêlek diyarî dane dadmen min xaniyê xwe firot, lê ez ji xefkê nefilitîm. Piştî ku mal û hebû min ji destên min çûn, min got, wê dev ji min berdîn, tu nabê pê xapiyabûm, wan dev ji min bernedan. Ji ber vê yekê min û lav xwe li çiftlika xwe ya din, li Palo de Venado dest bi jiyaneke 1 kir. Dem buhurî û lawê min zewicî. Niha jî heşt zarokên wî her Gelek sal di ser wê bûyerê re derbas bûn, diviyabû ew bûyer nî bihata jibîrkin, lê mixabin, ew hê jî nehatiye jibîrkin.

Ez wê demê wilo bawer bûm, ku wê hemû tişt bi sed pesoyî bé girtin, Don Lupe û jina xwe du zarokên şîrmij li dû xwe hiştibû Pir tê re neçû, jina wî jî mir... Zarokên wan birin cihekî dûr, bir ba merivên wan. Êdî tu tîrsa min ji aliyê wan ve nemabû. Lê yê din hertim ez ditirsandim. Wan ez şût û rût kirim; wan her dig tin hukûmet li dûv te ye. Gava yekî biyanî bihata gund; digoti "Gelek zîlam hatine gund û li Juvencio digerin".

Hema ku min jî ev yeka han dibihîst, ez bi çîyan diketim, m xwe di bin dar û devîyan de û di şikeftan de vedişart. Ez bi rojan pel û pincaran dijiyam. Roj hebûn ez wek kûçikên har nîvê şevê nava nivînên xwe hol dibûm û diçûm serê çîyan. Hemû jiyana m wilo derbas bû. Ne tenê salek an du sal, lê hemû jiyana min di b vê saw û tîrsê de buhurî.

Rojek ji rojan ku êdî wî hew texmîn dikir wê kes bigirin ser gun wî bawer dikir êdî ew ê salên dawî yê jiyana xwe bi aramî bijî, demeke wilo de wan ji nişkê ve girtibûn ser wî. Wî digot: "Qet n be ez kal bûme, ew ê dev ji min berdîn".

Wî xwe bi hemû hêza xwe ve bi hêviyê ve girêdabû. Di vî teme

de, ji bo ew zora mirinê bibe, wî ewçend li ber xwe dabû, wî vir de û wê de bazdabû; di ser de jî gava wî ji her kesî quleke ku ew xwe tê de biparêze dixwest, di demeke ku laşê wî ji serî heta binî ziwa bûbû de, ji nişkê ve hîskirina mirinê, jê re zor dihat.

Wî jina xwe jî ji xwe veqetandibû û ji xwe bi dûr xistibû. Gava wî bihîstibû jina wî ji malê bazdaye, ew hîç li ber neketibû û lê jî negeriyabû. Ji bo ew danekeve gund, wî ji gundiyan pirsra jina xwe nekiribû, wî guh nedabû bazdana wê. Mîna wendakirina her tiştên xwe, ew ji bo wendakirina jina xwe jî bêdeng mabû. Wî niha bi tenê ji bo jiyana xwe xem dikişand, qet nebe wî nedixwest ew jiyana xwe wenda bike. Wî stûyê xwe li ber kuştinê neditewand. Na. Ji xwe piştî van hemûyan wî qet stûyê xwe neditewand.

Lê wan ew ji bo kuştinê ji Palo de Venadoyê anîbûn vir. Tew wan pêwîstiya girêdana destên wî jî nedîtibûn. Destên Juvecio Nava bi tirsra wî ve girêdayîbûn û ew bi xwe dimeşiya. Wan fêhm kiribûn ku ew ê nikaribe di vî emrî de, bi wan çimên xwe yên mîna şivan zirav ku ji tirsan diricifin, baz bide. Ji ber ku li dawiya ve riyê mirin li benda wî bû. Ew diçû mirinê. Wan ji wî re wilo gotibûn.

Wî tavilê fêhm kir. Gava wî mirin ji nêzîk ve hîs dikir, wî çavên xwe bi tirs vedikirin, ava tirs bi ser dilê wî diket û ji nişkê ve qolinçek dikete nava wî. Wî dîsan ew qolinca ku lingên wî xistibûn qeydê, serê wî revlihev kiribû, lêdana dilê wî xurt kiribû, hîs dikir. Na, wî ê stûyê xwe li ber kuştinê netewanda.

Diviyabû hê jî hêviyeke newindabûyî hebûya. Diviyabû hê jî li derinan hêviyek mabûya. Belkî jî wan xwe şaş kiribûn. Belkî jî ew ne li wî, lê li Juvecio Navayekî din digeriyân.

Ew di nava peyan de, herdu milên wî pê ve daliqayîbûn û bêdeng dimeşiya. Di vê dema sibehê de her der tarî bû, esman bêstêrk bû. Bayê sivik ku dihat ew erda hişk ya aydî riyên bi toz e ku bi bêhneke giran nixumandîbû, miz dida.

Wî di nava tarîtiyê de, bi çavên xwe yên ku bi salan re hûrik bû-

nayên ewrupî ve, mîna: Güldestadt, Hammer, Klaproth, Ch.J. Rich, Rödiger, Pott, Berezin, Sandreczki, Dittel hatin komkirin ⁽²⁾. Nivîsa li ser zaravê kurdî yê Silêmaniyê, Aleksander Chodzko yê polonî nivîsîbû ⁽³⁾. Metryalê vê nivîsê ne nivîskarî bi xwe li deverê xirvekiribû. Chodzkoyî Persya “Welatê farisan -wergêr” nas dikir, her weku em dizanin li wêderê têkiliyên wî bi kurdan re çêbûbûn, lê bi xwe ne çûbû Kurdistanê; ev metriyale ji zaravê Ahmed Xana yê kurd, ku ji Silêmaniyê bû û di salên 1853-1854’an de li Parîsê kêf dikir, hatibû girtin. Li wêderê Chodzkoyî tekst jê nivîsandin. Herweha lêkolînên wî li ser zaravê başûrê rojhilat jî, ku îro ji aliyê kurdologan ve bi zimanê kurdî tê naskirin⁽⁴⁾, bi dereceyeke pir buhadr hatin li qelem dan û cihê xwe heta roja îro jî di xebatên kurdolojîyê de girtiye.

Berperê nû di xebata kurdologên polonî de August Jabayî nivîsand. August Jaba (Jaba bi polonî weha “Zaba” dihêt nivîsandin -Wergêr) (1800-1894)⁽⁵⁾, ku carna bi çewtî bi Aleksander hatibû naskirin ⁽⁶⁾, ji binemaleka polonî ya begler, ji wîlayeta PoLcka bû û bi şekê dêrê hatibû deq kirin. Ew kurê Dominik Jabayî bû, yê ku (li dewrûbera 1765-1848) hilgirê alaya husarîskî (Husaria: hêzeke taybetî ya leşkerî ya pir baş çek kirî, ya siwar û êrişker bû. Di sedsala hevdehan de li Polonyayê hebû -wergêr)bû, xwediyê milkên Swierznoyê bû. Wî ji jina xwe Anna HoLowniankayê, ji bilî Augustî, kurine din hebûn. Ew welatparêzên polonî yên baş, efsêrên leşkerê polonî, beşdarvanên serhildana listopadê (Novemberê) û paşî penaber bûn⁽⁷⁾. Ji hemûyan bilîmmettir Napoleon Feliks Jaba (1805-1885) bû, efsêrê leşkerên polonî, xwediyê xelata Virtuti Militari (Virtuti militari: peyveke latînî ye û mebest jê gernasîya şervanî. Ev mezintirîn xelatê leşkerî yê polonî bû. Di sala 1792’an de dana vî xelatî dest pê kir û pêşkêşî wan di hate kirin yên ku di şeran de mîrxasiyên mezin û berbiçav dikirin -wergêr), beşdarvanê serhildana listopadê, paşî penaber, gerokekê navdar, çûbû gelek deveran û ji wan jî li salên 1876-1878’an giravên Sandwich, Fîjî, Australia û Zîlanda Nû, profesorê unîversîteyê li Buenos Aires, xwediyê gelek berhemên nivîskî, mîna: *Zaba’s Method of Studying Universal History...* New York 1868, *The principal featur of the history and literature of Poland*, London b.d. û hinekên din. Ew paşî li Galasyayê (Navê kevnê axa polonî ya ku hîngê li bin dagîrkirina nemsawî bû) binecih bû. Li Szczawnicy û Krynicji nivîsên xwe li ser geryanên

bûn, li erda ku di binê lingên wî de dirêj dibû, temaşe dikir. Her tiştên xwe yek bi yek li ser vê erdê wenda kiribû. Ew tam şalî li ser vê erdê jiyabû, bi destê xwe tev dabû, bi devê xwe tal kiribû. Wî demeke dirêj li erdê temaşe kir, mîna ku ew cara da be, wî dilê xwe lê rehet kir.

Paşê mîna ku ew ê tiştêkî bibêje, ew li peyayên li kêleka xwe zîrî. Wî ê ji wan daxwaza berdana xwe bikira; "Min kes neêşandi zarokno" wî ê bigota, lê belê wî dengê xwe dernexist. "Ez ê bîskî din bibêjim" wî di dilê xwe de got. Wî tenê li rûyên wan peyan hêrî û tiştêkî negot. Wextî wî di mêjiyê xwe derbas bikira ku ew wan re bûye dost, lê wî nekir. Ji ber ku ew ne tu dost most bû Wî ew nas nedikirin. Ew li kêleka hevdu dimeşyan, ji bo ku dawiya riya dûdirêj bibînin, carinan radibûn ser pozikên sol xwe, li dûr dinihêrîn û dîsa dimeşyan.

Wî cara pêşî ew li wî cihê reşîqîr mîna ku her tişt lê dişewitîn, radibûn. Wan garis ji hev belav dikirin û hesp dajotin. Wê di nêzîk de gêris bejin biavêta, ew daketibû jêr da ku vê bibêje. Lê ew nikaribû bibûya asteng.

Wî hatina wan tam di wextê de dîtibû. Ji aliyê diwextêdedîtir hertiştî de şansê wî hebû. Heta ku ew peya biçûna, ew dikaribû derketa çiyê, xwe li wir veşarta, paşê ew dîsa dikaribû daketa jêr. Digel ku zû de demsala baranê hatibû jî, lê wan hê rûyê baranê radîtibûn, garis êdî xera dibû. Ew ê di nêzîk de hişk bibûya.

Loma, hatina wî ya nava erd, li hemberî van peyan ketina wî xefkê, hemû vala bû.

Êdî ji bo ku ew nebêje, min berdî ez herim, wî bi zorê xwe digirt û bi wan peyan re dimeşiya. Wî bi tenê laşê wan didît, çavên wan nedidît. Gava ew dipeyivî, wî nizanîbû ka ew dengê wî dibilîzin an na. "Min kes neêşandiye ku" wî gotibû. Wî tenê ev gotibû. Lê tu tişt nehatibû guhertin, kesî guh nedabûyê. Tew wan li wî nenihêrîbûn. Mîna ew di xew de bimeşin, ew wilo meşiyabûn çûbûn.

"Min nekujin!"

"Wî bibin!" dengê li hundur emrê xwe dubare kir.

"Min bedêla tiştê ku min kiriye zêde jî daye, albayê min. Min cezayekî zêde kişandiye. Wan dest danîn ser her tiştên min. Wan gelek ceze dane min. Ji ber tirsê mirinê, ez çil salî mîna kotiyên ji mirovan reviyam. Min kuştina wilo heq nekiriye, albayê min. Qet nebe, bihêlin bila Xwedê cezayê min bide min. Min nekujin! Bêjin bila min nekujin!"

Ew li ber devê derî, mîna ku lêdan xwaribe, dinaliya, şewqê xwe li ba dikir, diqîriya, bang dikir.

Dengê hundur, "Piştî girêdanê, heta ku serxweş bibe pê bidin vexwarin, bila gule canê wî neêşînin," got.

Dawî dawî êdî hew dengê wî derket. Ew wilo li ber darê herikîbû erdê. Pêşî kurê wî Justino hatibû ba wî, paşê ew wenda bûbû, niha dîsa hatibû.

Justino bavê xwe li ser piştê hespê bi cih kir û ji bo ku ew nekeve, wî ew baş girêda. Ji bo kes jê netirse jî, wî kîsek kişand serê bavê xwe. Paşê wî destê xwe li hêta hespê xist û bi lez ket rê. Diviyabû ew zû bigihîştê Palo de Venado û merasima cenaze çêbikira.

Justino ji bavê xwe re, "Wê bûka te û neviyên te bêriya te bikin," digot, "gava ew rûyê te bibînin ew ê te nas nekin. Ew ê bibêjin qey kevjalan rûyê te yê ku ji gulleyan bûye mîna seradê, xwarine." □

Wergera ji swêdî: Firat Cewerî

Juan Rulfo di sala 1918'an de li Meksîkayê hatiye dinyayê. Ew îro yek ji nivîskarên Emerîka Latînî yê bijarte tete hesabandin. Ew bêtir bi pirtûka xwe ya kurteçîrokên *Deşta sincirî* (1953) û bi kurterromana xwe *Pedro Paramo* (1955) navdar e. Me ev çîroka wî ji *Deşta sincirî* wergerandiye.

Ji rûpelên nenaskirî yên rojhilatnasiya polonî ya sedsala nozdehan

Jan Reychman

Lêkolînên polonî yên ku di sedsala nozdehan de li ser zimanê kurdî ji aliyê wê zanayên polonî ve yên ku xizmet li biyanîgehê dikirin û paştî cihên giring deftera lêkolînvaniya cîhanî de li ser kultura kurdan girtine, hatine kirin, cihe taybetî di nav pêmijûlbûnên polonî de bi rojhilatê ve digirin. Tiştê balkêş ew e. her ji destpêka van lêkolînan paşnavên polonî bi berçav dikevin. Gerokê swêdî J. Björnstaahl di Briefe aus seinen ausländische Reisen (berga VI, deftera 1, Leipzig 1783, rûpel 118-120) de dibêje, ku çû seredana qeşe RafaL Zerowoniski (Zerowoniski ?), yê ku li Pragê ji binemaleke polonî jidayikbûbû û baş Kurd û zimanê wê dizanî, di dêra dominîkanan (dêreke rebenên fela ye; ya jin û mêra ye, li sedsala 1215'an ji aliyê Dominik Guzmanî ve hatibû damezrandin -wergêr) ve li Galatâ (taxeke Istambûlê). Domonîkanên Galatê wê çaxê ferhengê kurdî, ku wê demê destnivîs maye, berhev dikir. Dêra Galatê, bi rêya peywendiyên xwe bi misyonê xwe li Kurdistanê, bingehê lêkolînan bû li ser zimanê kurdî: Paştî, endamê misyonê M. Garzoni Grammatica e vocabolario della Lingua Curda (Roma 1783) çap kir, ku bêguman pêkhatibû ji wan materyalên ku Björnstaahlî behsa wan kir dibe ku zanyariyên hevwehatiyê me yê nepenî qeşe Zerowinski jî tê de hebin. Nav dominîkanan kurdnasekê di yê baş di sedsala hejdehan de derkeft, ew jî Leopold Soldini bû ⁽¹⁾.

Di destpêka sedsala nozdehan de materyalê pir bo zimanê kurdî ji aliyê z

xwe pêşkêş kirin. Li ser axa milkên xwe li Zbylitowiska Gorayê nêzikî Tarnobrzegê li 1885'an mir. Jina wî Mac Leoda ingilîz bû û ji wê kurekî wî bi navê Stanislaw hebû. Stanislaw kapîtanê leşkerên ingilîz bû û piştî mirina babê xwe bi xwediyê milkên wî li Zbylitowska Gorayê⁽⁸⁾.

August Jaba bi xwe li 1800ê an li Kraslawê ji dayik bûbû. Wî ne weku birayê xwe leşkerî hilbijart; di destpêkê de xwest biçe Institutya Komunikasyonê, lê di dawiyê de çû Institutya Rojhilatnasiyê ya ser bi Rêveberiya Peymangeha Asyeyê ya Pirsên Derve li Petersburgê. Wê çaxê gelek polonî li wan deran hebûn. Xwendina wî li 1828'an bi dawî hat û piştî wê bû wergervanê konsulata rûsî di Yafayê, Salonîk û Smîrnayê (Smîrna: navê kevnê Îzmîrê -wergêr), ku li wê derê di 1839'an hevbjariyê xwe yê gerok li rojhilatê, metranê mohilevî (Mohilev bi yareke li Rûsyasipî -wergêr), wergêrê Şekspîrî, Ignacy Holowinski naskir. Hîngê Jabayî ji erebî heft du'ayên musulmanan *Hazi-l awrak tasztamil ala-l musbat* û Dengê *derwîşî* "ji helbesta tirkî ya Nezirî" ji bo Holowinski wergerandin. Di gel deqa wê ya tirkî ji aliyê Holowinski ve, di behiskirina geryana wî de, hatin berçavkirin⁽⁹⁾. Ji sala 1849'an li Erzurumê, li rojhilata Tirkiyeyê, ku piraniyê runiştivanên wê di wê serdemê de kurd û ermenî bûn, bi karê konsulê rûsî re digel dibû.

Di dema mana Jabayî de li Erzurumê, li Rûsyayê interesa kurdolojiyê zêde bû. Destpêka kurdolojiyê vedigere bo salên çilan ji sedsala nozdehan. Di wê serdemê de zana W. Dittel ku li Rûsyayê kar dikir û paşî di destpêka salên pêncîha de zanayê rûs I. Berezin jî bala xwe da ser zimanê kurdî⁽¹⁰⁾. Lê piraniya tekstê di dest wan de bûn, ne timam bûn, çewt nivîsandîbûn, di gelek caran de ne zimanê devkî hatibûn girtin, lê ji zimanê çêkirî yê nivîskî bûn. Derfeteke nû bo civandina tekstan di şerê kirimî de (Şerê di navbera Rûsya û Tirkiyeyê de salên 1853-1856'an -Wergêr) çêbû, ji ber ku di nav êxsîrên leşkerê tirk de li Rûsyayê kurd jî hebûn. Hîngê, Iranîzan P. Lerchî (1828-1884)⁽¹¹⁾, ji zardevê wan êsîrî, hinek tekstên zimanê sax civandine ser hev. Herçend bû ew kêmbûn, lê bû egera balkişandinê di dema piştî wê de. Di Akademiya Rûsî ya Zanistanê de li ser pirsê civandina bêtir tekstan, li wan cihên ku Rûsyayê daîreyên xwe yê diplomatîk hebûn û runiştivanên kurd lê hebûn, rawestiyên. Di wê demê de akademîk B. Dornî (1805-1881) ew daxwaz gehande gelek oryentalan, ku li wa

deveran kar dikir, mîna oryentalê naskirî N. Chanykowa ku konsul bû li Tebrîzê û gelek metiryal jê bi destxistin. Her weha têkilî bi Jabayî jî re deyna û wî jî dest pê kir tekstên kurdî şandin Akademiyê. Tekstên yekem yên ku di meha deha sala 1856'an de hinartin, pêkhatibûn ji: parçeyekê ji wergera *Iskendernameya* Nizamî bo ser zimanê kurdî (rûpel 1-46) û wergera kurdî ya 224 gotinên pêşînanan yên tirkî, yên wergirtî ji gramera tirkî ya Jauberta (rûpel 47-118). Jaba şiya dostîniyê bi zanayê kurd hecî Mehmûd Bayezîdlî re bike. Hecî Mehmûd Bayezîdlî yê ku tekst bi alfebêya erebî dinivîsandin, û li aliyê çepê yê rûpelan bi alfebêya latînî transkripsiyona wan ya fonetîk, bê destnîşankirina devokan, digel wergera fransî dihatin nivîsandin. Hemî tekst bi zaravê kurmançî, zaravê kurdî yê bakûrê rojava bûn ⁽¹³⁾. Ji ber ku ew tekst ji aliyê kurdekî ve, ku baş ziman dizanî, hatibûn nivîsandin, Komisyona Akademiya Zanistan ew bi awayekî buhadar hilsengandin û herçende ew werger bûn ji tirkî û farisî, lê nivîskar, tê de, tûştî mubalexeyê nebûbû ⁽¹⁴⁾.

Di 05.06.1857'an de, di civîna beşa dîrokî-filolojî ya Akademiya Zanistan de, P. Lerchî pirsra weşandina wan tekstan anî pêş. Wî tirsra xwe ji awayê transkripsiyona Jabayî ya ne cihgirtî berçav kir û got ku dê li ser daxwaza Akademiyê wan tekstan biweşîne, lê mafê hindê jî da xwe ku li gor "transkripsiyona lingvîstîk" ya Lepsîusî guhertinan di transkripsiyonê de bike ⁽¹⁵⁾. Ji wan tekstan Lerchî parçeyek ji *Iskendernameyê* û 25 gotinên pêşînanan yên tirkî, digel destnîşankirina dirêjîya tîpên dengdar (wî tîbînî nivîsî ku, Jaba wekî Chodzkoî, nikaribû wan destnîşan bike, ji ber ku di zimanên silavî de dirêjîya dengadaran nayê dîtin) Weşandin. Wî transkripsiyona Lepsîusî biakranî û her wisa wergerên xwe yên taybetî bi zimanê almanî li ser zêdekirin ⁽¹⁶⁾.

Akademiyê careke din daxwaz ji Jabayî kir ku materyalan jê re bişîne, wî jî hinek materyal civandin ser hev û hinartin. Di 24.09.1857'an de wî, bi nameyekê, Akademî li ser hindê agahdar kir ku ew, stiranên kurdî yên folklorî berhev dike û li ser çêkirina ferhengeke kurdî-fransî û fransî-kurdî kar dike û ji herduyan ya yekem amadebûbû ⁽¹⁷⁾. Di civîna liqê ya 08.01.1858'an de Lerchî rapor tek li ser berhema nivîskarê kurd yê sadsala şazdehan Ahemed Efendî Xanî, Mem û Zîna ku Jabayî kurtkirî û hinartî, pêşkêş kir. Herweha digel de perçeyeke transkripsiyona wê û wergera fransî ya wê çîroka evîndariyê, ku çîrokên

romantîk yê ji rengê wê mîna çîroka leyla û Mecnûnî li rojhilatê hene, hebû. Ew hemû 94 rûpel bûn, lê Lerch ne yê pişt rast bû ji peywendiya wê perçeyê digel originalê bi hemî ve ⁽¹⁸⁾.

Di civîna 04.05.1859'an de nameya Jabayî ya 03.03.1859'an hat xwendin. Jabayî herwisa *Recueil des et udes kourdes avec transcription du texte et traduction française* şand. Akademîk Dornî li ser hindê raportek pêşkêş kir û guhdariya pêdçûna Lerchê hat kirin û komîteyek ji bo munaqêşkirina çawatiya weşandî wan materyalan hat hilbijartin û ji van kesan pêk hatibû: Akademîk Dor. Böhrling, Wiedemann, Weliaminov-Zernov ⁽¹⁹⁾.

Di 18.05.1856'an de Komisyona Akademiya Zansitan munaqêşeya raporta komîteya liqê, ya li ser materyalên ku Jabayî hinartibûn, kir. Materyal jî ev bû: 1)pirsa *Notice sur la litterature et les tribus kourdes*, 2)kurtiya berhema Ahmed Efendî, *Mem û Zîn*, 3)ferhenga devoka Hekarî û Revendî, 4)gramera Alî Termaxî ya zaravê kurmançî, 5)têbînî li ser gramere û bingehên zanista zimanê kurmançî, 6)komeleyeke çîrokan digel wergera wan ya fransî. Komisyonê, pişt munaqêşeyan, biryara çapkirin û weşandina *Notice sur la litterature et les tribus kourdes*, *Notion preliminaires sur la science de la grammaire* û *Recueil des rec. kourdes* da. Û ji aliyê din ve biryar hat standin ku *Mem û Zînê* bihêlin, ji ber ku ew û her wekî Lerchê di nameya xwe ya 20.01.1858'an de xuyakiribû, kurtiyek berhema Ahmedê xanî ya original bû. Wan wisa zanî ku ya çêtir ew e ku ew berhem bi hemîve bihête weşandin û haya wan jê hebû ku Jabayî du nuxseyê *Mem û Zînê* yê original hebûn. Li gor dîtina komisyonê gramere Alî Termaxî ji bo weşandinê ne hind giring bû, ji ber ku materyalên di wê gramere de ferhenga Jabayî durustkirî de hatibûn bikaranîn ⁽²⁰⁾.

Di warê wan materyalên ku ji bo weşandinê hatibûn destnîşankirin de, komisyonê brier girt ku tekstên original digel wergera wan bihêne weşandin transkripsiyona wan bimîne bo wê wexta ku tê de awayê transkripsiyonkirin bihête destnîşankirin û di ferhengê de cihê xwe bigire. Û herweha brier da ku Lerch berê xwe bide wergeran û stîla wan edebîtir lê bike ⁽²¹⁾.

Komisyonê bi çavên pîrî buhadarî temaşayî wan materyalên Jabayî hinartî kir. Wan da xuyakirin ku ne weku şandekên berê bes ji wergera pêk hatibûn, materyalên original yê bi zaravê kurmançî û zanyariyên li ser jiyannameya ş

irên kurd yên ku heta wê demê nehatibûn naskirin û detalya li ser eşîran û transkripsiyona fonetîk ya tekstan (li gor rênivîsa fransî) û herweha wergerên wan yên fransî digel de hebûn. Ew materyal bi karekî pir qezencdar bo filolojî, etnografî, statistîk û dîrokê hatin binavkirin ⁽²²⁾.

Careke din amdekirina wan tekstên Jabayî, Lerchî bi dest xwe ve girt û ji wan *Recueil des notices et recits kourdes servant a la connaissance de la langue, de la litterature et des tribus du Kourdistan, reunis et traduits en français par M. Alexandre (!) Jaba, consul de Russie a Erzerum*, li St. Petersburgê di 1860'an de hatin weşandin. Li ser bergê rastê navê pirtûkê bi kurdiya bi tîpên erebî hatibû nivîsandin û navê berhevkarî jî wekû Askender Jabayî (bi tîpên erebî -wergêr) tê de cih girtibû. Ew berhema çapkirî bi 1 rubilê yan jî bi 1 talara rensî û 3 giroşan, li cem endamên komisyone li Akademiyê li Petersburgê, Rîdayê û Lipskê dihatin bidest xistin. Ew karê Jabayî zû bû cihê gelek balkêşanan û dengvedana xwe ya mezin hebû ⁽²³⁾.

Jabayî bi serê xwe *Ballade kurde recueillie et traduite par A. Jaba et communiquee par M. de Techihatcheff*, di "Journal Asiatique", hejmara pênc, berga çar-de, rûpelên 153-166'an, sala 1859'an de weşand ⁽²⁴⁾.

Her ji karê Jabayî bû ku originala farisî digel wergera kurdî ya berhema navdar ya şairê kurd yê sedsala şazdehan, mîrê Bitlîsê, Şerefeddîn Bitlîsî, *Şerefnameyê* bişîne ⁽²⁵⁾.

Jaba heta sala 1866'an ma li Erzurumê û paşî bû xanênşîn. Evca xwe ji wir veguhaste Smîrnayê, bo cem malbata jina xwe û ma li wir heta mirina xwe li sala 1894'an. Jabayî di wê hemû demê de peywendiyên xwe bi Akademiyê re qut nekirin û bi berdewamî li ser wan tekstan yên ku li Erzurumê civandibûn kar dikir û her weha tekstine din ji kurdên ku li seranserî Tirkîyeyê tera berabûyî komkirin û herwisa destnivîs jî bi dest xwe dixistin û hwd.

Di sala 1867'an de destnivîsa ferhenga xwe ya kurdî-rûsî-fransî (656 rûpel), ya ku berî niha me binavkirî, şande Akademiyê û *Dictionnaire français-russe-kurde* (721 rûpel) bi ser ve kir, û her weha 100 diyalogên kurdî digel wergera wan ya fransî dan digel. Weşandina ferhenga kurdî-rûsî-fransî xistin ûbala îranînnasê almanî F. Justî (1837-1907), yê ku hevok û term ji ferhenga fransî-rûsî-kurdî ya Jabayî û ji diyalogên wê ferhengê yên fransî-kurdî û tekstine din bi ser ve zêde

kirîn. Ew termên frazeoloji yê ku wî civandibûn hatin bikaranîn. Transkripsiyon li gor ya fransî û hevwateryên di rûsî û fransiyê de hatin li ber çav girt. Justî her weha etîmolojiya peyvan jî da digel (ne hêsan bû, vekolandina gel peyvan zehmet bû; aya ew jî farisiyê hatine qerz kirin yan jî zimanê hevberpeîranî ne yan jî bi rêya tirkîyê jî farisiyê hatine) û her weha materyalek jî wê tekstên Lerchî pêşkêşkirin hat bikaranîn. Herwisa û li hember gelek peyvan jî bo berhevdanana wan Justî hevwateryên wan yê indoewrupî, tirkî û sadeyan⁽²⁶⁾.

Ew hemî pêkve di nav weşanên Akademiyê de wekî *Dictionnaire kurde-français par M. Auguste Jaba, publiee par M. Ferdinand Justi*, li St. Petersburgê li s. 1879'an derkeft. Ev behem bû cihê balkêşiyê û buhaya xwe heta roja me ya îro heye⁽²⁷⁾. Hêjayî gotinê ye ku Justî di karên xwe yê piştî vê de wec jî materyalên Jabayî komkiribûn dît; di durustkirina *Kurdische Grammatika* (St. Petersburg 1880) xwe de feydê bingeîn jî ferhenga Jabayî û tekstine wî yê din dî ye⁽²⁸⁾.

Ji tekstên ji aliyê Mahmûd Bayezîdlî bi dest keftin, Jabayî *Ghebri et ses chansons* („Athenee Oriental”, 1881) weşand. Ew jî strana Gewrê ye, keça kurd (tirkurmançî) û serhatiya evîna wê bo Xelîl Begê, kurê Abdî paşayî, yê ku di nav rasta sedsala nozdehan de hukim li Avaşkertê dikir. Hemû hat transkripsiyon kirin û komentareke têr hat pêve kirin⁽²⁹⁾.

Li Smîrnayê peywendiyên Jabayî yê baş bi polonyayê hebûn, mîna peywendiyên wî bi niyasê wî yê rewşenbîrvan E. Znatowiczî re. Dema ku di s. 1889'an de şahê faris bi seredan hatî Varşavayê, “Tygodnik Ilustrowany” (kovara heftane ya polonî -wergêr) gelek cih da pirsên farisî û Znatowiczî li wê derê perçeyek ji *Ksiega Spiewakow (Munganniname)* (dibe ku ya durust Mu'xarname be -wergêr) ya Hafizî (Hafiz Şemsildîn Muhemed 1325-1390 şairê farisî yê mezin -wergêr) belav kir. Ew jî Jabayî gehiştibû destên wî û wî jî di wê karê de weha xuya kir; ku “teksta original digel wergera wê ya durust û ravelandinan ji niyasê min li Smîrnayê P. Antonî (!) Jabayî ku berê konsul bû li Erzurumê gehiştine min”⁽³⁰⁾. Teksta ku di wê kovarê de hatibû weşandinê teksteke edebî bû, ji aliyê Znatowiczî û li gor wergera filolojî, ya ku Jabayî jê re şandilkar li ser hatibû kirin. Weha bo me xuya dibe ku Jabayî tekst hem jî erebî û ti

kî (bo Holowinski), û hem ji farisî û kurdî wergerandine.

Opniyona polonî bi berdewamî aghdarî li ser Jabayî wekî hevvelatîyekê xwe hebûn. Piştî weşandina ferhenga kurdî ya Jabayî ji aliyê Justî ve, "Gazeta Lwowska" (rojnameyeke polonî li Lwowa -wergêr) jiyannameya wî belav kir û behsa berhemên wî û beşdariya wî di çêkirina wê ferhengê de kir û got jî ku "bi vî awayî zanayê almanî, yê ku eger kurd dîtîbin jî bes di resmên wan yên di (Illustrierte Zeitung) de di dema şerê dawîn de dîtine, wî zanayî eger ne hemû navdariya xwe, hinek jê bi xêra hevvelatîyê me çêkir. Vî hevvelatîyê ku çend salên diwar û pîrî metirsî di nav eşîrên kwîvî de derbaskirin, bona ku bo karê xwe materyalan berhev bike û herweha ew kesê yekemîn bû ku ziman û leteratura wan eşîran bi ewrupîyan da nasandin" ⁽³¹⁾. Piştî mirina wî "Kurier Warszawski" (rojnameyeke polonî -wergêr) bi kurtî li ser nivîsand û pesna wî da ⁽³²⁾.

Hêjayî gotinê ye ku dema Jaba li Erzrumê bû, opinyona polonî li mişextîgehê ew bi kesekî xerab dinasî. Ji ber ku, li gor wê, ew polonî bû û wekî karmendekî qeyserî beşdar dibû di wan kiryanan de yên ku armanc jê bi dûketin û ji Tirkiyeyê derxistina wan polonîyan bû, yên ku ji Rûsyayê reviyabûn Tirkiyeyê û li ser sinûran li Piştqefqasan, bi hêviya şerê Rûsya û Tirkiyeyê xirvebûbûn ⁽³³⁾.

August Jaba xudanê xelata leşkerî ya Legia Honorowa, xelata tirkî ya mecîdiyê û gelek xelat û mertebeyên bilind yên rûsî bû, şîrervanekê dewletî yê rastîn bû. Temenkî dirêj jiya û di 03.01.1894'an de li Smîrnayê mir. Hêştta dema li Yafayê bû, Greczynka, ku keça konsulê rûsî bû li wêderê, mare kir. Ji wê, çend kurek hebûn, ji wan Teodor, efserê rûsî yê ku xelat li ser beşdarbûna xwe di şerê Qefqasê de wergirtî. Du ji keçên wî bûn jinên rêberên miletên rojhilatê, yên ku ji wan li wê serdemê gelek wergervan û konsulên ewrupî derkeftin: Testa û d'Andria ⁽³⁴⁾.

Jabayî gelek destnivîs û berhemên rojhilatê kom kiribûn. Qeşe Ignacy Holowinski, yê ku li 1839'an çûbû seredana Jabayê ku hîngê bi karê wergervaniyê li konsulxaneyê rûsî li Smîrnayê radibû, weha li ser nivîsandibû ku, "wî komeleyeke berhemên rojhilatê yên bijare û buhadar hene. Pirtûkxaneyê wî ji bilî bergên çapkirî, ji 260 destnivîsên erebî, farisî û tirkî pêkhatiye. Hinek ji pirtûkxaneyên mîr, wezîr û paşayên rojhilatê hinek ji wan destnivîsan bi dest xwe xistine. Hemû jî bi rengekê baş hatine hilgirtin û sexbêrî jê hatiye kirin û bi nivîsên

zêrîn û nexşine din hatine xemilandin û ciwankirin” (35).

Beşeke destnivîsan, ku malê Jabayî bi xwe bûn û pêkhatibûn ji wan tekstê kurdî yê ku wî hinartibûn Akademiya Zanistan digel beşeke mezin ya destnivîsine din yê kurdî yê kevin li sala 1868’an di nav hilgirtiyên Pirtûkxane Gîştî li Petersburgê (36) (îro bi navê Saltykowa Szczdrina li Leningradê) di be destnivîsan de hatin dîtin. Li wê derê 54 destnivîsên kurdî hene, di nav wan (hem tekstên ku ji aliyê bêjerên kurd (mîna yê ku me li jor behsa wî kirî, M. mûd Bayezîdlî û herweha Mela Mûsa Hekarî, Mela Mistefa, Şêx Nezer û hwc bo Jabayî hatibûn nivîsandin hene, hem jî destnivîsên kevin yê ku Jabayî dest xwe xistibûn, mîna helbestên Ahmedê Mela Bateyî, şairê kurd yê sadsa şazdehan di destnivîseke ji sadsala hejdehan de digel wergera wan ya fransî transkripsiyona wan hene. Di nav wan de ev xebatên Jabayî hene mîna; *Exercices de langue kurde par Mella Mistefa traduits par Auguste Jaba, Dialogues en deux kurdes recueillis et traduits par A. Jaba, Vocabulaire kurde des dialectes Hekiari et Revendi par A. Jaba*. Ji bilî van di nav xebatên Jabayî yê hilgirtî de destnivîsên farisî, 3 yê tirkî û 3 yê fransî hebûn. Hinek ji hilgirtiyên di arşî beşa Lenîngradê ya Instîtuya Miletên Asya û Afrîkayê ya ser bi Akademiya Zanistan ya Sovyetê de hene (37). Ji bilî van xuyabû ku hinek ji xebatên Jabayî yê hilgirtî mabûn li Smîrnayê, li cem malbata jina wî. Li dewrûbera sala 1913’an bi xêra xebata rojhilatnasê rûsî yê navdar, bispor di pirsgirêgên îranî de, yê bala xwe bi taybetî dabû ser kurdan. M. Minorskî û bi arîkariya konsulê rûsî Smîrnayê hîngê, beşeke wan kaxezan gehişt bo nav hilgirtiyên Akademiya Zanistan li Petersburgê; beşa mayî jî ku pêkhatibû ji hinde nivîsên mîna *Dialogues kurdes-français* demeke dirêj ma di destên Minorskî de, ji nû piştî şerê cihanî yê duyemîn, ew jî gehiştin Lenîngradê (38).

Beşek ji destnivîsên rojhilatê, ji yê Jabayî bi xwe, gehiştin cihine din mîr hilgirtiyên British Museum li Londonê. Di nav wan de wekî nimûne destnivîsê ke balkêş hebû, ew jî wergera tirkî ya *Şahnameyê* ku di sadsala dehan de bo su tanê memlûkî yê Misrê Gawrî (Gavrî) hatibû çêkirin (39). Ev bi hemî ve ji zanistê re berhemke zindî ye û materyalên buhadar in ku bi renckêşan û xwehdîna hevvelatîyê me August Jabayî hatine bi dest xistin. Ew Jabayê ku bûbû se kêşê qada nû ya rojhilatnasî û kurdolojiyê, Jabayê lêkolînan û hevalê miletê j

bîrkirî, bi tenê hêlayî û gernas, miletê kurd.

Ji poloniyana ne bi tenê Aleksander Chodzko û August Jaba di sed sala nozdehan de mijûlî filolojî û folklorê kurdan ya ku heta hîngê kêma li ser hatibû xebitîn, bûbûn. Demeke kurt piştî wan polniyekî din hebû, kêma tişt naskirî û peywendiyên wî bi polinyayê hebûn, wî jî di qada lêkolînavaniyê de li ser zimanê kurdan xebat kiribû. Ew jî Leonard Zagorski bû (1827-1891) ⁽⁴⁰⁾. Di 06.12.1827'an de li Bakszynayê (li devera Rowneyê) jidayikbûbû. Li pêşiyê amadeyî li Kiyovê xwend û paşî xwendina xwe di beşa felsefeyê de li Universîteya Kiyovê bi dawî anî. Piştî wê, li pêşiyê bû kandîdat û paşî mamosta li mala Sujkowski begî (1849-1850). Paşî bû mamosta li debistanên Kiyovê yê navîn û ji 1888'an karmend di hinek karên taybetî di rêveberiya sîvil de li Qeqqasê. Ji 1876'an serokê liqa qeqqasî ya Komeleya Geografîk ya Qeyseriya Rûsî. Di dema mana xwe de li Pştqeqqasê, Zagorski gelek geryan li wê derê kirin û dest bi lêkolînavaniyê li ser ziman û etnografiya miletên Pştqeqqasê kir. Li ser wî babetî çend xebat jî, bi gelemperî di "Nûçe" û "Belavokên" Komeleya Geografîk de pêşkêş kirin. Wekû Jabayî, Zagorski jî bi xwe li Kurdistanê nebû; danûstandinên wî bi kurdan hem li Pştqeqqasê hebûn û hem jî bi kurdên wan deveran hebûn yê ku li salên 1829 û 1878'an ji wîlayetên tirkî yê rojhilatê hatibûn veqetandin û bi ser Pştqeqqasê ve zêdekirin. Herwisa danûstandinên ji wî rengî di geryana wî di sala 1872'an de bo herêma axawtsixskî çêbûn. Hîngê şiya guldariya zaravê kurdên li wan deveran xwecih bike û wî, zaravê wan bi kurmancî binav kir û behsa wan kurdan bi başî kir "Ku em temaşayî sexletên kurdan yê kirêt nekin, dostaniya wan ya baş, karektera wan ya rastgoyane û vekirî, rûniştivanên dewrûbera wan ji bo qezenca wan yekkirine" ⁽⁴¹⁾.

Xebata mezin ya Zagorski digel S. A. Egiazarovê ermenî weşandina ferhenga rûsî-kurmancî û kurmancî-rûsî bû ⁽⁴²⁾; Egiazarovî materyal civandin ser hev, lê Zagorski ji çapê re amadekirin. Wî, herweha pêşgotin ji bo wan tekstên kurmancî yê ku Egiazarovî komkiribûn nivîsî ⁽⁴³⁾. Karên bingehîn yê Zagorski, çî yê etnografîk û çî jî yê zimanvaniyê, peywendîdar in bi hemû zimanên qeqqasî ve, mîna: *Klasîfikasyona etnografîk ya miletên Qeqqasê, Li ser lêkolînan li ser zimanên dagestanî, Li ser lêkolînan zimanên çiyayiyên qeqqasî*, bi berferehî rawestiyana li ser xebatên Uslarî li ser zimanê tabasaranî yan Millerî li ser zimanê

ošetînî. Heta roja me ya îro jî wan xebatan buhaya xwe ya mezin di nav xeb-
tên qefqasolojîyê de heye (44). Ne kêmtir ji wan, di nav lêkolînên polonî de, x-
batên wî yên di warê kurdolojîyê de jî, ku di sadsala nozdehan de lêkolînvanîy
oryental ne gelek bişkivî bû, dibin cihê balkêşiyê. Her wekû xuya dibe Zagorski
peywendiyêke hêzdar bi polonyayê re hebû. Polonyên ku diçûn Tîblîsê, diçû
seredana wî û welatî ew wekû polonyekî nas dikir. Wekû mînak, di nûçeyel
de di rojnameyêke heftane ya Varşavayê de, li sala 1885'an li ser wî tê nivîsar
din, ku "di nav zîrektirîn endamên Komeleya Geografîk li Qefqasê ev hevwe-
tîne li berçav in: L. Zagorski (etnograf)..." (45).

Her wekû me gotî, ne Chodzko yê ku tekstên xwe ji zardevê kurdekî li Parîs
girtibûn, ne jî Jaba û ne Zagorski yê ku tekstên xwe li Armenstanê yan Qefqa-
civandibûn, bi xwe li Kurdistanê bûn.

Hîngê hinek polonyên din gehîştine wêderê. Herçende ew mijûlî zimar
kurdî nebûbûn, lê bi rêya bikaranîna zimanê resmî yê hîngê ku tirkî bû û li
wecdîtîne ji xizmetên wergervanan, wan bala xwe da ser kurdan û agahdariyên
balkêş li ser wan hiştin. Em, li vir, behsa herdu birayan, Jablonowskiyan dikir
Wladyslaw (1841-1894) ku pizîşk bû, çend salekan li Bexdayê ma û di salên ep-
demiyê de li Kurdistanê bû. Di sala 1870'an de birayê wî Aleksander (1829-1931)
ku dîrokvan bû û bi rojhilatê ve mijûl dibû çû seredana wî; herduyan têbîniyê
balkêş li ser kurdan û jiyana wan nivîsandin (46).

Di wan salan de, ji bo meremên geodesîk Karol Brzozowski (1821-1904), şai-
romantîk, serhildanvan û hîngê di sala 1869'an de endazyar di xizmeta walîy
Îraqê Medhet paşayî de, çû devera Silêmaniyê li Kurdistanê (niha li Îraqê). Ji
geryana xwe bîrhatinên baş li ser kurdan hebûn "kwîvî, şervan, pir hez ji azadi-
ya xwe dikin", şehrezahiya wan di warê dermanvaniyê de bala wî kêşa. Carekê
dema wî dixwest bi ser gupîtka çiyayê Pîr Omer Gudrun bikeve, pê wî ji kevi-
rekî tehisî û birîndarbû. Kurdan bi giyayê arnîka (Arnica Montana; giyayê
çiya û di nav keviran de şîn dibe û gulên zer jê dibişkivin. Ew giya, piştî hişkkî-
rinê, ji dermankirina birînan re tê bikaranîn -wergêr) derman kir. Giyayê ku di
pateyekî de givaştî û paşî baş di cuhniyekê navmalan de vequtayî û bi berfê r-
têkel kirî û ji payîzê ve di nav kayê de hilgirtî. Brzozowski her weha gelek çîro-
kên gelêrî li ser "ercinên çiya" jî nivîsandibûn (47). Herwisa opinyoneka baş li se

mêvandariya kurdan, lê ne yên li Kurdistanê, lê di nav eşîrên kurd yên koçer de li persya (welatê farisan -wergêr) endazyarê polonî, geolog Karol Bohdanowiczî (1864-1947), yê ku li dawîya sedsala nozdehan de li wêderê kar dikir, nivîsand. Wî behsa hindê kir ka çawa mana gerokê ingilîz J. B. Fraserî (1783-1856), yê ku hêsta di nîva yekem ya sadsala nozdehan de çûbû wêderê, ne bi dilê wan bû û ka kurd li hember wî (Karolî) û geryana wî çawabûn “diyarbû ku mirovhez in û kêfxeşîya xwe bi mirovî diînin” (48).

Rojhilatnasiya polonî ya serdemên bindestiyê ya derbiderkirî bû û ew derbiderî ji behra zansitên polonî bi giştî bû. Zanayên polonî di xizmeta biyaniyan de kar dikirin û gelek caran kar û xebatên wan bi malê biyaniyan hatin li qelem dan û hinekên din destkeftiyên polonî ji xwe re bikaranîn. F. B. Charmoy bi navê xwe wergera *Iskendernameya* Nîzamî ya fransî weşand ya ku di rastiyê de ji aliyê L. Spitznaglî ve hatibû wergerandin û heta niha wekû amadekerê wê dihat naskirin (49). Bi xêra karên Jabayî yên pêşeng di warê kurdolojiyê de, beşeke navdariyê gehiştê Lerchî û Justî (50). Lê digel hindê jî rojhilatnasiya polonî di wan merc û rewşên weha dijwar de kar dikir û wê, li ser navê xwe, kar û xebat û destkeftiyên xwe hene. Ew, şîya rêyê li ber qadên nû yên ku heta hîngê kêma xebat tê de hatibûn kirin, xweş bike û balkêşiyê bo ser qad û pêmiyûlbûnên nû yên zanistê çêbike. Ne hema tiştêkê ji nişkan ve bû, ku hema behra Jabayî bû balkişandin bo ser folklorê kurdî, bo ser tekstên bi zimanê gelêrî, bo devberdanê ji efsaneyên edebî û bo dûketinê li pey tekstên bi devok û zimanên rojane. Aleksander Chodzko, ji bilî lêkolînên wî yên li ser zarav û zimanê kurdî, babê lêkolînvaniyê bû li ser zimanê gelêrî yê farisan, Jozef Kowalski tekstên zarav û devokan û folklorê Buryatiyan civandin û Tomasz Zanayî stiranên başkirî xirvekirin (51). Xwe ew hemû li melbenda rojhilatnasiya polonî li Vîlna yan li Petersburgê hatibûn perwerdekirin. Wan cihên ku kilîmata romantîzmê bi hêzdarî kartêkiribû û wekir ku ew bi hurmetgirtin temaşayî lavjeyên deverê bikin, ku hez ji zimanê xelkê û rewîşt û tîtalên wan bikin. Ev etmofere ji Vîlnaya filomatîk (Filomat; Komelya Filomatan: komeleyeke nihînî ya ciwan û xwendekaran ya welatparêzî û komelayetî bû li Universîteya Vîlnayê li salên 1871-1823 -wergêr) perwerdeyên wê universîteyê bir Petersburgê û li wêderê hêsta rojhilatnasên romantîk yên vîlnayî, Chodzko û Spitznaglî, xwe rewşnbîr dikir û li wê-

derê pejkê wê hezdariyê xwe gehande heta wan jî yên ku bi xwe şîr nenivîs: dîn lê ew nerîna romantîk bi xwe stand. Lewma nabe, heta ew destkeftiyên j lonî yên biçûk jî di warê kurdolojiyê de bihên pişt guh havêtin, ewên ku ne bawername ne li ser berferhebûna rojhilatnasiya polonî di salên dijwarên b destiyê de, lê herwisa belge ne, li ser pêmijûlbûna poloniyên bi hebûna y hûr, yên di tariyê de hiştî, yên hêlayî, jibîrkirî, lê hîn karektera xwe ya nete ya komelgehên milletên rojhilatê ya etnîk parastî. □

Wergera ji polonî: Sidqî Hîi

Ev nivîsa Jan Reychmanî, bi polonî, di hejmara 1(69) ya kovara Przegląd Orientalistyczny ya sala 1969'an, di rûpelên 49-59'an de, li Polonyayê belav bû Sidqî Hirorî ew ji polonî wergerandiye kurdî.

Çavkanî:

1. P. Lerch, *Forschungen über die Kurden und die iranschen Nordchaldäer*, I, St. Petersburg 1857, II, di eynî cihê de li sala 1858'an jî li ser hindê nivîsî.
2. Li ser xebatên lîkolnvanîya kurdoloji, berê xwe bide Lerchî eynî ya jorîn, ji bîlî wê Ç. X. Bakay *Dîroka hînkirina zimanê kurdî li Rusya û Yekîtiya Sovyetê* di: *Kurtiyek li ser dîroka hînkirina zimanên îrî* Moskva 1962 (bi rûsî).
3. A. Chodzko, *Etudes philologiques sur la langue kurde (dialecte de Soleimanie)* "Journal Asiatique", b V, berga IX, 1857, rûpel 297-356. Li ser Chodzkoyî J Reychman, *Zainteresowania orientalistyczne w sro ku mickiewiczowskim w Wilnie i Petersburgu* di: *Szkice z dziejow polskiej orientalistyki* (I) de, Varşava 19 rûpel 8-87.
4. Binere li I. M. Oranski, *Pêşkejiyek bo nav felsefeya îranî* (bi rûsî) Moskva 1960, rûpel 314-321 (bi rû herwisa *Zimanên îranî*, 1963 (li ser zimanê kurdî û zaravên wî, rûpel 135-138) (bi rûsî), A. Socin di: *sprache der Kurden* di: W. Geiger û E. Kuhn, *Grundriss der iranschen Philologie* de, berga I, beşa 2, Strasbourg 1901, Zaravên kurdî li ser rojhilatî û rojavayî dabêş dîke. Berê xwe bide herwisa D. N. Mackenz *Kurmancî, kurdî û goranî*, "Miletên Asya û Afrîka" hejmar 1, 1963 (bi rûsî); V. Minorski, *Kurd*, Enzykpaedie des Islam, II, rûpel 1234-1235.
5. Zanyariyên biyografîk li ser wî: S. Zielinski, *Mawy słownik pionierow polskich kolonialnych i morski*

Varşava 1932, rûpel 640; J. Reychman, *Zaintresowania orientalistyczne*, her di eynî ya jorîn de, rûpel 82, 88.

6. Bi navê Aleksander Jaba wekû amadekerê tekstên kurdî yê komkîrî cih digire. Pianiya jêderên din wî bi Augustî nav dikin, her ev navê xwe xistibû ser materyalên xwe jî. Carna jî bi Antonî hatiye navkirin. Pîrî caran paşnava xwe bi fransî dinivîsand: Jaba, carna jî wekû Zaba yan Zhaba hatiye nivîsandin.

7. Binere T. *Zychlinski, Zlota księga szlachty polskiej*, berga III, Poznan 1881, rûpel 323-336 û berga IV, Pznan 1882, rûpel 428.

8. Li ser Napoleon Jabayî, S. Zielinski, *Maly słownik*, rûpel 640-641. M. Haiman, *Nauka polska w Stanach Zjednoczonych Ameryki* "Nauka Olska" berga XXI, 1936, rûpel 210; L. Paszkowski, *Polacy w Australii i Oceanii* 1790-1940, London 1962, rûpel 32 û 257 (binere li 17-19).

9. Berê xwe bide J. Reychman, *Zainteresowania*, eynî ya jorîn.

10. L. Holowinski, *Pielgrzymka do Ziemi Swietej*, Petersburg 1853, rûpel 98.

11. Ç. X. Bakayev, eynî ya jorîn.

12. P. Letch, *Forschungen über die Kurden*, eynî ya jorîn, berga 1-2.

13. P. Lerch eynî ya jorîn, II, rûpel 46, "Bulletin de la Classe des Sciences Historiques, Philologiques et Politiques de l'Academie des Sciences" (St. Petersbourg) berga XIV, hejmar 22, rûpel 350-352; "Melanges Asiatiques" berga III, rûpel 109-113. Berê xwe bide li ser destnivîsên rêbinî û wergerên Jabayî di nav hilgirtiyên Pirtûkxaneyê Hukûmî ya Lenîngradê ya Giştî ya bi navê Szczdrina: M. B. Rudenko, *li ser destnivîsên hilgirtiyên Lenîngradê*, Moskva 1961, rûpel 18 û 29 (bi rûsî). Navê berhema A. Jauberta ya ku Jabayî wec jê dîtî *Elements de la grammaire turque*, binere Lerch, I, 93-97.

14. P. Lerch eynî ya jorîn, I, rûpel XXVIII, berê xwe bide "Bulletin", eynî ya jorîn, berga XIV rûpel 350; "Melanges Asiatiques" berga II, rûpel 647.

15. "Bulletin" berga XIV, rûpel 350-352.

16. Lerch, II, Rûpel 46 û yê piştî wê.

17. Lerch, II, rûpel 80.

18. *Resume de l'ouvrage kourde d'Ahmed Efendi Khani fait et traduit par A. Jaba*, "Bulletin" berga XV, rûpel 347. Herweha binere li *Jaba's resume du Mem ou Zin* di: H. Makas, *Kurdische Texte im Kurmanji Dialecte aus der Gegend von Mardin*, Leningrad 1926. Destnivîsên Jabayî binere li Rudenko, rûpel 48-51. Dastana Ahmedê Xanî, Mem û Zîn ji aliyê M. B. Rudenko ve, *Ahmed Xanî, Mem û Zîn*, Moskva 1962, di zîncîra şûnwarên leteratura miletên Rohîlatê de ku ji aliyê Akademiya Zanistan ya Yekîtiya Sovyetê ve dihatin weşandin, hat belavkirin.

19. "Bulletin", berga XV, rûpel 254-255, Jaba, *Recueil*, binere li ya jêrîn, Pêşgotin.

20. Berê xwe bide ya jorîn, Paşko 12, herweha berê xwe bide "Bulletin" berga XIV, rûpel 349 û berga XV, rûpel 161; "Melanges Asiatiques" berga III, rûpel 109-113, 242-255. Li ser desnivîs gramera Alî Tere-maxî, Rudenko, eynî ya jorîn, rûpel 101-102.

21. Jaba, *Recueil*, Pêşgotin, "Bulletin" berga XVI, rûpel 299-300.

22. Jaba, *Recueil*, Pêşgotin.

23. Socin eynî ya jorîn, rûpel 250-253, 254, herweha berê xwe bide *Bibliografya kurdolojiyê*, redaktor: K. Kurdoyev,, Moskva 1963 , rûpel 139 (bi rûsî); Bakayev, rûpel 104-105 (bi rûsî); V. Minorski, *Kurde Enzyklopaedie des Islam*, berga II, rûpel 1234-1235.

24. P. Lerch, di: *Sur une ballade kurde publiee dans le "Journal Asiatique"*, "Melanges Asiatiques" ber IV, pirtûka I, rûpel 25-62 de behsa weşana jabayî dike.

25. Paşî, ducaran teksta farisî li Rusyayê hat weşandin: *Scheref-Name ou histoire de Kourdes par Sche. prince de Bitlis*, wşana 1-2 V. Veliamianif Zernof, St. Petersburg 1860-62, û *Cheref-Name ou fastes de la nation kourdes par Cherefou'oddine prince de par Cherefou'oddine prince de Biddlis...*, trad. du persan et c. mente par F. B. Charmoy, 2 beş (di 4 bergan de), St. Petersburg 1868-1875, nusxeyek di Pirtûkxaneyâ K tedraya Turkolojiyê de li Unuversîteya Varşavayê ye.

26. Jaba, *Dctionnaire*, Pêşgotin; A. Jaba, *Name ji redaktorî re*, "Qefqas", hejmar 8, Tibilis 12.1.1879, n pel 3 (li ser xebata ferhengê) (bi rûsî).

27. berê xwe bide Socin, eynî ya jorîn, rûpel 254; ZDMG XXXVIII, rûpel 110-116. V. Minorski, eynî y jorîn, rûpel 105.

28. Socin, eynî ya jorîn.

29. Originala lavjeya Gewrê û Xelîl Begê digel wergera destnivîsê ya ku Jabayî çêkirî, îro di nav hilgirt yên Leningradê de ne, berê xwe bide Rudenko, eynî ya jorîn, rûpel 9; lê wê di listeya weşanan de di "A hennee Oriente" de navê wê destnivîsê neaniye, herweha navê wê di *Bibliografya kudoloji* de jî nehatiy eynî ya jorîn.

30. E. Znatowicz, *Ksiega Spiwakow*, "Tygodnik Ilustrowany" hejmar 336, 1889, li wir Jaba bi Antonî d hêt navkirin.

31. "Gazeta Lwowska" hejmar 164, 18.VII.1879. Min ev têbînî ji W. Olszewiczî ji Lvova bidest xist.

32. "Kurier Warszawski" hejmar 24, I, 1894.

33. W. Chrzanowski, *Pisma wojskowo-polityczne*, Krakow 1871.

34. Zychlinski, eynî ya jorîn.

35. I. Holowinski, *Pielgrzymka*, rûpel 98.

36. *Raporta Pirtûkxaneyâ Giştî ya Impiratorî* ya sala 1868'an, St. Petersburg 1869 (bi rûsî).

37. M. B. Rudenko, *li ser destnivîsên kurdî...*; *Hilgirtiyên rojhilatanîyê li mezintirîn pirtûkxaneyâ Yekît ya Sovyetê*, Moskva 1961; M. B. Rudenko, *Koleksiyona A. D. Jaba (Destnivîsên kurdî)*, "Xebatên Pirtûkxaneyâ Giştî ya Hukûmî ya bi navê M. E. Saltîkova-Şedrînî, Berhemên li ser rojhilatê", Leningrad 1957. . tekstên ku Jabayî civandibûn M. Rudenko ev weşandin: Mela Mehmûd Bayezîdlî, *Rewîşt û titalên ku. dan*, Moskva 1963 (di wergera rûsî de) û Xaris Bidîsî, *Leyla û Mecnûn* (tekst, werger û bilêvkirina filolo ya tirkî), Moskva 1965.

38. Zanyarî ji profesor V. Minorski di nameyekê de bo niviskarekî ji Cambridge di 18.III.1964'an de.

39. Ch. Rieu, *Catalogue of the Turkish Manuscript of the British Museum*, London 1888, rûpel 152-15 (li ser berhemên Jabayî civandin, rûpel VIII), A. Zajaczkowski, *Turecka wersja Sha-name z Egiptu Mamuckiego*, Varşava 1965.

40. Berê xwe bide "Belavoka Komeleya Geografik ya Impratoriya Rûsî, liqa Qefqasê" hejmar I, berga X, 1889-91; "Iberya" hejmara 89, 1891; "Hilsengandina NÛ" hejmar 2525; "Hilişkafinên etnografik" pirtûk 2, rûpel 150 (bi rûsî).
41. Raportêke kurt li ser geryanê li devera axawtsixstki, "Belavoka liqa Qefqasê", berga II, 1873 (birûsî).
42. "Belavoka Komeleya Geografik ya Rûsî, liqa Qefqasê" pirtûka 13, berga II, 1891, rûpel 1-122 (bi rûsî).
43. Eynî cihî.
44. Her li ser wî berê xwe bide J. Raychman, *Ze stosunkow literackich polsko-grudzinskih w XIX w.*, "Przeład Humanisryczny" hejmar 3(24), 1961.
45. "Tygodnik Ilustrowany" berga V, hejmar 121, 1885, rûpel IV.
46. A. Jablonowski, Pisma, berga VII: *Wschod muzulmanski*, Varşava; W. Jablonowski, *Pamietnik*, Wroclaw w 1965.
47. J. Raychman, Karola *Brzozowskiego wejście w r. 1869 na Pir Omar Gudrun*, "Wierchy" 1963.
48. "Belavoka Komeleya Geografik ya Rûsî" 1888.
49. Ez di nivisa bi navê *Ludwik Spitznagel jako tlomacz Nizamiiego* "Przeład Humanisryczny" hejmara 4, sala 1964'an de li ser vî babetî rawestiyame.
50. Bakayev jî di pîrsa li jor navbirî de li ser xebatên kurdoloyiyê, Lerchî wekû *Rexueil de Notices et Recits Kourdes* bi nav dike.
51. J. Reychman, *Piosenka baszkirska zapisana na wygnaniu przez Tomasz Zana*, "Rocznik Orientalisryczny" berga XXII, 2, 1958, rûpel 47.

Sartre li ser Sartre

Michel Contat

MICHEL CONTAT: *Ev serê salekê ye di derheqa siheta te de gotinên erîni neyînî têne kirin. Tu vê mehê dikevî heftê saliya xwe. Niha Sartre, tu dikê bibêjî, tu çawa yî?*

JEAN-PAUL SARTRE: Ez ê nikaribim bibêjim ku ez baş im, lê ez ne xerim im jî. Ji du salan vir ve ye ez bi siheta xwe re mijûl im. Bi taybetî jî çîmên mi ku ez zêdeyî kîlometreyekê bimeşim, çîmên min diêşin û bi tevayî ez mecbûr dibim ku qîma xwe bi vê mesafeyê bînim. Jê pê ve, bêrêkûpêkbûneke girîng tansiyonên min hebûn, lê belê ew van demên dawî ji nişkê ve wenda bûn:] bi cidî gilîdarê tansiyona bilind bûm, lê niha, piştî bikaranîna dermanan hema hema ez ji yê kêm tansiyon tême hesab.

Dawî, û bi taybetî, ji pişt çavê min yê çepê -gava ez sê salî bûm û min çavê xwe yê rastê wenda kiribû û min bi tenê bi çavê xwe yê çepê didît- xwîn jê hema halîhazir, ez hê jî rengan ji hev vediqetînim, ez şewqan, rengan ji hev derdixir lê belê ez êdî tiştan û rûyê mirovan baş nikarim ji hev derxim. Ji ber vê yekê êdî ne dikarim bixwînim û ne jî binivîsînim. Ya rastî ez dikarim binivîsînim yanî ez dikarim bi destan gotinan xêz bikim, ez vê yekê hema bêje bi rêk û pêk dikarim bikim, lê belê tiştên ku ez dinivîsînim ez nabînim. Herçî xwendin e, bo min niha bêîmkan e. Ez rêzan û valahiya nava rêzan dibînim, lê ez nikarim



gotinan bixwînim. Gava ez ji xwendin û nivîsandinê bêpar bûme, faaliyetê min yê nivîskariyê jî bêfmkan bûne. Çi bigire karê min yê nivîskariyê da hatiye.

Digel vê ez hê jî dikarim bipeyivim. Loma, xebatên min yê ji niha û şûn v ger televizyon îmkanên madî peyda bike, ez ê rêzeprogrameke ku behsa hef salên vê sedsalê dike, çêbikim. Ez vê xebatê bi Simone de Beauvoir, Pierre Victor û Philippe Gavi re dimeşînim, yê wan jî fikrên ku bînin zimên hene, û pê ve nivîsên min yê ku ez bi xwe nikarim binivîsînim jî, ew ê binivîsin. We mînak, ez dipeyivim ew notan digirin, an jî em bi hev re munaqêşe dikin, pa ew tiştên ku me li ser li hev kirine, dinivîsînin. Car caran jî ez jî dinivîsînim yanî naveroka axaftinên ku wê di van weşanan de cih bigire, not digirim. I ev yeka han jî ew ji min re dixwînin.

Ev e, rewşa min ya niha ev e. Ji bilî vê, ez xwe gelekî baş hîs dikim. Ez baş r dizêm. Xebata ku min ji te re behs kir, ez bi hevalên xwe re dibim serî. Bi g mana min hişê min weke yê deh sal berê -ne zêde lê ne kêm jî- ye û min dilt nikahiya xwe eynî parastîye. Hişê min piraniya caran baş e, lê bi tenê di bîran na navan de ez zehmetiyan dikişînim, carinan jê nav qet nayên bîra min. Ti tî ku ez dizanim ew li ku ne ez wan bi kar tînim. Ez di kuçê de bi xwe û t ku zêde zehmetiyê bibînim, rîya xwe nas dikim.

– *Digel her tiştî, nikarîbûna nivîsandinê divê darbeyek be. Lê belê tu bi sukûn teke mezin behsa vê dikî...*

– Ji aliyekî ve vê yekê hemû hebûna min ji navê rakir: Ez hebûm û niha mîr ku ez tune me, ev tiştêkî wilo ye. Diviyabû ez zêde li ber vê rewşa han biket ma, lê ji ber sedemin nenas ez xwe gelekî baş hîs dikim: gava ez li tiştên mi wenda kirine difikirim, ez qet li ber nakevim, ez tu deman jî melankolî nebî me.

– *Lê hîsa serîhildanê?*

– Ma tu li bende yî ku ez li dijî kê, li dijî çi serî hildim? Di vir de tu qet tev reke *stoayî* nebîne -mîna ku tu dizanî, her çi qas sempatiya min li hemberê *sto ayiyan* hebe jî... Na, bi tenê xebat wilo bû û tiştêkî ku ez bikaribim bikim tu neye, niha jî sedemeke liberketinê tune ye. Berî bi du salan, demekê, gava ev ti

hê jî cidîtir bû, min demên zehmet buhurandin. Ez celebekî dînîtiyeke biçûk jiyam. Li Avignona ku ez û Simone de Beauvoir diçûnê, li cihekî xuyayî, li ser textekursiyeke parkekê, ez li keçeke ciwan ku civan dabû min geriyam, bi bîr tînim. Helbet li holê tu civan filan tunebû...

Niha, hemû tiştên ez dikarim bikim, ez li gorî ahenga xwe bim, ez li dora wê herim û werim, ez îmkânên xwe hesab bikim û heta ji min bê ez ji van îmkânan destkewtî bibim. Helbet ya ku min aciz dike, nedîtin e. Di vê mijarê de, doktorên ku ez bi wan şewirî me, dibêjin tişteki ku bête kirin tuneye. Ev jî mirov bêhteng dike. Ji ber ku tiştên li der û dora min diqewimin, ne her deqîqe be jî, ez carinan daxwaza nivîsandinê hîs dikim.

– *Ma tu xwe mîna ku tu bê kar û mijûlî mayî, dibînî?*

– Erê. Ez hebekî ji xwe re digirim, ji min re rojnameyan dixwînin, ez li radyoyê guhdarî dikim, carinan tiştên ku di televizyonê de derdikevin, wek xeyalan dibînim, bi rastî jî, ev hemû, faaliyetên bêkarî û bê mijûliyê ne. Di jiyandê de armanca min bi tenê nivîsandin bû. Berê tiştên ku ez li ser difikirîm min ew dinivîsandin. Ez îro jî difikirim, lê gava nivîsandin ji bo min bêîmkân bû, faaliyetê rastî ya fikrê, bi celebekî, ji navê rabû.

Ji niha pê ve, ev tiştê ku li min qedexe bûye, tiştê ku gelek ji xortên me yênan îro biçûk dibînin: Bi celebekî nivîskî raxistina fikrekê an jî rastiyeke... Di vî karê han de pêwîstî bi rastkirinê heye - rastkirinê carinan ji pênc heta şeş caran... Ez êdî nikarim nivîsên xwe carekê jî di ber çav re derbas bikim û rast bikim, ji ber ku ez nikarim bixwînim. Ji ber vê yekê, tiştên ez dinivîsînim, an jî dibêjim weke xwe dimînin. Helbet hinek tiştên ez dinivîsînim an dibêjim dikarin ji min re bixwînin û ger pêwîst be ez dikarim bidim rastkirin, lê ev yekê han mîna ku ji pênuşa min bi xwe derketibe.

– *Ma gelo tu nikarî cîhazeke ku tiştê tu difikirî û dibêjî tê de qeyd bikî bi kar bînî?*

– Ez wilo bawer dikim di navbera gotinê û nivîsandinê de ferqeke mezin heye. Tiştên mirov dinivîsîne, dikare careke din bixwîne. Lê mirov vê yekê hêdî hêdî, an jî bi celebekî zû dike; mirov nikare biryara dema gotina hevokêkê bide. Ji ber ku di wê hevokê de tiştê rûnenîştîye û baş li hev nehatiye, dibe ku di



J. P. Sartre

awira pêşî de xwe nîşan nede: ev belkî tişteki bi wê ve girêdayî ye, belkî bi ku berî wê ve tê, an jî bi hevoka, bi paragraf, an jî ji ber nespehîtiya pevgerêd na bi beşa giştî ye...

Ev hemû dikin ku hûn pirtûka xwe mîna pirtûkek pîroz bibînin, hûn dixwzin hin gotinan biguherin, û paşê çavekî din li van gotinên ku we guhertine tgerînin, û hûn careke din rast dikin, û hûn di pêş de hin gotinên din diguharin, û divê ev wilo berdewam bike. Gava ez li teyibê guhdarî dikim, ew ne gora min, lê li gora leza şerîdê diçe. Nexwe ez ê li gora leza şerîdê biçim... □

Ji tirkî hatiye wergerand

Jean-Paul Sartre di sala 1905'an de li Parîsê hatiye dinyayê, wî vejandina ramana existentializmê û bicihanî ramana humanîzmê kir karê xwe yê seteke, di sala 1964'an xelata Nobelê girtiye û di sala 1980'ê de li Parîsê wefat kiriyê. Digel gelek berhemên felsefî wî gelek berhemên edebî jî nivîsandine.

Ewrê reş ê li ser Tirkiyeyê

Yaşar Kemal

Nîjadperestî di salên 1900'an de kete Tirkiyê. Yê ku îdeolojiya vê nîjadperesti-yê afirand jî Kurdek bû: Ziya Gokalp. Vê nîjadperestiya ku Ziya Gokalp afirand an ji Almanan, ji Fransizan hîn kir, ne nîjadperestiya Kurdî, nîjadperestiya Tirkî bû. Li Tirkiyê jî heta îro vê nîjadperestiya Tirkî, li gel mirovîbûn û demok-ratîkbûna hemû dinyayê hartir bû. Di salên 1940'an de nîjadperestî ala me bû. Nîjada Tirk a di ser her nîjadî de, li ser bergê pêşîn ên kovaran, di hemû qademe-yên dewletê de, di karbidestiya dewletê de bû. Vê karbidestiya nîjadperestî ya ku di salên 1900'an de dest pê kir, li gor tebîeta xwe, rejîmek herî fecî ya tadekar a dinyayê afirand. Hê jî ev sazûmana tadeyê, bi hemû harbûn, zilim, şkence, kedx-warî, mirovên xwe; bêtir jî mirovên xwe yên ku dixebitin kêmkê dîtin, bi destên xwe yên di nav xwîne de li naverasta dinyayê li ser piyan radiweste. Van sûcên mezin ên ku vê sazûmana nîjadperest a tadekar kirine, dê wekî dexma herî reş a dîroka mirov bimînin. Ezê bi tenê nimûneyekê bidim, ku ewê devê mirovatîyê ji hev ve bimîne. Ezê sêce bi tenê yê vê Komara nîjadperest bibêjim, ku ev sûc bi tenê jî bo ji dîrokê rakirina karbidestiyekê têr dike. An jî têr dike ku wê di ciyê he-rî tarî yê dîrokê de veşêre. Ji avabûna Komarê heta sala 1946'an, li Tirkiyê tu gun-diyekî ku lêxistina polîs û cendîrman nexwaribe tune. Ev ne îddia, lê rastiyek e ku hemû netewa Tirk jiyaye. Şikence bûye karê vê sazûmana tadekar. Dikare serpe-hatiya bi hezaran mirovên ku di şikencê de hatine derbaskirin û di şikencê de can

dane bê gotin. Di serhildanên Enedolê de jî heta ku tu bibêjî tevkuştin çêbûne.

Dîroka Komarê, ciyê herî tarî yê nîjada mirov e. Û li dinya hemdem tarista gelên Tirkîyê, di bin zilman de ji mirovatiya xwe dûrkirina wan hê jî dom dike. Tu welatekî hemdem, tu sazûmanek tadeyê ya ku heftî salî dom kiribe tune. Faşî ma Franko ya li Spanyayê jî, bi mirina wî re qedîyaye. Li Tirkîyê bi navê demoratiyê, di bin xêliya wê de, bi hemû haşmeta xwe li pêş û li paş wê; qirkirin, şikece, şewitandina gundan, şewitandina daristanan û dakoçkirin dom dike. Û kart destên vî welatî navê Danezana şoreşa Fransîz a 1789'an belkî bihîstine. Manî Carta belkî di gohên wan de hatiye gotin. Lê belê van karbidestan îmze avêtin bin Danezana Gerdûnî ya Mafên mirovî ya Netewên Yekbûyî. Di pey re Konseya Ewrûpa, di pey re jî THEE (Teşkilata Hevkarî û Ewlekariyê ya Ewrûpayê)'ê, pey re jî Helsinkî... Di van rojan de li Tirkîyê trajediyek herî mezin a dîrokê tê yîn. Ji bilî sewtek du sewtên kurt kes dernakeve û nabêje, "Ey heval, ey karbidest ya Tirkîyê, tu çi dikî, tu der û dorê hildiveşînî, di ser wan hemû sozên ku te da û hemû îmzeyên ku te avêtine de, di ciyên ku tu derbas dibî re erdên ku êdî gîrê tê de şîn nabin dihêlî," Suwar bûyî li elametê, diçî ber bi qiyametê." Kes nabêje dawîya vî karî heta kuderê here. Ev, sûcdarên herî mezin ên dîrokê Rojavayî nî Demokrasiyê, hemû xweşikîyên dinyayê ji bo xwe dixwazin. Ez, nikarim bibêji ji me re çi ye, ew çi dikin bila bikin. Min li çend ciyan got ya, dîsa jî di nivîsînê de feyde heye. Li Parîsê di civînek Mafên Mirovî de min mebûsek endamê Konseya Ewrûpa nas kir. Wê gavê leşker li ser kar bûn. Di ciyên ku Kenan Evren tê re de bas dibû de giya şîn nedibûn. Bi deh hezaran kes digirtin bin çav, bi wan şikandikirin, seqet dihêştin, dikuştin. Zarokên hivdeh salî dihatin didardekirin û dawî ya didardekirinan nedihat. Qûnûna ku zimanê Kurdî qedexa kiribû derketibû, leşker bûbûn bayek mirinê û bi ser Kurdan re dihatin. Mebûsê ku endamê Konseya Ewrûpa jî bû bi vana hemûyan dizanibû. Gava ku em li ser van mijaran peyivî hevalê endam got, "Me gelek qencî bi we kir." Min jî jê pirsî: "Ka we çi kir?" Vê got, "Em ewqas we fikirin ku me Tirkîyê ji Konseya Ewrûpayê neavêt." Ez gelek vê yekê ecêbmayî mam, matmayina min wusa di rûçikê min de xuya kiriye ku merik ji min pirsî, "Ma tu memnûn nebûyî? Heke me Tirkîyê ji Konseya Ewrûpa biavêta dê wan bêtir şikence bikira, bêtir mirov di darde bikira û bi hezaran kesî hepis bikirana." Min ji heval pirsî: "Gava ku we Tirkîyê ji rûçikê me de ji Kons

ya Ewrûpa nediyê der, gelo we ji me, bi awayê ka hûn ji vî karî razî ne an na pirsî? Mêrik li van peyvên min bêtir mat ma û sekinî. Min jî got ku, “ Binihêrin mebûsê berêz, we ji ber şikencekirin, girtin û kuştina me dev ji prensîbên xwe yê demokratîk berneda, we dê alîkariyek mezintir bi gelên Tirkiyê û mirovatiyê re bîkîra.”

Û niha dinya, alîkariya ku pêwîst e bi gelên Tirkiyê re nake.

1- Karbidestiyên Tirkiyê, biryara ji bo girtina masî zûwakirinê avê û şerê bi tevehî girtin. Dê av çawa bihata zûwakirin û masî bi çî awayî bihata girtin? Me ev di demeke kurt de dît û hîn kir. Hemû dinyayê jî dît û hîn bûn. Lê belê pirr wusa haya gelê Tirknîjad ji vê yekê çênebû. Çimkî nivîsîna rojnameyan a zûwakirina avê hatibû qedexekirin. An jî çapemeniya me ya bêsansûr, ji bo parastina welat, bi awayekî gelek neteweperest, ji wê ye ku ewê dinya tiştên ku dibin û diqedin nebihîze, nizanibe û nebîne, nûçeyên avê nedinivîsî. Av bi awayekî wusa fecî dihat zûwakirin ku, dûmana avê derdiket ser heft tebeqe azmanan. Lê ji bo çapemeniya me xapandina dinyayê, xapandina gelê me, ya rast zenkirina xapandinê, welatparêziya herî mezin û neteweperestî bû. Qet haya wan jê tunebû ku ew sûtê mirovatiyê dikin. Xwîn ketibû çavê wan, devê wan kef girtibû, hemûyan bi hev re bang dikirin: “Em xîçkek kevir, çengek ax nadin û nadin.” Xwedawo! Dengê wan bilind dibû. “ Eeeeeey, hevalên welatparêz û xoşewîst, kes ji me ne xîçkek kevir û ne jî çengek ax dixwaze. Hemwelatiyên me yê Kurd zimanê xwe dixwazin, ziman û kultura xwe ya ku tê kuştin dixwazin. Heke ew vana nexwazin jî, divê karbidestî bi mirovî bidin. Lê ji bo ku mafên xwe bi dest bixin birayên me yê Kurd niha di şer de ne. Ew birayên me yê Kurd ku em di xemgînî û hem jî di dilgeşiyê de tev bi hev re bûn. Di şerê Rizgariyê de mil di mil de me bi hev re şer kir. Me ev dewlet bi hevdû re ava kir. Ma mirov zimanê birayê xwe jêdike!” Qêrîna wan bi awayekî wusa dinya dadigirt ku te çî bigota nedibihîstin. Zûwakirin û zûwakirina avê. Xîçkek kevir û xîçkek kevir... Tayek dînîtiyê, çavsoriyek, harîtiyek... Di encamê de ji hemû nîrxên mirovî dûrketin, li rûyê tu kesî nenihartin. Qêrînek dîn, viya bi dengêkî nizimtir dîqîrin ya, dîsa jî naxwazin guhê xwe bidin kesêkî dîn: “ Ma yaxme ye, em hemû mafên mirovî ji Kurdan re bexş bikin, wekî ku Mafên Mirovî malê bavê wan be ew jî herin û bibin serbixwe.” Eeeeeey, heval, ma di tu danezanên ku te îmze avêtine binî de, ez Mafên Mirovî bidim gelê xwe, ewê ‘serxwebû-

na xwe' bixwazin heye? Ma te şerhek weha daniye? Ma di wan danezanên ku îmze avêtine binî de, gotinên her netewe, her civata etnîk dikare qedera xwe l destê xwe tayin bike nenivîsandine?

2- Dest bi zûwakirina avê hat kirin. Xaniyên nêzikî du hezar gundî hatin şew tandin. Di hundirê malan de, li gel mirovan gelek heywan jî hatin şewitandin. V yekê, ji bilî rojnameyên me yê zêde neteweperest hemû çapemeniya dinyayê jî n vîsî. Hê jî serê heştirmeyên me di sîlikê de ye. Welat bûye gola xwînê, dê çapeme niya me ya bi nav û deng çawa serê xwe ji nav sîlikê derxe.

Ji her ciyên Rojhilatê Enedolê du milyon û nîv mirov koçî derên cihê yê Tirk yê hatin kirin. Ev du milyon û nîv mirov, di nav birçîtî û xizaniya herî fecî ya dir yayê de, di qeraxên bajarên mezin de bêmal, tî, birçî, sitûxwar; yek bi yek ji nex weşînan dimirin. Diyar e ku ewê vê zivistanê mirinên li ser hev çêbibin. Ji niha v li hin herêmên Tirkîyê qolera heye. Du milyon û nîv, bi şewitandina gundan r zêdetir dibin. Di nêz de dikare sê çar milyonî jî bibîne. Ji van mirovên birçî yê k xezeba dewletê dîtine re, Hîvasor, Xaçasor jî alîkarî nake, nikare bike.

3- Zûwabûna avê li ser Tirkîyê, li ser mirovatiyê bi buhayî bû mal. Wusa dirû pê dixê ku ewê bêtir bibe mal. Heta niha 1700 mirovên ku ji cînayetên qisasnedi yar re qurban çûne tê nivîsîn, tê gotin û tê zanîn. Di nav hin komên ronakbîrê Rojhilat de munaqeşekirina qirkirinek nû dest pê kir. Tê gotin ku, " Kuştina b sedan, heta bi hezaran mirovên bijare yê netewekê, etnîkekê jî qirkirin e." Êdî t nivîsîn ku Tirkîyê sûcê qirkirinê kiriye. Bi ser de jî ji bilî van munaqeşeyên sûcê mafên mirovî, tê gotin ku ewê ji karbidestên Tirkîyê Dadgeha Mafên mirovî b avakirin. Pişt re li dijî Tirkîyê tetbîqkirina ambargoya ekonomîk... Ji xweşkiyay xweşikê bicibîne ji bo Tirkîyê!

4- Tiştê herî fecî yê kar, şerê bi tevahî, ji bo girtina çend masiyan zûwakirina av çiqas zor, meger çiqas dervayî mirovî bûye. Hema bibêje tevê daristanên Rojhilat Enedolê şewitandin; xwedênegiravî gerîlayan xwe tê de veşartine. Jixwe ji salên di rêj ve ye ku hemû daristanên Tirkîyê dişewitin. Li Tirkîyê daristana ku tê jê re bi bêjî daristan e nema ya, yê ku hene jî ji bo girtina masiyan em bi destê xwe dişewitîn... Çendê hanê waliyê Entabê diçe daristana navça Islahiye ya ku tê di yanzdeh gerîla hatine kuştin. Li wê derê ji rojnameyan re dipeyive. Dibêje me da ristan şewitandibe em çî bikin Me daristan şewitand, lê me tê de yanzdeh gerîla j

şewitandin. Qomûtanê mezin ê ku bi serkeftinên mezin serê wî bi tacên zêrîn hatiye hunandin. Te daristan şewitand ya, welat ji te re minetdar e. Bi daristanan re, bi qirkirinên qisasnediyar re, bi du milyon û nêv mirovê ku gundên wan hatine şewitandin, surgûn bûne, ji cih û warê xwe hatine kirin; sefil, birçî û tazî bi rîyan ketine re Tirkîye jî bi tevahî tê şewitandin; lê qet tu kes tişteki nake. Welatê her kesî, her rawilekî li gor xwe heye; ku mirov rûmetekê didinê... Tê gotin ku bi tenê warê guran tune; mirovatî weha dibêje. Eman em bala xwe bidinê, em nekevin rewşa gurê mirovatîyê! Em dikin bikevin!

5- Karbidestên Tirkîyê kar evqas xereb kirin ku, ji roja ku ev (dewlet) ava bû he- ta îro sûcê ramanî sûcê herî giran hat hesabîn û mirov ji ber vê yekê di girtîgehan de hatin rizandin, hatin kuştin û hatin koçkirin.

Dê hinek kesên ku ewê derkevin û bibêjin di nav evqas sûcên fecî de sûcê ramanî jî sûc e? Îro zêdeyî dused kesên ku ji ber sûcê ramanî ceza girtine û di girtîgehan de radizên hene. Hê bi seden jî tên mehkûmkirin. Di nav van sûcdarên ramanî de endamên fêrkarî yên zanîngehê, rojnamevan, nivîskar û serokên sendîkayan hene. Di nav van girtiyan de girtiyek heye ku kenê miriyan têne, ji trajediyan re şahî ye: Îsmail Beşîkçî, niha di girtîgehê de radizê, hê pênc emirên din jî bijî ewê di hundir de bijî. Bi ser de jî cezayek pereyê wusa lê kirine ku bavê wî bibe Qarûn dîsa nikare vî pereyî bide. Lê mercên derveyî mirovî yên girtîgehê! Bi qasî ku welatekî ji şerma xwe, dinyayê ji şerma xwe têxe binê erdê fecî ye. Min hergav got: Mirovê piştî şerê Cihanê yê Yekemîn ne mirovê berê ye. Bêhesasîyet bûye, pîrî ku xwîn, şikence, zilim û mirovên ku ji birçînan dimire dîtiye bêxem bûye. Mirovê piştî şerê Cihanê yê Duwemîn jî ne mirovê berê ye. Ew bêtir rizîyaye. Îcar şerê sar, piştî mirovatîyê şikandiye, xwîna wê zûwa kiriye. Ku wusa nebûya çawa kurê mirov li ber Ruanda, Somalî, Bosna- Hersek û Rojhilatê Enedolê di ber xwe dida.

Ev belaya ku li serê Tirkîyê ye, qat bi qat ji belayên ku li serê mirovatîyê ne xerabtir e. Tu dibêji qey rejîma nîjadperest û tadekar tê nekiriye, di nav hefê salan de sê derbeyên leşkerî çêbûn. Û tarûmar kirin. Her derbeyekê bêtir dejenere kir, bêtir gelên Tirkîyê hilweşand. Ji kokê ve rizî kir. Bi kultura xwe, bi mirovatîyê xwe, bi zimanê xwe rizî dike ha rizî dike. Ma gelo qet tu sedemek şerê derveyî mirovî yê li Rojhilatê Enedolê tune? Ez dîsa dibêjim: Kurd, ji mafên mirovî zêdetir tu tişteki naxwazin. Dixwazin bi qasî mafê ku dane gelê Tirk zimanê xwe bi kar

bînin, nasnameya xwe bi dest bixin, kultura xwe pêş ve bibin. Hûnê bibêjin 1 qey ev maf bi tevahî dane gelê Tirk. Heke ev bi vî awayî here piştî demeke ku emê bi pêlên berxwedanê yên ku ji gelê tirk tên re jî rûbirû bibin. Ev heftê s wekî bangeran di ser hemû gelên Enedolê re derbas bûye û di ciyê ku derbas bû re jî giya nedaye şînkirin. Niha em, bi tenê dikarin ji bo hemû gelên Enedolê h bikin, da ku bigîhjin tevê mafên xwe yên mirovî. Ziya (ejderha) yekî wusa, hevparên xwe yên Rojavayî re dev kiriye gewriya Enedolê û bi awayekî ku bî nesitîne xwe li pêçaye ku, rizgarî ancax dikare bi diran û bi neynokan pêk bê.

Van hemûyên ku min li jor jimartin ji ruyê tiştêkî de, ji ruyê gaspkirina azadi gelên Enedolê ye. Ji bo mêtin, adîdîtin û birçî hiştina Enedolê karbidestiya tadek hemû tişt kiriye. Di nav vî heftê salî de tiştê ku Enedoliyan ji destê vê karbidesti nekişandine nemaye. Axa Enedolê ji ber ku axa kulturên mezin bûye li hember e qas bahozên di ber xwe dabe. evqas zilim û tunehî dikare gelekî ji mirovatiya dûr bixe û rizî bike.

Ev دنیا goristana ziman û kulturên hundabûyî ye. Hê çî kulturên ku me n û dengê wan qet nebihîstine li vê dinyayê hatine û çûne. Ji ber ku kulturên En dolê mozaîkek kulturên bûye ji kulturên dema me re bûye kanî. Ji bilî zimanê T kî, kulturên din nehatana qedexekirin û kuştin, dê dîsa feydeyek mezin a Enedc ji kultura dinyayê re çêbibûya. Em jî weha li ser ruyê erdê netewek bi vî awayî n dîman; nîvbirçî, nîvîrê, welatekî ku hêza xwa afirenêr hunda dike...

Şerê ku deh sal e dom dike, ji Tirkiyê re pîrr bû mal, wê bêtir ji bibe. Gelo hî dizanin, nîfşên me, mirovatî çiqas dejenere dibe bila bibe, yê ku di van deh sal de hatin kirin dê ji bîr neke. Ewê bi sedan romanê vî şerî bên nivîsîn û bi sedan f mê wî bên çêkirin. Lorî û sitranên vî şerî ji niha ve li hawirdor tije bûn. Mirov efû nake, çiqas bexişkar bê dîtin jî... Em mînaka Almanya bidin, Hîtler û Hîtle parêzan sûcên herî mezin ên dîrokî kirin. Hê mirovatiyê ji ber wê yekê ûjdana xv pak nekir, pişt a xwe rast nekir; nexweş ket. Mirovatî ne mirovatiya kevn e. Bi t nê ji ber şerê Cîhanê yê Duwemîn hêza mirovatiyê ya afirenêr birîn sitand. A manya, bi milyonan karkêrên ku li hember Hîtler derketin û hatin kuştin, nivîsk rên ku kitêbên wan hatin şewitandin, hunermend û zanyar nebûna nikaribû ji n leta mirovatiyê xelas bibûya. Heke îro gelê Alman piçekî rihet be, piçekî dikaribe ruyê mirovatiyê binihêre, ji ruyê wan karker, ronakbîr, zanyar û hunermendê

xwe yên ku li hember Hîtler derketine ye. Ku ne ji Thomas Mann, Heînrîch Mann, Stefan Zweîng, Brech, Erîch Marîa Remarque û yd. ên ku li hember Hîtler şer kirine bûya, îro Alman nikaribûn weha serbilind di nav mirovatîyê de bigeriyana. Dîsa jî ne mumkun e ku di kûr de, di quncikê dilê wan de hîsek şermê tunebe.

Ez dîsa dibêjim. Ezê hezar carên din jî bibêjim. Heta ku emrê min hebe ezê bibêjim: Tu maneyek şerê Tirk- Kurdan tune. Sedem jî tune. Bi tenê sedemek vî şerî heye, ew jî kansera mirovatîyê nîjadperestî ye. Ku ne wusa bûya, bi salan dikaribûn bergê pêşîn ên kovarên rastgir û nîjadperest, rûpelên rojnameyan bi peyvên, “Di ser her nîjadî re nîjada Tirk” bixemilandana? Ez cara yekem di sala 1951’ê de çûm Rojhilatê Enedolê. Li ser kevir û çiyayan, li ser her hervazê ku derketiye pêşiya wan, bi herfên gir, ji sê pênc kîlometreyî de tê xwendin, “Xwezî bi wî ku Tirk e” nivîsandibûn. Li ser hervazên Çiyayê Agirî jî bi vî awayî tije kiribûn. Tevê Çiyayê Agirî bûbû “Xwezî bi wî ku Tirk e.” Bi ser de jî her roj serê sibeyan li dibistanên seretayî bi zarokan, “Tirk im, rast im, jêhatî me” didan gotin... Niha bi vana hemûyan, van tiştên ku min gotin ne tiştê in. Lê ew tûrên me yên ku ji Altayê dihatin avêtin û zikê Çiyayên Alp diqelaşt û derbas dibûn. Xwedê belayek bi vî awayî neyne serê tu kesî! Ya!...

Ha ev zîhnîyet bû ku îro Tirkiyê kir vî halê ku jê dernakeve. Destê welatê me kir nav xwîné. Li hember dinê em bêxîret kir. Karkerên me yên bi şîûr ên ku wekî yên Almanan xîreta me xelas bikin jî tunin. Yên me, Thomas Mannên me yên ku ewê li hember vê sazûmana li ser serê me ya ku di bin navê demokrasîyê de bi zîlim û şikencê mirov ji mirovatîyê derdixe şer bikin tunin. Yên me, Freûdek, Frankek, Dr. Nissenek me, Einsteinekî me tune. Tu tiştê me yî ku ewê li hember mirovatîyê xîret û kultura me rizgar bike, devê min nagere ku ez bibêjim tune ya, tune.

Kurdên ku sê hezar sal e bêrawestan Cejna Newrozê pîroz dîkin, ji ber ku niha jî pîroz dîkin, yên ku bêyî ku bibêjin jin, zarok, nexweş, seqet û pîr e heştê kesî dikujin û mirovên welatekî ku destûr didin vê yekê, we şîtrê dinya heta qiyametê bexş dike? Ew nîşên Enedolî yên ku ewê piştî me bînin, gelo dê vê hovîtiya me bîbexşînin?

Hê çî dibin li Tirkiyê, hê çî! Piştî surgûnkirina du milyon û nîv kesî îcar ambar-

goya xwarinê danîn ser Rojhilatê Enedolê. Ji yên ku ji qereqolê belga hewcedar nestînin re erzaq tune. Çimkî gundî, xwedênegiravî parekê ji erzaqa xwe didin rîlayan. Debir, darên fistiq, darên fêkî û daristanên gundiyan ku ne gundparêz lê surgûnê pejirandin bi hev re tên şewitandin, heywanên wan tên kuştin. Çi gund tên şewitandin û xerakirin? Ji ber ku gerîla tê de nesitirin û erzaqê nexw Li gor nûçeyên ku heta Sitenbolê tên guhê me, gerîla jî hewcedariyên xwe ji alî rên dewletê yên mezin ‘gundparêzan’ temîn dikin. Çend roj berê rojnameyan vîsîn, gerîlayan heftsed miyên gundparêzan birine. Li Rojhilatê Enedolê pêncî l zar gundparêzên bi miaş hene. Hemû Rojhilatê Enedolê kole û xulamê vana ye. Rojhilatê Enedolê dewlet jî, hemû tişt jî ev in. Ev bi dar de dikin, dişkênin, da jin, dikujin, dişewitînin. Tu qaydeyek mirovî, tu qanûnekê nas nakin.

Qesebeyek Rojhilatê Enedolê ya ku hatiye xerakirin û şewitandin û nifûsa wî 25 hezarî hatiye ser 5 hezarî, leşker û gundparêz Serokwezîra Komara Tirkîyê rî kinê. Herê em bibêjin serokwezîr jin e û ev yek li mêranîtiya wan dikeve wê na nê, îcar çima wezîrên inêr nakinê? Dixwazî bila bikinê, dixwazî bila nekinê, xv diyên Rojhilatê Enedolê eşkera ne. Niha xwediye Rojhilatê Enedolê ne Kurd û jî Komara Tirkîyê ye. Ku siya Komara Tirkîyê li Rojhilat hebûya ev qirkirin, tal û şewitandin çêdibû? Bajarekî mezin; Şirnax, qeza: Cizîr, Nisêbînê, Licê bi vî aw yî didan ber topan û dikirin dojeh? Leşkerên Komara Tirkîyê ne ew Sirpên dikevin Bosnayê ne ya.

Hê çî dibin li Tirkîyê, hê çî dibin! Meytên muxtarên qeza Ovacikê yên ku g tin, “Leşkeran gundên me şewitand” çend roj bi şûn de di nav daristanên şewita dî yên nêzikî gundên wan de hat dîtin. Wezîrê dewletê Azîmet Koyluoglu yê l digot, “Leşkeran gund şewitandinin,” çend roj bi şûn de ji van peyvên xwe zivirî got, “Ma qet leşker gundan dişewitînin, PKK gundan dişewitîne.” Vana hemûy: jî ez nizanim çawa bû, ‘rojnameyên azad ên welatê me’ nivîsîn.

Hê çî dibin li Tirkîyê, hê çî dibin! Wellahî jî, billahî jî rojnameyan ev nivîsîn. nizanim li kîjan çiyayî gur miriye, zimanê min di devê min de bû gilok. Binîh rin, li qezayek Wanê serê sibê rabûne, dîtine ku her der bi xêzikên sor hatine îş retkirin. Ma rojnameyên me çawa viya nenivîsîn; SS’yan jî eynî ev yek kiribûn.

Yek jî, li çiyayan şivan neman. Şivanên mezin kuştin. Yên ku li gundên xwe m bûn, îcar rabûn zarok şandin, gotin çawa be zarûk in kes têkilî wan nabe; bed

nên zarûkên biçûk ên mirî çend roj bi şûn de ji serê çiyayan didin hev.

Hê çî dibin li Tirkîyê, eman Xwedê qehra xwe lê bike, mirov ji mirovatiya xwe şerm dike. Ez viya jî binivîsim... Serê sibeyekê hevalekî min ê rojnamevan telefon kir. Gava ez romanê dinivîsim ez têkilî tu karî nabim, bersiva telefonê jî nadim. Gava min navê hevalê xwe nivîst ez derketim telefonê. Bi hevalê xwe re, me bi salan bi hevdû re rojnamevanî kiribû. Ji min re got, "Eman keko, çî dibin çî!" Min jê pirsî, "Çî dibin?" Ji min re got, "Keko! Polîsan emû xebatkarên Rojnameya Ozgur Gundemê birin û çûn." Ez rabûm pê re çûm Ozgur Gundemê. Min dît ku polîs hawirdor girtiye. Min xwest ku ez bikevim hundirê avahiya rojnameyê, lê polîsan destûr nedan. Li Rojnamê, tu kesekî ku ewê rojnameyê derxe nemabû. Polîsên me sed û bîst, tam sed û bîst xebatkarî bi tevahî biribûn, kiribûn qulikê. Rebeno, garsonê ku di qehwê de dixebite jî biribûn. Heke havîn bûya, ez bawer im dê emrê birina mêşên li rojnameyê jî bidana.

Êdî bes e, marîfeta dîrokî ya Komara Tirkîyê, kirinên wê yên ku rûçikê mirov sor dikin, gundparêzên wê yên ku dê mirovên welatê me heta qiyametê li hember mirovatiyê rezîl bikin, qanûnên wê yên rûşermiyê yên kesên ku hevalên xwe, xwe bi xwe îxbar dikin xelat dike; hê bêtir devê min nagere ku ez bibêjim, dilê min jî li ber van karên fecî di ber xwe nade, êdî bes e. Tu tiştek ji destê tu kesî ji me nayê ku em li hember mirovatiyê, li dijî karbidestîya ku xîret û mirovatiya welatê me biçûk dike hin tiştan bikin. Çimkî îro li Tirkîyê li hember zilmê şerkirin ne heddê her mîrxasî ye. Mîna Îsmail Beşikçi sê, pênc deh jîyan girtûti heye. Şkence heye. Birçîhiştin heye. Adetek mezin î Komara Tirkîyê ye ku muxalîfên xwe bike 'Gurê Bi Zengil.' Yek jî, yek jî, li hemberî dewleta îroyîn rabûn bi bulayê serî dayinê ye. Bulayê li hember şerê Kurd û Tirkan rabûn giran e. Yaaaa, buhayê wê pîrr giran e. Em her roj vê yekê dijîn. Lê xwe kerr mekin çî bikin? Mirov carekê tê dinyayê! Ne wusa?

Derba 12'ê Îlonê bi tenê ronakbîran nemehand. Bi tenê bi sed hezaran nekir girtîgehê û şikence nekir. Hemû welat mehand, dejenere kir, ji mirovatiya xwe dûr xist. Hemwelatiyê muxbîr ê berêz, derbekarên ku ew îtirafkarên ku her yek ji wan gurên devbixwîn bûn afirandin, exlaqê mirov ê gerdûnî anîn ser sifirê li welatê me. Welatekî ku exlaqê wî yê gerdûnî hatiye korkirin, herdem di nav mirovatiyê de wekî nexweşekî di qomayê de ye.

Serokê derba leşkerî Evren Paşa gotiye, “Ma em bi dar de nekin, em wan girtûgehan de xwedî bikin?” huqûq mûqûq çî hebe kiriye bin lingên xwe, di nav rasta dinyayê de wekî peykerekî vampîr ê xwînaxwar, zilimkar, û dilneşewat rawe tiye. Zagona Bingehîn a wî ya ku wî di bin siya çek û sunguyan de derxist, ku %90’ê netewê Zagona wî ya Bingehîn teyid kiriye. Vaye tam donzdeh sal e li Tîrkiye li gor vê Zagona Bingehîn tê îdarekirin. Min ji hûqûqnas, profesorê wela min, evûqat, dozger û qadiyê ku derket pêşiya min pirsî, Zagonek Bingehîn a wî ha li dinya hemdem, li welatekî ku bi sazûmanek demokratîk tê îdarekirin hey. Ne bi tenê ji Tîrkiyê, min ji gelek huqûqnasên pispor ên dinyayê jî pirsî. Nema biyaniyan gava ku ji min bihîstin ku Tîrkiye bi Zagonek Bingehîn a weha tê îdarekirin, ji min pirsîn ka Tîrkiye endamê Konseya Ewropa ye an na. Rasterast tin dikirin. Gava ku mirov dikeve rewşeke pêkenînê ev ji şikence dîtîne diwartir. Îcar li pêş tevê mirovatiyê ketina rewşeke pêkenînê, bi ser de jî peyva demokrasi li ber tevê mirovatiyê rezîlkin; ev ji bo karbidestiyekê sûcekî ku nayê efûkirin. Bi ser de jî li pêş nîşên bê yên wî welatî... Erê, parlamentoya Tîrkiyê heye, ku mîbûsan ji pêş deriyê Meclîsê wekî têjîkên pisikan bi çemika sitûyê wan bigirin wan bibin girtûgehê jî. Dadgeha Qanûna Bingehîn jî heye. Ew Dageha Qanûn Bingehîn a ku li gor Zagona Bingehîn a Leşkeriyê biryara emilandin û neemila dina qanûnan dide.

Belkî jî li dinyayê welatê bi tenê Tîrkiye ye ku ew Kenen Evrenê ku Zagona Bingehîn îxfal kir, betal kir û ji holê rakir, qanûnên yê ku ev welat ava kir, hem jî hûmû perê xwe da Sazgeha Ziman a Tîrk, Sazgeha Dîrokê ya Tîrk ji holê rakir zarokekî 17 salî di darde kir û ji ber van kirinên xwe hat xelatkirin û bi ser vana hûmûyan de jî kirin serokkomar. Li min biborin, lê ez bi hin welatên paşvemayî yê Asyayê nizanîm. Haya min wusa pîrr ji eşîrên Afrîqa jî tune. Belkî ji wan derê Kenan Evren Paşayek dikare derkeve.

Ziravê hinek mirovên me diqete, xwedênegirî ku ewê leşker dîsa derbê biki. Derbê bikin jî, nekin jî ewê çî biguhere... Belkî bi tenê tiştê diguhure, Zagona Bingehîn a li kar betal û ji holê radikin, ewqas. Ez qet zen nakim ku derbeyek rî Zagona Bingehîn a Evren Paşa ya li kar betal bike û ji holê rake. Bila tu kes bî mekeve, dê derbe çênebe. Bila tu kes netirse; ez ji dil garantiyê didim wan. Çim ku tu pêwistiyek derbê tune. Ewê çima bikin. Dê bi kêrî wan û çî bê; bi tenê ewê xv

bikin binê bar û berpîrsiyariyê. Lê serokkomarî? De bila ew jî tune be rihê min.

Hinek dostên min, hevalên min ên kevin ên rojnamevan, wan hevalên min ên ku ez ji wan hez dikim û naxwazin ku li tu derekê pozê min xwîn bibe, ji bo min ditirsin. Hinek jî, ji bo min dibêjin tu alî digirî.

Ma ji alîgirtina min tebîtir çi heye ku...

Min xwe dît nedît ez li rû gelên Tirkiyeyê me.

Min xwe dît nedît ez bi yên ku zilim dîtine re, yên ku heq û keda wan hatine xwarin re, bi yên ku êş kişandine re, bi yên belengaz re bûme.

Ez ne ji malbatek elewînîjad im. Di dîroka me de yên herî pîr biçûk hatine dîtin û zilim dîtine Elewî ne. Ez bi Elewîyan re jî bûm yek.

Ez ne ji dînê Êzîdî me. Êzîdî li Rojhilata Navîn 52 caran di qirkirinan re derbas bûne; piştî her qirkirinê jî yên ku mane xwe sipartine Çiyayên şengelê. Gava ku pîr bûne zivîrîne Laleşê. Di kitêbên min de ev qirkirinên wan jî gelek cih distînin.

Ez li rû zimanê ku ez pê dinivîsim, li rû Tirkî me jî. Ji bo bêtir xweşikbûn û dewlemendbûna Tirkî jî çi ji destê min tê, ez xwe pêwîst dibînim ku bikim. Hêrsa min a herî mezin a li dijî Kenan Paşa jî ji girtina Sazgeha Ziman a Tirkî tê.

Bêguman ez alî digirim. Ji bo min dinya baxçeyek kulturê ya bi hezar kulîlkî ye. Hemû kulturên misêwa di dîrokê de hevdû xwedî kirine, hevdû tamandine û bi vî awayî dinya me xweşikîr û dewlemendtir bûye. Ji dinyayê hundabûna kulturekê, ji dinyayê rabûna rengêkî, ronahiyek û kaniyekê ye. Bi qasî ku ez li rû kultura xwe me, ez ewqas li rû her kulîlka vî baxçê kulturê yî hezar kulîlkî me jî. Enedol her gav bûye mozaîkek kultura ku dinyayê bi çiçekên xwe yên xweşik, bi ronahiyên xwe yên xweşik dagirtiye. Ez dixwazim îro jî weha be. Divê em li ser kultura axa xwe bilerizin. Mozaîka îroyîn dîsa dikare tîrêjên ronahiya xweş bişîne dinyayê û dinya me bi kulîlkên xweşik dewlemend bike. Ha ez alîgirê vê yekê me. Yên ku fêm dikin bila fêm bikin, yên ku fêm nakin jî Xwedê selametê bide wan. Di dawiyê de serkeftin ya mirovatîyê ye. Ew kesên ku li hember serpêhatîya mezin a mirov derdikevin ewê rastî qehr û xezeba mirovatîyê bînin.

Ger mirovên welatekî rindî, dilgeşî û bi mirovî jiyane bibijêrin, ev pêşiyê di Mafên Mirovî yên gerdûnî, di pey re di azadiya ramanî ya herheyî û gerdûnî re derbas dibe. Gelên welatên ku li hember vê yekê derketine jî, ewê xîreta xwe hundakirî û

wek mirovên ku ketibin rewşeke wusa ku nikaribin li rûyê mirovatiyê binihêr bikevin sedsala bîst û yekemîn.

Rizgarkirina nan û xîreta welatê me, dewlemendiya axa wê ya kulturî di des me de ye. Ya demokrasiyek rastîn, ya jî... qet! □

Wergera ji tirkî: Felat Dilge

Ne dema kirîn û firotina gulan e*

Erdal Öz

Dê ev strana xweş jî bê jibêrkirin
Di nav êş, xwîn û qirkirinan de
Ber bi ba bibin rojên ku em dijîn
Vê pirsê mutlaq tê bipirsî:
Ji me çi ma, ji me çi ma li pey?

Onat Kutlar

I

Hatin û çiyî xweş hebe pelçiqandin.

Çiyî xweşiktir hebin, hatin li pêş me rawestîn û ji dîtina me re bûn asteng.

Ev kî bûn? Ev dagirker? Ev ‘Yaqûbên ku bêyî bangkirin hatin?’

Gotin ku em bi hemû tiştî dizanin.

Hinek ji yên bêqirewat bûn ku digotin ji vê demê bi şûn ve fikirin ne pêwist e; çimkî li ser navê hemû mirovatîyê, li ser navê tiştên ku ewê bibin, herî baş û herî rast ji alî wan ve berî bi sedsalan hatiye fikîrin û dîtin; ev, yek bi yek di kitêbê de hatine nivîsîn, ji ber vê yekê li ser navê welat û civatê afirandina fikrên nû beredayî û bi xesar in.

Hinek jî yên bi qirewatên ji kirinên xwe ewle bûn ku digotin, emê hemû rasti-yên welatên pêşveçûyî yên دنیا hemdem bi mêjiyekî hemdem fêm bikin û bêyî ku xesarê bigihînin nasnameya xwe ya dîrokî û neteweyî binin welatê xwe. Yên ku xwediyê mêjiyê herî pêşverû, herî hemdem û herî baş difikirin ew in. Bêrawest du-

bare dikirin ku bi bêtirsê ew notirvaniya komara layik û 'Parvenebûna yekîti gel û welat' dikin û li ramanên nû, li mafên nû û li azadiyên nû ew xwedî derk vin

Her ew peyivîn. Me dengê xwe dernexist.

Em çiqas bêdeng man ew ewqasê peyivîn.

Dema ku em bêdeng jî man ji me hez nekirin. Çimkî em difikirin.

Tiştê ku herî pirr jê ditirsîn jî ev bû.

Armanca wan avakirina civatek bêdeng bû. Bi pirranî di vê yekê de bi ser ketin Ji bo ku civateke ji mirovên ku nafikirin ava bikin, hemû hêza xwe bi kar anî Perwerd, ji bo gihandina mirovên bêdeng bi rêxistin. Zagon, ji bo bêdngkiri tirsandin û serîdanîne çêkirin û emilandin. Di ciyê aqil de ji bo ku baweriya ke neperest bi cih bikin, di ciyê ronahîdarbûnê de, ji bo ku bi qayideyên hezar sal t rê (civatê) îdare bikin bingehên zexm danîn û li ser avahiyên bilind damezirandir

Yên ku li dijî derketin, yê ku ramanên xwe beyan kirin girtin û avêtin girtîg han; bi wan şikence kirin, li wan xistin, kuştin û ew bi dar de kirin.

Em kê m bûn. Ez dizanim.

Em kê m bûn û hê jî em dixwazin ku dev ji vî şerî bê berdand. Em aştî, demokî sî û azadiya ramanî dixwazin.

Çi ye azadiya ramanî? Û li ser navê kê?

Civatek wisa afirandin ku, hê jî haya beşekî mezin ê vê civata mezin ji vê meşh mê tune. Girseke wisa afirandin û ew bi awayekî wisa perwerde kirin, bi awaye wisa di xew re kirin, bi awayekî wisa di tengasiyan re derbas kirin û ew tam di nav şerekî jiyanê yê wisa ku, komek biçûk a hindikanî ya ku azadiya ramanî di west jî li dûriyek wisa man ku ew nikaribûn wan bibînin û dengê wan bibîhizin.

Em hindik kirin, em kirin rewşeke hindikanîbûnê.

Em bûn civatek ku bi lez qeşbalix dibe, lê bi lez ber bipaş diçe û bi tenê dir ne.

Hatin û çiyî xweş hebe pêpas kirin

Di Çileyê Paşîn a sala 1995'an de piştî bûyera Onat Kutlar em bûyera Yaşar Kemal jî jiyan. Du bûyerên ji hevdu biêştir.

“Ew mirovên baş, li wan hespên rind suwar bûn û lêxistin çûn”⁽¹⁾ Ji bo ku bi me weha nedin gotin, komek nivîskarên ku hejmara wan çiqas diçe kêr dibin, hatine ba hev, ji bo ku bikaribin ji çûyina welat a xerab re bibêjin bes e, astengên li pêş ramanê bîn rakirin, pêşiya demokrasiyê bê vekirin, pîvanên gerdûnî yên mafên mirovî bîn hesabî, wextek zûtir dawî li şerê xwîndar ê birayan bê dayin, ji bo ku bikaribin hêviya rojên pêş baştir û ji jiyane re destdayîtir bikin, biryara çêkirina kitêbekê bi hev re dabûn. Li gel gelek edebiyatnasên hêja Yaşar Kemal jî du nivîs ji bo vê kitêbê nivîsîn. Hê berî ku kitêb derkeve, ji van herdu nivîsan yekê, li ser daxwazê, da kovarek Alman a ku pirr tê firotin. Ev nivîsa ku di kovarê de bi awayekî kurtkirî hat dayin, bi lez û ji ser ve ji bo tirkî hat wergerandin û di rojnameyek me ya rojane de hat çapkirin. Lê bi hîlebaziyeke wisa çap kirin ku, di eynî rojê de, nivîskarên navdar ên eynî rojnamê, di vê mijarê de nivîs nivîsîn û genîtiya xwe nîşan dan û bi fersenda sixêfên ku mirov nagire devê xwe êrîşî Yaşar Kemal kirin. Di rojên pişt re rojnameyên din jî, li hember banga Yaşar Kemal a aştiyê derketin û ji şerê ku dom dike re, bi awayekî dizî an vekirî pişt derketin. Bi van nivîsan armanc ev bû: Yaşar Kemal parvekarek bû. Ji bo ku Xelata Nobelê bigire welatê xwe ji Rojava re gilî kiribû. Ew rasterast xayinek bû.

Em ji ramanê re azadî dixwazin ha! Ji bo kê?

Ev ne ji bo wan nivîskarên ku nav û dengê wan ji wan mezintir e û lê dixebitin ku hostayê zimanê me, Yaşar Kemalê ku li hemû derên dinê tê naskirin nedin peyivandin û dengê wî bibirin. Ew yê ku evqas ji welatê xwe hez dike, evqas ji nêz de tê naskirin, di romanên xwe de bergehên mirovên nemir ên ji vî welatî diafirîne, yê ku ji dil naxwaze mirovên welatê wî-jî kîjan nijadê tîn bila bînceng bikin, bimirin, yê ku bi daxwaza weletakî ku bi biratî tê de bê jiyîn bi aşkerayî aştiyê dixwaze, yê ku ji bo welatê xwe yê ku pirr jê hez dike parve nebe, dixwaze vê çûyinê bide rawestandî. Ji xwe hewcedariya wan ji azadiyek weha re nabe. Ji xwe ew azad in. Ge di vê rojnameyê de tînin û geh li wê rojnameyê; ge di vê kanala televizyonê de bejna xwe nîşan didin û geh jî di wê kanalê de. Di siya dewlemendan de li ser hev berê xwe didin aliyên cihê û nobetê diguhêrin. Ew, bi “yên din” re bi vî awayî ji çûyina vê sazûmanê hez dikin. Hûn ji mebûsan cihêtiya wan a ku di cihê ‘hakem’ de ‘haakem’, di cihê ‘laîk’ de ‘laayik’ dibêjin nenihêrin, ‘hakem’ jî, ‘laîk’ jî rast dibêjin; lê ev ne ji ber xweşbikaranîna wan ya tirkî ye, ji hostayiya wan

a li ser hev nivîs nivîsînê tê. Gava hûn perdeyê rakin, hûn ê bibîn ku wisa cil tiyek wan ji pirraniya li parlamentoyê tune. Bi qasî ku ji berê ve bibînin jî in û bînin ku ewê ramanên cihê, dîtinên cihê bikaribin bibin talûke û gava ku ev saz mana xerab bikeve pergalekê, ewê jî ji berjewendiyên xwe bibin. Bi qasî ku ri aqil bibijêrin bi aqil nebin jî, bi qasî ku riya menfaetê bizanibin jîrtiyek wan a p tîk heye. Tiştê ku ji bo wan girîng e ne demokrasî, azadiya ramanî, mafên miro biratî, aşû û filan e; tiştê girîng hezar salî jiyana marê ku ewê xesarê nede wan Divê serê marê ku xwe nade ber vê yekê bê pelçiqandin; 'li ciyê ku hat dîtin bê ç lçiqandin. Wan jî wisa kirin.

Ku wisa be, ji bo kê azadiya ramanî?

Şerê xwîndar dom dike.

Ji butça sala 1995'an ji bo vî şerî 425 tîrîlyon hatiye veqetandin. Ku wisa ye, em bo kê aştiyê dixwazin. Li ciyê ku evqas pere ji bo şer hatiye veqetandin, binge madî ya ku ew ê şer saleke din jî dom bike hatiye şewirîn, em aştiyê ji kê û ji l kê dixwazin?

Di şerê ku dom dike de evqas can hatiye hundakirin, evqas gund û daristan ha ne şewitandin, evqas mirov li ber koçkirinê mane, evqas mirov hatine girtin, evq mirov hatine kuştin; em ji mafên mirovî re hurmetê ji kê dixwazin, ji bo kê dixw zin.

Li dadgehên ku bi selahetiyên serdest li ser kar in 1700 dozên sûcên ramanî ha ne vekirin, di dema ku 5000 meznûnên van dozan tèn mehkûmkirin de, em r mana azadî ji kê dixwazin, ji bo kê dixwazin?

Ew demokrasiya ku baweriya me pê heye û em çareserîya van hemûyan jê dik li kuderê ye? Ew welatê bihuşt li kuderê ye?

Çiqas diçe em kêmbibin.

Dengê me çiqas diçe tê birrîn.

Bi vê çûyîné kêmtirbûna me muheqeq e.

Bi dîtina wan boşahiyên bêpîr û paşdemayî...

Bi bihîstina wan dengên buhurî, bi zeng, cîrnexweş...

Û li ber van hemûyan bêdengmayin...

Na, em naxwazin ku ev welat bê parvekirin.

Em kevnepereştiyê naxwazin.

Ji kuderê tê bila bê, em şidetê qet lê qet naxwazin.
Baweriya me hê jî, digel ku em kêm jî dibin bi pêwistiya zêdebûna me ye.
'Ne dema kirîn û firotina gulan e'
Em dîsa strana xwe dibêjin.

* Ev nivîs ji pirtûka *Azadiya Ramani û Tirkiye* hatiye wergerandin. (Weşanên Can, Sibat 1995, Stenbol)
(i) Romana Yaşar Kemal ya ku ez pîr jê hez dikim, *Cîneyeta Çarşiya Hesinkeran* bi vê hevokê dest pê dike.

Erdal Öz nivîskarekî tirk e û xwediyê weşanxaneyê *Can* e

Îlyada

Homeros

Agahdariyek di derheqa Îlyada de

Gava min hinek ji Îlyada xwend, beşê sêyam bi min xweş û balkêş hat. Mantiqê gelle hêlên wê, bi min wek mantiqê me kurdan hat. Ya jî hîna gellek hêlên mantiqê me kurdan wek ê wê hatin. Min wî çaxî ji xwe bi xwe re wilo got: wê pirt baş bûya heger Îlyada hemû bi kurdî hebûya. Lê ez hêvîdar im ku wê ji aniha û nêzik hinek derkevin û vî kurî bikin. Ez di wê baweriyê de me ku divê Îlyada ji yûnanî bê wergerandin. Û her wilo ez hêvîdar im ku tiştê min wergerandiyê, wê ji wan re nebe asteng.

Bêyî ku ez vê yekê ji bîra bikim, min bi kêfxweşî xwest ez beşa sêyem wergerînin. Min bi vê yekê xwest ez balê bikişînim ser vê berhema delal. Tiştê ku min wergerandiyê, min ji wergera tirkî, a Azra Erhat û A. Kadir, a çapa 7. an 1993-an e. Weşana çapa xana Can e. Bi bawerîya min wergera tirkî, weregeke delal e. Loma jî min a tirkî birgeh girt û min da ber a Swêdî. Guhertinên hindik di wan de hene. A rastî, ne guhertin, lê bi a min awayê tercumekirinê ne. Di maneyê de wek hev in.

Îlyada bi yûnaniya kevn hatiye nivîsîn. Ziman û alfabe ya yûnanî a wî çaxî, guherbû. Dengên dirêj bi tîpên ji bo dengên dirêj, dengên kin jî bi tîpên ji bo dengên kin hatine nivîsîn. Ev yek, babetekî ahengê û melodyê dide berhemê. Berhem bi pîvar **Heksametron** hatiye nivîsîn. Li gor vî qalibî û vê pîvanê, kêşan şeş `nig` e. Di çî qalibê ku heye de, kîteke dirêj û duduyên kin hene. Ji wan kîtan re **daktylos** tê gotin. Yê jî du kîtan dirêj **-spondaïos-** hene.

Wergerandina bi qalibê orîjînal, îro ne gengez e. Li gor ku tê gotin, di yûnaniya îro bi xwe de jî qalibê orîjînal dernakeve. Loma jî tiştê ku divê mirov di vê derheqê de bike, parastina maneyê a bi awayekî helbestvanî ye. Carinan mane ahenga helbestvanî jî red dike. Wî çaxî hêla helbestvanî bi awayekî din tê avakirin.

Îlyada çîrokek e. Tê gotin ku bûyer qewimiye.

Li gor mîtolojiya yûnaniyan, gava daweta Peleusî û Therisê (dê û bavên Akilleusê mîrê Myrmidonian, yûnaniyê helî xurt û egît, ê ku di şerê Troya de Hektor dikuje, lê ew jî ji aliyê Parîs ve tê kuştin) dibe, gazî nakin Erîsa Xwedaya *jihêvxistin û hilweşandinê*. Erîs aciz dibe. Radibe sêvake zêrînî diavêje nav mêvanan û “ji ya helî spehî re” dibêje. Wî çaxî xwedan Hera, Athene û Afrodîte li ser bê kê ji wan spehî ye li hev nakin. Îcarê rojekê ji rojan, ji bo hilibjartina ya helî spehî ji wan, Parîsê lawê mîrê Troya mîr Prîamos, dibe hakimê darezan. Parîs, Afrodîtê hildibijêre û Sêva Zêrînî dide wê. Afrodîtê jî wek xelata vê kirina wî, ahda dana pîreka helî xweşik a li dinyê, Helenaya Spartayî dide wî.

Îcarê çîrok ji vir û pê ve dest pê dike. Dibêjin ku demekê ji deman mîrekî bi navê Tyndareos li Spartayê hebû. Keçeke wî ya gellekî spehî hebû. Navê wê Helena bû. Li hemû Yûnanîstanê tu mîrên ku ew ji xwe re nedixwestin tunebûn. Bavê wê ji wan re wilo digot: wê keça min yekî ji we bike. Lê divê hûn ên din hemû sozê bidin ku piştî wê jî hûn dost bin. Û heger hin bixwazin wê bi kotekî ji xwe re bibin, divê hûn hemû bên alîkariya mîrê wê bikin. Heger hin wê birevînin, divê hûn herin wê dîsa bînin.

Hemû sozê didin ku wê li ser vê bin û wilo bikin. Helena kê ji wan ji xwe re hilibjêre, dimîne a wî. Piştî wê ne bi gellekî, Helena mîr Menelaosê birê mîrê mîran Agamemnon dike. Agamemnon mîrê welatê Mykene bû. Yûnanî hemû di bin destê wî de bûn. Piştî ku bavê Helenayê dimire, Menelaos dibe mîrê Spartayê. Mîritiyêke xurt bû. Ew û Helena dilgeş bûn. Keçeke wan jî çêdibe. Lê rojekê, Parîsê Prîamos tê mêvandariya wan. Wî çaxî, radibe wê û xişrên wê direvîne û dibe ji xwe re. Îcarê li gor peymanê, Mîr Agamemnon radibe mîrên yûnaniyan dicivîne û dixwaze ku herin Helenayê û xişrên wê bînin. Parîs ew revandibû Troya. Troya li hêla din a derya Egeyê ye. Yûnanî artêşeke şêst hezar leşker amade dikin û dikevin rê. Heta ew diçin, Troyayî jî xwe ji şer re amade dikin. Ew jî çil hezar in. Li jêra bajarê Troya, şer dest pê dike. Deh salan da-jo. Îlyada li ser pêncî û rojêke wî şerî ên sala nehan hatiye avakirin. Hemû bîst û çar beş e. Min ê sêyem wergerand.

Süleyman Demir

Beşa Sêyem

Duelloya Parîs û Menelaos

Gava her êlekê bi dû mîrê xwe de
herdu artêş ji bo şerî derketin meydanê,
Troyayî wek refên çûkan bi qêrîn li ezmên,
wek dema quling ji ber bê, bahozê û baranê,
ber bi ava rûbarên Okeanos de bi qêrîn difirin,
bi sihara sibê re şer, mirinê û qelandina ji dinyê
ji tovê hacûcên Pygmeyan re dibin, derketin.
Lê Akhayî bédeng derketin meydanê,
di ber hev re dimeşyan bi biryardarî
ji bo parastina hev bi ahd û bawerî.
Carinan, bayê qublî mijê bi xwe re tîne
xwe li serê çiyar radipêçe,
erê ruhê şivanan jê diçe
lê ji bo dizan ji şevê jî baştir e,
mirov inces ber nigên xwe dibîne.
Gava bi lez dimeşyan û bi pêş ve diçûn
toz û dûmaneke wilo ji ber nigên wan diçû.

Dema herdu artêş hatin nêzîkî hevdu

Parîsê rûxweda derket pêş ji nav Troyayiyar.
Şûrê wî, di ber xelesa kevên re ji ser milên wî
xwe berdida bi ser eyarê parsan de li bejina wî.
Du rimên serik tûncîn dihejandin û gazî dikir Argosiyar
da şervan yeka yek derkevin duelloyê hemberî wî.
Gava mîr Menelaosê şervan, ezîzê ber dilê Aresê,
dît ku ê gav radane û derketiye pêş, Parîs e,
bû wek şêrê ku çav bi nêçîra xwe bikeve,
bêderew pîrr kêfxweş bû bi dîtina wî.
Ji nîfşkê ve wek şêrekî ku pîrr birçî bû
û çav bi xezaleke bistureh, ya jî pezkoviyekê bikeve,

heger xortên nêçîrvan bi sayên xwe jê biparêzin jî,

ew ê zû bike piç û parî û dabelîîne.

Wilo bû kêfxweşiya mîr Menelaos

gava çavên wî bi Parîsê rûxweda ketin.

Êdî ji bo ku heyfê hilîne ji Parîsê tawanbar

bi çekan rapêçayî zû peya bû erdê ji erebê

û ji nav egîtên navdar gav radan hêla wî.

Ji ber tirsê kezeb qetiya li Parîsê xwedayî,

ji bo xelaskirina canê şêrîn rev ket bîra wî,

qûna qûna bû, zû bi nav peyên xwe de reviya.

Wek gava mirov li çiyar ji nîşkê ve marekî dibîne,

bê mirov çawa di nav tirs û lertzê de dimîne

û bê reng û xwîn dibe û gavan ji wir radide,

wilo behitî ket nav Troyayîyan Parîsê rûxweda

ji ber tirsê lawê Atreusê şervan ku nav di xwe da.

Hektor ew dît, bi galgalên hişk pê de teqiya:

“Parîs, wey li te rezîlî, tolazê bi ser pîrekan de mirî!

Xwezî tu çenebûya, ya jî nezewicî mabûya heta dawî!

Ev e xwestina min aniha ji kezebê û dilî.

Wê pîr baştir bûya bêguman wilo,

wê ev hetîketî nehatina serê me

û tu li serê me û xelkê nedibû bele.

De îcarê bila Akhayên porxelek te bibînin û bikenin

bawer dikirin ku tu him spehî yî û him jî serokekî mêrxas î,

tu dê dest hilînî gava ku hewece be bi wan re li pêşî

lê aniha jî dibînin bê tu çi tov tirsonekê rezîl û pîs î.

Madem tu ev bû, te çima camêr bi xwe re karkirin

te ew bi keştiyan di ser deryayên kûr re birin

te ji nav welatên dûr û biyan jina delal,

ew xatûna mala xweşmêran revand,

te ew anî û kir bela serê bavê xwe,

a serê milletê xwe û welatê xwe;

te xwe wilo rezîl kir û kêfa neyaran anî.
De ka îcarê derkeve hemberî mîr Menelaos
û bibîn bê kirina şerê bi mêrxasan re çawa ye,
ku te çû jina wî ya wek gulekê ji xwe re anî.
Gava tu bigevizî nav tozê tu dê bibînî,
hemû diyariyên ku Afrodîte dane te
spehîbûna por û rûyê te
tembûrvaniya te
qet alîkariya te nakin.
Troyayî miletekî bêzirav in,
yan na bawer be gerek ji zû ve
bi keviran tu bikuştina ji bo wê kirina tel”

Parîsê rûxweda lê vegerand, got:
“Tu mafedarî Hektor gava tu min wilo pîs dikî,
heçê tu bi xwe ye, bi mêrxasiya xwe dilbivirek î,
di destê hostenecarekî keştiyan de diqelêştî
her cara ku li dêr dixê, tu hîna bêtir diqelêştî,
wilo ye di sênga te de ew zirdilê te, tu bêtirs î.
Diyariyên Afrodîta zêrîn neke serevde li min
galgal bi diyariyên xwedan re nayên kirin
ew hemû ji dilgeşiya wan in û pîroz in,
em mirov wan li ser serê xwe digirin,
ew çî bidin, soxî hemû tèn qebûlkin.
Lê heger tu îllehî dixwazî ez duelloyê bikim,
xweşmêrên Akhayan û Troyayîyan bide rûniştin
ez ê derkevim li navê bi mîr Menelaosê şervan re
li ser Helenayê û xezîna wê, yeka yek şer bikim.
Yek ji me tê kuştin, ê din jî serketî dimîne
wî çaxî wê û xezîna wê, ew dibe mala xwe,
hûn, ên din jî sozê bidin, şer nekin, dost bimînin,
bila Troyayî bi xwe, li Troya bi xêr û ber bimînin
Akhayî herin Argosê û hespan xwedî bikin

li wê Akhaya pîrekspehî vegerin.”

Parîs wilo got, kêfa Hektor hat;
xweşmêrên Troyayî hemû li wir ragirtin,
bi nivê rima xwe girt û pekiya pêş ji nav wan.
Porxelekên egîtên Akhayan kevan kişandin
ji bo ku tîran û keviran bi ser wî de bibarînin,
lê mîrê mîran Agamemnon zû li wan kir qêrîn:
“ka rawestin gelî Argosiyân, egîtên Akhayan,
em bibihîzin bê Hektorê bi tolga biroqanî çi dibêje.”

Wilo got, şervan hemû di ciyê xwe de rawestiyân.
Hektor derket di nav herdu artêşan de rawestiya û got:
“Gelî Troyayîyan, Akhayên çîm rapêçayî, guhdar bikin,
bînerin bê Parîsê ku bûye sedema şerî çi dibêje,
dixwaze ku em Troyayî û hûn Akhayî hemû li vir
çekên xwe yên spehî deynin ser axa bi xêr û ber,
ew ê derkeve bi mîr Menelaosê şervan re li navê
yeka yek şer bike li ser xişran û Helena spehî.
Kî serketî be, sax bimîne ji vî şerî
bila wê û xişran bibe ew mala xwe,
û em ên din jî ji ber hev rabin bi dostanî.”

Wilo got, hemû bêdeng rawestiyân.
Wî çaxî mîr Menelaos li wan kir qêrîn:
“Îcarê ka hemû li min guhdarî bikin,
vê êşê, ji hemû kesan bêtir, daye dilê min.
Ez jî bawer im ku êdî divê Troyayî û Akhayî
vî şerê ku li ser Parîs derketiye betal bikin,
ez dizanim ku hûn hemû têra xwe êşiyane.
Ecelê kê hatibe ji min û wî, êdî bila bimire,
hûn ên din jî, ne dereng dev ji hev berdin.
De ka hûn Troyayî du mêşinan bînin,
ji wana, bila a mê reş be û ê nêr jî spî,
bikin qûrban ji bo xwedayê Erdê û ê Rojê.

Ji bo Zeus jî, em ê yekê bînin û bikin qurban.
Gazî bikin mîr Prîamosê xwediyê desthilata xurt,
madem bêbext in, tu bawerî nabe li lawên wî,
bila ew bê peymanê girêbide di nav me de,
bila ew bê sondê bixwe li ser navê wan,
ji bo ku sonda ji Zeus re tê dan, bê cî,
hişê xortan wek bê ye, namîne li cî.
Lê heger salmezinekî wek wî be,
bîra pêş û paş herduyan dibe
wê ji bo herdu artêşan a baş bike.”

Wilo got, Akhayî û Troyayî dilgeş bûn,
bawer bûn ku wê xelas bibin ji dijawariya şerî.
Erebe kirin rêzê, peya bûn ji wan erdê,
çek ji xwe kirin, danîn ser erdê.
Hektor du qasid rêkirin bajêr,
ji bo ku mêşinan bînin û gazî bikin Prîamos.
Mîr Agamemnon jî rabû ferman da Talthîbîos,
herin, ji keştiyên zikmezin mêşinan bînin, got.
Wî jî bi gotina mîr Agamemnonê xwedayî kir.
Îrîsê, rabû wek qasid çû ba Helena zendspî.
Di şiklê Laodîka dişa wê de çû, jina lawê Antenor,
bi spehîbûna xwe a helî bedew bû ji keçên Prîamos.
Helîkaonê lawê Antenor ew kiribû jin ji xwe re.

Îrîsê, li hêwanê Helena dît,
cawekî fireh çêdikir li ser tevnê
diçirîsand ji herdu rûyan cawê wê,
wêneyên şer li ser çêdikirin bi pûteyî,
Troyayiyên suwarî û Akhayên bi tunc rapêçayî,
di şerê ku Aresê, li ser wê anîbû serê wan de.
Îrîsa nîgsivik hima derket pêşberî wê û got:
“ka were û îcarê bibîne bûka min a delal,
were li çelengên suwariyên Troyayîyan

û Akhayên bi tunc rapêçayî temaşe bike,
berê, du artêşan li deştê hev dibirrîn,
lê aniha jî bêdeng rawestiyane
xwe spartine mertalên xwe,
rimên xwe di erdê çikandine û mane.
Ji ber ku, êdî wê Aleksandros
û mîr Menelaosê şervan
ku pîrr ezîz e li ber dilê Aresê,
yeke yek şer bikin bi rimên dirêj li ser te.
Kî zora ê din bibe, wê xatûna wî ya delal be navê te.”

Gava xwedayê Îrîs wilo got,
bêrîkirineke şêrîn kir nava Helenayê,
hezkirina mêrê wê yê kevn, a dê û bavê wê
a welatê bav û kalan xwe berda ser dilê wê.
Helenayê rabû fotên spî li xwe pêçan,
bi çavên tijê hêstir ji girî, derket ji derî.
Du berdestên wê jî rabûn dan dû,
yek jê Aîthreya keça Pîttheus bû
a din jî Klymeneya çavqirqaş bû.
Zû giha ser sûra deriyê Skayiskayê.
Li wê derê, di birca rasta derî bi xwe de
Panthoos, Thymoites, Lampos, Klytios,
Hîkeatonê ji tuxmê Xweda Ares,
Oukalegonê aqildar û Antenor hebûn,
şewra extiyaran dikirin li dora Prîamos.
Erê extiyariyê ew ji şeran bi dûr xistibûn
çekên xwe danîbûn û xwe hinekî dabûn alî
lê ji axavtinê re hîna camêrên pîrr şareze bûn,
wek temojên li daristanê, difitilîn li daran
û xweş digotin di ber hev re hêdî hêdî.
Di bircê de wilo rûniştî bûn mezinên Troyayî.
Dema dîtin ku Helenayê dertê ser birca rasta derî

hêdîka ji hev re gotin ev gotinên bi bask û perî:
“Qet ne şerm e ku em xelkê Troyan û Akhayî
bi salan êşê dikişînin ji bo jineke wilo spehî.
Gava mirov wê dibîne, mirov wê bi xwedan dişibîne.
Lê dîsa jî, xwezî suwar bûbûya li keştiyê û biçûya malê,
û em û zarokên me hemû nexistina vê belayê.”

Wilo gotin, lê Prîamos bi xwe gazî kir Helenayê:
“Tu ka were keça min, were rûne li vir, li ba min,
wa ye mêrê te yê berê, merevên te û dostên te.
Tu bi xwe ne tawanbar î, xwedan tawanbar in bi min,
wan bi ser min de aniye ji bo vî şerê giran artêşa Akhayî
wan bi serê min de aniye ev şerê xwînrej û ev qiriktahlî-
tu ka were bibêje min, bê navê wî mêrxasê girs çi ye?
Kî ye ew mêrxasê Akhayî ê bi zend û bend û spehî?
Bi rastî tu bibêjî, ên jê girstir û dirêjtir jî hene li wir,
lê heta aniha, nedîtîne çavên min ên wek wî spehî,
dişibe mîrê mîran ew mêrxasê han bi min.”

Helena xwedayî bersiv da, got wî:
“Ez him ji te ditirsim, him jî hurmetê digirim
bawer be bi vê yekê ey xezûrê ezîz li ber dilê min.
Xwezî min mirin bida ber çavên xwe û min mala xwe,
ew keça xwe ya ku min wilo pîrr nazdar mezin dikir,
dost û merevên xwe, mêrê xwe nehiştina li wir,
û ez bi lawê te re nehatima vir.
Lê mixabin wilo nebû, ma ez dikarim çi bikim,
tu dibînî ku ez hêdî hêdî dihilim bi hêstiran û girî.
Lê ez ê bêm ser pirsê te, ez ê bersivê bidim te;
ew ê han, lawê Atreus mîr Agamemnon e
xwediyê desthilateke pîrr bilind e li Mykene,
him mîrekî mezin e û him jî şervanekî çeleng e.
Demekê ji deman, tiyê min rebena xwedê bû,
erê, erê... demekê ji deman wilo bû.”

Wilo got, devê pîremêr ma ji hev û bi dû re got:
“Ey lawê Atreus, zilamê dilgeş, ezîzê qederê û xwedan,
ku tu bûye mîrê wilqasê egîtan, hêza topa Akhayan.
Ez çarekê ji caran çûbûm Frîgya bi bexçe û rezan,
min gellek egîtên Frîgî li ser hespên rehwan dîtin.
Otreusiyên û Mygdoniyên ku dişibiyên xwedan,
artêş li ber qeraxên çemê Sakarya rêz kiribûn,
dema ku Amazonî bi mêranî hatibûn, wî çaxî,
ez jî wek şervanekî navdar di nav wan de bûm,
lê em hemû bi qasî van Akhayên çavsor nedibûn.”

Pîremêr bi dû re Odysseus dît, li wî pirsî:
“Ka wî jî bi min bide naskirin keça min a delal,
ma îcarê ew ê han kî ye li wir?
Bi serekî kintir e ji Agamemnonê Atreus,
lê bi nav milan û sêngê, firehtir e ji wî.
Çekê xwe daniye ser axa ku mêr lê digihin,
derketiyê pêş wilo wek beranekî ji nav mêran.
Ez bi xwe, wî pîr dişibînim beranekî bi bisk û hirî
ku di nav keriyekî mîhên wek şîr spî de digere,
bi wê rîha wî ya spî li ser sênga wî.”

Helenayê, keça Zeus bersiv da, got:
“Ew Odysseusê pîr bi aqil e, lawê Laertes e,
ji xelkê Îtakayê ye li wê giravka lat û kevirî.
Pîr şareze ye, gellek fen û fûtan dizane.”

Antenorê biaqil zû bersiv da, got:
“Xatûna min, te çî rast got ew gotina han,
demekê ji deman ew Odysseusê xwedayî
ji bo dan û stendinên li ser te qasid hatibû vir,
mîr Menelaosê şervan, ezîzê Aresê jî pê re bû.
Min ew kiribûn mêvan bi kêfxweşî li mala xwe,
min ew hilanîbûn û danîbûn ji dil li ba xwe.
Herdu jî bi bejin û bi bal bûn, bi aqil bûn.

Bêderew gava herdu derdiketin nav Troyayîyan
mîr Menelaos li pêyan bi ser wî diket ji milan pê ve,
lê gava rûdiniştin, Odysseus wek çiyayekî spehî bû.
Gava li ber çavan, dihûnan di serê xwe raman,
bi rastî Menelaos xweş diaxivî, bi dengê gird,
hindik digot carê, lê giran digot bi maneyê,
bi temenê xwe jî ciwantir bû ji Odysseus, lê,
gava Odysseusê pîrr bi aqil radibû pêyan,
awirên xwe berdidan erdê, dinerf û dima,
darê xwe qet nedihejand bi vî alî û wî alî de,
wek bêaqilekî ku nizanibe çi bibêje bû li pêyan.
Lê gava dengê gird berdida der ji sênga xwe,
gotin li mirov dibariyan wek berfê ji ezmanan,
tu kesan nikaribûn bidin ber bi ramanan.
Tiştê ku wî çaxî kiribû dilên me bibijînê,
ne spehîbûna wî bû, ev yeka han bû.”

Bi dû re Aîas dît pîremêr, pîrsî:

“Ma ew kî ye îcarê, ew Akhayê din,
ew ê esîlzade, aha ew egîtê girs,
ê ku Argosiyân, ji milên pan pê ve,
bi serê xwe tevî derbas dike kî ye?”

Helenayê, xweda kirasdirêj, got:

“Ew Ayasê, tune ne egîtên wek wî,
ew bi tenê keleheke lawên Akhayan e.
Lê li hêla din binere îcarê, di nav Gîrîtiyan de,
Îdomeneus heye, wek xwedakî li wir rawestiya ye,
ew ên din, hemû mîr û mezinên Gîrîtê ne li dora wî ne.
Mîr Menelaosê şervan, ezîzê ber dilê Aresê,
ew her carê dikir mêvan li mala me,
çi dema rêya wî ji Gîrîtê diket ba me.
Ez hamû egîtên Akhayan dibînim aniha,
ez wan baş nas dikim, bi nav û dengê li ser wan.

Lê ez dikim û nakim ez herdu birayên xwe yên ji dê
suwarê şareze Kastor û Polydeukesê bi navê navdar
wek mîran nabînim li tu deveran li teniştaya wan.
Ma gelo bi artêşa Lakonya şêrîn re nehatine?
Ma gelo bi keştiyên ku deryan diqelaştin
hatine vir, lê xwe tev şerî nakin wek mêran?
Gelo şerm dikin, ditirsin ji bihîstina gotinên tahl
ku her rojê tên gotin ji devan, gelo çi bela wan e?”

Wilo got. Nizanîbû ku axa bi xêr û ber
ji zû ve herdu jî kiribûn himbêza xwe li wir,
li Lakonyayê, welatê şêrîn ê bav û kalan.

Ji bo merasima ahda li ber xwedan,
qasidan, qurban li seranserê bajêr gerandin;
du mêşin bûn ew qurban,
û meşkeke bizinan de jî,
şeraba ku kêfê dide mirovan,
ew berê ji axa bi xêr û ber hebû.
Îdaïosê qasid tas û piyalên zêrîn anîn
û çû ba mîr Prîamosê pîr û nav tê da:
“Rabe îcarê, rabe lawê Laomedonî rabe,
mezinên Troyiyan û ên Akhayên bi tunc rapêçayî,
gazî te dikin ji bo kirina merasima ahdê li deştê.
Wê Aleksandros û mîr Menelaosê şervan, ezîzê Aresê,
bi rimên dirêj yeka yek şer bikin, ji bo vê xatûnê.
Kî ji wan serkerî be, sax bimîne ji wî şerî
wê hemû xişran û jinê, ew bibe mala xwe.
Wê ahd bidin û dost bimînin ên din jî.
Em ê li Troya bi xêr û ber bimînin
wê Akhayî jî li Argosa ku hesp lê tên xwedîkirin,
wê Akhaya ku pîrekên wê spehî ne veşerin.”

Wilo got, pîremêr di ciyê xwe de sar bû,
lê emir da ku zû hespan bidin ber ereban,

wan jî bi a wî kirin, zû xwestina wî anîn cî.
Prîamos bi xwe suwar bû li wê ereba spehî,
Antenor jî suwar bû li ba wî û rişme kişandin,
di deriyê Skayîska re hesp bezandin deştê.
Gava gihan nava Troyayîyan û Akhayan,
peya bûn ji erebê ser axa bi xêr û ber
di nava herdu artêşan de rawestiyan.
Mîrê mîran Agamemnon zû rabû pêyan
Odysseusê bîaqil jî pê re rabû wek hemû caran.
Ji bo merasima sondê, îcarê qasidan qurban anîn
şaraba di tasê de tevdan, av li destên mîran kirin.
Lawê Atreus, ew kêra xwe ya ku her demê
di ber şûrê xwe re, bi teniştê xwe ve berdida
kişand û du bisk hirî ji serê mêşinan qusandin.
Qasidan, hirî li mezinên Troyayî û Akhayî gerandin.

Lawê Atreus destên xwe hildan û kir qêrîn:
“Ey Zeus, ey bavê helî mezin, xwedayê li çiyayê Îda,
Helîos, roja ku diçirisîne, hemû tiştan dibîne û dibihîze,
hûn Çemno, tu Axê û hûn herdu desthilatdarên bin erdê,
hûn ên ku mirovên li sondê diqulipin, bi mirinê ceze dikin,
bibin şahid û wekîlên min û sonda me biparêzin.
Heger Aleksandrosê Prîamos, Menelaos bikuje,
bila Helenayê û hemû xişrên wê bibe ji xwe re,
em jî vedigerin malê bi keştiyên ku deryan diqelêşin.
Lê heger mîr Menelaosê kej Aleksandros bikuje
bila Troyayî Helenayê û hemû xişrên wê,
qelenekî ku bi pîrbûna xwe baş bê dîtin
û bi me Argosiyên bikeve bidin me
ji bo ku bi salan bê qalkirin û gotin.
Lê heger Aleksandros bikeve ser axê,
û mîr Prîamos û lawên xwe wilo nekin,
ji bo ku ez heyfê hilînim, ez ê li vir bimînim,

ez ê şer bikim, heta ez tiştên dixwazim, bistînim.”

Wilo got, bi kêrê serê mêşinan jê kir,
kêra ji mefreqê dijwar zû birrî, hêza jiyane zû bir,
lawê Atreus, laşên ku diperpitîn berdan ser axê.
Bi dû re şarab ji tasê rijandin ser axê,
hemûyan li wir duê ji xwedan re kirin.
Topa Akhayan û Troyayiyan, wilo gotin:
“Ey Zeus, xwedayê helî mezin,
û hemû xwedayên nemir şahid bin,
kîjan ji artêşan sondê pêşî xerab bike li vir,
bikin ku mejiyê wan û ê zarokên wan
wek vê şarabê birije ser axê
û jinên wan bibin ên xelkê.”

Wilo gotin, lê Zeusê lawê Kronos
ev dengên giliyan nebir xwe û nebihîstin.
Prîamosê lawê Dardanosî, wilo got wan:
“Gelî Troyayiyan û Akhayan guhdar bikin,
divê ez bi xwe îcarê vegerim Troya li ber bê;
ez nikarim bi çavan bibînim ku lawê min ê ezîz
bi mîr Menelaosê şervan re yeka yek şer dike.
Lê Zeusê mezin û nemirên din dizanin
bê wê îro ji herduyan kî bimore li vir.”

Wilo got extiyarê wek xwedan.
Tavilê mêşin avêtin ereba du hespan,
ew bi xwe jî suwar bû û rişm kişandin li wan.
Antenor jî suwar bû bi dû re, da kêleka wî,
bi paş de vegeriyan Troya, ba extiyaran.
Hektorê Prîamos û Odysseusê rûxweda
derketin îcarê û pîvan qada şerî pêşî.
Rê û rêbaz danîn, di tolgayê de hejandin,
bê wê kî ji wan rima serik tunc biavêje pêşî.
Artêşan destên xwe hildan, hewar dan xwedan.

Çi Akhayî û çî Troyayiyê ku hebû li wir, wilo got:
“Zeusê bav, xwedayê mezin ku ji çiyayê Îda hukum dike,
kê ji wan anîbin serê me ev şer û derd û bele hemû
bike ku a xwe bibîne û here jêr mala Hadesî,
û em ên din jî, wek sonda xwarî dost bimînin.”

Wilo got Hektorê girs û spehî ku diçirisî,
berê xwe da tenîştê û hejandin rê û rêbazên şerî.
Dora Parîs pengizî derve ji nîşkê ve pêşî.
Herdu artêş, rêz bi rêz rûniştin li ser axê.
Li ba hespan rûniştin bi çekên biroqonî
çi mêrê ku hebû li wir ji herdu artêşên şerî.
Aleksandrosê xwedayî, mêrê Helena kezî spehî,
xwe rapêça bi wan çekên xwe yên helî spehî,
pêşî rapêçan zend û bend û herdu pî,
kişandin ser çîman zirxên bi xelekên zîvînî,
bi dû re jî da ber sêngê zirxê birê xwe Lykaonî,
ma çî xweş lê dihatin ew zirxên wilo spehî.
Avêt milan şûrê xwe yê bi zîv neqîşandî,
kir destên xwe mertalê xwe yê pêtî,
mîxfera neqîşandî kir serê xwe yê esîl,
li ba dibûn bask û rêşiyên mîxfera serê wî.
Û rahişt rima ku wilo bi destê wî diket helî dawî.
Li hêla din, mîr Menelaos zirxên xwe li xwe dikirin.
Herduyan jî zirxên xwe li xwe kirin êdî ji bo şerî,
yek ji nav komekê derket, ê din ji nav koma din
di nava Troyayîyan û Akhayan de rawestiyan,
bi saw û erjeng bûn, herdu jî bi awiran.
Gava ew wilo dîtin, di çî de şaş bûn
suwariyên çeleng ên Troyayî
û Akhayên bi zirxên tuncî.
Li qada pîvayî derketin hemberî hev,
û bi hêrs rimên dirêj daweşandin hev.

Pêşî Aleksandros rima xwe ya sî dirêj avêt
li nîvê mertalê pan ê lawê Atreus xist,
lê rima tuncî mertalê wî qul nekir,
serê wê xwar bû ji wî mertalê hişk.
Menelaosê Atreus qêrîn da Zeusê bav,
rima xwe hilda, avêt pêş û li ber geriya:
“Zeusê bav, bihêl ku ez heyfê hilînim
ji vî zilamî, ji Aleksandrosê xwedayî,
ku bêsedem ev bele anîn serê min,
bihêl, ku ez wî bi destên xwe hûr bikim,
ji bo ku ji vir û pê ve, ji mirovên ku çêdibin
tu kes li dinyê, nema xerabiyên wilo bikin
bi ên ku wan li mala xwe dikin mêvan
û wan bi merdî hiltînin û datînin.”

Wilo got, rima sî dirêj avêt,
li mertalê bedew ê lawê Prîamos xist,
rima tûj mertalê biroqonî derbas kir
zîrxê xweş neqîsandî qul kir,
rast derbas bû û hinek ji qutikê wî bir.
Parîs xwe twandibû û reviyabû ji mirina reş.
Lawê Atreus şûrê xwe yê bi zîv neqîsandî kişand
ji jor ve li nava mîxfera wî xist ji nîşkê ve,
lê şûr bû sê çar perçe û ket ji destên wî.
Lawê Atreus nerî li ezmanê bêserî û bêdawî, kir qêrîn:
“Tu xweda tunene, ey Zeusê bav, wek te bêdalet,
nû min fikir ez heyfa xwe hilînim ji Aleksandros,
şûrê min şkest, rima min vala çû ji destê min,
min ew nekuşt bi tu awayî.”

Wilo got û xwe avêt Aleksandros, mîxfera wî girt,
ba da û kişîşand ba Akhayên ji çogan xweş rapêçayî.
Gava qaîşa mîxfera baş asêkirî hat kişandin,
di qirika wî rabû, stûyê wî yê nazdar êşand gellekî.

Heger ku keça Zeus, Afrodîta awir tûj ew nedîtîbûya,
ew qaîşa ji çermê gayan bi destên xwe nebirrîbûya
wê navdariyeke nebihîstî bi mîr Menelaosê şervan biketa,
wê Aleksandros bi dû xwe de bikişkişanda bi saxî.
Mîxfera vala mabû di nav tiliyên qalind ên wî de,
mîxfera di destê xwe de wek xelekekê ba da,
avêt nav Akhayên ji çogan xweş rapêçayî,
dostên wî mîxfêr girtin û birin bi xwe re.
Bi dû re, bilind bû û li xwe fitilî dîsa,
har û bêhedan bûbû bi xwestina kuştina Parîs.
Çi bikira û çi nekira wê ew bikuştî illehî,
lê Afrodîtê hatibû û ew revandibû ji ber wî.
Ev yek, ji bo xwedayekê kirineke hesan bû,
bi xar û zû dûmaneke tarî girt dora bedena wî,
û ew bir li oda Helenayê, a bi bêhn û misk danî.

Xwedayê derket îcarê, çû dû Helenayê,
ew li ser bircê dît, li nav komeke pîrekên Troyayî.
Hêdîka bi pûşiya wê ya ambrosî girt û hejand.
Ketibû şiklê wê pîra ku demekê ji deman
gava Helenayê hîna li Lakonyayê bû
jê re hirî dirêst, tiştên spêhî dihûnan.
Gava ew dît, pirr kêfa Helenayê hat.
Di şiklê wê pîrê de Afrodîtê, got:
“Ka were, Aleksandros li malê gazî te dike,
li oda razanê, li ser nîvînên delal û bêguhik e.
Gellekî lê tê ew rubayê biroqonî, pirr spêhî ye.
Qet naşibe yekî ku îro bi egîtekî re duello kiriye.
Wek yekî ku ji çûna dîlan û şaiyan re amade ye,
ya jî nû ji dîlan û şaiyan hatiye, bêhnê vedide ye.”

Wilo got, dilê Helenayê di sênga wê de êşiya.
Helenayê, ji wê gewriya bi nav û deng xwedayê nas kir,
ew ji sêng û berên spêhî, çavên ku diçirisan din nas kir.

Pêşt ji ber xofê ricifî û tirsîya, bi dû re devê xwe vekir.
 “Ma dîsa tu yî li pêşberî min hey xwedaya zalim,
 tu çima her dixwazî min bi gotinên xweş bixapînî?
 De ka bibêje min bê mexseda dilê te çi ye,
 gelo tu dixwazî min hîna jî dûrtir bixînî,
 min bavêjî bajarekî mezin ji bajarên Frîgyayê
 ya jî yekî xweştir li welatê ava yê Meyoniyan?
 Gelo li wan deran ji miriyan û mirinê bi xwe
 hinên ku dost û hevparên te ne hene?
 Ji ber ku Menelaos xurt û serketî ye
 te dît ku zora Aleksandros biriye
 îcarê wê min dîsa bibe malê,
 tu dîsa qulizî vir bi xaîntî
 û dikî min bi fen û fûtan bibî malê!
 Tu bi xwe here rûnê li wir li ba Parîs,
 derkeve îcarê ji rêya xwedan bi temamî,
 bila nigên te nema bi Olymposa ruhnî bikevin.
 Tu here ba wî, li ber destên wî here û were biguhdêrî,
 belkî te bike jina xwe, ya jî xulama ji xwe re soxî.
 Heger kevir jî bibarin ez nema diçim mala wî,
 şerm e êdî, bi min nakeve ku ez ji îro pê ve,
 dîsa herim û raxim doşek û nivînên wî.
 Ma wê pîrekên Troyayî çî nebêjin ji bo min,
 ji xwe birîndar e ji serî ve, bi kovanê dilê min.

Afrodîtê, xweda mezin, pirr aciz bû û got:

“Pîreka bêhurmet, teng neke aniha bêhna min,
 neke ku îcarê ez te têxim ber darê xezeba xwe
 bi qasî ku ez ji te hez dikim wê pirr be xezeba min.
 Ez ê rikeke mezin têxim nav Troyayiyan û Akhayan,
 ez ê şerî gur bikim, tu jî dê bi wan re wenda bibî bi rezîltî.”

Wilo got, kezeb qetiya li keça Zeus, Helena spehî.

Fota spî ku wek rojê li ber çavan diçirîsî li xwe pêça,

da dû xwedayê û vegeriya malê bi rebenî
bêyî ku wê bibînin tu pîrekên Troyayî.

Gava giha mala Parîs a xweş û spehî,
bi karên xwe ve beziyan xulaman û cêriyên wî.
Pîreka xwedayî derket oda wî ya bilind a razanê.
Xwedaya rûken, Afrodîtê çû kursiyek jê re anî
bi destên xwe li hemberî Aleksandros danî.
Keça Zeusê bi mertal, Helena spehî rûnişt li wir,
berê xwe da wî alî û bi hêrs bi ser mêrê xwe hilbû:
“Nexwe tu ji şerî vegeriya,
xwezî tu li wir mabûya û miribûya,
xwezî mêrê min ê berê, wî zilamê xurt tu kuştibûya.
Bi xurtiya xwe û bi rima xwe, her gavê tu dipesinî.
Ka tu xurttir bû ji mîr Menelaosê ezîzê Aresê?
De ka îcarê here dîsa gazî wî şervanî bike,
de ka here, bila bê dîsa bi te re şer bike.
Lê heger ez bixwazim şîretê li te bikim,
ji bo ku tu soxî bikaribî dawiyê li vî şerî bînî
derneke hemberî mîr Menelaosê zer bi wî awayî,
canî nede bi duelloya yeka yek, qet nebe bi rima wî.
Na gidî, lew wê rima wî bibe mirina te,
tiştê ku ez bi xwe dizanim bi esehî.”

Parîs dest bi gotinê kir, wilo got:
“Pîrekê, min bi gotinên wilo giran neêşîne,
heger Menelaos ez îro şikandibim bi alîkariya Athene
ez ê jî rojekê wî bişkînim illehî, lew xwedayên me jî hene.
De ka were îcarê di ber min keve li ser vê doşeka hanê
em ê bi ramûsanan dest pê bikin û bigihin wê xweşiyê,
min tu caran wilqasî bêriya hezkirina te kiribû li jînê.
Bawer be wê gava bi keşiyên ku derya diqelaştin
min ji Lakonya xweş tu revandî wê girava ji latan
û min bi xwestineke mezin bi te re kiribû bi xwe jî,

ne wek xwestina mina aniha bi xwe bû bi rastî.”

Wilo got û çû ser doşekê, wê jî da dû wî.

Lê gava ew li ser doşekê bûn ji bo kêfê bi hev re lawê Atreus wek pilingekî har di nav geremolê de li vir diket û li wir diket ji bo dîsa dîtina Aleksandros. Lê tu kesan ji Troyayîyan û jî alîkarên wî bi xwe jî nikarîbûn Aleksandros şanî mîr Menelaos bikin, heger bikarîbûna wî bibînin, nikarîbûn nebêjin; him ji ber ku gellek rûmet didan mîr Menelaos û him jî ji ber ku hemûyan ji Aleksandros êdî biqasî mirina reş nefret dikirin.

Serokhêzê mezin mîr Agamemnon,

rabû ji nav wan û dest bi axavtinê kir îcarê:

“Troyayiyî, Dardanosî û hevalbendên wan,

ka îcarê hemû li min guhdarî bikin!

Pirr êşkere xuyaye ku serketin

a mîr Menelaosê şervan,

ezîzê ber dilê Aresê ye.

Ka îcarê Helena Argosî û xişrên wê

û malekî mezin ku ji bo me minasib bê dîtîn,

ji bo ku bi salan bê qalkirin û pesinandin bidin me.”

Lawê Atreus wilo got,

hemû Akhayan jî serê xwe hejandin û wek wî gotin.

Wergera ji tirkî: Süleyman Demir

Di encama çîroka berhemê de, Paris û Hektorê girs, lawê Priamos ê mezin tên kuştin û bajarê Troya tê şewitandin.

Kurd di tarîxa Teberî de

Yek ji dîroknasên rûmetbilind î berhemdar yê serdema Îslamê xwediyê Berhema ma “Tarîx er-Rusul yan jî el-Umem we el-Mulûk= Dîroka Pêxember yan jî Milet û Padîşahan” Ebû Ca‘fer Muhemmed îbn Cerîr Et-Teberî (839-923) ye. Berhema Et-Teberî di forma kitbên salewext de ku bûyerên sal bi sal didin, hatiyê nivîsîn û bûye wek bingeh û çavkanî ji bo dîroknasiya erebî ya Îslamê. Ew hê ji çaxên berî dîrokê dest pê dike û pêl bi pêl pê ve rê heyanî serdema Îslamê; jê û pê vî jî ew sal bi sal li pey hev didomîne ta ku digihîje sala 915’yan.

Dîroka Et-Teberî di nav dîroka Îslamê de, yek ji wan kirêbên dîrokê yên rasttirîn û pêbawertirîn hatiyê dîtin. Ew bi awayekî berfireh û bi rêk û pêk hatiyê nivîsîn û gellek agahdariyên rind î giranbiha ji devên salixdarên (rawiyên) ser wext dide xwendevanan; xwendina wê jî xweş û hêsayî ye. Dîroknivîserê me bi vê berhema xwe, xebata tarîxzanên berî xwe yê mîna **El-Yaqûbî, El-Belazûrî, El-Waqidî û Îbn Se‘d** tamam kiriye û ji dîroknasên pey xwe yê mîna **El-Mes‘ûdî, Îbn Mîskeweyh, Îbn El-Esîr û Îbn Xeldûn** re jî rê vekiriye û çavkanî nîyeke hêja û tekûz ji wan re hiştiye.

Tarîxa Et-Teberî deh cild in, cildê pêşî li ser afirandina cîhanê û ya mirovan e, ew hin bi hin pê ve diçe û cild bi cild lê didomîne heyanî digihîje serdema pêxemberan û şah û qiralên hevçaxên wan. Ew wan li gor rêza hatina wan di **Tewrat û Incîlê** de digel delîl û şiroveyên ji **Quranê** li pey hev rêz dike ta ku

digihîje wextê Îslamê. Ji Îslamê û pê ve ew li ser jiyana Pêxemberê Îslamê Muhammed û sal bi sal jî li sera bûyêrên dema wî û peyrew û xelîfeyên wî radiweste hayanî ku tê sala 915'yan.

Berhema Et-Teberî ya dîrokê cara pêşî bo zimanê farisî û piştê jî ji farisî bo Tirkî hatiye wergeradin. Herweha ew bo zimanê Fransî jî hatiye wergerandin û di sala 1874'an de hatiye weşandin.

Et-Teberî di sala 839'an de li **Amûla Teberîstanê** (Mazendêrana niha) çêbûye û li bajarê **Reyyê** xwendiyê. Ew ji bo xwendinê li gellek deverên din mîna Besre, Kûfe, hinek bajarên Sûriye û Fustatê (Qahîreya kevn) geriyaye. Piştî xwendina 40 salî ku di warê zanistiya olî, zimanzanî (filolojî) û dîroknasiyê de xwe ji yên berê yan jî ji yên vê paşiyê pirr cudatir gihîştandiyê, ew hatiye li Bexdadê cihwar bûye û 40 salî li ser hev, bêrawestan dersdarî kiriye û nivîsandiyê.

Ji bilî dîrok û Tefsîra Quranê ya Et-Teberî ku 30 cild in wî helbest jî nivîsîne û li ser ferheng, rêziman, matematîk û bizîşkiyê (tîbbê) jî berhemine hêja dane.¹

Et-Teberî jî yek ji wan dîroknasên ereban e ku di hinek cihên berhema xwe ya "Tarîx er-Rusul we el-Mulûk" de qala kurdan kiriye. Min li jêr hinek ji wan cihan ji erebî wergerande kurmancî û hinek cudahiyên çapê ku di jêrenotên kîtbê bi xwe de jî hebûn li dawiyê nivîsîn û bi tîpa serê navên wan ew diyar kirin. Di nav notan de jî min diyar kiriye ku ew ji kîja cild, beş, û rûpelî hatine wergerandin.

Emîn Narozî

Tarîx er-Rusul we el-Mulûk (Et-Teberî)

Îbn 'Hemîd ji min re qal kir ku Seleme ji Muhemmed îbn Îs'haq, wî jî ji 'Hesen îbn Dînar, wî jî ji Leys Ebû Suleym bihîstiya ku Mucahîd jê re wel gotiya: "Min vê ayetê ('Herrîqûhu we'nsurû âlîhetekum...= alîkariya xwedayê xwe bikin û wî bişewitînin E. N.) ji 'Ebdullah îbn 'Umer re xwend, wî pirs: "Mucahîd ma tu dizanî bê ew ê ku şewitandina Îbrahîm [pêxember] nîşan da kes bû?" Min got: "na". Wî got: "Zilamek ji koçerên (bedewiyên) Fars bû Min pirs kir: "Ebû 'Ebdurrehman, ma koçer li Fars hene?" Wî got: "Erê, **ku** koçerên Fars in, yek ji wan bû ku şîreta şewitan-dina Îbrahîm [pêxember] kir"

Yaqûb ji min re qise kir ku ji îbn 'Uleyye wî jî ji Leys wî jî di heqê gotina [Xwedê] ya "'Herrîqûhu we'nsurû âlîhetukum= alîkariya Xwedayê xwe bikin wî [Îbrahîm] bişewitînin" de got ku: "Zilamek ji koçerên Fars yanî ji kurdan e tişt gotiya".²

Şahên Fars û Berzbûna Şahîtiya Wan

Ji xwe li pêş me ji bo rêzkirina dîrokê bi tevayiya hinek bûyerên mezin ku dema şahên Fars, qiralên Îsraîlî, ên Rûman û melîkên Eraban de heya ku bê ser dema Erdeşîr gotibû.

Şahîtiya Erdeşîr îbn Babek

Li gor xiristiyan (xaçparêz) û xwedîkitêbên pêşî, 523 sal piştî vegirtina erdê Babîlê ji hêla Îskender ve û li gor Mecûsiyan (Agirperestan) jî 266 sal piştî Îskender, şahê milkê bixêr û bêr **Erdeşîr** îbn (kurrê) **Babek** îbn **Sasan** el-Esxe (Sasanê Piçûk) îbn Sasan îbn Babek îbn **Mehermis** îbn Sasan îbn **Behmen** Şa îbn **Îsfendiyar** îbn **Buştasb** îbn **Luhrasb** îbn **Key Wecî** îbn **Key Menûş** ku di heqê neseba wî de weha jî tê gotin: "Erdeşîr îbn Babek îbn Sasan îbn Babek îbn **Zerar** îbn **Behafrîz** îbn Sasan el-Ekber (Sasanê Mezin) îbn Behmen îbn Îsfendiyar îbn Buştasb îbn Luhrasb", li Fars – Li gor gotina wî [Erdeşîr] – ji ber heyfa kurapê xwe **Dara** îbn Dara îbn Behmen îbn Îsfendiyar ku şerê **Îskender** kiribû û ji aliyê du nobetdarên xwe ve hatibû kuştin, bi mebesta vegeran-din milk li xwediyê wî û zivirîna ser pêl û demên kevnare yên bav û kalên wî ye.

berî şahîtiya Eşîran û ji bo ku mezinatiyê têxe destê yek serok û yek şahî, derketibû meydanê.

Tê gotin ku: “Ew [Erdeşîr] li gundekî ku bi navê Teyrûdê tê nasîn û bi wîlayeteke bi xêr û bêr a herêma Îstexrê³ ve girêdayî ye, hatiye dinê. Kalê wî Sasan mêrxasekî pirr jêhatî bû, nav û dengê mêrxasî û egîdiya wî deng dabû û wusa belav bûbû ku wî bi tena serê xwe bi 80 mêrên Îstexrî re şer dikir û zora wan dibir. Jina wî ji nesla hinek mîrekên Fars ku bi navê **el-Bazrencîn** tên nasîn, bû. Navê wê **Ramebihušt** bû û jineke pirr delal î hêja bû. Sasan nazirê ser **beyt-nara** (Agirxaneya) ku jê re Enahîz⁴ dihate gotin, bû û heyran û dêranê nêçîr û mêrxasiyê bû. Gava Babek ji Ramebihušt re çêbû porê wî ji bihostekê dirêjtir bû. Demek piştî re ku salên wî bi pêş ve çûn ew kete cihê bavê xwe, piştî jî kurrê wî Erdeşîr çêbû.

Hingê şahê Îstexrê zilamekî Bazrencînî bû ku li gor Hîşam ibn Muhemmed navê wî **Cûzihr** bû, lê hinekî din wî bi Cuzihr bi nav dikir. Xizmetkarekî wî bi navê Tîra hebû ku wî [Cûzihr] ew li **Darabecirdê** kiribû **ercebza** (pîr)⁵. Dema Erdeşîr bû heft salî bavê wî ew bir cem Cûzihr ku hingê li Beydaê dima, ew [bavê wî] derket cem, jê pîrsî ku Erdeşîr ji bo perwerdekirinê deyne cem **Tîra** da ew piştî wî bibe ercebza (pîr). Wî [Cûzihr] ew qeyd kir û şande ba Tîra; wî [Tîra] jî ew bi dilekî xweş girte cem xwe û wek zarûkekî xwe qebûl kir. Gava Tîra mir Erdeşîr kar girte ser xwe û kete cihê wî. Hinek ji remildar û rêçenasan nûçeya başiya wextê çêbûna wî danê û pê hesandin ku wê ew welat û şaristanan zêft bike.

Tê gotin ku Erdeşîr gotina remildaran bi cih aniye guh daye nûçeya wan û gencî û başiya xwe herroj zêde kiriye. Herweha wî di xew de jî dîtiye ku şahek li ber serê wî rûniştiye û ji bo wî gotiye: “Wê Xwedê welatan bidê”. Dema ew şiyar bûye bi vê yekê pirr şa bûye û di dilê xwe de hêz û mêrxasiyeke xurt ku berê pê re tinebû his kiriye.

Serê pêşî ew meşiya ser devereke [girêdayê bi] Darabecirdê [ve] ku jê re Cûbanan dihate gotin û melîkê ku navê wî Fasîn⁶ bû kuşt. Piştî ew çû cihekî bi navê Kûnîs, melîkê wê Menûşehr [menoçehr] jî kuşt û ji wir jî derbasî Lerwîrê⁷ bû, serokê wir Dara jî kuşt û wan deveran tev da eşîrekê. Dûvre kirinên xwe ji bavê xwe re nivîsand û jê xwest ku here Beydaê, bavêje ser Cûzihr. Ew çû Cû-

zihr kuşt, taca wî zeft kir û ji şahê Çiyayan û hawîrdorên wan **Erdewan Belewî** re nivîsand, beremriya xwe pêşkêş kir û destûr jê xwest ku taca Cûzihr lê de serê kurê xwe Sabûr [Şapûr]. Erdewan nameyeke tûj (sirt) jê re nivîsand û de diyar kir ku kurrê wî Erdeşîr û ew bi kuştina wan giregiran pirr çewtî diki Babek qet guh neda vê gotina Erdewan lê hima zû, di wan rojan de jî mir. **Sbûrê** [Şapûrê] kurrê Babek ew tac da serê xwe, kete cihê bavê xwe û ji Erdeşîr re nivîsand ku [meziniyê] jê re berde. Erdeşîr bi ya wî nekir û li ser vê yel ew ji Erdeşîr xeyidî, leşker kom kir û çû şerê Erdeşîr. Gava ew ji Îstexrê derk birayên wî ku hinek ji wan bi temenê xwe jî jê mezintir bûn, pê hisiyan. Ew r bûn li hev civiyan û tac û textê şahîtiyê dane Erdeşîr. Wî tac da serê xwe li s text rûnişt û hê ji dil û can û bihêztir dest bi karê xwe kir. Wî nîşan li xelkê b la kirin, zilamekî bi navê Ebresam îbn (Kurrê) Re'hfer kire wezîrê xwe û desth latdariyê sipartê. Wî [Erdeşîr] Zilamekî bi navê Fahir⁸ kire serekpîr (serol dînaparêzan). Piştî wî ji birayên xwe bihîst ku hinek kesên pê re dixwazin fen fûtan lê bikin û li ser vê yekî ew rabû wî gellek ji wan kuştin. Dûvre nûçe gih: yê ku hinek ji xelkê Darabecirdê dijî wî rabûne; ew rabû dageriya wir û piş kuştina hinek xelkên wê, wî ew der vegirt. Di pey de çû Kermanê û bi mezir wê yê bi navê Belaş re şerekî giran kir. Erdeşîr bi xwe kete şer û şer kir ta k Belaş dîl girt, dest danî ser bajêr û kurrê xwe yê bi navê Erdeşîr danî ser wir.

Li qerexê deryaya Fars şahekî bi navê Ebtenbûd ku siyaneta wî pirr diha girtin û di hate perestîn, hebû. Erdeşîr çûyê ew kuşt, bi şûrê xwe ew kire du qe kesên der û dorên wî jî tev kuştin û gencîneya ku di mexzenîka wan de heb hemû derxist. Wî [Erdeşîr] ji Mîhrekê mezinê Îrahsana Erdeşîr Xurre û hine kesên din re nivîsand û ji wan xwest ku têkevin ber fermana wî, lê wan fermar dariya wî qebûl nekir. Erdeşîr rabû avête ser wan, wî Mîhrek kuşt û ji wir ç cihekî, li wir wî bi navê "Cûr"ê bajarekî ava kir. Piştî dest bi avakirina Cewse qa ku bi navê Tîrbal jî tê nasîn, kir û beyt-narekê [agirxaneyekê] jî li wir çêkir.

Hê ew wusa di wê navê de peyamê El-Erdewan bi nameyekê ve giha cem El deşîr. Wî xelkê xwe civand û ji wan re nameya wî xwend ku weha digot: "Bê guman te heddê xwe derbas kirye û te kuştina xwe bi destê xwe amade kiriye. Ey **kurdê** ku di nav konên **kurdan** de hatiye perwerde [xwedî] kirin, kî destûr wergirtina wê taca serê te û vegirtina wan welatên ku te zora şah û gelên wa

birine, daye? Kî Fermana avakirina wî bajarê di çolê de – mebest pê Cûr e– li te kiriye? Digel ku me dev ji te û avakirina wî berda jî, te rabû di berriyekê de bajarekî deh fersex (fersexek=12,5 km ye) dirêj ava kir û navê wî danî Remma Erdeşîr”. Bi vê re jî wî pê da zanîn ku melîkê Ehwezê ber pê ve diçe û dê wî bi saxî bîne cem [Erdewan]. Erdeşîr jî weha bersîva wî da: “Xwedê bi xêra wê taca ku min daye serê xwe ji min hiz kiriye, wî ew welatên ku min vegirtine dane min û ji bo kuştina wan şahên Zordar jî alîkariya min kiriye. Încar ez hêvîdar im ku ew bajarê ez ava dikim û navê wî datînim **Remma Erdeşîr** bi te bê cî û serê te û xezîneya te jî ji bo beyt-nara [agirxaneyay] ku min li **Erdeşîr Xurre** ava kiriye, bê şandin.

Di pey de Erdeşîr berê xwe da Îstexrê û Ebresam li Erdeşîr Xurreyê li şûna xwe hişt. Demeke hindik piştî çûna wî, nameya Ebresam ku tê de vegirtina mezinê ehwezê ji nedî ve bi ser ve û vegeza wî zorbirî û şikestî, nivîstîbû. Piştre ew [Erdeşîr] çû Esfehanê mezinê wê Şaz Sabûr [Şah Şapûr] dîl girt û kuşt; ji wir jî ew zivirî Fars û berê xwe da şerê xwediyê Ehwezê Neyrûfer. Ew heyanî Er-Recan, Bunyan û Taşana **Ramehurmuzê** pê ve çû û derbasî ser Surreqê bû. Piştî ku gihîşte wir ew digel hinek hevalên xwe siwar bû û çû heya qerexê Dîcleyê piçûk bajarê wê derê zeft kir, bajarê Sûq el-Ehwezê jî ava kir û tevî talanên zeftkirî dageriya Fars. Dûvre ew bi riya Ciriş û Kazerûnê ji Fars ber bi Ehwezê ve bi rê ket. Ji Ehwezê ew çû Meysanê, mezinê wê Bendû kuşt û li wir bajarekî bi navê Kerxa Meysanê ava kir. Ji wir jî çû Fars, li wir qasidekî şande cem Erdewan û daxwaza diyarkirina cihekî ji bo şer jê kir. Erdewan jî jê re xeber şand ku di dawiya mihirmahê de ew li çola **Hurmuzcanê** li benda wî ye. Erdeşîr berî wextê, xwe gihande wir cihekî ji xwe re girt û ji xwe û leşkerê xwe re xendekê çêkir. Wan kaniyeke ku li wê derê bû ji xwe re girt û di wê navê de Erdewan jî gihîşte wirê.

Leşkerê wan ji bo şer rêz bû, Sabûrê [Şapûrê] kurrê Erdeşîr ji bo parastinê bi pêş ket û cengê di nav wan de dest pê kir. Sabûr [Şapûr] Darabendazê katibê Erdewan bi destê xwe kuşt; Erdeşîr jî hingê xwe di nav leşker de şûlifand û çû gihîşte Erdewan, wî kuşt, gellek ji hevalên wî jî dane erdê û kesên filitî jî revîyan.

Tê gotin ku: “Erdeşîr ji hespê xwe peya bû ye, serê Erdewan xistiye bin lingê

xwe û ji wê rojê û pê ve ew bi navê Şahenşah [şahînşah] hatiye binav kirin.”

Piştî ew ji wir çû Hemezanê [Hemedanê] wir vegirt û çû çiya, Azerbayca Ermenîstan û Mûsilê jî bi zor zeft kir. Di pey de ji Mûsilê çû **Sûrîstanê** ku jê es-Sewad jî tê gotin⁹ wê vegirt û li qerexê Dicle li pêşberî bajarê Tehsebûnê ku dikeve rojhilatê **El-Medainê** bajarekî ava kir û navê wî danî Erdeşîr. Wî çû kire wîlayet û Behuresîr, er-Rûmeqan, Nehr (çemê) Derqît, Kûsa û Nehr (çemê) Cewber da ser û hinek qezayan jî pê ve girêda. Dûvre ji **Es-Sewadê** çû li texrê ji wir jî çû Sicîstan û Cûrcanê, piştî derbasî Ebrîşehr [Bajarê Ewrazî Merwe, Belx û Xuwarzemê bû û pê ve çû ta ku gihîşte tixûbê Xorasanê. Di pey de dageriya Merweyê, hinekan ji wan kuşt, serê wan şande agirxaneyê Enahî û ji wir çû Fars. Ji Fars xwe berda Cûrê, li wir qasidê mezinên Kûşan, Tûran û Mekranê hatin cem û beremriya xwe jê re pêşkêş kirin. Erdeşîr ji Cûrê jî çû li Bahreynê û dora melîkê wê Sentereq¹¹ girt û wî bêgav kir ta ku xwe di sûra kîrî leyê de avête xwar. Ji wir jî çû el-Medaîne li wir ma û di saxiya xwe de tacê serê kurrê xwe Sabûr (Şapûr).¹¹

(. . . .)

Surrî ji Şu‘eyb, ji Seyf, ji Tel’he û ji Ma’han wergirtiye û ji min re nivîsandî ku dibêje: “Xirabtirîne gelê Fars li Celûlayê xelkê Reyyê ye; ew li wir bûne be paqê gelê Fars”. Roja vegirtina Celûlayê xelkê Reyyê wînda bû. Bi giştî tê gotin ku: “Dema Celûlayî dageriyan el-Medaîne û çûne ser erdê wan [Reyiyan], çû es-sewad jî Ji bilî malê Kesra ku Xwedê ew pê paqij kiribûn, kete ber zimme wan û ya wan kesên ku bi wan re lec kiribûn. Gava gotin û dîtina ‘Emer a heqê es-Sewadê û deverên paş wê de gihîşte xelkê Fars hingê tevan pêkve goştî” “Tiştê ku ew pê razî bin em jî razî ne”, lê kurdên deverê neqayil bûn ku kesê li gihîje kozeçêrên wan.¹³

(. . . .)

Vegirtina Fesa û Darabecirdê¹⁴

Surrî ji min re nivîsand ku; Şu‘eyb, Seyf, Muhemmed, Muhelleb û ‘Emr jê gotine: “Sariye îbn (kurrê) Zuneym qesta Fesa û Darabecirdê kir û çû heya li gihîşte leşkerê wan. Ew çû wî avête ser wan û çawa ku Xwedê hizkiribû, do

wan girt. Piştire wan daxwaziya alîkariyê kir, alîkarî gihîşte wan û pê re **kurdên Fars** jî li cem wan civiyan. Hejmareke pirr derkete pêşberî Musulmanan û zor li wan hat. Di wê şevê de ‘Umer di xew de mîna naverojê wê hejmara ku derketibû pêşberî wan û şerrê wan dikir dît. Roja din wî gazî nimêja îne kir û sekinî heyanî wê seeta ku wî ew bi şev dîtibûn. Di wê demê de gava ew derkete ser mînberê jê ve xuya kir ku leşkerê Musulmanan li çolekê ye û ger ku ew li wî ci-hî bimînin dê dora wan bê girtin, lê ku hilkişin çiyayê paş xwe hingê bes ji kê-lekan ve êrîş têne wan. Ew rabû piya û got: “gelî civatê (cema’etê) ez wan herdu beran dibînim”, wî rewşa wan ji civatê re diyar kir û paşî weha kire gazî: “Ey Sariye çiya, çiya”, [hilkişin hêla çiya!]. Piştire li wan fitilî û domand: “Ez hêvî-dar im ku hinek ji leşkerên Xwedê bigihîjin wan”

Ew roj di wê seetê de Sariye û Musulmanên pê re biryar dan ku hilkişin çiyê, ew kişiyên û ji hêlekê ve şer kirin, Xwedê ew ji wan [Musulmanan] re şikandin. Wan [piştire] ev bûyer û vegirtina bajêr digel du‘ayên gel û ewlehiya wan ji ‘Umer re nivîsand.¹⁵

(. . . .)

Nûçeya Beyrûza Ehwazê

Gotin ku: “Dema siwar bi aliyê herêman ve veqetiyên û çûn hingê li Beyrûzê komeke mezin ji kurdan û hinekî din civiya bûn. ‘Umer jî bi Ebû Mûsa re soz dabû ku dema leşker bi herêmên Fars ve bi meşe dê hingê heyanî deverên Bes-reyê here da weku ji musulmanan paşbîrr nê sitandin. Herweha ew ditirsiya ku hinek ji leşkerên wî têkevin nav leşkerên dijmin yan jî bîrr li aliyekî wan bikeve û pişt ji wan bê sitandin. Ew bi kombûna xelkê Beyrûzê hisiya bûn lê Ebû Mûsa rawestiya ta ku ew civiyan ser hev. Piştire di meha remezanê de ew ji bo êrîş-kirina ser wan kesên ku li Beyrûzê kom bûbûn, derketin. Ew li navbera çemê Tîrê û Menazirê pêrgî hev hatin. [Berî hingê] xelkê en-Necdatê, yên **Fars û kurd** jî gihîştibûne wir ku ji nedî ve bi dek û hîle êrîşî ser Musulmanan bikin. Ji xwe wan di vê de yek û dû nedikir. Muhacir îbn Zeyyad ku xwe ji bo kuştinê amade kiribû bi hêrs rabû piya û ji Ebû Mûsa re got: “Her rojîgirî bide sondê ku gava dageriya bira bifitire”. Birayê wî jî di nav wanên sondxwarî de bû, ji xwe wî jî wusa kir ku ew [birayê wî] wî ji cengê nezivîrîne. Ew bi pêş ve çû û

şer kir heya ku hate kuştin û Xwedê xwedênenasan qels kir ta ku xwe li pîsî rezîliyê qedaxe kirin (qelaptin). Piştî birayê wî er-Rebî‘ hat, ew zahf bi hêrs li wî got: “Amade be ya cîhana derewîn¹⁶” Ebû Mûsa gava rewşa Rebî‘ ya ji ber na birayê xwe dît rabû di ber dilê wî de da û ji pêla birayê wî ve ew danî ser leker.¹⁷

(. . . .)

Bûyera navbera Seleme ibn Qeys el-Eşce‘î û Kurdan

‘Ebdullah ibn Kesîr el-‘Ebdî ji min re bahs kir ku wî ji Cafer ibn ‘Ewn, wî Ebû Cenab, wî jî ji Ebû el-Mu’heccel er-Redînî, wî jî ji Muxelled el-Bekrî ‘Eqleme ibn Mersed û wan jî ji Suleyman ibn Bureyde bihîstibû ku: “Dem leşkerê musulmanan li cem **Emîr el-Mu’minîn** (Serdarê Bawermendan) dicivyan wî zilamekî zana û şerîetmedar dikir mezinê wan. Carekê jî dema ku leşk hate cem, ew rabû wî Seleme ibn Qeys el-Eşce‘î kir serdarê wan û jê re got: “Navê Xwedê bîne û here ji bo wî [Xwedê] şerrê wan kesên ku wî înkâr dik bike! Dema hûn rastî neyarên xwe yên muşrik (yên ku hevbeş û şerîkan ji Xwedê re çêdikin) hatin wan bangî sê tiştan bikin: Wan vexwînin ser dîne îslam ger ku musulman bûn lê xwestin li mal bimînin hingê zikat li malê wan dikeve lê di destkeftiyên musulmanan de para wan nîne. Bes ger ku bivên bi we re bi hingê [ji Xenîmetê] tiştê ku ji we re hebe ji wan re jî heye û [ji îbadetê] tiştê ku li ser we hebe li ser wan jî heye. Încar ger ku musulman nebin hingê doza xeracê li wan bikin ku dan herin şerrê neyarên xwe yên din û wan ji xeracê re be din, lê barê zêdeyî qeweta wan li wan nekin. Bes ku wê jî nekin hingê şerwan bikin û bêguman dê Yezdan li hember wan alîkarê we be. Vêca ger ew ber we xwe di keleyekê de asê bikin û piştî bixwazin ku hûn li gor hukum biryara Xwedê û Pêxemberê wî bi wan re bikin, nekin çiku hûn nizanin bê hukum û biryara Xwedê û Pêxemberê wî ji bo wan çiyê! Ger ku ji we soz û peymanîna Xwedê û Pêxemberê wî xwestin, wê jî nedin wan lê yên xwe bidin wan Erke ku şerrê we kirin hingê xwe nesipêrin wan, dev ji wan bernedin û wan destên xwe nefilitînin û zarûkên nûçêbûyî jî nekujin”.

Seleme got: “Em çûn ta ku em rastî neyarê xwe **muşrikên kurd** hatin¹⁸. Mew dawetî ser fermana Emîr el-Mu’minîn (Serdarê Bawermendan) kirin, e

musulman nebûn; me doza xeracê li wan kir ew jî nedan, em rabûn me şerrê wan kir, Xwedê jî alî me kir me şervanên wan kuşt, zarûk û pîrekên wan dîl girtin û mal û pertalên wan civand.¹⁹

(. . . .)

Sedemê avêtina Ebû Mûsa ji aliyê 'Usman ve ji walîtiya Besreyê

Surrî ji min re nivîsand ku Şu'eyb ji Seyf wî jî ji Muhemmed û Tel'he bihîstîbû: Dema 'Usman hate ser hukum wî sê salan Ebû Mûsa kir mezinê Besreyê, lê di sala çaran de wî ew ji mezinatiyê avêt. Herweha wî 'Umeyr ibn 'Usman ibn Se'd jî anî ser Xorasanê, wî 'Ebdullah ibn 'Umeyr el-Leys jî ku ji Kenaniyan bû danî ser Sicistanê. Ew piştîre haya Kabûlê pê ve çû, kuşt û vegirt. 'Umeyr jî bi hêla Xorasanê ve çû wî jî şerr kir û kuşt ta ku gihîşte Ferxana [Turkmenîstanê] û piştî wê tu herêmên ku wî ew neanînîn rê neman. Wî ['Usman] 'Ubeydullah ibn Mu'ammer et-Teymî jî şande Mekranê, ew jî pê ve çû, kuşt û vegirt heya ku giha çem. Herweha Wî Ebdurrehman ibn Xubeys jî şande Kermanê, yekî jî şande Fars û Ehwezê û Berriya Besreyê jî da ser erdê 'Huseyn ibn Ebû Hurr. Piştîre wî ['Usman] 'Ebdullah ibn 'Umeyr ji serkariyê avêt û 'Ebdullah ibn 'Amir anî ser kar, salekê ew kire mezin, lê dûvre ew jî ezil kir. Wî 'Asim ibn 'Emr jî anî ser kar û 'Ebdurrehman ibn Xubeys ji ser kar avêt piştîre wî 'Edî ibn Suheyl ibn 'Edî dîsa zivirande ser kar. D sala sisiyan [ji xelîfetiya 'Usman] de xelkê **Îzecê** û **kurd** kafir bûn, hingê Ebû Mûsa di nav xelkê de da gazî kirin, wan teşwîq kir û qala başiya çûna şerr bi piya kir ta ku hinek kesan xelkê li dewarên xwe siwar kirin û xwe kirin yek ku bi piya derkevin herin şer. Lê hinek ji wan jî gotin: "Na bi Xwedê em lez nakin ta em binêrin bê çî bi wan tê. Erke gotina wî bişubihe kirina wî hingê em ê jî wek hevalên xwe bikin."²⁰

(. . . .)

Ebû Mîxnef got ku 'Hesîre ibn 'Ebdullah el-Ezdî, Fudeyl ibn Xedîc el-Kendî û En-Nedr ibn Salih el-'Ebesî jê re weha qal kirine: "Zilamê pêşî ku el-Muxtar pê re peyman çêkir û ala hilda 'Ebdullah ibn el-'Harisê birayê el-Uştur bû. Wî ji bo çûyina ser Ermeniyên pê re peyman çêkir û Muhemmed ibn 'Umeyr ibn 'Utarid jî şande ser Azerbaycanê û 'Ebdurrehman ibn Se'îd ibn Qeys jî şande

ser Mûsilê. Herweha Îshaq îbn Mes'ûd jî şande ser el-Medaîne û erdê Cû Wî Quddame îbn Ebû 'Îsa îbn Rebî'e en-Neserî ku hevkarê Seqîf bû şande ser Bihqubaza jorî, Muhemmed îbn Ke'b îbn Qereze jî şande ser Bihqubaza navî 'Hebîb îbn Menqez es-Sewrî jî şande ser Bihqubaza xwarî. Wî Se'd îbn 'H zeyfe îbn el-Yemanî jî bi hezar siwarî ve şande ser 'Hulwanê." Wî [Ebû mîxnef] got ku: "Wî [Muxtar] hermehê hezar dîrhemî [diravî] dida wî [Se'îd] da ku ew serê rîyan bigire û şerê **kurdan** bike."²¹

(. . . .)

Çûyina Muterref îbn el-Muxîre ser 'Heccac û 'Ebdulmelik

Wî [Ebû Mîxnef] got: "Hevalên wî [Muterref Îbn el-Muxîre] xwe avêtinê û jê re li hev hatin. Di pey de ew kete nav karwanê xwe û xeber şande cem Seb'î îbn 'Ebdurrehman îbn Mîxnef û cem 'Ebdullah îbn Kennaz en-Nehedî, wan anî ba hev û ji wan va ku ew jî wek hevalên wî yê din bikin. Wan qîma xwaranê û dema ew bi rê ket ew jî bi hevalên wî re zivirîn, çûn heya ku li Şebîbê gihîştin Heccac û pê re bûyera Şebîbê dîtin.

Wî (Ebû Mîxnef) got ku: "Muterref ji ed-Deskereyê bi hevalên xwe re derket û berê xwe da Hulwanê. Wê salê 'Heccac jî, Suweyd îbn 'Ebdurrehman ew Se'dî şandibû ser 'Hulwan û Masebzane. Dema nûçe gihîşte [Suweyd] ku Muterref îbn el-Muxîre berê xwe daye erdê wî, famkir ku Heccac qebûl nake ew [Suweyd] bibe hevalê wî [Muterref] û ne jî jê re xweşekiyan bike. Suweyd rabû ji bo şerê wî xelkê bajêr û **kurdan** da hev. Heçî **kurdan** ew deverên bilind yê 'Hulwanê girtin û Suweyd jî ji ber ku ne dixwest şerê wî [Muterref] bikir lê ji bo ku ji 'Heccac jî bifilite rabû çû pêşiya wî, bes çûyina wî ji bo lêborînê bû".

Ebû Mîxnef got ku; 'Ebdullah îbn 'Elqeme el-Xes'emî ji min re weha qal dide kir: "Dema 'Heccac îbn Cariye el-Xes'emî derketina Muterref ji el-Medaîne hilkîşîna wî ya ber bi çîyan ve bihîst ew jî digel nêzî 30 zilamî ji eşîra xwe û henekî din jî pê re, çûn." Wî [Ebû Mîxnef] domand: "Ez jî di nav wan [30 kesar] de bûm û em li 'Hulwanê gihîştin wan. Em jî digel wî bûne şahidê cenga Suweyd îbn 'Ebdurrehman".²²

(. . . .)

En-Nedr îbn Salih ji Ebû Mîxnef re gotiye: “Min dît ku ew nêzî dused kesî bûn”. Herweha îbn ‘Elqeme jî got: “Ew ji sêsed kesî hindiktir bûn. Muterref gazî ’Heccac îbn Cariye kir, bi qandî hejmara wan jî çekdar dane wan û ew şandin ser el-Qe‘qa‘iyên ku qesta kuştina wî dikirin û palewanine perwerdekirî bûn. Dema Suweyd dît ku em ber bi kurrê wî ve diçin, rabû xulamekî xwe bi navê Rostem ku piştî li dêra Cemacemê pê re hate kuştin, digel alaya Îbn Se‘d şande cem wan. Xulamê wî meşiya ta ku gihîşte ’Heccac îbn Cariye, wî bi tenê kir û jê re got: “Ger ku hûn bixwazin di welatê me de derbasî cihekî din bibin, fermo derbas bin! Em şerê we nakin, lê erke qesta we em bin divê hûn pêşî tiştên ku di destên me de ne, ji me bistînin”. Dema vî tiştî ji ’Heccac re got wî jê xwest ku here vê yekê ji serdarê wan re jî bibêje. Ew rabû çû cem Muterref û tiştê ku ji ’Heccac re gotibû ji Muterref re jî dubare kir. Muterref weha bersîv da: “Em nehatine we û welatê we”. Wî jî got: “Nexwe têkevin ser vê rê heya ku hûn ji welatê me derdikevin; em navên ku kes hatina me ya pêşiya te bibîne û bibihîze”.

Wî [Ebû Mîxnef] got: “Muterref şande pey ’Heccac, ew hat û ew ketin ser wê rê ta ku gihîştin wan qiracên jorî û **kurdan** li wir dîtin. Muterref û hevalên xwe giş li wir peya bûn. Ji aliyê rastê ve ’Heccac îbn Cariye û ji yê çapê ve jî Suleyman îbn ’Huzeyfe hilkişiyane wan [**kurdan**], ew şikandin û kuştin. Muterref û hevêlên wî bi selamêtî li rîya xwe domandin û çûn heya nêzî Hemezane [Hemedanê] lê neketinê, ji wir fitilîn hêla çepê û heya ava Dînarê çûn. Hingê birayê wî [Muterref] ’Hemze îbn el-Muxîre mezinê Hemedanê bû; ji wê bonê ew nekete wir da ku birayê wî li cem ’Heccac nekeve bin şikê. Paşînê gava ew gihîşte ava Dînarê hingê rabû ji birayê xwe ’Hemze re nivîsand: “Piştî spaskarî û du’ayan, bêguman nefeqe pirr bûye û mûnet giran bûye, ji çek û mal çî ji te hat alîkariya birayê xwe bike!”²³

(. . . .)

Wî [Ebû Mîxnef] got: “Ew [‘Edî îbn Werad] ji bo hazirkirina leşker derket gazî perwerdekarên leşkerî kir û ji wan xwest ku çaryekê gel ji bo leşkeriyê bicivînin. Hê înek neçûbû ku em gihane Ceyyê; li wir jî nehse kes ji xelkê Şamê tevî ’Umer îbn ’Hubeyre û Qubeys el-Qehaffî gihîştin me. Em bi tenê du rojan li

wir man. 'Edî îbn Wetad di gel mirovên ku bi ya wî dikirin û sêhezar şervar xelkê Reyyê, hezar şervan jî bi el-Bera' îbn Qubeyse re ku 'Heccac ji Kufe şandibûn, heftsed kesên Şamî û nêzî hezar mêrxasî jî ji xelkê Esfehanê û **ku dan**, pê re [bi 'Edî re] rabûn. Dema ku tev gihîştin cem Muterref îbn el-Mu re hejmara wan bi tevayî bûbû nêzî şeş hezar şervanî.²⁴

(. . . .)

Wî [Ebû Mîxnef] got: "Îbn el-Eş'es û Fellên ku pê re şikestibûn ber bi Sicist nê ve çûn. Heccac, 'Emmare îbn Temîm el-Lexemî kire mezinê leşker û bi ku rê xwe Muhemmed îbn 'Heccac re xiste pey wan. 'Emmare îbn Temîm da p 'Ebdurrehman, li Sûsê gihîştê û naverojê bi qasî s'etekê pê re şer kir. Piştê ['Ebdurrehman] û hevalên xwe şikestin û reviyar çûn heya gihîştin Sabûrê [Ş pûrê]. [Li wê derê] **kurd** jî digel Fellên ku pê [bi 'Ebdurrehman îbn Muher med] re bûn li dora wî civiyan. 'Emmare îbn Temîm li 'Eqebetê şerekî mez bi wan re kir lê 'Emmare û pirrên hevalên wî birîndar bûn. Di pey de 'Emma û hevalên xwe reviyar û 'Eqebeyê ji wan re berdand. 'Ebdurrehman pê ve çû h ya gihîşte Kermanê.²⁵

(. . . .)

Reva Yezîd îbn el-Muhelleb û Birayên wî ji Zindana 'Heccac

Di sala 90/708'an de Yezîd îbn el-Muhelleb, birayên wî û hinek kesên din ku pê di zindanê de bûn, reviyar û çûn gihane Suleyman îbn 'Ebdulmelîk û pê xwe 'Heccac îbn Yûsuf û ji Welîd îbn 'Ebdulmelîk azad kirin.

Sedemê rizgariya wan ji zindana 'Heccac û çûyina wan bi bal Suleyman ve.

Hîşam got ku; Ebû Mîxnef li ser devê Ebû el-Muxarîq er-Rasibî ji min re got ye: "Ji ber ku **kurdan** erdê Fars giş zeft kiribû, 'Heccac rabû ji bo lêgerînê (te rêşê) derket û berê xwe da Rustuqbazê. Wî Yezîd, birayê wî el-Mufeddel û 'Ebdulmelîk jî bi xwe re bire Rustuqbazê. Wî nêzî odeya xwe di nav leşker de xel dekek çêkir, konekî reş veda, wan xistê û yekî Şamî kire pasbanê wan. Wî bi ş hezar dirav ew deyndar kiribûn û zor dida wan ku deynê xwe bidin. Yezîd b

di ber xwe de dida lê 'Heccac jî pirr pê diqehirî. Carekê jê re hate gotin ku: "Tîrek li paqa Yezîd ketiye û sertîr tê de maye, ji ber vê yekê gava tiştekan lê dikeve qarîn jê diçe, hima piçek jî bê libitandin deng jê dertê. 'Heccac ferman kir ku eziyet bidinê û çîqên wî îşk bikin. Dema wusa lê hate kirin qarîn jê çû. Xweha wî Hinda qîza Muhelleb ku hingê li cem 'Heccac bû, qarîna Yezîd bihîst, wê jî kire qêrîn û li ser gerand. Li ser vê yekê 'Heccac jî rabû ew berda. Piştî hingê wî dev ji îşkdana wan berda lê deynê xwe jî her ji wan dixwest. Wan jî timî ew [deyn] hino hino didanê, bes pê re jî lê dişuxulîn ku ji wir xilas bibin.

Wan [xeber] şande cem Merwan ibn el-Muhelleb ku hingê li Besreyê dima û jê van ku ji wan re çend hespan amade bike. Herweha wan jê xwest ku ew wan wek hespên firotinê nîşan bide, lê bihayekî wusa pirr li wan bike ku nêne firotin. Bi vî awayî ka belkî ew karibin bi wan xwe ji wir rizgar bikin. Merwan jî wusa kir bes di wê navê de Hebîb jî li Besreyê di eziyetê de bû. Yezîd Xwarineke zahf ji nobetdaran re da çêkirin û şerabê jî ji wan re da anîn, wan jî xwar û vexwar û pê ve mijûl bûn. Yezîd rabû cilê aşpêjan li xwe kir riyekî spî bi xwe ve danî û derket. Pasbanekî ew dît û got: "Ev mîna ye meşa Yezîd", dûvre çû li ruyê wî nihêrt dît ku riyê wî spiye dev jê berda, got: "Ev pîr e" û çû. Herweha El-Mufeddel jî li pey derket û kes bi wî jî nehisiya. Ew çûne gemiya xwe ya ku li kelebestê hatibû amade kirin û di nav wê û Besreyê de 18 Fersex hebûn [fersexek 12,5 km ye - E. N.] Ew gihîştin gemiyê lê Ebdulmelîk dereng ma û ji wan bi paş ket. Yezîd ji Mufeddel re got: "Siwar be dê ew bigihîje me", lê Mufeddel ku birayê Ebdulmelîk yê ji dê, (ji Behleya Hindî) bû, got: "Na bi xwedê, ger ez dagerim zindanê jî ez ji vir ranabim ta ku ew jî were". Yezîd jî rawestiya ta ku 'Ebdulmelîk jî hat gihîşte wan. Ew pêkve li gemiyê siwar bûn û bi rê ketin, ew bi şev çûn heyânî berbanga sibê. Piştî ku bû sibe hê nobetdar bi reva wan hisiyên û xeber dane Heccac.²⁶

(. . . .)

Tayinkirina Xalid ibn Bermek ji bo Walîtiya Mûsilê

Yek ji wan bûyerên ku di vê salê (158/774) de çêbûne şandina **Xelîfe el-Mensûr** kurrê xwe Mehdî bi aliyê er-Reqê ve, fermankirina wî bi avêtina Mûsa ibn Ke'b ji ser Mûsilê û tayinkirina **Ye'hya ibn Xalid ibn Bermek** ji bo Walîtiya

wirê [Mûsilê] ye. Li gor ku 'Hesen îbn Weheb ji Salih îbn 'Etiyye bihîstiye s demê vê yekê ev bûye: "El-Mensûr sêhez ar hezar [3 milyon] dirav wek cirm Xalid birrîbû, ji ber ve jî xwîna wî lê nezir kiribû û sê roj moledan dabûyê. Ser vê yekê Xalid ji Kurrê xwe Ye'hya re got: "Kurrê min zor li min hatiye û ti tê ku ji min nayê ji min tê xwestin. Bêguman mebest bi vê jî bes serê min e. T lê xe here cem kulfet û ehlê xwe, tiştê ku tu dê piştî mirina min bikî hima vêt bike". Piştî wî weha domand: "Kurrê min ji xwe kes rê li ber te nagire ku xwe bigihîjî cem dostên me û di ba 'Ummare îbn 'Hemze, Salihê xwediyê e Mûsellayê û Mûbarekê Turk de bibihûrî û wan bi rewşa me bihisîn".

Salih îbn 'Etiyye jê [el-'Hesen îbn Weheb] re qise kiriye ku; Ye'hya [bi xwê jê re weha gotiye: "Ez çûm cem wan, hinek ji wan madê xwe ji min kirin û li dizî mal ji bo min şandin. Hinekan jî destûr ned ku ez herim hizûra wan lê pey min mal şandin".

Piştî wî weha domand "Min destûr ji 'Ummare îbn 'Hemze xwest û ez derketim cem; ew li dergehê xwe û berê wî li hêla dîwar bû. Wî berê xwe jî ned min, min lê silav kir, wî bi dengê nizim silava min vegirt û pirsî: "Kurrê mi bavê te çawa ye?" Min got: "Baş e, silavên wî ji te re hene û dîviya ku tu li serê vê yeka ku hatiye serê wî bêyî agahdar kirin û sedhez ar dirav alîkarî ji te dipê Wî ne ji pîrî û ne jî ji hindikî tu bersîvek neda min. Cih li min teng bû, erd dora min hejiya, lê demek piştî min tiştê ku ez pê ve hatibûm jê re got". Paş wî wusa bersîv da: "Ger ku ez karibim ez dê bidim te".

Ye'hya got: "Ez ji cem derketim lê min di dilê xwe de digot: 'lanet li hertişt ku ji kubarî, qurretî û nefsmeziniya te bê, be'. Ez çûm cem bavê xwe û min bû yerê jê re qise kir û jê pirsî: Ez dibînim ku tu bi 'Ummare îbn 'Hemze zêde ba werî? Lê bawerî pê nayê. Hê ez wusa qasidê 'Ummare îbn 'Hemze bi sedhez ar dirav ve xuya kir.

Di du rajan de me du hezar hezar (2 milyon) û heftsed hezarî civand lê sêsed hezar kêma. Bi peydakirina wan xebata me encama xwe dida lê bi derengxis tina wan jî xebata me giş vale diçû".

Wî got: "Bi Xwedê ez dilbikil û bi keser li Bexdadê li ser pîrê digeriya gavê keştîvanekî xwe avête cem min û pirsî: Ma ez ji te re bêjim ku teyr têtjik derxis tiye? Min berê xwe jê dagerand lê ew ji min neqetiya, bi min ve eliqî û ji min

re got: ‘Bi Xwedê tu xemgîn î lê dê Xwedê derdê te derman bike û beyaniyê tu dê di vir de digel alayê derbasbibî’. Ez li gotina wî şaş mam lê wî domand: ‘Ger ku rast derket 5000 diravên min li te’. Min got: ‘Baş e’ û ez çûm. Ku bigotina 50 hezar jî min dê bigotina erê çiku bûna wî li cem min pirr dûrî aqilan bû”. [Di wê navê de] xebera serîhildana Mûsilê û ya belavbûna **kurdan** li wir giha el-Mensûr; wî jî pirsî: Kî diçe wir? Dostekî Xalid îbn Bermek bi navê Museyyib îbn Zuheyr got: “Ey Emîr el-Mu’minîn (Serdarê Bawermendan) dîtineke min heye lê ez dibînim ku tu guh nadî şîretên min û wan napejirînî. Bes ez ne ku şîretan li te dikim lê bi te dişewirim”. Wî [el-Mensûr] got: “bibêje ez wan wek şîretên xayinî nabînim” Wî [Îbn Zuheyr] got: “Tu yekî weke Xalid jê re nabîni”; wî pirsî “Waweylê! Ma piştî vê yeka ku me pê re kir êdî ew ji me re dibe?”.

–Erê ya Emîr el-Mu’minîn, te bes wî xurt û rast kirye, ez dibim keflê wî.

– Bira be welleh ew jê re, bira hima sibê were û tu jî were! Wî (el-Mensûr) 300 hezarê mayî jê re bexişand û pê re li hev kir.²⁷

(. . . .)

Muhemmed îbn ‘Ebdullah ji ber tirsê hatina Turkan ber bi Enbarê ve, ferman kir ku sikran biteqînin û avên wan berdîn ser devera Enbarê û yên nêzî wê mîna devera Baduraya û bi vî awayî riya wan bibirrin. Yên ku vî karî girtibûn ser milê xwe Necûbet îbn Qeys û Muhemmed îbn ‘Hemd îbn Mensûr es-Se’dî bûn.

Muhemmed îbn ‘Ebdullah nûçeya çûyina Turkan bi pêşiya Şemseya ku bi Beynûqê Ferxanî re bû, da hevalên wî yên parastina wê. Muhemmed çarşema berî meha Muherrema sala 251/865’an bi deh rojan Xalid îbn ‘Umran û Bendarê Teberî şande devera Enbarê. [Muherrrem, meha pêşî ji salnameya koçî ya qemerî (hîvî) ye ku li vir dibe îna 2’yê sibata sala 865’an- E. N.] Piştî wan jî wî, Reşîd îbn Kawis şand. Ew di rê de rastî Beynûq û Turk û Mexribiyên ku pê re bûn, hat. Xalid û Bendar doza Şemse li wan kirin Beynûq û hevalên wî bi Xalid û Bendar re çûn Bexdadê cem [Xelîfe] el-Muste’în.

Muhemmedê kurrê Hesênê kurrê Cîleweyhê **kurdî** (Muhemmed îbn Huseyn îbn Cîleweh **el-Kurdî**) alikariya ‘Ukbera girtibû ser xwe. Hingê Zilamekî Mexribî jî ku li ser er-Razanê bû gellek malê xelkê civandibû. Îbn Cîleweyh çû

bal û jê xwest ku malê gelê navçeyê bide wan lê wî neda û pê re şer kir. Îbn Cîleweyh wî mexribiyî dîl girt, û digel 12 hezar dînar û 30 hezar dîrhem ji ma xelkê navçeyê anî ber deriyê Muhemmed îbn 'Ebdullah. Wî jî deh hezar dî hem ji wan da Îbn Cîleweyh.²⁸

(. . . .)

Di meha rebî' el-axera [meha çaran ji salnameya koçî ya qemerî (hîvî) ye - E. N.] vê salê [251/865] de di bin serdariya Eblecê²⁹ Turk de siwar û peya duse kes ji aliyê Mu'tezz ve ber bi herêma Bendenecînê ve hatibûn şandin. Wan av te ser Hesenê kurrê Elî, êrîşî ser gundê wî kirin, xaniyê wî xirakirin û piştre çar ne gundekî nêzikî wir, li wir xwarin û vexwarin. Dema ku li wir dilbcih bû hingê Hesenê kurrê Elî jî ji gundekî dora gundê xwe û ji xalanên xwe yê **kurd** alîkarî xwest ku bavîjin ser wan. Ew çûn avêtin ser wan [mirovê Mu'tezz] û ew jî reviyên lê ew [mirovên Hesenê Elî] gihîştin wan li wan da zahfên wan kuştin û hivdeh kes ji wan dîl girtin. Eblec jî hate kuştin û yê nêkilî filitîn jî bi şev reviyên. Piştre Hesenê kurrê Elî yê nêkilî girtî tevî serê Eblec kuştiyên din hemû şandin Bexdadê. Hesenê Kurrê Elî bi xwe Zilamekî Şeybanî bû û çawa li pêş jî bihûrî gellek caran cihgiriya Yehyayê kurrê Hefs jî kiribû, diya wî **kurd** bû.³⁰

(. . . .)

Di sala 258/871'ê de Mesrûrê Belxî (Mesrûr el-Belxî) êrîşî ser kurdên Yaqûbî kir ku wan şikand û gellek zirar da wan.³¹

(. . . .)

Bûyerek ji yê nêzikî (260/873) kuştina Muhemmedê Kurrê Harûnê kurdî Mu'ammer e ji aliyê zilamekî ji kurdên hevalên Musavir eş-Şarî ve ye. Wî ew [Muhemmed] li Zewreqê dît ku qesta Samûrra dikir; wî [yê **kurd**] ew li wî kuşt û serê wî şande cem Musawir. Di meha cemadulaxerê de [Meha şeşan ji salnameya koçî ya qemerî (hîvî) ye - E. N.] Rebî'e doza xwîna wî kir û li ser wî yekê Musrûrê Belxî û hinek serdarên din mirov şandin ku herin riya Musawir bigirin.³²

(. . . .)

Di sala 262/875'an de hevalên Yaqûb îbn Leys - ji ber ku hemla wan li ser Muhammed îbn Wasil bû- avêtin ser xelkê Zemma³³ Mûsayê kurrê Mîhranê **Kurdî** û Mûsayê kurrê Mîhran ji ber wan şikest.³⁴

(. . . .)

Bûyera Navbera Zenciyan û Ehmed îbn Leyseweyh

Di vê salê (262/875) de şerek di navbera Zenciyan û Ehmedê kurrê Leyseweyh de qewimî gellek ji wan [Zenciyan] hatin kuştin û Ebû Dawud es-Su'lûk ku bi Zenciyan re çûbû şer hêsîr bû.

Tê gotin ku: "Mesrûrê Belxî, Ehmedê kurrê Leyseweyh şande navçeya Ehwezê ew çû gihîşte wir û li Sûsê peya bû. Berî hingê, Seffar jî herêma Ehwezê, dabû Muhammedê kurrê 'Ubeydullahê kurrê Ezazemerdê³⁵ Kurdî. Muhammedê kurrê 'Ubeydullah (Muhammed îbn 'Ubeydullah îbn Ezazemerd **el-Kurdî**) jî name şand cem serdarê Zenciyan ku wî bikişîne hêla xwe. – Ji xwe hê ji dema destpêka derketina wî [serdarê Zenciyan] ve Muhammed jê re name rêdikirin û hêvî didanê ku dê walîtiya navçeya Ehwezê bidê û es-Seffar jî qayil bike heya ku rewşa wî [Serdarê Zenciyan] li wir baş bibe. Xubeys³⁶ jî bi şertê ku Elî îbn Eban bibe waliyê navçeyê û Muhammed îbn 'Ubeydullah jî bibe cîgirê wî erê kir. Muhammed îbn 'Ubeydullah jî şertê wî pejirand. Elî îbn Eban birayê xwe Xelîl îbn Eban tevî komeke zahf ji Sûdaniyan û hinekî din rê kir û Muhammed îbn 'Ubeydullah jî ew bi Ebû Dawud es-Su'lûk bihêztir kirin. Ew bi hêla Sûsê ve çûn lê negiştinê, Îbn Leyseweyh û mirovên Sultan ku pê re bûn nehiştin têkevin wir. Ew şikestî zivirîn, gellek ji wan jî yan hatin kuştin yan jî dîl bûn. Ehmed îbn Leyseweyh pê ve çû haya ku li Cindîsabûrê [Cindîşapûrê] peya bû.

Elî îbn Eban ji bo alîkariya Muhammed îbn 'Ubeydullah ji Ehwezê çû da ku zora Ehmed îbn Leyseweyh bibin. Muhammed îbn 'Ubeydullah jî bi hinek **kurd** û Su'lûkiyan ve çûne pêşiya wî û dema Muhammed nêzîkayî lê kir hingê ew pêkve meşiyar. Wan [çemê] el-Musruqan xiste nav xwe û heryek li kêlekeke wî meşiyar. Piştî Muhammed îbn 'Ubeydullah hevalekî xwe digel sêsed siwarî şand ba Elî îbn Eban, hêzên wan bûn yek û bi hev re çûn ta ku gihîştin

leşkerê Mukrem. Muhemmed îbn 'Ubeydullah û Elî îbn Eban hev bi tenê kirin û xeberdan, piştî Muhemmed dageriya cem leşkerê xwe. Wî Qasim îbn Ibrîhîm û yek ji serokên kurdan ku jê re Hazim di hate gotin, tevî şêxek ji hevalên cî Seffar ku navê wî et-Talaqanî bû, şande nik Elî îbn Eban. Ew çûn gihîştin ce Elî û silav lê kirin. Elî û Muhemmed her dost man ta ku Elî gihîşte sikra Fars muhemmed îbn 'Ubeydullah jî kete Tusterê. [Di wê navê de] nûçeya hevgirtî û hevkarîya Elî îbn Eban û Muhemmed îbn 'Ubeydullah li hember ehmed Êlî Leyseweyh gihîşte Ehmed û ji ber vê yekê ew rabû ji Cindîsabûrê [Cindîşapûrê] derket û berê xwe da Sûsê. Elî ku berê Muhemmed îbn 'Ubeydullah pê soz dabû dê di xutbê de li ser mînbera Tusterê li ser navê serdarê Zenciyan û wî [Elî îbn Eban] du'a bike, roja îne gihîştibû ser sikra Fars û li benda xutbê wî bû. Wî [Elî] Behbûz îbn 'Ebd ul-Wehhab şandibû nimêja îne ku xeberê re bîne. Wextê nimêjê mele xutbe xwend û ji Mu'temed [xelîfeyê hingê], cî Seffar û ji Muhemmed îbn 'Ubeydullah re du'a kir. Qasidê Elî vê xeberê jê anî, ew jî pêre pêre siwar bû û li hevalên xwe ferman kir ku bizivirin Ehwaz Wan da pêşî, biraziyê wî Muhemmed îbn Salih û cihgirê wî Muhemmed îbn Yehyayê Kermanî jî tevî katibê xwe bi wan re derketin. Ji bo ku siwar negihîştine wan ew bi wan re kişiyên heya wan jî şikêneka sikrê derbas kirin.

Muhemmed îbn Hesen got: "Ez jî di nav wan hevalên Elî yê bi paş ve zivirî de bûm. Di wê şevê de leşker zû bi rê ket û berê sibê bi şevqê re gihîşte leşkerê Mukrem ku hingê ketibûn Selm el-Xubeys. Hevalên wî sozên xwe şikandî. Êrîşî ser leşkerê Mukrem kirin û xwe gihandin talanan. Elî îbn Eban jî da perê çê hevalên xwe û ew gotinê ku berê di nav xwe de kiribûn anî bîra wan lê ne karibû wan [ji kirinên wan] vegeftin û çû heyanî gihîşte Ehwazê.

Dema nûçeya zivirandina Elî gihîşte Ehmed îbn Leyseweyh ew dîsa dageriya û çû Tusterê. Wî ji wir êrîşî Muhemmed îbn 'Ubeydullah û yê pê re kir; Muhemmed filitî lê Ebû Dawud es-Su'lûk kete destê wî [Ehmed îbn Leyseweyh wî ew [es-Su'lûk] şande cem sultan el-Mu'temed û ew [Ehmed] li Tusterê ma.

Fedl îbn 'Edî ed-Daramî ku Yek ji hevalên Serdarê Zenciyan bû û leşkerê xwe bi yê birayê 'Elî, Muhemmed îbn Eban re kiribû yek ji Muhemmed îbn 'Hersen re weha qal kiribû: "Gava Ehmed îbn Leyseweyh li Tusterê bi cih bû Elî îbn Eban jî bi leşkerê xwe ve bi wir ve çû heya ku gihîşte gundekî bi nav

Berencanê û ji wir nijdevanên xwe şande pêş ku rewşa wî [Ehmed] hînbibin. Ew vegeyriyan û xeber danê ku Îbn Leyseweyh ber pê ve tê û pêşiya siwarên wî gihîştine gundekî bi navê el-Baheliyyînê. Elî îbn Eban jî leşker kişande şer û mizgînî û sozê serkeftinê da hevalên xwe û wusa nîşan da ku ew soz ê el-Xubeys e. Li Baheliyyînê Îbn Leyseweyh tevî siwarên xwe ve ku bi qandî çarsed kesî bûn, derket pêşiya wan. Herku çû alîkarî zêde bû û siwarên hevalbendên Sultan pirrtir bûn. Hinek ji erebgêrayiyên [Ew kesên ku eslê wan ne ereb in lê asîmîle bûne- E. N.] ku bi Elî îbn Eban re bûn jê [ji îbn leyseweyh] ewleyî xwestin û çûne aliyê wî. Siwarên Elî îbn Eban ên mayî jî şikestin û ji peyayên wî jî hindik li cihê xwe man, lê pirrên wan ji hev belabûn.

Şer di nav wan de germ bû lê dawî Elî jî peya ma û bi xwe bi peyarî kete şer. Xulamekî Ebû 'Heddadê hevalê wî ku navê wî Fet'h bû bi tenê pê re ma û pê re şer domand. [Di nav şer de] çavên Ebû Nesr Selheb û Bedr er-Rûmî ku bi nasnavê Eş-Şe'ranî jî dihate naskirin, pê ket û ew naskirin. Wan berê şerkaran da ser û şer lê giran kirin. Ew bi paş ve kişiya û reviya çû ta ku gihîşte cemê Mesruqanê û xwe avête nav. Fet'h jî li pey çû û wî jî xwe avêtê. Fet'h [bi xwe] xeniqî lê Elî gihîşte cem Nesr er-Rûmî. Wî ew ji avê xilas kir û xiste keştiyekê, lê şervanan tîrek avêtê û li çîqê wî xistin. Ew bi halekî perîşan zivirî û gellek ji egîd û fêrisên Sûdaniyan jî hatin kuştin.³⁷

(.)

Rewşa es-Seffar li wir di vê salê [263/876] de

Hatiye gotin ku: "Dema Yaqûb îbn Leys gihîştîye Cindîsabûrê [Cindîşapûrê] û li wir peya bûye çî mirovên ku ji ber Sultan ve li wir bûne tev ji wê derê çûne. Wî [Yaqûb îbn Leys] yekî bi navê el-H'usn îbn el-'Enbar şandiye Ehwazê. Gava ew ['Husn] nêzî wir bûye Elî îbn Eban yê hevalbendê serdarê Zenciyan ji wir [Ehwazê] derketiy. Ew jî ['Husn] çûye li cemê Sedreyê peya bûye, ketiye keleya Ehwazê û tê de rûniştîye. Hevalên wî û yên Elî îbn Eban dest bi avêtina ser hev kirine û derbên dijwar li hev û din xistine. [Vê yekê wusa domandîye] heya ku Elî xwe qenc daye ser hev û çûye ser Ehwazê. Elî êrîşeke xurt biriye ser 'Husn û hevalên wî, gellek ji mirovên Yaqûb kuştine, hespên wan zeft kirine û gellek ji pezên wan jî talan kirine. Husn bi mirovên xwe ve reviyaye cem leşke-

rê Mukrem û Elî jî tiştên ku li wir ma bû giş talan kiriye. Ew çendakî li Ehwa zê maye, piştî ziviriye çemê Sedreyê û ji Behbûz re nivîsandiye ku êrîşî ser yel ji hevalên es-Seffar ên **kurd** ku li Dewreqê dima, bike. Behbûz avêtiye ser, hevalên wî kuştine û ew [**kurd**] dîl girtiye, lê piştî qencî pê kiriye û ew berdaye. Piştî hingê Elî çavnêriya êrîşa Yaqûb kiriye lê wî êrîş nekiriye.³⁸

(. . . .)

Di vê salê [263/876] de Îshaq îbn Kundacîq ji leşkerê Ehmed îbn Mûsa îbn Buxa veqetiya, çiku dema Ehmedê îbn Mûs îbn Buxa tayînî Cizîrê bû Mûsa îbn Atamîş kire waliyê Diyarê Rebî'e, lê Îshaq ev yek nepejirand, leşker jê re veqetand û çû ser herêmê. Wî li wir êrîşî ser kurdên Yaqûbî jî kir, ew şikandin, malên wan talan kir û xwe pê bihêz kir. Piştî ew rastî Îbn Musawir eş-Şarî hat ew jî kuşt.³⁹

(. . . .)

Ketina hevalên serdarên Zenciyan ya Ramehurmuzê 40

Di vê salê [266/879] de Hevalbendên Serdarê Zenciyan ketin Ramehurmuzê.

Sedemê çûna wan ber pê ve

Li pêş me rewşa Muhemmedê kurrê 'Ubeydullahê **Kurdî** û hevalbendê el-Xubeys Elî îbn Eban diyar kiribû ku li hev hatibûn û qeweta xwe kiribûn yek. Tegotin ku; ji hingê ve Elî ji ber bûyerên rê di dilê xwe de kîn ji Muhemmed gihtibû û hertim xirabiya wî dixwest. Herweha Muhemmed îbn 'Ubeydullah jî li wê yekê hisiyabû û diviya ku jê xilas bibe. Wî rabû ji Îbn el-Xubeysê re ku li navê Enkelay jî tê nasîn, name rê kir û hediye şandin. Piştî wî ji el-Xubeys pirsar herêma xwe kir û jê xwest ku wê bisipêre wî û destê Elî ji ser rake. Vê yekê xeyd û kerba Elî îbn Eban zêdetir kir û wî ev xeyd û dilêşiya xwe ji el-Xubeys re nivîsand, ew pê hisand û jê destûr xwest ku xeraca herêma Muhemmed bike manî (behane) û bavêje serê. El-Xubeys ew destûr dayê, wî jî ji Muhemmed îbn 'Ueybdullah xwest ku jê re mal [xeracê] bibe lê wî ew veşart û neday. Elî rabû hazirî kir û avête ser Ramehurmuzê ku hingê Muhemmed îbn 'Ubeydullah li wir dima.

Muhemmed nikaribû xwe ragire, ew reviya û Elî kete Ramehurmuzê, wir talan û tajan kir. Muhemmed îbn ‘Ubeydullah çû gihîşte geliyên Erbeqe û Beylemê ku geliyên wî yên herî dûr bûn. Elî jî bi talanê wî ve zivirî. Muhemmed li ser vê yeka Elî şaş bû û jê re nivîsand, jê pirsra gelşê û daxwaziya çareserkirina wê kir. Elî jî ev daxwaziya wî gihîştande Xubeys. Wî jî li Elî ferman kir ku ew daxwaziya wî bipejirîne û Muhemmed jî jê re mal bar bike û bibe. Muhemmed îbn ‘Ubeydullah dused hezar dîrhem (dirav) bir, Elî jî ew gihandin el-Xubeys û dev ji Muhemmed îbn ‘Ubeydullah û ji deverên ku di destê wî de bûn, berda.⁴¹

Bûyera navbera Kurdên Darîbanê û Zenciyan

Di vê salê [266/789] de Bûyerek di nav **kurdên** Darîbanê û Zenciyan el-Xubeys de ku ew tê de şikestin û perîşan bûn qewimî.

Sedemê bûyina vê Bûyerê

Hatiye bihîstin ku: “Muhemmed îbn ‘Ubeydullah îbn **Ezarmerd**, piştî birina wî malê ku hejmara wî li pêş bihurî, ji Elî îbn Eban re û piştî jêqerîna Elî ji deverên di destê wî [Muhemmed] de, wî dijî hinek **kurdên** devera Darîbanê bi sozê ku pezên wan bide Elî û hevalên wî, jê [Elî] alîkarî xwest. Elî rabû ji Xubeys re nivîsand û daxwaziya destûra vê yekê kir. Wî jî weha bersîv dayê: “Xelîl îbn Eban û Behbûz îbn ‘Ebdulwehhab bişîne lê tu neçe û heya ku tu ji bo ewleyiyê ji Muhemmed îbn ‘Ubeyddullah gerewan (rehîneyan) nestînî û nexî destê xwe ku belkî bi xêra wan tu ji xayîntiya wî ya behît paristî bimînî, leşkerê xwe jî neşîne. Çimkî qet bawerî pê nayê ku dê ew li heyfa xwe negere”.

Elî rabû fermana el-Xubeys ji muhemmed îbn ‘Ubeydullah re nivîsand û jê rehîne xwestin. Muhemmed îbn ‘Ubeydullah soz û peyman dayê lê gerewan bi derengî xist. Dilê Elî bijiya wan talanên ku mehemmed îbn ‘Ubeydullah ew lê tima kiribûn û vê dilbijandinê leşker bi Elî da şandin. Ew digel zilamên Muhemmed îbn ‘Ubeydullah çûn ta ku gihîştin cihê xwe. Xelkê wir derket pêşiya wan û di nav wan de şerr dest pê kir. Serê pêşî Zenciyan zora kurdan bir lê piştê kurdan zor da wan, hevalên Muhemmed îbn ‘Ubeydullah jî dev ji wan berdan. Ew ji ber hev ketin û bi perîşaniyeke nedîtî şikestin. Muhemmed îbn ‘Ubeydullah berê hinek ji wan qaîl kiribû ku dema çikistinê ji wan veqetin. Ew

ji wan veqetiyān, êrîşî wan kirin û wan şêlandin, hinek ji wan dewarên xwe kirin lê ew jî ji wan sitandin û ew di rewşa herî xirab de bi paş ve dageriyan. Muhellebî rabû tiştê ku hatibû serê wî û hevalên wî ji el-Xubeys re nivîsa. Wî [el-Xubeys] jî loma lê [li Elî] kir û got: “Min ji te re gotibû ku; tu li N hemmed ibn ‘Ubeydullah ewle nebî û gerewan di nav xwe û wî de bikî êmî lê te bi ya min nekir û tu li pey nefsa xwe çûyî. Ev ew xirabî ye ku tê pêşiya t leşkerê te.

El-Xubeys ji Muhemmed ibn ‘Ubeydullah re jî nivîsand ku serkeftina wî dijî leşkerê Elî ibn Eban wî [Xubeys] natirsîne û kirinên wî bê ceza namîn Muhemmed ibn ‘Ubeydullah ji geffên ku di nameya wî de bûn tirsîya û jê nameyeke bi hêvî û zarî tevî hespên ku hevalên wî ji hevalbendên Elî sitan bûn, şand. Wî got: “Ez bi kesên cem xwe giş re çûm cem wanên ku êrîşî Xelî Behbûz kiribûn, min soz da wan û ew tirsandin ta ku min ev hesp bi paş ve wan sitandin û şandin nik te. Vê yekê hêrsa el-Xubeys zêdetir kir û jê re ni sand ku wê leşkerkî giran bişîne ser. Muhemmed bi hêvî û bi beremrî dîsa b siv jê re nivîsand û ji Behbûz û Muhemmed ibn Ye’hya el-Kermanî re jî hingê tesîra wî li ser Elî ibn Eban hebû nivîsand û sozê şandina mal da wî. Behbûz rabû çû cem Elî ibn Eban û Muhemmed ibn Ye’hya el-Kermanî jî ji vî tiştî piştgiriya wî kir ta ku dîtina Elî di heqê Muhemmedê kurrê ‘Ubeydullah de guherandin, wî aşt kirin û kîn û xeyda dilê wî jê derxistin. Piştî ew ç cem el-Xubeys ku di wê navê de nameya Muhemmed ibn ‘Ubeydullah jî gih tibû wî [el-Xubeys]. Wan ew rast dêra û çûn cem û hatin heya ku el-Xubeys daxwaziya wan qebûl kir lê ji bo hêviya Muhemmed ibn ‘Ubeydullah ya zivî nê weha got: “Ji niha û pê ve, heya ku ew li ser mînberan bi navê min xut nede xwendin ez nabêjim erê”.

Behbûz û el-Kermanî vê yekê ji Muhemmed ibn ‘Ubeydullah re nivîsa din. Wî jî hertiştê ku el-Xubeys jê xwestibû anî cih lê du’aya ser mînberê bi c rengî xist û ew pêk neanî. Elî çendakî li ser vê yekê bêpêjn ma lê piştî ji bo ç yîna ser keleya Mettuse xwe amade kir û avête ser, lê ji ber asêbûna keleyên wî û pirrbûna parêşgerên wê ew nikaribû tiştêkî bike û destvale dageriya. Pi ewî hacet û nêrdewanên xwe da hev ku bi wan derkeve ser sûrê û ji bo vê ye jî hevalên xwe civand û haziriya xwe kir. Di wê navê de **Mesrûrê Belxî** jî .

hingê li navçeya Ehwezê dima, bi niyeta wî ya çûyina ser Mettusê hisiya bû; piştî haziriyê gava ew car din fitilî ser, hingê Mesrûr jî çû şerrê wî. Hema roj li ber zeriya bû gava ew [Elî] gihîştibû serê û Mesrûr jî eyn wê demê gihîşte wî. Dema çavên hevalbendên Elî bi siwarên Mesrûr ketin gelekî piştîsikestî bûn û temamê aletên ku anîbûn di cih de hiştin. Pirrên wan hatin kuştin û Elî îbn Eban jî zorbirî dageriya. Di pey de hê demeke pirr neçûbû ku nûçeya hatina Ebû Ehmed hat. Piştî dagerandina Elî ji Mettusê ta vegirtina Sûq el-Xemîs û Tuheysayê li ser destê Ebû Ehmed tu bûyerên wî [Elî] neqewimîn. Wê gavê Elî jî bi nameyeke ku el-Xubeys ew tê de pirr teşwîqî çûyina ser leşkerê wî [Ebû Ehmed] dikir ve dageriya.⁴²

(.)

Bûyera navbera Kurd û Ereban

Çend şev ji dawiya meha zulqê'dehyê [meha yazdemîn ji salnameya koçî î qemerî (hîvî) ye- E. N.] re mabûn gava ku el-Mu'tedid careke din qesta 'Hemdan îbn 'Hemdûn kir û çû Mûsilê. Çiku xeber gihîştîbûyê ku wî ['Hemdan] meyla xwe daye ser aliyê Harûn eş-Şerî el-Waziqî û jê re [di Xutbeyê de] du'a xwendiyê. Nameya el-Mu'tedid ji Kerxecuddanê gihîşte Nîcah el-'Huremî ku wezîfedarê bi bûyera navbera wî [el-Mu'tedid], ereb û kurdan ve bû. Hingê îna dawî ya meha zulqê'dehyê bû.

Bi navê Yezdanê dilovan î mehrîvan. Nivîsandina vê nameyê di sêyekê pêşî yê vê şeva îne de ye. Xwedê alîkarî da me - spas jê re - ku em li dijî **kurd** û ereb û êla wan bi ser ketin. Bêguman te em dîtin ku me çêlek û pez diajot, çawa ku me sala berê jî ew diajotin. Tîr û şûrên me jî her ew [**kurd** û ereb] dihingaftin. Dema şev bi ser me de hat agir li ser çiyayan vêket. Ji sibeya vê rojê û pê de gera me ya ji bo gelşê bi dawî hat û leşkerê me jî bi me re dageriya û em gihîştin Kerxê. Bi qandî pêncî mîlî em li pey wan çûn û me bi wan re şerr kir. Gellek spasî ji Xwedê re ku tu pêjn ji wan nema. Bêguman şêkr û spasî ji bo Xwedê li ser me pêwîst bûye û hemd û pesin jî her ji Xwedayê cîhanê re be. Herweha mihrîvanî û aştiya Yezdan a pirr jî li ser Pêxember û ehlê wî be.

Dem a nûçeya hatina el-Mu'tedid gihîşte **kurd** û ereban, wan sond xwar ku wê ji bo xwîna hev bêne kuştin. Ew bûne yek û leşkerê xwe kirin sê qefleyan,

wan li pey hev rêz kirin û zarû-zêçên xwe jî xistin pey qefleya paşî. El-Mu'tedid leşkerê xwe yê siwarî î cirîdavêj ajot û êrîştî wan kir, hinek ji wan hatin kuştin gellek ji wan jî di çemê Zabê de xeniqîn.

Piştî vê yekê ew ber bi Mûsilê ve kişiya û qesta keleya Mardînê ku hingê destê 'Hemdan îbn 'Hemdûn de bû, kir. Gava nûçeya hatina el-Mu'tedid gihîste wî ['Hemdan] ew ji wir reviya û kurrê xwe danî cihê xwe. Çaxê leşkerê Mu'tedid gihîste ser keleyê rûniştvanên wê, ew roj tev pê re şer kirin, lê derê bû sibe hingê el-Mu'tedid siwar bû û bi keleyê ve kişiya heya giha ber derê Piştire gazî kir: "Ey îbn 'Hemdan", wî bersîv da û got: "Lebbê" (Fermo). "Wê ji te re! Derî veke!" el-Mu'tedid gotê; wî derî vekir, Mu'tedid jî li ber derî rûnişt û li wanên ku şande keleyê fermana barkirina mal û pertalan kir. Piştire fermana ruxandina keleyê da û ew [kele] hate hediman-din. Di pey de wî da pey 'Hemdan îbn 'Hemdûn û li girtina wî pirr kudand. Zora wî çû, malê sipartî vî jê hate sitandin û digel mal ew anîn cem el-Mu'tedid. El-Mu'tedid paşî çû bi jarê Heseniye (el-'Heseniyye) ku zilamekî pirr zorba û xwediyê leşkerekî zah bi navê "Şeddad" lê dima. Dihate gotin ku ew [leşker] dehhezar kes bûn û bajêr keleyeke wî hebû. Mu'tedid zora wî jî bir, wî girt û keleya wî anî xwar.⁴³
(. . . .)

Di meha Cemadulûla [Meha pêncemîn ji salnameya koçî î qemerî (hîvî) ye k dibê nîsana sala 903'yan - E. N.] de serdarê ewleyî yê ku bi navê Ebû Se'îd e Xuwarzemî tê nasîn, ji Bexdadê reviya û berê xwe da hêla Mûsilê. Ji 'Ebdullare ku bi navê Xulamê Nûn hatiye naskirin û li Tikrîtê, devêrên pê ve girada heya tixûbê Samurra û yê Mûsilê cihgirî dikir, hate nivîsandin ku jê biqete dest deyne ser. Tê gotin ku: "Ebdullah dijî wî derketiye lê Ebû Se'îd ew xapandiye û pê re li hev kiriye ku şerrê hev û du nekin. Dûvre Ebû Se'îd ji neve êrîştî wî kiriye, ew kuştiye û bi hêla Şehrezorê ve çûye. Ew û Îbn Ebû er-Rabî'eye **Kurdî** bûne yek, ew [Ebû Se'îd] bûye xezûrê wî û herduyan ji bo serîhiyê dana dijî Sultan li hev kirine. Lê piştî vê yekê Ebû Se'îd hatiye kuştin û kesê ku pê re bûbûn yek ji hev qetiyên.⁴⁴
(. . . .)

Bûyerên ku di vê salê (295/907) de qewimîne:

Derketina ‘Ebdullah îbn Îsmâ‘îl el-Mîsmê‘î ji bajarê Esfehanê û çûyina wî ber bi gundekî nêzî wir ve bi çend qonaxan. Daneheva bi dehhezaran **kurd** û kesên din ji bo hemberiya Sultan ji aliyê wî ve ku li pêş qala wan hate kirin. Ji bo şerrê wî [‘Ebdullah], Bedr el-‘Hemmamî bi hinek serdar û digel 5000 leşker ve hatin kufş kirin.⁴⁵

(. . . .)

Di vê salê (295/907) de Huseyn îbn Mûsa avête ser kurdîyê [yê kurd] ku li hêla Mûsilê desthildardarî dikir. Wan zora hevalên wî bir, leşker û malê wî talan bû lê kurdî bi xwe filitî çû xwe gihande çiyên û nehat zefte.⁴⁶

(. . . .)

Wergera ji erebî: Emîn Narozî

1) Christopher Toll, *Den Arabiska Litteraturen*, Norstedt & Söners Förlag, Stockholm, n. d., r. 91-92.

Ebû Ca‘fer Muhemmed îbn Cerîr Et-Teberî, *Tarîx er-Rusul we el-Mulûk*, Dar el-Me‘arif, Qahîre, 1960, cild 1, çap 4, pêşgotin, rûpel. 23.

Arabic literature, ed. H. A. R. Gibb, Oxford University Press, London, 1963, çap 2, r. 80.

The Cambridge History of Arabic Literature, Religion, Learning, and Science in the Abbasid Period, ed. M. J. L. Young, J. D. Latham and R. B. Serjeant, Cambridge University Press, Cambridge, 1990, r. 199.

2) Ji berhema Ebû Ca‘fer Muhemmed îbn Cerîr Et-Teberî ya *Tarîx er-Rusul we el-Mulûk*, Dar el-Me‘arif, Qahîre, 1960, cild 1, çap 4, ji rûpelên 141-42’an hatiye wergerandin.

3) Îstexr bajarekî kevn e, dikeve başûrê rojavayê Îrana niha û ji dema sasanîyan heya wextê Îslamê navendeke mezin bûye (Ferdînand Tûlû, *el-Muncid fi el-Luxe we el E‘lam*, Dar el-Meş-riq, Beyrût, 1973, çapa 7’an, beşa dîrok û agehan, r. 49.)

4) Li gor çapa T. “Narehîz” e û li gor ya S. jî “Narhîd” e. (Et-Taberî, *Tarîx er-Rusul we el-Mulûk*, c. 2, r. 39, not 1)

5) Di hinek çapan de “Hercebza” ye û carna jî “Herebze” tê (Et-Taberî, Tarîx er-Rusul el-Mulûk, c. 2, r. 38, not 2) Herebza yanî pîrê olî, yan jî parêzgerê olî yê dereceya duyemîn piştî “Mûbez”(serekpîr, serokê parêzgerê olî) tê. (El-Mes’ûdî, Kitab et_Tenbîh we el-Îşî Brîl, Leiden, 1967, r. 103)

6) Li gor çapa T. “Qasîn” e û li gor ya S. “Qasîr” e. (Et-Taberî, Tarîx er-Rusul we el-Mulûk, c. 2, r. 38, jêrenot 3)

7) Li gor çapa T. “Lezwîr e û li gor ya S. “Lezûbîn” e (Et-Taberî, Tarîx er-Rusul we el-Mulûk, c. 2, r. 38, jêrenot 4)

8) Li gor çapa T. “Qahir” e, lê li gor ya L. “Hahir” e. (Et-Taberî, Tarîx er-Rusul we el-Mulûk, c. 2, r. 39, not 2)

9) Sûrîstan navçeyek e li Îraqa niha (hinek jî dibêjin li Xûzîstanê ye) û ji ber ku cihê darber, çandinî û şînahiyê bûye gava cara pêşî ereban ew der ditiye jê re “Es-Sewad” yanî reşgotine, çiku di çola wan de cihekî wusa tinebû. Herweha ji hinek bajarên wê re jî re “El-Mecîn” ku pirneya “medîne” yanî bajar e, jî hatiye gotin, çiku di wê navçeyê de çend heb bajar hene ku dê navê wan li xwar di deqê de bê. (Yaqût el-’Hemawî, Mu’cem el-Buldan, dar Beyrûtdar Sadir, 1957, c. 3, r. 272 û 279) Li gor Îbn Xurdazbeh Es-Sewad ji dozde kûre - li gor wê wilayetan - pêk tê û şahên Îranê jê re gotine: “Dilê Îranşehrê” yanî yê Îraqê. (Îbn Xurdazbeh El-Mesalik el-Memalik, Brîl, Leiden, 1967, r. 5) Îranşehr navê Îraqê yê kevn e.

10) Li gor çapa T. “Tehyesûn” e û li gor ya S. “Teyhesûn” e. (Et-Taberî, Tarîx er-Rusul we el-Mulûk, c. 2, r. 41 not 1)

11) Li gor çapa T. Sîtreq e. (Et-Taberî, Tarîx er-Rusul we el-Mulûk, c. 2, r. 41, not 3)

12) Ji kitêba Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Mulûk beşa “Şahîtiya Erdeşîr îbn Babek” cildê 1’ê rûpelê 37-41’ê hatiye wergerandin.

13) Ji kitêba Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Mulûk cildê 4’an beşa “Sala 17/638’an rûpelê 32-33’yan hatiye wergerandin.

14) Darabecird hem navê herêmê û him jî navê serbajarê herêmê ye; çendî ku Fesa jê meztir e jî lê ji ber ku şah Dara ew ava kiriye, ew wek serbajarê herêmê maye. (El-Îstexrî, Kit. Mesalik el-Memalik, Metbe’ Brîl, Leiden, 1967, r. 97)

15) Ji kitêba Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Mulûk, cildê 4’an, beşa Sala 23/643’yan rûpelê 178’an hatiye wergerandin.

16) li gor Îbn Ceys “Walix” e, yanî “ya cîhana lewîti”. (Et-Teberî, Tarîx er-Rusul we el-Mulûk, c. 4, r. 183)

- 17) Ji kitêba Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Mulûk cildê 4'an beşa Sala 17/638'an rûpelê 183'an hatiye wergerandin.
- 18) Di çapa Ebû Fedl de peyva "kurd" tine lê belê du rûpel piştire ev gotina Seleme li ser devê yekî din tê dubare kirin û di wir de ev peyva "kurd" derbas dibe. Herweha di çapa 'Hubeyş de jî peyva kurd heye. (Et-Teberî, Tarîx er-Rusul we el-Mulûk, c. 4, r. 187, not 1 û r. 189)
- 19) Ji kitêba Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Mulûk cildê 4'an beşa Sala 23 /643'yan rûpelê 186-187'an hatiye wergerandin.
- 20) Ji kitêba Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Mulûk cildê 4'an beşa Sala 29 /649'an rûpelê 264-265'an hatiye wergerandin.
- 21) Ji kitêba Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Mulûk cildê 6'an beşa Sala 66/685'an rûpelê 33-34'an hatiye wergerandin.
- 22) Ji kitêba Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Mulûk cildê 6'an beşa Sala 77/696'an rûpelê 290-291'ê hatiye wergerandin.
- 23) Ji kitêba Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Mulûk cildê 6'an beşa sala 77/696'an rûpelê 291-292'yan hatiye wergerandin.
- 24) Ji kitêba Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Mulûk cildê 6'an beşa Sala 77/696'an rûpelê 296'an hatiye wergerandin.
- 25) Ji kitêba Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Mulûk cildê 6'an beşa Sal 83/702'yan rûpelê 367-368'an hatiye wergwandin.
- 26) Ji kitêba Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Mulûk cildê 6'an beşa Sal 90/708'an rûpelê 448-449'an hatiye wergerandin.
- 27) Ji kitêba Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Mulûk cildê 8'an beşa Sala 158/774'an rûpelê 54-55'an hatiye wergerandin.
- 28) Ji berhema Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Milûk cildê 9'an beşa Sala 251/865'an rûpelê 289-290'an hatiye wergerandin.
- 29) Di çapekê de "Eble'h" e. (Et-Teberî, Tarîx er-Rusul we el-Mulûk, c. 9, r. 317)
- 30) Ji berhema Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Milûk cildê 9'an beşa Sala 251/865'an rûpelê 317'an hatiye wergerandin.
- 31) Ji berhema Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Milûk cildê 9'an beşa Sala 258/871'ê rûpelê 490'î hatiye wergerandin.
- 32) Ji berhema Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Milûk cildê 9'an beşa Sala 260/873'yan rûpelê 508'an hatiye wergerandin.

- 33) li gor Îstexrî “Remm” e. (El-Îstexrî, Kîtab Mesalîk el-Memalîk, rûpel 97)
- 34) Ji berhema Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Milûk cildê 9’an beşa Sala 262/875’an rûpelê 514’yan hatiye wergerandin.
- 35) Li gor çapa S. “Ezamerd” e, lê li gor Îbn el-Esîr “Hezarmerd” e. (Et-Teberî, Tarîx er-Rusul we el-Mulûk, c. 9, r. 527, not 2)
- 36) Di çapa “B”. de “es-Seffar” e. (Et-Teberî, Tarîx er-Rusul we el-Mulûk, c. 9, r. 527)
- 37) Ji berhema Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Milûk cildê 9’an beşa Sala 260/873’yan rûpelê 527-529’an hatiye wergerandin.
- 38) Ji berhema Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Milûk cildê 9’an beşa Sala 263/876’an rûpelê 531-532’yan hatiye wergerandin.
- 39) Ji berhema Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Milûk cildê 9’an beşa Sala 263/876’an rûpelê 551’ê hatiye wergerandin.
- 40) Ramehurmuz navê herêma û bajarekî ye ku li Xuzîstanê, li ser riya navbera Ehwaz, Şuşt û Esfehanê dimîne. Ew gotineke hevdudanî ye ku ji “Ram” a farisî ya bi maneya mirad û ji nashah Hurmuz pêk hatiye. (Yaqût el-’Hemawî, Mu’cem el-Buldan, c. 3, r. 17. Ferdînanand Tûl el-Muncid fi el-Luxe we el-E’lam, Dar el-Meşriq, Beyrût, 1973, çapa 7’an, beşa dîrok û aqêha r. 303)
- 41) Ji berhema Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Mulûk cildê 9’an beşa Sala 266/ 879’an rûpelê 554’an hatiye wergerandin.
- 42) Ji berhema Et-Teberî, ya Tarîx er-Rusul we el-Mulûk cildê 9’an beşa Sala 266/879’an rûpelê 554-556’an hatiye wergerandin.
- 43) Ji berhema Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Mulûk cildê 10’an beşa Sala 281/895’a rûpelê 37’an hatiye wergerandin.
- 44) Ji berhema Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Mulûk cildê 10’an beşa Sal 290/903’ya rûpelê 98’an hatiye wergerandin.
- 45) Ji berhema Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Mulûk cildê 10’an, beşa Sala 295/907’a rûpelê 137’an hatiye wergerandin.
- 46) Ji berhema Et-Teberî ya Tarîx er-Rusul we el-Milûk cildê 10’an beşa Sala 295/907’an rûpelê 137’an hatiye wergerandin.

Ji Eflatûn

Rih ango jîyan ebedî ye. Lewra tiştê ku di bizavê de ye namire. Tiştê ku bizava wê ji yekî din tê, gava ew bizav xelas dibe, ew jî xelas dibe. Lê tenê tiştê ku xwe bi xwe dibezivîne û qet ji xwe venaqete, bizava wê xelas nabe.

Ev tişt serecem û destpêka her tiştî ye, ku bizava wê ji xwe de (li nava xwe) nîn e û belku tê bizavtin.

Lê destpêk abadîn e (ebedî ye) ne ku paşê peyda bûye. Lewra her tiştê ku hatiye jîyanê, ji xwe ji destpêkê dizê, helbû ku destpêk bi xwe ji tişteki nazê.

Lê gava destpêk ji tişteki bûya, dê nikarîbûya ji destpêkê bihata jîyanê.

Ji ber ku destpêk abadîn e û paşê nehatiye jîyanê, bi pêdivî abadîn e.

Çi dema destpêk bifelişiya wê ne (destpêk) bi xwe bikariya ji tişteki bizabûya û ne tiştên din dikarîbû ji wê bihatana der.

Lewra her tiştê zayîne divê ji destpêkê bèn. Lê sercema bizavê, tişteki ji hundurê xwe ye.

Tişteki wilo ne dikare bifelişe û ne mimkin e bê zanê, ji xwe wê kindirê temamê KAIÂNATAN û hemû xudan zayînan û bûyînan wê ji hev bifelişiya û wê bêdengî û bêbizaviyek li ser hikim bibûya û tişteki din nehihûya ku sercema bizavê (tevgerê) bibûya. □

Wergera ji farisî: Faxir Mamedî

Bi Marquez re hevpeyvîn

Plino A. Mendoza

Marquez: Min bi tesadufî dest bi nivîsandinê kir. Belkî jî ji bo ku ez bikribim ji nivîşê xwe nivîskarekî baş derxînim. Paşê ez ketim xefka nivîsa dina ji bo zewqê. Dawiya dawî jî ez pê hesiyam ku ji bo min li dinyayê ji nivîsandinê xweştir tiştekî din tuneye.

Plino A. Mendoza: *Te got ku nivîsandin zewq e. Te berê jî gotibû ew êşkişana e. Nivîsandin kîjan ji van e?*

– Herdu jî rast in. Di destpêkê de gava ez hînî hunera nivîsandinê dibûr min bêhawe pir û bêberpirsiyarî dinivîsand. Piştî min saet dudê sibehê ka xwe yê li rojnameyê diqedand, min heta sibehê dikarîbû bi hêsanî çar, pênc h ta deh rûpelên pirtûkekê binivîsanda. Tê bîra min, carekê di rûniştinekê c min kurteçîrokek nivîsandibû.

– *Lê niha?*

– Niha ger ez bikaribim hemû rojê paragrafêkê binivîsînim ez xwe bextiy hîs dikim. Her ku dem dibuhure, kar û barê nivîsandinê diwartir dibe.

– *Çima? Ger zanebûn zêde bibe, mirov texmîn dike ku divê karê nivîsandinê hêsantir bibe?*

– Tenê hîsên berpirsiyariyê zêde dibin. Êdî mirov hîs dike her gotineke ku t te nivîsandin divê bêtir tesîrê li mirov bike, divê giraniya wê zêdetir be.

– *Ev netîceyên navdarbûyî ne. Ma ev te aciz dike?*

– Ev min xemgîn dike. Li qitayeke ku ji nivîskarên biserketî re ne amade b

û nivîskêr jî ji xwe re edebiyat kiribe kar, ya herî xerab dikare were serê wî ew e ku pirtûkên wî mîna avê werin firotin. Ez nefret dikim gava mirov min hêjayî temaşekirinê dibînin. Ez ji televizyonan, ji kongreyan, ji konferansan, ji civînên dor maseyên girover nefret dikim.

– *Ji hevpeyvînan jî?*

– Erê, ez ji hevpeyvînan jî nefret dikim. Ez naxwazim xwe li hemberî kesî biserketî nîşan bidim. Ev mîna çiyavanekî, ji bo ku ew bi çiyê ve rapelike ew mirina xwe dide ber çavên xwe ye; gava ew bigihîje serê çiyê, wê çi bibe? Ew ê dakeve jêr, an jî ew ê bixwaze dakeve jêr. Ew ê vê yekê jî bi bîaqilî û bi rûmeteke bilind bike.

– *Gava tu xort bû û te jiyana xwe bi karin din derbas dikir, te bi şev dinivîsand û te pir cigare dikişand.*

– Min rojê çil cigare dikişand.

– *Lê niha?*

– Ez niha cigarê nakişînim û ez tenê bi roj dixebitim.

– *Sibehan zû?*

– Ez li odeyeke germ û bêdeng, saet ji nehê sibehê heta sisê piştî nîvro dixebitim. Deng û serma bala min belav dike.

– *Kaxezeke vala bêhtengiyê dide nivîskarên din, gelo bêhtengiyê dide te jî?*

– Erê, piştî klastrofobiyê, ya herî pir mirov aciz dike ew e. Lê piştî ku min şîreteke Hemingway xwend, êdî min dev ji wê fikrê berda. Hemingway dibêje, ger tu bizanibî tu ê sibehê çawan karê xwe bidomîni, ancax wê çaxê divê tu navbirê bidî karê xwe.

– *Xalên ku pirtûkên te jê têne pê çi ne?*

– Resimê xuyayî ye. Ez bawer dikim ji bo nivîskarên din pirtûkek ji ramaneke an jî ji têgihîştinekê dizê û bi pêş dikeve. Ez her tim bi resimekî dest pê dikim. *La siesta del martes* ya ku ez çîroka xwe ya herî baş dizanim, ji resimê gava min jinikek bi kincên reş, bi sîwaneke reş, bi keçikeke ciwan li gundekî wêran dîtibû, min ew nivîsandibû. Herçî di *La hojarasca* de ye, resim kaloyekî ku neviyê xwe dibir goristanê bû. *Name ji Albay re nayên* jî li Barranquillayê peyayekî ku li benda vekirina mazatê bû. Peya bi bêdengiyê xemgîn rawestiyabû. Piştî bi salan, min jî li Parîsê gava ez li benda nameyekê bûm -hebe tunebe ew name ji bo peran bû- min xwe bi eynî xemgîniyê dîtibû. Ez bî wî re hevbeş bûm.

– *Te di Tenêtiya sedsalan de kêjan resimê xuyayî bi kar anî?*

– Min peyayekî kal, ku zarokek biribû ji bo ku temaşeyî qeşa ku weke harîk yeke sîrkê bû, bike, bi kar aniye.

– *Ew kalikê te Albay Marquez bû?*

– Erê.

– *Ma ev bûyer bi rastî jî bûye?*

– Ne tam, lê tesîra tiştê rast lê bûye. Gava ez li Aracatacê zarokekî biçû bûm, tê bîra min ku kalikê min ez biribûm sîrkê, da em temaşeyî hêştireke yel qopikî bikin. Rojêke din jî gava min ji kalikê xwe re gotibû, ku ez bûzê mera dikim, wî ez biribûm şîrketa mûzan û wî ji wan tika kiribû ku ew sindoqa masiyên qeşagirtî vekin û masiyekî têxin destê min. *Tenêtiya sedsalan* hemû bi resimî dest pê kir.

– *Yanî te ew herdu bîranîn gîhandin hev û kir gotina pêşî ya romanê. Tam çawa bû?*

– Piştî bi salan, li hemberî cihê îdamê, ew ê Albay Aureliano Buendia wê pi tînvroya ku bavê wî ew biribû temaşekirina bûzê bi bîr bîne.

– *Tu bi piranî gelekî guh didî gotina pêşî ya pirtûkê. Te carekê ji min re gotib carinan nivîsandina gotina pêşî ji nivîsandina hemû pirtûkê bêtir wext digire. Çi bo çî?*

– Ji ber ku gotina pêşî dikare stîla pirtûkê, avakirina wê, heta dirêjîya wê bicî kirin.

– *Gelo nivîsandina romanekê demeke dirêj digire?*


– Ji bo tenê nivîsandinê demeke dirêj nagire. Beşa nivîsandinê pêvajoyek kurt e. Min *Tenêtiya sedsalan* di hundurê du salan de nivîsand. Lê berî ez li sî dektîloyê rûnê, ez panzdeh-şanzdeh salan li ser fikirî me.

– *Û ji bo nivîsandina "El Otono del Patriarca" jî demeke wilo dirêj kişand. Li berî tu "Cronica de una muerte anunciada" binivîstî tu çiqasî rawestiya?*

– Sî salî.

– *Ji bo çî tu demeke wilo dirêj rawestiya?*

– Gava di sala 1951'ê de bûyer bû, ne ji bo alavê romanê lê belê ez mîna rojnamevanan bi bûyerê re eleqeder dibûm. Lê wê demê ev celeb nivîs li Colombiyayê zêde bi pêş neketibû, û ez çî dibe bila bibe, rojnamevanekî gundî bûm ku divê yabû ez bi van bûyeran re eleqeder nebim. Piştî çend salan ez bi riyeke edebî



bûyerê fikirîm. Lê min dizanîbû ger diya min bibihîze kurê wê li ser heval merivên wê romanekê dinivîsîne, wê çiqasî hêrs bibe. Ya rastî, piştî ez demek dirêj li ser mijarê fikirîm, paşê heta min keşif kir ku du kes naxwazin cinayet bikin, û hewl didin ku ji kirina cinayetê re bibim kelem, ez ne hakimê mijar bûm. Di dramê de bi tenê ev tişt rast bû, dawiya maye, bûyerên ku li hem Emerîka Latînî diqewimîne ye. Sedemeke din ya derengmayinê jî avahiya w bû. Çîrok di jiyana rastî de, piştî ku mêrik li jina xwe vedigere û bi bîst û pênc salan dawî tê. Lê min rast dît ku ez dawiya pirtûkê bi tasvîrên cîneyetê dawî bî nim. Çareserî ew bû ez bûyerbêjekî ku dikare romanê bi azadî ji dinyayê biqetî ne, têxim dewrê: Min ew pêşî bi forma kesê yekem nivîsand. Piştî sê salî mi. tişteki ku romannivîs ji bîr dîkin keşif kir: Rastî her tim formuleke edebiyatê y baş e.

– *Hemingway gotiye, divê mijarek ne pir zû ne jî pir dereng were nivîsandir. Gelo tu aciz nebû ku te demeke wilo dirêj ev mijar di serê xwe de girt?*

– Ez tu carî nêzîkî ramanekê ku li pêşberî îhmalkariya salan raneweste nabim. Ger bi qasî *Tenêtiya sedsalan* panzdeh sal, *El Otono del Patriarca* huvdeh sal *Duşema sor* sê sal baş be, divê mirov ji bilî nivîsandinê tişteki din neke.

– *Tu notan digirî?*

– Ji bilî tek tuk kaxezan, wekî din ez qet notan nagirim. Tecrubeyan nîşan daye ku gava mirov notan bigire, mirov ê ne li ser pirtûkê, lê li ser notan raweste.

– *Gelo tiştên tu dinivîsînî tu wan pir rast dikî?*

– Xebatên min yê di vî warî de pir tê guhertin. Gava ez xort bûm, min dîre dinivîsand, paşê min kopyaya wan derdixist û min di ber çav re derbas dikir. E niha rêz bi rêz rast dikim. Wilo ku, êvarî rûpelekî bêkêmasî ku hîç îşaret lê tune y û ji bo çapê amade ye derdikeve holê.

– *Tu gelek kaxez xerc dikî?*

– Bêhawe. Ez kaxezekê dixim dektîlo...

– *Ma tu her tim bi dektîlo dinivîsînî?*

– Erê, her tim. Ez bi dektîloyeke li ser elektirîkê dinivîsînim. Gava ez şaş bi nivîsînim, an jî gava ez gotinekê neccibînim, an jî ger ez şaşiyekê dektîlo bikim ji ber qusûrekê, tebîtekî, an jî ji ber meraqekê, ez kaxezê derdixim û kaxezek nû diximê. Ji bo çîrokeke donzdeh rûpel ez dikarim pêncsed kaxezî xerc bikim

Nexwe ez ê tu carî zora fikra dengikirina şaşiyên dektîlo û yên hukmê avakirî nê nebim.

– *Gelek nivîskar ji dektîloyên bi elektirîk hez nakin. Ma kêfa te jê re tê?*

– Erê, ez ji dektîloya bi elektirîk ewqas razî me ku ez nikarim bêê wê tiştekî binivîsînim. Ez bi gelemperî bawer dikim ku mirov dikare li deverên rehet û bi konfor baştir binivîsîne. Baweriya min bi wê fikra romantîk ya ku dibêje nivîskar berî nivîsandinê divê hîs bike ku ew di nava perîşanî û belengaziyê de ye, qet nayê. Bi xwarineke xweş û bi dektîloyeke li ser elektirîkê baştir tê nivîsandin.

– *Li gorî hevpeyvînên bi te re têne çêkirin, tu pir kêm behsa pirtûkên ku tu li ser dixebitî, dikî. Çima?*

– Ji ber ku ew bi jiyana min ya şexsî ve girêdayî ne. Tu ya rastî bixwazî, gunehê min bi wan nivîskarên ku di hevpeyvînan de behsa planên pirtûkên xwe dikin, tê. Ev hemû wê nîşan dide ku karê wan baş naçe û ew dixwazin bi vê riyê ji bo çapkirina romanên xwe xwe teselî bikin.

– *Lê ez bawer dikim tu bi hevalên xwe yên herî nêzîk li ser pirtûkên xwe dipeyivî?*

– Erê, bi rastî jî ez û hevalên xwe gelekî li ser dipeyivin. Gava ez tiştekî dinivîsînim ez gelekî li ser dipeyivim. Ez bi vê riyê fêr dibim ka gelo ez li ku bi ser ketime û li ku kêmasiyên min hene. Ev, celebekî ku mirov di tarîtiyê de rîya xwe ya rast dibîne ye.

– *Tu bi hevalên xwe re li ser xebatên xwe yên neçapkirî dipeyivî lê tu tu carî nahêlî ew bixwînin.*

– Na, ez qet destûr nadim. Ev li ba min bûye mîna baweriyeke dînî. Ez bi rastî jî her tim wilo bawer dikim nivîskar mîna keştîvanê ku di nava deryayê de keştiya wî binav bûye, tim bi tenê ye. Nivîskarî di dinyayê de karê herî bi tenê ye. Tu kes nikare di nivîsandina te de ji te re bibe alîkar.

– *Ji bo nivîsandinê bi te cihê herî baş ku ye?*

– Min ev berê jî gotibû: sibehan zû giraveke bêdeng û bi şevan jî li bajarekî mezin. Ez dixwazim sibehan zû bêdeng be, piştî nivroyan jî çend qedeh ara qewim û bi hin hevalan re sohbetê bikim. Ez dixwazim her tim bi mirovên li kuçeyan re di têkiliyê de bim û bizanibim li dinyayê çi diqewime. Sibehan bêdengî û bi şevan jî bajarekî mezin, ji bo nivîskarekî, ger em gotina Faulkner jî

bi bîr bînin, tê wê maneyê ku cihê îlhamê kerxane ye.

– *Em niha jî vegerin ser hunermendiya nivîskariyê. Di pêvajoya dirêj ya şagirti de yê ku herî pir ji te re bû alîkar kê ye?*

– Ya pêşî pîrka min e. Wê tiştên herî bêînsaf, pir bi hêsanî behs dikir. Ya kî çîrokên min evqasî bi qîmet dike ji ber tewra wê ya bêhîsî û dewlemendiya w neyên (xeyalên) wê ne. Min *Tenêtiya sedsalan* bi metoda pîrka xwe nivîsand.

– *Ma rast e ku tu bi riya pîrka xwe fêrî nivîskariyê bû?*

– Na, ez bi riya Kafkayê ku bi metoda pîrka min çîrokên xwe bi almanî din vîsandin fêrî nivîskariyê bûm. Gava min di hufdeh saliya xwe de *Gubert* xwend, ez têgihîştim ku ez ê bibim nivîskar. Gava min dît ku çawa Gregor Samsa sibehekê bûye mêş, min ji xwe re got, "Ez dizanim ev çawan dibe, lê gava ez bi ser bikevim, ez ê tam bi edebiyatê re mijûl bibim".

– *Ji bo çi ewqasî tesîr li te kir? Gelo ji ber ku te keşifa tişteki te jê hez dikir kir?*

– Min ji nişkê ve ferq kir, ku ji bilî mînakên edebiyatê yê nasyonel û pir akademîk ku me di dibistana navîn de dixwend, ez têgihîştim ku çiqas îmkana pêşiya min raxistîne. Digel vê jî, tahlûkeya nexistina holê ya rastiyê, û ji ber ku derew di edebiyatê de ji rastiya jiyanê cidîtir e, min hingî keşif kir ku ez ê nikaribim her tiştê ez jê hez dikim, bikim çîrok û roman. Her dinyayên kêfî jî li gora xwe xwediyên qanûnan in. Heta mirov nekeve bêmantiqî û kaosê, mirov dikare xwe ji rasyonelîzmê pak bike.

– *Yanî tu nakevî fantazyayê?*

– Erê.

– *Tu ji fantazyayê nefret dikî, çima?*

– Ez bawer dikim resim ji bo gihîştina rastiyê bi tenê alavek e, û çavkaniya afirandinê ya dawî her tim rastî ye. Ya herî pir ez jê nefret dikim, celebê fantazyayê ya Walt Disney e, ku gelekî dûrî rastiyê ye. Gava ez bi nivîsandina pirtûkek zarokan ve mijûl dibûm, tê bîra min ku min ji te re destnîvîsa "Derya derwenadbûyî" şandibû. Te bi durustbûna xwe ya herdem ew necibandibû. Te gotibû, divê mirov bi tenê bi fantazyayê ve mijûl nebe, û wê munaqeseyê ez serrobino kiribûm, ji ber ku kêfa zarokan jî ji fantazyayê re nayê. Zarok ji resim hez dikin. Ferqiyeta di navbera fantazyayê û rastiyê de, mîna ferqa di navbera mirovan û kûklayên vantrologan de ye.

– *Ji bilî Kafka, di pêşdexistina hunera xwe de tu di bin tesîra kêjan nivîskariyê de...*

mayî û kêjan nivîskarî tu fêrî hunera nivîsandinê kiriye?

– Hemingway.

– *Hemingwayê ku tu wî mîna romannivîskarekî mezin nabînî?*

– Hemingwayê ku ez wî mîna romannivîskarekî mezin nabînim lê ez wî mîna çîroknivîskarekî mezin dibînim. Li gorî şîreta Hemingway çîrokek dişibe çiyayê bûzê (qeşayê), divê ew li ser beşa nediyar raweste; bi hemû raman, xebat û alavên çîrokê ku civiyane ser hev, lê nayêne bikaranîn. Erê, Hemingway mirov fêrî gelek tiştan dike, heta dike ku mirov bala xwe bide li kuçêzîvirandina psîkekê jî.

– *Tu ji Greene jî fêrî hin tiştan bûyî. Te carekê ji min re behs kiribû.*

– Erê, qet nebe Graham Greene ez fêrî çareserkirina sirra herêmên tropîkal kirime. Pir zehmet e yek sentezên şîrî yê dinyaya ku mirov pir nas dike, derêxe. Tu wilo nas dikî ku tu nizanî tu ê ji ku dest pê bikî û ewqas tiştên divê bêne gotin hene, ku tu tişteki fêhm nakî. Problema min ya bi herêmên tropîkal re ev bû. Min gelekî bi kêfxweşî Christof Colombo, Pigafetta û nivîskarên di derheqa rohilata giravên Hindê de xwendine û ji wan re heyran mame. Min di eynî wextê de Salgarî, Conrad û "tropîkalîstên" Emerîka Latîni ku bi berçavkên moderntiyê li her tiştî dinêrin, xwendine. Lê min dît ku di navbera danasîna wan û rastiyê de ferqeke mezin heye. Gelek kes ji wan ketin xefka çêkirina listeyan û bêşik bi zêdebûna listeyan re nêrîna wan bi sînor bû. Graham Greene ev pirsgerêka han pir baş çareser kir: Bi ahenga hundurîn ya rastî û sîrrê û bi hin tiştên din yên cûda re. Bi vê metodê, tu dikarî bi hemû sirra tropîkê, derbasî bêhna guayaba xerabe bibî.

– *Ma tê bîra te ku tu ji şîretin din destkewtî bûyî?*

– Ez gotineke nivîskarê Domînikî Juan Bosch ya ku wî berî niha bi bîst û pênc salan di gotareke xwe de anîbû ziman, bi bîr tînim. Wî gotibû, divê mirov di xortaniya xwe de fêrî hunera nivîsandinê bibe. Teknîka nivîsandinê, riyên avakirina avahiyê û teknîka bihevgehandina tiştên veşartî. Em nivîskar dişibin Papaxanan, em nikarin bi salmezîni fêrî peyvê bibin.

– *Gelo fêdeyeke rojnamevantiyê gihîştîye nivîskariya te?*

– Erê, lê mîna carinan tê gotin, ne ji ber bikaranîna zimanekî bi tesîr. Rojnamevantî ji min re bû alîkar ku ez kurteçîrokên xwe ji rastiyê derxim. Lixwepêçana şelte (şeltê spî) ya Remediosa spehî ji bo ku ew biçe buhuştê, an jî berî ji

erdê bilindbûna peder Nîcanor Reina ya bi çar tiliyan û vexwarina wî ya çukulata (ne vexwarina tiştêkî din lê vexwarina çukulata). Ev hemû canbaziyan ro namevaniyê ne û pir bi kêr tên.

– *Tu her tim hezkirekî sînemayê yî. Gelo nivîskar ji sînemayê fêrî teknîka kêrhatî dibe?*

– Ez nizanim ez ê çi bibêjim. Herçî ji bo min e, sînema hem bûye alîkar, her jî bûye kelem. Ez ji sînemayê fêrî dîtina resiman bûme. Lê di hemû pirtûkê min yên berî *Tenêtiya sedsalan* de, ji bo ku ez bikaribim karakter û sehneyan çêkirin, hişê xwe de jîndar bikim, ez xîreteke bêhawe, hetta ez perspektîva kamera û çarçoveya kamerayê dibînim.

– *Qey tu behsa (Ji Albay re name nayên) dikî...*

– Erê, wek stîl ew dişibe senaryoyeke film. Tevger û livandinên karaktera min ku kamera dikişîne. Niha gava ez careke din pirtûkê dixwînim, ez kamerayê dibînim. Ez niha dizanim ku çareseriyên lîteraturê ne wek çareseriyên sînemayê ne.

– *Ji bo çi tu di pirtûkên xwe de evqas hindikî cih didî diyalogan?*

– Ji ber ku di spanyolî de diyalog ji guh re xweş nayê. Min her tim gotiye ku di vî zimanî de, di navbera diyalogên peyvê û yên nivîsandinê de ferqêke mezintir heye. Diyalogên spanyolî yên ku di jiyana rastî de baş in, di romanê de ne ew qas baş in. Loma ez pir kêr bi kar tînim.

– *Berî tu romanekê binivîsînî, tu dizanî wê tam çi were serê qehremanê te?*

– Ez tenê bi gelemperî dizanim. Di pêvajoya pirtûkê de, tiştê mirov ne li ben de ye dikare derkeve. Ya ku ez cara pêşî ji bo Albay Aureliano Buendia fikirî bûm ew bû ku ew ê şerkerekî teqawîd bûya û gava ew li bin darekê dimîze, ew ê bimira.

– *Mercedes* ji min got ku gava Albay mir tu pir li ber ket.*

– Erê, Ez li benda pêwîstiya kuştina wî bûm, lê belê ramana kuştina wî em me hû dikirim. Albay êdî kalemêrekî ku masiyên xwe yên zêrîn çêdikir. Piştî nîvroyekê "Dem hat" min got. Diviyabû êdî min ew bikuşt. Gava min ew beqedand, ez çûm qatê dudiwan ba Mercedesê. Gava ew çav li rûyê min ket, wê çîrok fêhm kir. "Albay mir" wê got. Min xwe li ser nivînê xwe dirêj kir û ez di saetan giriyam.

– *Ji bo te îlham çi ye? Ma bi rastî îlham heye?*

– Ev hevoeke ku romantîkan qîmeta wê xistine. Bi ya min îlham ne wehiye-ke ku ji ezmanan dadikeve, ne jî xêreke Xwedê ye. Bi ya min îlham ew dem e ku tu bi kontrol û înad bi mijarê re bibî yek. Gava tu bixwazî tişteki binivîsînî, nerehetiyek dikeve navbera te û mijarê, loma tu ê mijarê teşwîq bikî; û wê mijar jî te teşwîq bike. Wê kêliyek were ku hemû kelem û asteng ji navê rabin, wê tu berberî nemînin û tiştên te xeyal nekirine wê werin bîra te û tu ê binivîsînî. Wê çaxê, li dinyayê ji nivîsandinê xweştir tişteke tune ye. A ez ji vê re dibêjim îlham.

– *Gelo di pêvajoya nivîsandina pirtûkekê de, tu qet vê celebwestekê wenda dikî?*

– Erê, wê çaxê ez dîsan ji serî de difikirim. Ez di demên wilo de radihêjim tornavîdekê û hemû fiş û kiltên malê tamîr dikim, an jî hemû deriyan bi boyaxa şîn boyax dikim. Carinan jê karê destan zora tirsarastiyê dibe.

– *Gelo şaşî ji ku tê?*

– Bi tevayî ji problemeke avakirinê tê. Carinan problem ewqas cidî ye ku ez mecbûr dimînim û ji serî de dest pê dikim. Di sala 1962'an de, gava min *Payiza Patîark* dinivîsand, piştî nivîsandina sêsed rûpelî, min dev jê berda û bi tenê di destên min de navên qehremanên bingehîn ma. Di sala 1968'an de min li Barselonayê dîsan dest pê kir. Piştî xebata şeş mehan min dîsan dev jê berda. Ji ber ku ez tam ji exlaqê qehremanê navendî, dîktatorê kal tê nedigihîştim. Piştî du salan, min pirtûkeke Heminhway ya behsa nêçîra li Afrîkayê dikir, kirî. Tişteke di pêşgotinê de tunebû, lê min beşa li ser filan xwend û çareseriyê romanê ji wir bi dest xist. Hin adetên filan, tam li exlaqê dîktatorê min dihatin.

– *Ji bilî problemên avakirina çîrokê û psîkolojiya qehremanê sereke tu problemên din hebûn?*

– Erê, kêliyeke ku min tişteki pir cidî ferq kir hebû. Min bi tu awayî nikarîbû hewayeke germ bidaya pirtûkê. Ev pirsgirêkeke gelekî cidî bû, ji ber ku bûyer li bajarekî Karayibî ku diviyabû gelekî germ bûya, derbas dibû.

– *Tu çawa bi ser ketî?*

– Ya ji destê min dihat ew bû ez hemû malbatê bidim hev û herim Karayibê. Bê ez li wir tişteki bikim, ez salekê geriyam. Gava ez vegeyriyam cihê nivîsandina pirtûkê, Barselonayê, min hinek şenkayî çand û hinek baharat jî tevî kir û bi vî awayî min kir ku xwendevan germahiya pirtûkê hîs bikin.

– *Gava dawîya nivîsandina pirtûkekê tê, çi dibe?*

– Ez hemû întresa xwe ya di derheqa wê de wenda dikim. Mîna Hemingway dibêje, ew dişibe şêrekî mirî.

– *Te gotibû, her romaneke baş behskirineke poetîk ya rastiye ye. Tu dikarê hebe vê termê vekî?*

– Erê, bi rastî jî, ez bawer dikim roman bi gotinên bi şîfre temsîla rastiya di yayê dikin. Rastiya di romanê de, ji rastiya jiyane cûdatir e, lê ew ji wê diz Eynî tişt ji bo xewnan jî derbas dibe.

– *Bikaranîna rastiye di romanên te de, bi taybetî jî di "Tenêtiya sedsalan" "Payiza Patriark" de, navek peyda kiriye, realîzma magîk. Ez bawer dikim xwe devanên te yê ewrûpayî wê magîkê di romanên te de dibînin, lê ew rastiya li pi magiye nabînin...*

– Rast e, ji ber ku rasyonalîzma wan nahêle ew bibînin ku rastî bi buhayê hi kan an jî firingiyan bi sînor nabe. Li Amerîka Latînî, jiyane bi tiştên fewqelac ve mişt e. Di vê derheqê de ez her tim mînaka keşîfê emerîkî, F. W. Up ç Graff didim. Keşîf di dawiya sedsala dawî de rêwîtiyeke ecêb li daristanê Amazonayê dike û digel pir tiştên din, ew çemekî bi ava kelandî û cihekî k dengê mirovan barana mîna lehiyê dibarîne, dibîne. Li rohilatî Arjantînayê, Comodora Rivadaviyayê bayê ku ji kûtpa rohilat dihat, sîrkek li ber xwe bir dotira rojê, masîvanan di torrên xwe de cendekên şer û zurafayan dîtibûn. E di Cenazeya *Mama Grandes* de behsa gereke Papa ya ecêb û dûrî aqilan ya gundekî Colombiyayê dikim. Tê bîra min, ji bo serokê ku wê biçûya pêşiya Pa pa neşibe serokê wê demê, yê ziravokî û dirêj, min yekî qelew û serrût tasvîr k ribû. Piştî nivîsandina vê çîrokê bi yanzdeh salan, bi rastî jî Papa çû Colombi yayê û mîna di çîrokê de, yê ku çû pêşiya wî jî yekî qelew û serrût bû. Piştî mi *Tenêtiya sedsalan* nivîsand, li Barranquillayê lawikekî ku îdîa dikir dûvê berê pê ve heye, derketibû. Ji bo mirov bizanibe bê her roj çî tiştên ecêb dibin, mi rov li rojnameyan binihêre bes e. Ez mirovên gelekî basîd nas dikim bê ku ev şaş û ecêbmayî bimînin wan *Tenêtiya sedsalan* xwendine. Ew ecêbmayî nema ne, ji ber ku min behsa tişteki dûrî jiyana wan nekiriye.

– *Yanî her tiştên di pirtûkên te de ne xwe dispêrin jiyana rastîn?*

– Di pirtûkên min de rêzek jî tune ye ku ne li ser rastiye ava bûbe.

– *Tu êmin î? Di "Tenêtiya sedsalan" de pir tiştên ecêb hene. Bihewaketina Re meiosa Spehî ya ber bi ezmên û pinpinîkên zer yê ku li dora Mauricio Babilon*

difirin...

– Hemû li ser rastiyê ava bûne.

– *Wek mînak...*

– Wek mînak Mauricio Babilonia. Gava ez pênc salî bûm, rojekê ji bo guher-tina saeta elektrîkê yekî elektrîkçî hat male me ya li Aracatacayê. Wek niha tê bîra min, ez pir di bin tesîra qayîşa wî ya ku ji bo ew nekeve wî xwe bi darê ve şidandibû, de mabûm. Ew gelek caran dihat. Tê bîra min carekê pîrka min "Ev peya kengî were, pinpinîkên zer jî bi wî re tîn" got û bi kevnikekî pinpinîkek diqewirand. Ev pêşnumaya Mauricio Babilonia ye.

– *Lê fikra kişandina Remediosa spehî ya ber bi ezmên ji ku tê?*

– Min pêşî plan kiribû gava ew bi Rebecca û Amarante re nexşan çêdike, ez ê wê ji navê rakim. Lê paşê kêfa min ji vê sehneya hema hema sînemayî re nehat. Diviyabû Remedios hê jî li wan deran bimaya. Paşê fikra ku ez wê ber bi ez-mên ve bifirînim hate bîra min. Rastiya bûyerê? Neviyê pîrekê di berbangê de ji malê baz dide; ji bo ew bazdana zarokê veşêre, ew dibêje ku neviyê wê firiya-ye ezmên.

– *Te di derekê de nivîsandibû ku firandina wê ne hêsan bû?*

– Erê, ew bi tu celebî nikarîbû ji erdê bilind bibûya. Ji ber ku min nikarîbû riyek ji firandina wê re bidîta ez dîn dibûm. Rojekê, gava ez bi vê pirsê re mijûl bûm, ez derketim baxçe. Pir ba dihat. Jineke zencî ya pir mezin û pir xweşik ku kincên me dişuştin, hewl dida li baxçe kincan bi benekî ve daliqîne. Çênedibû, ew ber bê diçûn. Min hingî xwe bi got "A ev e ya ku ez lê digirim." Ji bo ku Remediosa spehî bikarîba bifiriya, hewcedariya wê bi şeltê spî hebû. Di vê bû-yerê de, şelte ji rastiyê tê. Gava ez vegeriyam ser dektîloya xwe, bêh ku Remedi-osa spehî pêrgî tu zehmetiyan were, ew firiya û çû. Xwedê jî nikarîbû ew rawes-tanda. □

Wergera ji swêdî: Firat Cewerî

Ev beş ji pirtûka bi navê *Samtal med Marquez* hatiye wergerandin. (Weşanên Wahlström û Widstrand, Stockholm 1983)

* Mercedes jina Marquez e

Gabriel Garsia Marquez di sala 1928'an de li Colombiyê hatiye dinyayê. Wî di sala 1982'an de xelata Nobel ya edebiyatê girtiye. Bi romana xwe *Tenêtiya sedsalan* navdar e.

Albert Camus

Fawaz Husên

Camus demeke kurt li ser rûyê erdê dijî. Lê di vê jiyana kurt de, ew pirsên herf girîng û serekîn li ser meneya mirov û çîhanê ji xwe dike. Di çarçefa van pirsên girîng û jiyana xwe ya zehmet de, Camus behemên xwe ava dike û nêrînen xwe bi nav dike.

Albert Camus li Cezayirê li bajarê Modoviyê li herêma Konstantînê ji diya xwe dibe. Bavê wî di sala 1914an de dimire û Albert biçûkaniyeke pir perîşan li taxeke zîvar û gelêrî ji taxên serbajarê Cezayirê bi diya xwe re derbas dike. Di şanzdehsaliya xwe de ew bi nexweşiya jana zirav dikeve. Lê li gel zîvarî û nexweşiyê ew xwendina xwe ya navîn û paşê jî ya bilind bi serbilin-



BIYANÎ
Albert Camus
Wergêr: Fawaz Husên
Weşanên Nûdem

dî derbas dike. Camus dixwaze bijî, bizanibe ka doza mirov di çîhanê de çi ye, çi girîng e, çi pûç û bêmene ye. Hemû şeweyên hizrê bala wî dikişînin û ew dikeve nava jiyana rewşenbîrî, bi karê şanoyê radibe, dest bi rojnamevanîyê dike, dibe

endamê partiya komnîst ji bo azadbûyîna gelê nîsilman xebatê dike. Carr piştî salên xizaniyê bi tajiyanê dikeve û dixwazê zîncîra zîvarî û neçariyê şikîne, dilê xwe bide ber xwe ka havînê û pêlên peraderyayê û xweşiyê. Ew ê rengtir bêje ku ew gotiye azadiyê ne ji Marks hîn bûye lê ji tengasiyên jiyanê xwe. Di van salên pêşîn ew Rû û Pişt (1937) û Şanoyên Zewacê (1938) dinivîsîne. Piştî zarotîtiyeke zehmet, ew bi van herdu pirtûkan evîna xwe ji jiyana diyar dike.

Gava Cenga Duwêr dest pê dike, Camus dixwaze şer bike, bibe leşker, lê ber nexweşiya wî, daxwazê wî bi cîh nabe. Di s-

1940î de, ew Cezayirê û Afrîqa Bakur li dû xwe dihêle û berê xwe dide Parîsê.

Albert Camus her gav li ser zehmetiyên jiyânê dirame, bi dirêjayî difikire. Li Parîsa şikestî, ew aloziyên serdemeke pir têkel û diwar dibîne. Wilo jî, nêr-nên wî li ser pûçiya jiyânê hin bi hin xurtir dibin û ciyekî mezin di nav ramanên wî ên felsefî de digirin. Ew di Parîsa bîndest de bi valabûna jiyânê dihese û Biyanî dinivîse. Fikira vê romanê bi xwe ji mêj ve di serê wî de ye; Camus ji sala 1937an de dixwaze tiştekî wilo binivîse. Li Parîsa di bin destê faşîstên Hitler de, ev pirtûk di sala 1940î de bi gewde dibe û di 1942an de çap dibe. Camus esseyekê bi navê Afsaneya Sisyphê bi vê pirtûkê re çap dike, weke ku dixwaze ku ew tiştekî bi tiştekî din bide rohnak û xuyakirin. Ew paşê du şanoyan: Şaştêgîhaştin (1944) û Caligula (1945) dinivîsîne. Hemû berhemên vê demê li dora milê pûçiyê digerîn.

Piştî pûçiyê rêyeke din li ber Camus vedibe û tevger


û berxwedana mirovan di rûyê aloziyên jiyânê de meneke din di serê wî de distînin. Camus di nav jiyana xwe ya rewşenbîrî de rê de serdemeke nû : serdema mirovê ku serê xwe bilind dike. Ew anuha dibîne ku giring e ku mirov meneyekê bidin hebûna xwe li ser rûyê erdê. Mirov gerek destên xwe bidin hev û di rûyê napakiyê de rawestin. Di rûyê bêdengiya Xwedê û dunyayê de, qehrmanên pirtûka Wêba (1957) di rûyê rencê û bayê hovitiyê de xwe dikin yek û dawiya dawîn bi ser dikevin. Camus pesnê berxwedanê, tevgera civakî di Mirovê serîhilda (1951) de jî dide.

Lê pêwendiyên di navbera mirovan de herdem pêwendiyine zehmet in, Camus di vê yekê de xweş digihêje û pê dêşe. Rewşenbîr nikare bi jiyânê re bingehên danûstandinên xurt saz bike. Hîsa gunehkarî û naçariyê roj bi roj mezintir dibe. Hunermend dunya dora xwe fêr nake û bêgav dibe bar bike, bide ser rêya surguna hundirînî. Camus di

sala 1957an de Xelata Nobelê li Stockholmê digire û di gotara xwe de dîsa li ser pîrsa şaşîtiyê, li ser surgun û tenhayiya mirovê rewşenbîr diaxîfe. Ew nivîsên xwe li ser Cezayirê di Nûçeyên Teze de berhev dike lê ev pirtûk gelekî deng nade û di nav sersariya mirovan de zû tê ji bîr kirin. Camus xwe ji bo romanekê nû amede dike dema trumbêla wî ji ser rêya xwe derdikeve, dide ser rêya mirinê. Gelo ev rêya nû bi dilê Camus ye? Bersiva vê pîrsê zehmet e ji ber ku Camus gelekî di nivîsên xwe de behsa pûçiya dunyayê dike û pesnê xwekuştinê dide. Ew bi dirêjayî li ser vê pîrsê ramiyaye, nexasim di Efsaneya Sisyphê de, di xuşka cewî ya pirtûka Biyanî de. Camus di sala 1960î de di çel û heftsaliya xwe de mîna çirakê vedimire.

Mirov dikare anuha ji xwe bipirse çima ev pirtûka biçûk wîqasî deng da û bi sed caran hat çap kirin û wergerandin? Bêtirî pênç salî piştî derketina wê li weşanxaneya Gallimardê, ev

pirtûka hêna bala rewşenbîr û hemû xwendevanan bi xurtî dikişîne û hêna tê wergerandin. Çima? Çi di vê pirtûkê de heye ta ku ew bibe berhemek di nav bernameyên xwendegehên biçûk û bilind de? Çima ew bûye berhemeke cihanî, geytî? Bersiv bêguman e dirêj be lê mirov dikare bi kurtî bibêje ku berdewama vê pirtûkê bêguman bi hurnermendiya Camus û bi nêrînen wî li ser pirsra pûçiyê girêdayî ye. Her yek jî dikare rojekê ji rojan xwe di Meursault de bibîne. Her yek ji me dibe ku rojekê xwe biyanî di nav kesên biyanî de û di çîhaneke biyanî de bibîne. Kî dizane, belkî her yek ji me gelek caran di temenê xwe de wek Meursault dixwaze xwe di nava "Sersariya dilovan ya çîhanê de" ji bîr bike. □



MÎRZAYÊ BIÇÛK
Antoine de SAINT-EXUPÉRY
Wergêr: Fawaz Husên
Weşanên Nûdem

Antoine de SAINT-EXUPÉRY (1900-1944) li bajarê Lyonê di 29'ê meha şesan de ji sala 1900'î ji diya xwe dibe. Di çarsaliya xwe de, Antoine bavê xwe winda dike û sêwî dimîne. Lê rewşa malbata Saint-Exupéry xweş e û liigel mirina vî bavî, Antoine û zarokên din bi diya xwe re biçûkaniyeke xweş dibînin.

Di sala 1909'an de diya wî li Mansê bi cih dibe û Antoine li wê derê di-

bistanê. Ev salên xwendin zaroktiyê ciyekî mezin e nav biranînen wî de digirin. Antoine wê paşê binivîsîr ku li ser her masê ji masê dibistanê, wî hinek ji wê dilovaniya zaroktiya xwe hiştiye.

Di sala 1912 ew çav li balafirê dikeve, dibîne çav ew bi asamanan dikeve. Wê gavê, daxwaza firîne hinava wî de ciyekî mezin digre û gava yê balafirva rêdigihêje ku ev zarok dixwaze li balafirê siwar be, ew daxwaza dilê wî li gewde dike û wî jî, ji cara yekemîn di duwan dehsaliya xwe de, Antoinê hîsên xweşî û azadiyê nêrî dike. Ev bûyera hanê şûra xwe di dilê Antoinê zaro de çêdike û firîna ji wê rojê re dibe mebest û armanca

Di destpêka Cenga Cihanî ya yekemîn de, Antoinê û birayê xwe François deri bajarê Frîbourgê li Swîsê xwendina xwe li wê derberdidomînin. François li nexweşiya dil dimire û Antoine gelekî li ber mirina wî lawikê panzdehsalî dikeve. Ew xwendina xwe ya navî

tev dike û tê Parîsê. Ew di beşên zaniyariyê û nemaze di matematîkê de xurt e lê belê di nivîsandina salixdanan de hinekî qels e. Ew di xwendina xwe de bi ser nakeve û sala 1919'an ew li zanîngehê dikeve beşê Hûnerên Xweşik.

Di sala 1921ê de, ew leşkeriya xwe dike, dibe hostê balafirvan. Ew peran ji diya xwe dixwaze û hîn ajotina balafirvan medenî dibe û dîploma xwe ya balafirvanîyê digre. Lê rêya firê hêna li ber wî dirêj e. Piştî çend salan, ew li bajarê Toulousê di kargeha balafirvan de kar dike. Di 1927'an de xewna wî ya kevin û şîrîn bi gewde dibe. Ew bi balafirê nameyan ji Toulousê dibe Kazablankayê, li Afrîqa bakur û, ji wê derê jî, di ser Sehayê re, ew wan digihîne bajarê Dakarê. Ew di sala 1928'an de navê ku li ser kîsên postexanê Nameyên Başûrê li romana xwe ya pêşîn dike. Ew di vê pirtûkê de li ser jiyana û zehmetiyên balafirvanan dinivîse. Weşanxane gelekî kêfa xwe ji vê romanê re diyar dike û

ji Antoine de Saint-Exupéry dixwaze ku ew ji bo wê heft romanên din binivîse. Ev peymana pîrozwer tiştêkî mezin di jiyana Antoine balafirvan de naguherîne ji ber ku ew her karê xwe, wek berê, berdeham dike. Ew bi balafira xwe rêya Europa û Argentînayê vedike. Ew romana xwe ya duduyan Fira bi şevê di sala 1931ê de çap dike û mara xwe li jineke argentînî dibire. Nivîsên Antoine de Saint-Exupéry deng didin û Erda Mirovan (1939) Xelata Mezin ya Akademiya Fransî digire.

Cenga Cihanî ya duyemîn dest pê dike û Antoine de Saint-Exupéry gelekî li ber şikestina Fransayê dikeve. Ew xwe digihîne Amerîkayê û li wê derê, Balafirvanê Cengê û Nameyek ji bo girtîyêkî dinivîsîne. Ew çîroka Mîrzayê Biçûk li Nû Yorkê di sala 1943an de di-de çap kirin û paşê berê xwe dide Cezayîrê. Ew xwe digihîne hevalên xwe ên balafirvanîyê. Ew anuha çel û sê salî ye û temenê herî mezin ji bo ajotina balafirvan bi

xwe sî û pênc e. Lê bi saya dost û nasan, ew balafirê dajo. Di 31 meha heftan de ji sala 1944 şopa wî di firanehan de bi giştî winda dibê û kesek nizane balafira wî li kuderê dikeve.

Tiştê ku ji van pirtûkan xuya dibê ew e ku Antoine de Saint-Exupéry hemû berhemên xwe li ser jiyana balafir û balevirvanîyê, ango li ser jiyana xwe ya kesane û rojane, ava dike. Antoine nivîskar zora Antoine balafirvan nabe. Ew bûyeran di kirasekî edebî de rêz dike û di nav van rêzan de peynamekê digihîne xwendevanan, moralekê, suncekê bi gewde dike. Nivîskar pesnê tevgerê, jiyana mirovan dide. Ew dibêje ku tenê tevger û berxwedan dihêlin ku meneyek ji jiyana re çêbibe. Gava mirov xwe ji can û dil dide kar û barên xwe, ew tixûbên mirinê her gav dûr dixîne û rêya bexteweriyê fireh dike. Di xwêdan û daxwazên mirovan de meneyek ji jiyana re çêdibe. Fransa rûmeteke mezin dide Antoine de Saint-

Exupéry. Ji bo bîranîna pêncîsaliya mirina wî, banka fransî wêneya nivîskar û nigara *Mîrzayê Biçûk* li ser kaxeza pêncî frangî dixîne.

Pirtûka *Mîrzayê Biçûk* di nav berhemên Antoine de Saint-Exupéry de bi rastî ciyekî taybetî digre. Ew bi babet û naveroka xwe ji hemû pirtûkên din cihê ye. Ji navên pirtûkên din mirov dikare bizanibe ew li dora çî mijaran digerin. Eger ceng û serêşên jiyane ciyekî mezin di nav wan de dibînin, pirtûka *Mîrzayê Biçûk* cîhaneke bi serê xwe ye, berhemeke yekta ye. Ew di nav serdemên harbûyînê de xewneke xweş e, di nav sedsalên dijminatîyê de bîstîkek dilovanî ye.

Di jiyana xwe ya kurt de, Antoine de Saint-Exupéry di nav herdu cengên cîhanî de derbas dibe. Ew tenê di zaroktiya xwe de demên kêfxweşî û pakîyê dibîne. Gava ew “mezin” dibe, ew bêgav dibe bikeve nav cengê û bi “Mirovên mezin” re pêwendîyan çêbike, bijî. Di

vê jiyana dorgirtî de, xewn rêya xelasê di rûyê wî de vedike, xewna xweş her gav bang wî dike. Wilo jî gava bayê hovitiyê gûr dibe û xwînxwar li bajarên Europayê li laşan digerin, Antoine di serê xwe de dûrî navendên bajarvaniyê, dûrî cengê dikeve. Ew li balafira xewnan siwar dibe, diçe Biyabanê, diçe Sehraya Afrîqayê û li wê tenhatiyê, wek piraniya pêxemberan, tiştên ku bi çavan nayên dîtin ew wan bi dilê xwe dibîne. Li wê derê ew pêrgî mîrzayekî biçûk tê û herdu, bi hev re, li rastiya tiştan digerin û aveke ne wek hemû avan vedixwin: ew li bîra dilovaniyê digerin û wê di bilindbûna hîsên pak de peyda dikin. Antoine de Saint-Exupéry dûrî Fransa şikestî, li Amerîkayê, tevnê vê xewnê kok dike. Ew bi vê berhemê, ango bi vê xewnê, salên reş li paş xwe dihêle û xwe davêje nav pêlên demên zaroktiyê. Dûrî “Mirovên mezin” ên tenê ji tiştên vala hez dikin, ew hîn


jiyana rastîn dibe, xwe kirasê mîrzayê biçûk de nadike. Balafirvan û nivîskar bi saya vê xewnê, bi alîkariya wê diltenikiyê, dikarin herdu xwe bigihînin wê hêviyê. Xewnên rojane dikarin deriyê jiyaneke sade ber wî vekin. Antoine de Saint-Exupéry di baweriyê min de dixwaze bêje ku hê kes dikare li balafira xewnan siwar bibe û pê mîrzayekî biçûk bibe, hê kes dikare vegere dilpakîyê zaroktiyê û hîsên xêrxwaziyê.

Eger ez ne şaş bim, peyxa Antoine de Saint-Exupéry di vê pirtûka biçûk de ê tiştêkî wilo bi Xwendevan dikarin bi gelek şêweyan wê pirtûka hîsên bixwînin. Lê belê ew zarok dikarin bi gelek hîsên nî têbigihêjin, ew ê ji bi “mezinan” gelekî zehmet be. Kûranî bi çavên mezinan hatiye û ta ku ew bikişibin wê pirtûkê bixwînin gerek pêşî ew li dilpakîyê zaroktiya xwe bigerin. Ew dikarin wek mîrzayê biçûk

û nivîskar xwe hîn bikin çawa tiştên ku bi çavan nayên dîtîn bi dilê xwe bibînin. Wilo jî ev pirtûka xweş di serdemên tîbûnê de wê bibe tasek ava hênîk, di birçîbûnê de gepek nanê germ û di rojên tengezariyê de awazek xweş û dilnişîn.

Eger kêmasiyên wê wergerê hebin, -û bêguman wê hebin,- ez bexşîn û lêbihurîne ji xwendevanên biçûk û mezin dixwazim. Min ev berhem bi kelecane wergerand ji ber ku min xwest ez zû reşbeleka evîn û lêbihurîne ya di serpêhatiya mîrzayê biçûk de bigihînim xwendevanan. Ev berhem dixwaze me fêr bike çawa em bi dilpakî û dilovanî bi kesên li dora xwe bidin û bistînin. Wêk ku rovi ji mîrzayê biçûk re dibêje, tişteki békêmasî rune. Lê belê eger mirov hîn bibin bi dilpakî li tiştan binerin, kêmasî bêguman beyî ku rabin wê gelekî kême bibim. □

Dr. Fawaz Husên



LI BENDA GODOT

Samuel Beckett

Wergêr: Firat Cewerî

Weşanên Nûdem

Samuel Beckett ku yek ji nivîskarên sedsala me yê mezin e, di sala 1906'an de li Îrlandayê, li bajarê Dublînê hatiye dinyayê, di sala 1969'an de xelata Nobel ya edebiyatê girtiye û di sala 1989'an de jî wefat kiriyê.

Digel ku wî gelek roman û kurteçîrok jî nivîsandine, di sê ew li dinyayê mîna dramatikvan û bi vê berhemê xwe *Li Benda Godot* navdar e. *Li Benda Godot*

drameke bi heyecana nedîtî, bi qerf, bi xumam û provokativ e.

Li ser riyekê, li ber dareke rût Estragon û Vladimir rûniştine. Ew difikirin ku xwe bi dar ve bikin, biryar didin ku ji hev veqetin, lê tenêti bi wan zor tê. Ew pev diçin, digirîn, distirên. Ew carina xwe ji bîr dikin ku ew li benda Godot ne. Godot ji wan re soz daye ku ew ê were... □



BEXÇEYÊ VÎŞNE

Çexov


Wergêr: Firat Cewerî

Weşanên Nûdem

Jack London

Di dawîya sedsala 19-an û di destpêka sedsala 20-an de, hem li dinyayê û hem jî li Amerîkayê gellek guhertin çêbûn. Mirovatî ji qonaxekê derbasî yeka din dibû. Di pêvajoya vê derbasbûnê de, pêşveçûnên ku di warê teknolojiyê de hatin holê û guhertinan tesîr li têkiliyên mirovan kirin û jî nû ve şikil dan wan, bi gellek awayan hatin zimên. Edebiyat jî li hember van guhertinan nikarîbû laqayt bima. Xwendevan di nava rûpelên berhemên nivîskarên wê demê de, xusûsiyetên wê demê û manzarayên însanên wê demê jî nû ve dijîn.

Jack London jî yek ji wan nivîskarên ku damga xwe li dawîya sedsala 19-an û destpêka sedsala 20-an xistine, ye. Belkî nivîskarê herî pro-



ZAROKA ŞEVÊ

Jack London

Wergêr: Mustafa Aydoğan
Weşanên Nûdem

duktîv û yê ku behsa wî herî bêtir tê kirin, be jî. Di wê demê de, kêman nivîskarên bi qasî wî tesîr li civakê kirine. Li gel ta'ma xwendinê nivîsên wî, enteresantbûna jiyana wî jî bala mirov diqêşîne. London ne bi tenê di nava xwendevanên edebiyatê de tê nas kirin. Ew mirovekî pirralî bû. Di na-

va hemû aliyên vê pirra bûna wî de, ji aliyê şiyar nivîsandinê ve ahengê pirr baş hebû. Lê ji bo nas kirina London, lêhûrbûn jiyana wî ya zaroktiyê şert. Bêî vê yekê, fahmkirina wî û nivîsên wî, dê pirr zêde met be. Ger mirov bibêjê hema hema hemû pirtûkên wî yê edebî, li ser bingel wan hedîseyên ku ew bûyê şahidê wan, an jî yê ku ew bi xwe jiyane, hatine avakirin, dê ne mubalaxe be. Ew numûne di "Xwêdana Eniyê" de xusûsiyetên zaroktiyê ya London bi awakî pirr wî nas kirî xuya dibin. Ji bo ku bi wî be yê herî xurt, yê herî pirr û yê herî bilind bi awal nedîtî xebitî. Ji bo xwe herî warî de bi mirovan bicî qebûl kirin û mirov li herî ber van xusûsiyetan ser xwe bitewîne, çî ji destî v-

dihat teksîr nedikir. Ev daxwaza û hewildanên ji bo pêkanîna van daxwazan, di jiyana wî de, di danûstendin û helwestên wî yê li hember mirovan de tesîreke gellek mezin kir. Di kîjan grûpê de ba, bila biba, wî hertim dixwest ku ew bibe yê sereke. Ev di pirtûkên wî de, di xusûsiyetên qehremanên wî de, tê dîtîn. Ger hûn Londonê ku hertim digot; “Zaroktiya min qet çênebû”, Johnnyê “Xwêdana Eniyê” yê ku di kar de nedixwest tu kes bighêjê û qet tu zarokî nejiya, tîne bîra mirov.

Di pirtûkên wî de heyecaneke mezin heye. Heyecan û hêviyên qehremanên pirtûkan, bi zimanê Londonê ku diherike û bûyeran bêtir enteresan dike ve xwendevanan bi temamî dixin seha xwe ya magnetîk. Ev xusûsiyet meraqa xwendevanan û heyecana ku di berhemê de heye, tev li hev dî dîke. Xwendevanên ku piştî dest bi xwendina pirtûkeke wî dikin, êdî ne bi destên xwe ne. Heta ku pirtûk biqede, nema di-

karin dev jê berdin.

Rastiya civakê û protestoya li hember şertên jiyane, bingeha nivîsên wî bû. Lê wî hemû hêlên ve tastiyê, di bin ronahiya zanyariya edebiyatê de, dianî ba hevdû; heyecan û hîsên xwe tevê dikirê: ew bi hemû şiyana xwe ya hunerî distira; bi îdealên xwe yê pêşerojê ve dihûna û piştî gîhaştina qonaxa yêkîtiya diyalektîk ya di navbera estetîk û rastiye de, ji nû ve pêşkêşî civakê dikir. Ji ber vê yekê, London wî cihê xwe yê ku di dilê xwendevanên edebiyatê de hatibû peydekirin hîn jî diparêze.

Min li jor diyar kir ku London nivîskarekî pirralî bû û di nava ve pirralîbûna wî de ji aliye şiyana nivîsandinê ve ahengek hebû, lê divê lê bête zêdekirin ku ev aheng di warê fikrî de cihê xwe ji dijayetiyan re dihêle. Ji ber vê yekê ew nivîskarekî bi şiyana, lê bi paradoksan ve hilmîştî tê dîtîn. Li gor gellek lêkolîneran fikrên wî ji tevliheviyeke Marks û Nietzsche pêk dihat. Sosyalîzm, neteweperestî, elîtîzm,

nîjadperestî... Wî hertim weha digot; “ Ez berê sipî mim û dî re sosyalîst im”. Vê helwesta wî carinan serê wî dixist belayê jî. Bo numûne; ji nîjada zer nefreteke mezin dikir. Gava li Japonayê bû, ji ber vê nefretê xwe di munaqeseyekê de li yekî Japonî dixê û tê girtin. Ger serokê Dewletên Amerîkayê yê Yekbûyî Roosevelt mudaxele nekira, ew ê bi şertê ku divê Japonayê terk bike jî nehata berdan. Paradoksa di warê fikrî de hebû, bi Şerrê Cihanê yê yekem re, giraniya xwe da aliyekî. Di Şerrê Cihanê yê yekem de, hêla wî ya neteweperestî pirr êşkere bû. Wî di vî şerrî de bi awakî neteweperest piştgiriya Amerîkayê kir û dî re jî têkiliyên xwe ji Partiya Sosyalîst birrî. Lê bi paradoksan ve hilmîştîbûna wî, di îstîfanameya wî de jî xuya dibû; wî di îstîfanameya xwe de dîsa prensîpên sosyalîzmê parastibû.

London di 12.01.1876-an de, li San Fransisco hatiye dinyayê. Ew, berhemê wê têkiliya bi dizî ya dîya xwe

(Flora Wellman) û bavê xwe (astrologê Îrlandî William Chaney) bû. Gava hîn ew di zikê dîya xwe de bû, astrologê Îrlandî ji San Fransisco diçe û nema vedigere. Piştî ku Jack dibe nehme, dîya wî bi John London re dizewice. Jack li ba vê malbatê mezin dibe. Ji xwe paşnavê xwe, yanî LONDON jî ji vê malbata zirbavê xwe stendiye.

London xwedî jiyanekê zarokî ya pirr enteresant bûye. Zarokîya wî di feqîriyê de derbas bûye. Ji ber vê yekê jî London di temenekî pirr piçûk de, dest bi jiyana kar kiriye. Wî ji rojname firotinê, ji kovboytiyê, ji lizêgerinê, ji di fabrîkeyan de karkirinê, ji serserîtiyê û hwd heta di 1904-1905-an de, korrespondentiya herba Rûsya û Japonayê, tu kar nema ku nekiriyê. London gelek celeb mirov nas kir û li gelek jîngehên cûda jiya. Jiyanekê bûyêzengîn û enteresant... Nivîsên wî, li ser vê jiyana bûyêzengîn û enteresant hatin ava kirin û bûn zimanê protestoya li hember ne-

heqiyê... Ji ber vê jî tev paradosên wî yên di warê fikrî de hebûn jî ew dîsa wek nivîskarê xebatkaran tê nas kirin.

Nivîskariya wî bi saya musabaqeyê kovara bi navê "San Fransisco Morning Call"ê dest pê dibe. London wê gavê 17 salî bû. Bi çîrokeke xwe ya ku li ser bîngê bîranînên deryayê hatibû avakirin, beşdarî wê musabaqeyê dibe û 25 dolarê xelata yekem werdigre. Çîroka wî di 12-ê Mijdara 1893-an de di Callê de tê weşandin. Piştî vê bûyerê, biryara nivîskariyê dide. Çend çîrokên din jî dinivîsîne, lê wê gavê bi sernakeve û hêviyên wî yên di warê de hebûn jî qels dibin.

Londonê ku xwe bisernekêrî dihesiband di nava bêhuzûriyê mezin de bû, tam di wê navê de Rêxistina Bêkaran "Coxey" bi ordiyê bêkaran ku gellek ji wan sendikavan bûn, ji bo hin daxwazan, berê xwe dabû Qesra Sipî. London jî bi hevlekî xwe re da dû şopa vê rêxistinê. Di vê rêwîtiyê de bû şahidê munaqeseyên

pirsên civakî û siyasî. Di tesîra wan kesên ku di de heqa Marks, Engels, Dîwîn, Nietzsche û hwd gellîşt dizanbûn de ma. Ji bîvê tesîrê gava vegeheriya ma tev li ku 19 salî jî bû, li Lîsa ya Oaklandê dest bi xwe dinê dibe. Beşdariya civîna Partiya Karkir a Sosyalîst jî wê demê dest pê dikir Jack Londonê ku ku bi aşîrê xwendinê dikeliya 1896-an de dest bi Unîversîteya Berkeley dibe, lê wira ancax salekê diqedîn dî re dev ji xwendina unîversîteyê ber dide û nema vedigere.

Ji bo peydekirina zêrê wî jî wek gellek kesên vî demê berê xwe da Klondîkeyê. Wê demê Alaska lîtemamî di bin êrişê zêrgerokan de mabû. Di vê gerîde hem hêviyên dewlîmendbûnê û hem jî heycaneke pirr mezin hebû Londonê ku ji macerayî pirr hez dikir jî beşdarî karwanî bû û berê xwe da Klondîkeyê. London di vî gerrê de dîrhemekê zêr nedîtibû, lê serpêhatiyên ku di pêvajoya êrişê zêran d

hatibûn jiyîn, tiştên ku ew di pêvajoyê de bûbûn şahid, bi serpêhatiyên wî yên zarokî re ew bi bingeheke xurt ve li nivîsandinê sor kir. Ew munaqeseyên li Klondîkeyê di pêvajoya ku ew li zêran digeriyan de, tesîreke mezin li fikrên wî yên ku di warê sosyalîzmê de hebûn, kir. Londonê ku dirhemeke zêr jî peyde nekiribû, dû re bi saya sefera Klondîkeyê bi awayekî din dewlemend bû. Lê tev vê dewlemendbûnê jî ji ber fêrbûna xwe ya pirr pere xerckirinê, gava mir jî deyndar bû.

London piştî vegeza ji Klondîkeyê, bi awakî pirr cidî dest bi xebata nivîskariyê kir. Hinek îddîa dikin ku ger London neçûba Klondîkeyê, ew ê nebûya nivîskarekî navdar. Bi rastî jî tev li ku bi wê musabeqeya kovarê dest bi nivîskariyê kiribû jî çî bû piştî 1898 - an bû, yanî piştî ku ew ji Klondîkeyê vegeziya. Wê demê li Californiyayê gellek kovaran ji bo wergirtina çîrokên wî di ber hevdû de dan. Ji wê rojê û pê ve, rojê

hezar gotin nivîsand û ev prensîp heta mirinê qet xera nekir. Pirtûka wî ya yekem bi navê "Lawê Gur" di 1900-î de ket destên xwendevanan. Ev prensîp hişt ku ew bibe yek ji wan nivîskarên herî produktîv. Di navbera 16 salan de li ser hevdû 49 pirtûk nivîsand. Ji vê tê fahmkirin ku wî salê bi kêmanî 3 pirtûk weşandine.

Jack London di şeva 21.11.1916-an de, ji ber nexweşiya xwe di nava nivînê xwe de bû. Bi şev, ji dermanên ku doktor dabûnê dozajê zêde xwar û roja din çavên xwe bi yekcarî girt. Li gor hinekan sebeba mirina wî, bêdîqetî bû. Lê li gor hinekî din jî wî bi zanebûn weha kiribû û bi vî awayî qedera Martin Eden raqîp kiribû. Gava ku London çavên xwe girt çil salî bû. Wî çil salên xwe qedand, lê ew tev paradoksên xwe yên fikrî jî bi 49 pirtûk (wek Pahniya hesinî-1907, Martin Eden-1909, Qêrîna Wahşetê-1903, Berî Adem-1906, Şampiyon, Geliyê heyvê, Berxwedan, Agir dandan, Kûçikê Sîrkê û hwd)

û gotarên xwe yên bêhejmar ên ku wî li dû xwe hiştin, di dinyaya edebiyatê de, jiyana xwe didomîne.

Jack London ji nava dilê gel û ji kûrahiya civakê dest pê kir, bilind bû, gîhaşt serê keleha cîhana edebiyatê û di çapa dinyayê de, bû nivîskarekî navdar... Ew berhemê Amerîkaya wê çaxê bû. Berhemên wî, hem eyna civaka wê demê û guhertinên ku bûn bingeheke pêşveçûnê ne û hem jî şahidê pêvajoya ji sedsala 19-an derbasî sedsala 20-an bûyî nê ne. □


Mustafa Aydogan

Dostoyevskî

Fyodor Dostoyevskî di sala 1821'ê de li Moskovayê tê dinyayê. Diya wî di salên xwe yê ciwan de wefat dike, bavê wî yê doktor, çikûs, zalim û dijwar jî di sala 1839'an de tê kuştin.

Zaroktiya Dostoyevskî li Moskovayê derbas dibe. Ew di 12 saliya xwe de dikeve dibistaneke rastîn. Lê di dema xwe ya dibistanê de gurekî xwendinê ye. Bi şev û roj dixwîne, ji ber xwendina xwe ya pir wext nabîne ku li dibistanê ji xwe re hevalan çêbike. Hevalên wî yê herf baş pirtûkên wî ne. Ev yeka han heya mirina wî dom dike. Ew xwendina wî ya zêde dinya wî fireh dike, êdî bi awirekî din li der û dora xwe dinihêre, tiştên ku her kes nabînin, ew dibîne û ev yeka han wî di salên wî yê biçûk de diajoser niviskariyê.

Dostoyevskî di sala



ŞEVÊN SPI
Dostoyevskî
Weger: Firat Cewerî
Weşanên Nûdem

1845'an de romana xwe ya pêşî bi navê Mirovên Reben dinivîsîne. Ew romana wî ji aliyê rexnegirên wê demê ve baş tê pesinandin. Di sala 1846'an de romana wî Dubbelgângaren derdikeve. Paşê li dû hev Vârdinan (1847) Herr Prochartjin (1846) Dizê Rastgo ârligNiyetoçka Nezvanova (1849), Qehremanekî Biçûk (1849, lê di 1857'an de derket), ev

romana di destên we de Şevên Spî (1848)

Lê di sala 1949'an de Dostoyevskî ji nişka ve aliyê leşkerên Çar ve tê girtin. Dostoyevskî zêde hember girtina xwe dernêve, lê tenê meraq dike ku ew ji bo çi hatiye girtin. Paşê tê gorin ku sedema girtina wî ew bû ku wî di civnekê de nameyên Belînskiyên qedexê ku ji Gogolî şandibûn, xwendiyê. Gava piştî girtina îfadeyên wan rojekê dibihîzin ku ew ê bo wî sûcê bêne gulebaran kirin, Dostoyevskî ecêl mayî dimîne û ji yê li kêleka xwe re dibêje: "Ma gel bi rastî sûcê me ewçend giran e, ku divê em ji bo wê bêne gulebarankirin?" Hîwilo xeberek ji aliyê Çar ve tê şandin, ku dev ji îdamwan berdin. Lê ew ber Dostoyevskî didin Sibîryayê, wî davêjin nava girtiyê

mêrkuj, diz, narkoman û gelek tade û neheqiyana di-gihîninê. Lê tiştê ecêb ew e, ku Dostoyevskî li wir ji mirovan bi dûr nakeve, gir û nefreta wî li hemberî mirovan çênabe, lê belê hezkirineke bê dawî ya mirovantiyê di dilê wî de çêdibe. Heta ew li hemberî Çarê ku ew mecbûrî wê jiyana zehmet kiribû jî, bi rehim dibe û evîna gelê Rûsyayê di dilê wî de pêl dide. Ev evîn û hezkirina wî ya li hemberî rûsan ewqasî xurt dibe ku, ew carinan mîna şovenîstekî difikire.


Ew çend salên dirêj yê nê surgunê, çî bigire navê Dostoyevskiyê mezin li Rûsyayê dide ji bîr kirin. Lê belê piştî ku ew tê berdan, ew bi tûrikê xwe yê tijî ruhuyetên kûr yê mirovantiyê, dîsan derdikeve pêş. Ew bêî rawestan û li dû hev romanên mîna Xewna Apo (1859), Gundê Stepançikova û Şênîyên wê (1859), Qumarbaz (1866), Gêjik (1869), Sûc û Ceza (1866), Birayên Karamazov (1880) û gelek nivîsarên din dinivîsîne. Ew Dostoyevskiyê

ku hatibû jibîrkirin, dîsan li seranserî Rûsyayê navê wî tê bihîstin, dibe yek ji nivîskarên dema xwe yê herî mezin.

Lê Dostoyevskî mîna hin nivîskarên din yê nê dema xwe berhemên xwe ne di xweşiyê de nivîsandin, wî berhemên xwe li surgunê, di feqîrî, perîşanî û belengaziyê de nivîsandin. Ew mirovekî nexweş, bi êş û azar bû. Ji ber vê yekê ye ku cîhana Dostoyevskî tije mirovên nexweş in, tije mirovên reben in... Ew jî carna yek ji wan e, carna jî psîkoanalîtekek e, dadikeve kûraniya ruhiyeta wan, cîhana wan ya zaroktiyê tev dide, li sedemên derd û problemên wan digere.

Çavkaniya Dostoyevskî mirovantiye. Loma wî heta niha navê xwe parastiyê, pirtûkên wî heta niha aktuel in, navê wî gerdûnî ye.

Armanca weşanxaneyê me ew e ku bi wergerandin û weşandina vê berhema Dostoyevskî, zimanê kurdî bike xwediyê berhemeke nemir û pirtûkeke din li pirtûkxaneyê kurdî ya jar zêde bike. □



MIŞK Û MIROV
John Steinbeck
Wergêr: Firat Cewerî
Weşanên Nûdem

Digel ku dîroka Amerîkayê ne ewçend dirêj e jî, dîsan Amerîkayê gelek nivîskarên nemir derxistiyê. Jack London, Ernst Hemingway, Faulkner, John Steinbeck, Mark Twain û gelekên din... Lê car caran mîna ku John Steinbeck hatibe jibîrkirin, navê wî mîna navê Faulkner û Hemîngway nayê bihîstin. Xelatgirê Nobelê yê 1962'an John Steinbeck, ne bi tenê di çapa Amerîkayê de, herweha di çapa dinyayê de jî nivîskarekî mezin û xwediyê cihêkî bi rûmet e. Xwen-


devanên kurd wî bi romana wî ya hêja *The Grapes of Wrath* "Tiriyên Xezebê" nas dikin. Digel ku John Steinbeck bêhejmar berhemên mîna Tiriyên Xezebê afirandine jî, dîsan ew bê-tir bi vê romana xwe ya kurt *Of Mice and Men* "Mişk û Mirov" tê naskirin. Min bi xwe ne zûde, berî niha bi demeke kurt ev roman xwend. Paşê jî ji şansa min ya çê re, ew mîna piyês dihate leystin; min çû piyês jî dît. Piştî dîtina piyêsê, min biryara xwe da ku ez vê romanê wergerînim kurdî. Mixabin ku min nikarîbû ew ji zimanê wê yê orjînal wergeranda, lê min ew ji ber wergera swêdî û du wergerên tirkî yên cihê cihê wergerand. Hem bi zimanê wê yê orjînal, hem bi swêdî, hem jî bi tirkî navê romanê plural e, lê, li gorî qaîde û rêzimana kurdî, sernaveke plural li romanê nehat; yanî me nikarîbû navê wê bikira "Mişkan û Mirovan" lê me "Mişk û Mirov" danî.

Di sala 1937'an de Steinbeck vê romana xwe ya

kurt pêşî mîna piyêsê dinivîsîne, dixwaze ew mîna piyês li ser dik û sehneyên Amerîkayê bête leystin û jiyan mirovên di civatê de jibîrbûyî ji aliyê raya giştî ve bête zanîn. Lê, tu kes naxwazin vê piyêsê bileyizin û herweha tu weşanxane jî xwe nadin ber çapkirina wê. Ev yeka han hebekî dilê nivîskêr dişikîne, baweriya wî sist dike, lê nivîskarê me ji ser ya xwe danakeve, mijarê jî dest xwe bernade û wê di eynî salê de mîna romanekê dinivîsîne. Ev romana ku di derheqa serpehatiya du mirovan; George hûrik û bîaqil û Lenny eyê girs û kêmaqil, an jî mîna zarokê saf de ye, çîroka jiyan karkerên çiftlikan e. Herdu heval jî hev naqetin, bi hev re ji bo kar dikevin riyên çiftlikan û çiftlik bi çiftlik digerin. Ew mîna goşt û neynûkê bi hev ve ne, her tiştên xwe bi hev re par ve dikin, heta ew şirikên xewn û xeyalên hev in jî.

Mîna xwendevan, mirov bi xwe jî dibe şirikê xewn û xeyalên wan, bi wan re ra-

dibe, bi wan re rûdinê, serpehatiyên wan dijî. □



ŞÎRÊN BIJARTE

Mayakowski

Werger: Süleyman Demir

Weşanên Nûdem

Mayakovkî di sala 1893'an de hatiyê dinyayê û di sala 1930'yî de xwe kuştîye. Ew li Rûsyayê yek ji serkêşên tevgera Futurîzmê bû, piştgirê partiya Bolşevîkan bû û hîmdarê şîra nûjen bû. S. Demir şîrên wî yên bijarte di vê berhevokê de gihandine hev. Lê mixabin di tîprêziyê de şaşiyeke biçûk bûye: *Klama li ser zîndana Redingê* ku berdevama şîra *Li ser wilo* ye, mîna şîreke serbixwe hatiye pêşkêşkirin.

NÜDEM
WERGER

No 1 1996

